


KOVARA LÊKOLÎN Û LÊGERÎNÊ

B Î R

ARAŞTIRMA - İNCELEME DERGİSİ



KOVARA LÊKOLÎN Û LÊGERÎNÊ

B Î R

ARAŞTIRMA - İNCELEME DERGİSİ

B Î R

KOVARA LÊKOLÎN Û LÊGERÎNÊ

BÎR

ARAŞTIRMA - İNCELEME DERGİSİ

Şertên abonetiye

Bo nêva welat salek 30 YTL
Bo derveyê welat salek 100 \$

Çapxane/Matbaa:
Bariş Matbaa Mücellit

Davutpaşa cad. Güven Sanayi Sitesi
C. Blok No: 274, 275, 276

Tel:(0212) 6748528-29

Cîyê Rêvebirinê/Yönetim Yeri:
İnönü caddesi Magül İş Merkezi
No: 49

Dağkapı /DİYARBAKIR

Tel: (0412) 2287828

*Berpirsariya her nivîsê ye nivîskar bi xwe ye.
Mesuliyetiya her nûşeyî ê nuştaxî bi xo ya*

Ji Sê Mehan Carekê Tête Weşandin
Ûç Ayda Bir Yayimlanir

Bûha: 7 YTL

BÎR Reklamcılık -Yayıncılık

Sahibi ve Sorumlu Yazışleri Müdürü:
Turgut ERSOY

Redakte:

Roşan LEZGİN
Remezan ALAN
Seîd VEROJ

Tîprêzî-Mîzampaj: BÎR

e-mail: kovarabir@yahoo.com
kovarabir@hotmail.com

NAVEROK - İÇİNDEKİLER

Çend Pirsgirêkên Kurdolojiyê / 9

Salih AKIN

Université de Rouen - CNRS

Türkoloji Varsa Kurdoloji de Vardır,
Kurdoloji; Kürtlerle İlgili Bütün Bilimleri Kapsar / 15

Martin Van Bruinessen

Kurdolojî ji du Peyvan Pêk Hatiye; "Kurd" û "Zanîn" / 21

Prof. Dr. Celîlê Celîl

ŞOREŞA QOÇGIRIYÊ / 27

Îsmâîl Heqî Şaweys

Sömürge Yönetimi Altındaki Suriye'de Kürtler Ve Kürt Milliyetçiliği:
Siyaset, Kültür Ve Kimlik / 44

Doğu ve Afrika Araştırmaları Okulu

Londra Üniversitesi: Nelida Fuccaro

Mêjûyî Hikumdarîya Şêx Mehmûdê Hefîd / 63

Mela Xalid Ezîzî Motkî

Bangî Kurdistan: 1922-1926 (Silêmanî) /68

Dr. Cemal XEZNEDAR

Rojî Kurdistan: (1922-1923 /Silêmanî) / 92

Dr. Cemal XEZNEDAR

Bangî Heq: Yekemîn Rojnameya Şoreşa Kurdistanê / 110

Dr. Kemal Fuad

Umîdî Îstîqlal: Weşana Agadarî ya Sêyem
Hikumeta Kurdistanê Cenûb / 125

Sidiq Salih

Zarê Kurmancî: (25/5/1926-23/7/1932)

(Yekemîn Kovara Kurdî ya Bajarê Rewandizê) / 153

Dr. Kurdistan Murkrîyanî

Lavij: Mar Basellîos Şimûn / 171

Dr. Felat DILGEŞ

SILÎVA: Bajarê Ku Heft Car Xerab û Heft Carî Ava Bûye / 179

Rohat Alakom

Eliyê Teremaxî û Dîtinên wî Yên li Ser Rêçikên Rêzimana Kurdî li Gor
Pirtûka wî ya Bi Navê "Destûra Zimanê Erebî Bi Kurdî Digel Hinde
Nimûneyêd Farsî û Kurdî" / 192

Mamoste Qedri

Bavê Helbesta Gelêrî û Ferxên Wê / 199

Remezan ALAN

Irak Kürdistanı Bölgesinde Araplaştırma Plânlarının Siyasî Boyutları/ 205

Prof. Dr. Halîl İsmâil Muhammed

Prof. Dr. Sa'dî el-Berzencî

Dr. Hüseyin Tevfik Feyzullah

Gotarên Konferansa Edebiyata Rojhilata Navîn û Pirçandiyê/ 222

Roşan Lezgîn

Destpêk

Wek usûleke adetî em jî dixwazin bi bersivdayîna pirsra "Çima kovarek nû û çima **BÎR**?" dest pê bikin û sedemê derçûn, armanc û rêbaza xebata xwe dîyar bikin. Bêguman wek hebûneke civakî û dîrokî, li hember komelga û mirovatîyê berpirsyarî û wezîfeya me heye. Îro berpirsyarî û wezîfeya me çi ye? Dema em her yek armanc û daxwazên dilê xwe bi rewş û şertên heyî ra raberî hev bikin, wezîfeya me jî dîyar dibe. Ji destpêka dîroka mirovatîyê vir ve, armanca guhartina rewş û şertên heyî, yan jî çalekîya biarmanc bûye bingeh û dînamîka guhartinê. Ciyê ku guherîn hebe, bêşik statuko jî heye. *Em* çi qas bixwazin guhartinê pêk bînin, *yên din* jî ew qas dixwazin rewşa heyî biparêzin û bidomînin. Di encamê de li navbera *me* û *yên din* de têkoşîn û dînamîzmeke berdewam peyda dibe.

Di pêvajoya guherînê de bidestxistin û dîyarkirina zanîna rast û durist, ji bo guhartina rewşa heyî pêdivîyeke bingehî ye. Armanca derxistina kovara **BÎRÊ** jî bi taybetî di derbarê komelga, dîrok, çand û zimanê kurdî de bi giştî jî di derbarê pirrengîti û cûdahiya çandên herêma Mezopotamya û Rojhelata Navîn de bidestxistin û derxistina belge û zanîna rast û durist e.

Îro cografyaya ku em li ser dijîn navendek herî kevnare ya ji navendên şarezayîya mirovatîyê ye. Eger perava Nîlê yek ji wan cîyan be, cîyê din jî Dicle û Firat e. Çavkaniya herî kevnare, çavkaniyên arkeolojî ne. Her wekî têtê zanîn, Kurdistan warê herî kevnare yê çandinî ye, li ser vê axê gelek millet, medeniyet û dewlet pêk hatine, di pêvajoya dîrokê de jiyane û şopa wan hemûyan jî di nav kurdan de heye. Di vê çarçovê de, bêşik di mîrasa şarezayîya Mezopotamya û Rojhelata Navîn de cî û para kurdan ji yê milletên din zêdetir nebe, ne kêmtir e. Bi giştî di pêkhatin û pêşketina çand û şarezayîya mirovatîyê û bi taybetî jî ya Mezopotamyayê de cî û rola kurd û Kurdistanê girîng e. Kedîkirina heywanên kovî, destpêkirina çandinî û hilberîna zad, çêkirina berhemên tevnî û madenî, karûbarê mîmarî û bajarvanî li ser vê xakê rû daye.

Kovara **BÎRÊ**, dixwaze bi lêgerîn û lêkolînên li ser ziman, dîrok û çanda kurdî xwerûtî û aliyên cîyawaz ên çand û dîroka kurd derxîne holê û rastiya wan a dîrokî û civakî pêşkêşî xwendavanan bike. Di vê derbarê de hiş û bîra we ya dîrokî-civakî teze bike, rastiya dîroka civaka kurd û berhemên çanda wê bi ber çavan raxîne û ji aliyên erîni û neyînî, ronî û tarî ve, bi bîra we bîne. Û digel wê jî dê bersiva wan kesên mejişêlûker bide ku bi navê "zanistiyetî" û "pêşverûyî", li miqabilê hemû hovîti û bêperwayiya dagîrkeran, tevgera netewî û civakî ya kurd bi "kevneşopî" û "neteweperestî (?)" tawanbar dikin. Di vê çarçovê de rêbaz û rêgezên me yên bingehî ev in:

* Dîroka mirovayetiye, dîroka hilberîna çandê ye. Çand (kultur), di pêvajoya dîrokî û jîyana civakî de hilberîna hemû nirxên maddî û manewî ye.

* Ji ber sedemên dîyar, dewlet û unsurên dewletên herêmi, naxwazin hebûn û tesîra kurdan di pêkhatina mîrasa şarezayî ya Mezopotamya û Rojhelata Navîn de qebûl bikin.

* Hebûna çandên cûda, dewlemendiya dîrokî ya mirovayetiye. Di herêma em lê dijîn de parastina pirçandîtî û pirrengîtiya çandî, wezîfeya me ya mirovperwerîye ye. Di vê çarçovê de lêgerîn û lêkolînên li ser çand û dîroka kurd, dîyarkirina têkilî û li hev tesîrkirina çanda kurd û milletên din (ereb, faris, tirk, sûryanî, keldanî, ermen, cihû û wd.), yek ji armanca kovara me ye. Lewra, ji mêj ve heta îro çandên cûda hene, lêbelê çandeke yekreng û homojen a li ser yê din de nîn e. Her weha çanda kurd jî ne di ser yê milletên din de ye û ne jî ji ya wan paşvetir û kêmtir e.

* Bêguman di pêvajoya dîroka milletan de serkevtin û têkçûn, wendakirin û îxanet, kêfxweşî û xemgînî, başî û xerabî, rastî û çewtî jî hene. Ronîkirina sebeb û encamên van bûyeran, ji nû ve lêkolîn, honandin û şirovekirina wan yek ji armancên kovara me ye.

* Armanca lêkolîna me ya li ser ziman, dîrok û çanda kurdî ev e, ku kurd wek *subjekteki dîrokî* bigêje bîrewerîya hebûna xwe ya civakî û netewî. Bêşik daxwazên netewî ne tenê bîdestxistina mafê kulturî (çandî) ye, di heman demî de/her weha rêgezê mafê sîyasî ye.

* Li ser ziman (hemû lehçe û devokan), dîrok, wêje (edebiyat) û çanda kurdî pêkanîna lêkolîn-lêgerîn û weşandina cûr bi cûr nivîsar û belgeyên di derheqê vê babetê de, armanca bîngêhîn ya derçûna kovara **BÎR** e. Bi taybetî jî xebatên li ser zimanê kurdî. Lewra ziman, şiklê hebûna netewî ye û binyata bi *xwehesîn* û cûdahîya ji yê di derdixê holê û dîyar dike.

* Her netewe ruh û milkîyeteke hevpar peyda dike, ev ruh, xwe dispêre du bîngêhan, yek jê rabirdu yanî mîrasa bîranînên navxwe ye, yê di jî dilxwazîya bihevrahîna îroyîn e. Wek berhemê ruhê hevpar berhevdan û ji nû ve honandina çîrok, kilam, lavij, heyranok, metelok, serborî û wd. yek ji armanca lêkolînên me ye. Milkîyeta hevpar jî xak e, di mîrasa netewî de xak, çavkaniya objekt û berhemên çandî ye.

* Nirx (helseng) û berhemên çanda kurd, di nav pêvajoya dîrokî de li encafa faalîyeta biarmanc a gelê kurd peyda bûne. Berhevkirin û ji nû ve honandin û şirovekirina nirxên çandî, bîngêha xebata me ye.

* Girîngî pêdana çanda kurdî, nayê wê wateyê ku em parastina fehma netewetîya kulturî dikin, netewetî, di heman demî mafê desthelatbûna sîyasî ye jî.

Xwendevanên birûmet, piştî ku me armanc û rêgezên xwe yê bingehî dîyar kirin, hem wek prensîbeke çapemenîyê û hem jî bo pêşilêgirtina xelet têgihîştinê, divê em agadariyekê bidine we. Yê kovara **BÎRÊ** derdixin, hinek jî wan di pêvajoya derxistina kovara **WARÊ** de jî hebûn. Ji hejmara yekê heta hejmara dawî(16), em naveroka hemû hejmarên kovara **WARÊ** diparêzin. Lêbelê em dixwazin bi xwendevanan bidin zanîn ku kovara **BÎRÊ**, berdewamiya kovara **WARÊ** nî ye.

Kovara **BÎR**, bi çapkirina lêkolîn û lêgerînên li ser zimana, dîrok û çanda kurdî her dixwaze bîra we ya dîrokî û civakî teze bike, bi berdewamî bibe hafiza we ya dîrokî û neteweyî. Ew miletên ku bîra wan a dîrokî û neteweyî bihêz nebe, bûyerên rabirdû yê dîrokî jibîr bikin, bêşik gelek bûyerên pêkhatî yê dîrokî ducar dê di ser wan de werin. Yanî şert û merc û dem bigore jî, dê dîroka wan dubare be. Digel wî yê ku rabirdûya xwe jibîr bikin yan jî nizanibin, dahatûya wan jî nedîyar dibe.

Di vê çarçovê de, qe nebe em dixwazin bûyerên xweş û nexweş ên di vê mehê de qewimî bînin bîra we:

- * 1ê Adara 1979, *Sereokê netewî yê kurd Mistefa Barzanî çû ser heqîya xwe.*
- * 6ê Adara 1921 *Serhildana Qoggirîyê dest pê kir.*
- * 6ê Adara 1975 li hember *Tevgera Azadîxwaz a Neteweyî ya Kurdistanê Başûr Peymana Cezayîrê hat îmzekirin.*
- * 11ê Adara 1970 li *Başûrê Kurdistanê daxwaza xudnuxtariya Kurdistanê hate qebûlîkirin*
- * 11 ê Adara 1991 *rizgarkirina bajarê Hewlêrê ji dagîrkerên Beasî.*
- * 12ê Adara 1971 li *Tirkiyeyê derba leşkerî çêbû.*
- * 12ê Adara 2004 *Qetliyama Qamişloyê.*
- * 13ê Adara 1974 *jina şoreşgera kurd Leyla Qasim hate dardekirin.*
- * 14ê Adara 1903 *roja ji dayikbûna Mistefa BARZANÎ.*
- * 16ê Adara 1988 *kîmyebarankirin û jenosîda helepçeyê çêbû, 5 hezar însan hat kuştin û bi deh hezaran jî hatin birindarkirin.*
- * 18ê Adara 2002 *hêzên hevpeyman dest bi operasyona li dijî rejîma Seddamî kirin.*
- * 21ê Adara *Roşana Netewî ya Kurd, NEWROZ e.*
- * 23ê Adara 1960 *alîm û rewşenbîrê kurd Seîdê Kurdî çû ser heqîya xwe.*
- * 25ê Adara 1976 *serokê Serhildana Agirî Îhsan Nûrî Paşa çû ser heqîya xwe.*
- * 31ê Adara 1947 *serokê Komara Kurd a Mehabadê Qazî Mihemed hat dard êkirin.*

Yekemîn hejmara Kovara **BÎRÊ** di çarçova dosyaya Belgeyên Kurdoloji de, hinek belgeyên balkêş ên kurdolojiyê pêşkêşî we dike û dê her bixwaze belgeyên wisa çap bike.

Meha Adarê jî aliyê pêkhatina bûyerên dîrokî ve ji bo kurdan meheke pîrr girîng e û ligel wî bi xelasbûna zivistan û hatina biharê jî destpêka geşbûna

xweza û bînfirêyîya jiyânê ye. Her weha dema geşbûna kûlîlkên biharê û agirê **NEWROZê** ye. Ji niha ve **NEWROZA WE PÎROZ BE!**

Xwendevanên birûmet, em di vê yekemîn hejmara Kovara **BÎRê** de hinek belgeyên balkêş ên kurdolojîyê pêşkêşî we dikin ku qismek ji wan nêzîkê çarsed sal di ser wan ra derbas bûye. Hûnê di van belgeyan de hinek xal û xisûsiyetên girîng ên komelga û ziman û tevgera kurd binasin. Ji van belgeyan yekemîn *Giramera Kurmancî* ya Elî Termoxî ye, *lavîja* Mar Basellîos Şimûn, li ser *Şoreşa Qocgirî* nivîsîna Îsmâil Heqî Şaweys, li ser *Tevgera Şêx Mehmûd* nivîsîna Mela Xalid Ezîzê Motkî, rojnameyên wekî *Bangî Kurdistan*, *Rojî Kurdisitan*, *Bangî Heq*, *Umîdî Îstîqlal* û *Zarê Kurmancî* rewşa wê demê ya Başûrê Kurdistanê bi zelalî dîyar dike. Digel wê hûnê li ser Kerkûk û wekî dî ji hinek nivîsên balkêş bibînin.

Kovara **BÎRê** di warê xwe de ne yekemîn kovar e û ne jî dê bibe ya dawîn. Hûn xwendevan û dilxwazên kovarê çî qas piştgiri bidin me, ew qas em dikarin astengan li dû xwe bihêlin û kovareke dewlemend pêşkêşî we bikin. **BÎR**, dengê hemû lêkolîner û roşinbîrên kurd e û heman demî dê wek weşanxaneyek jî di xizmeta berhemên ramyarî û edebî yên kurdî de be. Bi hêvîya hevdtîna gelek hejmarên **BÎRê** di nav xêr û xweşiyê de bimînin.

01.03.2005

B Î R

Çend Pirsgirêkên Kurdolojiyê

Salih AKIN

Université de Rouen - CNRS

E-mail : Salih.Akin@univ-rouen.fr

Di van çend salên dawîn de, gelek nivîs di derheqê kurdolojiyê de çap dibin. Kurdolojî bûye navê çend kovaran û her wiha, di sernivîsên gelek pirtûkan de jî cih digire. Bi "kurdologan" re, di derheqê destpêk, dîrok û rewşa niha ya kurdolojiyê de hevpeyvîn tînin kirin. Lê mixabin, ev nivîs, pirtûk û hwd. agahdariyeke bingehîn derbarê kurdolojiyê nadin xwendevanan. Wisa xwiya ku lêkolîner û nivîskar pêdivîya ravekirina kurdolojiyê di xabatên xwe de nabînin û bawer dikin ku her kes dizane kurdolojî çi ye. Ev tunebûn an kêmasiya agahdariyê dibe sedemê tevliheviyê û çend pirsan li ser me ferz dike: Kurdolojî çi ye? Gelo mirov dikare kurdolojiyê weke zanistiyekê şirove bike? Ma ev zanistî serbixwe ye, yan gelo xwedî metod û teoriyên taybetî ye? Mirov çawan dikare xebat û lêkolînên kurdolojiyê rave bike? Em

dixwazin di vê nivîsê de, hewil bidin da ku van pirsgirêkan zelal bikin. Metoda ku em ê di vê xebatê de bikar-bînin, metoda analîza lêkolînan e ku ew jî ji dûr an ji nêzîk ve bi kurdolojiyê ve girêdayî ye. Armanca me ne nivîsandina dîroka kurdolojiyê ye, ji ber ku ew bi xwe karê dîroknasan e. Em hêvî dikin ku bi vê nivîsê re, hin nîqaş di warê kurdolojiyê de dest pê bikin.

1. Etîmolojiya "Kurdoloji"yê

Hêjayî gotinê ye ku divê me dîyar bikira ka cara yekemîn peyva "kurdolojî"yê kengî bi kar hatiye, me bidest nexist. Em nizanin ew kengî, li ku û ji alî kîjan lêkolînerî/an ve hatiye afirandin. Her çiqas em baş nizanibin ev peyv kengî hatiye çêkirin jî, mirov dikare bibêje ku afirandina peyvê bi lêkolînên li ser kurd û Kurdistanê ve

girêdayî ye. Ev lêkolîn di sedsala 18-an de dest pê dikin û di destpêka sedsala 20-an de geş dibin.

Kurdolojî, li gor avasaziya zimanê fransî hatiye çêkirin. Wek tê zanîn, peyva "kurdolojî"yê peyveke hevedudanî ye : ango ew ji du peyvên bi hev ve pêk tê: *kurd* û *lojî*. Peyva *lojî* (logos) ji zimanê yunanî tê û gelek maneyên xwe hene : *axaftin, lêkolîn, mantiq*. Her wiha, peyva *lojî* di afirandina navên zanistî yê wek etnolojî, sosyolojî, biyolojî de jî tê bikaranîn. Ji alî bingeh û etîmolojiya xwe ve, kurdolojî dikare weke *lêkolînên li ser kurdî* bê şîrovekirin. Em dikarin peyvên *kurdnasî/kurdzanî* yê ku li başûrê Kurdistanê tên bikaranîn wek sînonîmên *kurdolojiyê* qebûl bikin. *Kurdolojî*, bi peyvên *îranolojî* û *turkolojî* re dikeve nav eynî paradîgmayê.

2. Ravekirina Kurdolojiyê di Ferhengên Kurdî de

Berî ku em lêkolîn û xebatên kurdolojiyê binirxînin, divê ku em maneya kurdolojiyê ya di ansîklopêdî û ferhangan de diyar bikin. Dema ku peyvek di ansîklopêdî û ferhangan de cîh digire û tê ravekirin, ev yek bi xwe jê re dibe nîşana prestîjê. Gelek peyv hene ku mirov wan di jiyana rojane de pîr bi kar tîne, lê mirov nikare wan di ferhangan de bibîne. Gava ku peyvek di ferheng an ansîklopediyekê de cîh digire, ev yek statuyeye taybetî dide wê peyvê. Ew dibe xwedî nasnameyek ku xwe li zimanaxêvan ferz dike da ku ew wê fêr bibin.

Bi qandê ku em dizanin, tu ansîk-

lopediyên, di ravekirina peyvên de, cîh nedaye kurdolojiyê. Bêguman, tunebûna ansîklopediyên kurdî yek ji sedemên vê kêmasiyê ye. Lê di ansîklopediyên ku bi zimanê biyanî hatine nivîsandin de jî, deqa (madeyê) kurdolojiyê tune ye. Wek nimune, Ansîklopediya Îslamê, di cîlda xwe ya 5-an de, deqeke bi navê "Kurd û Kurdistan"ê çap kiriye. Ev deq jî alî kurdologên bi nav û deng yê wek V. Minorsky, D. N. Mackenzie û T. Bois ve hatiye nivîsandin. Deqa ku ji 48 rûpelan pêk tê, di çapa 1986-an de hatiye nûjenkirin. Lê, ne di deqê de û ne jî di tevayiya ansîklopediyê de navê kurdolojiyê derbas dibe. Her wiha, di Ansîklopediya Universalis (1996) û Ansîklopediya Britanica (2000) de jî, tu agahdarî di derheqê kurdolojiyê de peyda nabe.

Her çend ansîklopedî cîh nedin kurdolojiyê jî, çend ferheng wê didin nasîn. Dîsa jî ev ne ferhengên kurdî-kurdî, lê du ferhengên inglîzî - kurdî ne û ferhengeke tirkî-kurdî ye. Ferhenga kurdî-tirkî û tirkî-kurdî ya Îzolzî (1992) û ya Torî (1999) cîh nadin kurdolojiyê.

Her wiha, di ferhenga J. Blau (1991) a bi kurdî - tirkî - fransî - inglîzî de, deqa kurdolojî û kurdologê peyda nabe. Balkêş e ku lêkolînereke ku weke kurdolog tê nasîn, di ferhengê xwe de tu cîhî nade kurdolojiyê.

Di her du ferhengên inglîzî - kurdî de ku deqa kurdolojiyê heye, agahdariyeye girîng peyda nabe. Ferhenga S. Sadallah (2001, r.620) tenê wergera peyvên "kurdology" û "kurdologist"ên bi kurdî dide:

Kurdologist. *Kurdzan, Kurdnas*
 Kurdology. *Kurdzanî, Kurdnasî*
 Di ferhenga tirkî-kurdî ya Farqînî (2000, r.783) de jî, em tenê wergera peyvên "Kürdoloji" û "Kürdolog"ên bi kurdî dibînin.

Kürdolog. *Kurdzan, Kurdnas, kurdolog*
 Kürdoloji. *Kurdzanî, Kurdnasî, Kurdoloji*

Bi tenê ferhenga M. Chyet (2003, r.338), bi ravekirina deqa "kurdologist"ê, di derheqê kurdolojiyê de agahdariyan dide.

Kurdîzan 1. *Kurdish-speaking. Who knows or speaks Kurdish*

2. *Kurdologist, one who studies the Kurds, their language, history and folklore.*

Bêguman, manaya ku bala me dikişîne, manaya diduyan e. *Kurdologist* (kurdolog) wek kesekî ku di derheqê kurdan, ziman, tarîx û folklorê wan de lêkolîn dike tê nasandin. Kurdolog jî wek lêkolîner û pisporê vî karî tê peji-randin.

3. Lêkolîn û Xebatên li ser Kurdolojiyê

Weke ku em dibînin, kurdolojî di ansîklopedî û ferhengan de cîhekî mezin nagire, ev yek bi serê xwe jî nîşan dide ku kurdolojî hîn jî negihîştîye qonaxa zanistîyeke gerdûnî. Her çiqas di ansîklopedî û ferhengan de agahdariyeke girîng tunebe jî, em baş dizanin ku xebat û lêkolînên kurdolojiyê pîrr girîng in. Em niha jî dixwazin xebat û lêkolînên li ser kurdolojiyê binirxînin.

Hêjayî gotinê ye ku çavkaniyên me jî şeş lêkolînên di vî warî de pêk tên.

Bi awayekî giştî ev lêkolîn peyva *kurdoloji* / *kurdnasiyê* di sernivîsên xwe de bi kar tînin. Em wan li jêr li gor rêza alfatik pêşkêş dikin :

Bayrak M. 1994, *Açık-Gizli / Resmi-Gayriresmi Kürdoloji Belgeleri*, Özge yayınları, Ankara, 602 r.

Benningesen A. 1960, "Les Kurdes et la kurdologie en Union soviétique", *Cahiers du Monde russe et soviétique*, n°3, Paris, r.513-530

Milhemmed H., Nebez C., Marif A., Kurdo Q., 1974, *Kurdnasî li Europe*, Kori Zanyari Kurdi, Bexda, 160 r.

Mokri M. 1963, "Kurdologie et enseignement de la langue kurde en URSS", *L'Ethnographie, Revue de la Société d'Ethnographie de Paris*, r.71-105

Pirbal F. 1998, *Serçawekanî Kurdnasî*, Gelawejî Niwê, Silemanî, 116 r.

Rohat, 1987, *Kürdoloji biliminin 200 yıllık geçmişi (1784-1987)*, Komkar Yayınları, Köln, 217 r.

3.1. Kurdolojiyê Wek Lêkolîna Dokûmantasyonê

Di nav çavkaniyên me de, du pirtûk bala me pîrr dikişînin. Ew pirtûkên M. Bayrak û Rohat in. Ya pêşî hêvîyeke mezin dide kesên ku li lêkolînên kurdolojiyê digerin û dixwazin, wek me, wan bixwînin. Lê dema ku mirov pirtûkê vedike û çend rûpelan jê dixwîne, hêviyên mirov ên destpêkê zû pûç û wenda dibin. Bêguman, em bikêrhatina pirtûkê înkâr nakin, ew ji bo hemû lêkolîneran çavkaniyeke girîng a dokûmantan e. Pirtûk, bi lêgerinekê dûr û dirêj, gelek dokûment û belgeyên dîrokî, peyman, axaftin, gotar, nivîsên rojna-

man ku di derheqê Kurd û Kurdistanê de hatine nivîsandin pêşkêşî xwendevanan dike. Ev bi serê xwe xizmetekemezin e. Lê mixabin, ji van belge û dokûmentan, mirov nikare yekê jî weke lêkolîneke zanistî nîşan bide. Pîrtûk weke koleksiyona dokûmentên dîrokî dimîne. Xebatên wiha bitenê dikarin rola arşîvê bilîzin. Loma, bi dîtina me, bikaranîna "Kurdolojî"yê di sernivisa pîrtûkên wiha de ne karekî di cîhê xwe de ye û dibe sedemê tevlihevîyê. Her çiqas xebat û lêkolînên dokûmentasyonê hêja û bikêrhatî jî bin, divê mirov berhemên wiha wek lêkolînên zanistî nîşan nede.

3.2. Kurdolojî Wek Zanistî

Pîrtûka din, kurdolojiyê wek zanistiyekê destnîşan dike: *Paşeroja 200 salî ya zanista Kurdolojiyê (1784-1987)*. Vê pîrtûkê bala me gelekî kişand, ji ber ku di lêgerîna me de, me lêkolîneke din nedît ku kurdolojiyê bi vî awayê zelal wek zanistiyekê bipejirîne. Pîrtûk ji 15 beşan pêk tê. Beşa yekem destpêka kurdolojiyê û peywendiyên wê yên bi rojhelatnasiyê (orientalizm) ve pêşkêş dike. Beşên din xebat û lêkolînên kurdolojiyê yên li Îtalya, Elmanya, Fransa, Îngîltêre, Awusturya, Holanda, Welatên Îskandînavya, Rusyaya Çarîtiyê, Yekîtiya Sovyetê, Irak, Îran, Sûriye û li Tirkiyeyê didin nasîn.

Li gor Rohatê lêkolîner, kurdolojî bi xebata zimanasê îtalî Garzonî dest pê dike. Wî di sala 1787-an de pîrtûkek bi navê "*Grammatica e Vocabolario della Lingua Kurda*" (Rêziman û Peyvên Zimanê Kurdî) li Romayê çapkirîye.

Rohat, kurdolojiyê wisa ravedike: "*Wek zanistiyekê, Kurdolojî beşek ji zanistiya berfireh e ku li ser ziman û edebiyata kurdî, tarîx û etnografyaya kurdî û di gelek warên din de li ser Kurd û Kurdistanê lêkolînan li dar dixê*" (r.9). Dû re, ev beşên din diyar dibin: *ziman, edebiyat, hûner, tarîx, arkeolojî, etnografîya, etnolojî, ol, coxrafîya, ekonomî, sosyolojî, hikuk, bîbliografîya* (r.11). Wisa xuyaye ku Rohat zanistê û babet û mijarên lêkolînên zanyariyê tevlihev dike. Em dizanin ku tarîx, arkeolojî, etnografîya, etnolojî, coxrafîya, ekonomî, sosyolojî wek zanistiyên sosyal û mirovî tîn qebûlkin. Ew xwedî metod û teoriyên gerdûnî ne. Lê ziman, edebiyat, hûner, ol mijarên lêkolînan in. Wek nimûne, zanistiya ku li ziman dikole zimanasî (linguistique) ye. Her wiha, mirov nikare bîbliografîya, ku xebata berhevkin û nirxandina çavkaniyan e, wek zanistiyekê bipejirîne.

Divê em li vir balê bîkşînin ser zanistiyê bê çî ye û ne çî ye. Zanistî, tevahiya zanyariyên ku xwedî mijareke kifşkirî û nasyarragirtî û her wiha xwedî metodeke taybetî ye. Divê ku babeta zanistiyên hevrêkî (homojen) û xwedî taybetmendiyêke xweser be. Metoda zanyariyê, li ser peywendiyên objektîf yên esehbar binyatkirî ye. Encamên xebatên zanistî gerdûnî ne û ji van encaman teorî derdikevin holê.

Dema ku mirov li zanistî, babet û mijarên ku Rohat di çarçoveya kurdolojiyê de bi nav kiriye dinêre, bi hêsanî xuya dibe ku mirov nikare kurdolojiyê wek zanistiyekê qebûl bike. Weke ku me berî jî got, jixwe tarîx, arkeolojî, etnografîya, etnolojî, coxra-

fiya, ekonomî, sosyolojî zanistiyên serbixwe ne. Mirov nikare bibêje ku kurdolojî van zanistiyên hemûyan digre nav xwe. Ji aliyekî din ve, babet û mijarên kurdolojiyê ne hevrêkî ne. Em ê niha li jêr bibînin ku ziman, edebiyat, tarîx, ol, folklor, û hwd. wek babetên sereke yên kurdolojiyê tên nasîn. Lê zanistiyek bi serê xwe nikare li wan hemûyan bikole.

3.3. Kurdolojî Wek Zanistiyeke Înterdîsîplîner

Weke ku em dibînin, sinorên kurdolojiyê pîrr fireh in. Kurdolojî bi gelek zanistiyên ve giridayî ye. Ev peywendiyên xurt ên bi zanistiyên din re taybetiyeke înterdîsîplîner dide kurdolojiyê. Ev kesayetî, di çavkaniyên din de jî diyar dibin. Wek nimune, A. Benningsen (1960), lêkolînên kurdolojiyê di çar beşan de ravedike : 1. *Organizasyona perwerdeyê*, 2. *Xebatên filolojîyê*, 3. *Xebatên li ser edebiyat û folklorê*, 4. *Etnografîya - Sosyolojî - Ekonomî - Ol - Tarîx - Politîka*. M. Mokrî (1963) jî, di bibliyografyaya xwe ya lêkolînên kurdolojiyê li Yekîtiya Sovyetê de, cîh dide tevahiya van beşan û zimannasî û etnolojîyê jî li wan zêde dike. Di pirtûka xwe de, H. Mihemmed, C. Nebez., A. Marif, Q. Kurdo (1974), giraniyê didin lêkolînên li ser ziman û tarîxa Kurdistanê. Ji vê jî eşkere dibe ku kurdolojî xwedî taybetiyeke înterdîsîplîner e. Lê dîsa jî ev taybetî nikare statuya zanistiyê bide kurdolojiyê. Metod û teoriyên ku zanistiyên ava dikin di warê kurdolojiyê de nîn in. Taybetmendiyên hevbeş yên lêkolînên

kurdolojiyê ew in ku ziman, edebiyat, tarîx, folklor û civata kurdî li gor metod û teoriyên zanistiyên wek zimannasî, etnolojî, sosyolojiyê analîz dikin. Bêguman, mirov nikare metod û teoriyên ku di zimannasîyê de tên bikaranîn li warê etnolojîyê jî tetbîq bike. Loma, kurdolojî, xwedî metod û teoriyên hevbeş nîn e.

3.4. Kurdolojî, Wek Tevahiya Dîsîplînen Lêkolînê li ser Kurd û Kurdistanê

Em baş dibînin ku ravekirina kurdolojiyê wek zanistiyekê pîrr zehmet e. Lê rastiyeke heye ku gelek lêkolîn û xebatên zanistî di derheqê Kurd û Kurdistanê de, li ser ziman, tarîx, edebiyat û hwd. pêk tînin. Ev lêkolîn li gor metod û teoriyên zanistî, li ser mijar û babetên jorîn tînin meşandin. Loma jî, em dikarin kurdolojiyê weke tevahiya dîsîplînen lêkolînê yên li ser gelekî ku zimaneke hevbeş diaxîfe rave bikin. Ev dîsîplîn, bi za istiyên sosyal û mirovî ve girêdayî ne. Ango, lêkolînên fizîkî yan kîmyayî di kurdolojiyê de cîh nagirin. Weke ku li jor jî eşkere bû, dîsîplînen ku mirov dikare di warê kurdolojiyê de destnîşan bike ev in: zimannasî, filolojî, etnografîya, coxrafîya, etnolojî, sosyolojî, antropolojî, ekonomî, tarîx, politîka, psîkolojî.

4. Perspektîfên kurdolojiyê

Kurdolojî xwedî paşerojeke dirêj e, ku li Rusyaya Çarîtiyê dest pê dike, li Yekîtiya Sovyetê geş dibe, û li welatên Ewrûpayê yên wek Fransa û Îtalyayê belav dibe. Berê, navend û dezgehên

kurdolojiyê yê giranbiha li Lenîngrad û Erîvanê bûn. Ji ber têkçûna Yekîtiya Sovyetê, em dizanin ku îro rewşa kurdolojiyê û dezgehên wê yê li Rusya û Ermenîstanê, pirr xirab e. Niha jî, navend û dezgehên ku xwe bi navê kurdolojiyê didin nasîn li Elmanya (Berlîn) û li başûrê Kurdistanê (Hewlêr, Silemanî) derdikevin pêş. Her çiqas li Zanîngeha Sorbonê ya Fransayê, perwerdeya bi ziman û edebiyata kurdî tê dayîn jî, navenda kurdolojiyê li Parîsê tuneye. Wisa xuyaye ku qedera kurdolojiyê bi qedera gelê kurd ve girêdayî ye.

Îro, îmkân heye ku lêkolînên li ser Kurd û Kurdistanê li ser axa Kurdistanê bi xwe bên lidarxistin. Divê êdî navendên kurdolojiyê li başûrê Kurdistanê bên avakirin. Di vî warî de, rola Hikûmeta Herema Kurdistanê pirr înezin e. Wekî yekem hikûmeta azad ya gelê kurd, ew dikare piştgiriyê xurt bide xebatên zanistî yê li ser Kurd û Kurdistanê. Bi alîkariya aborî û dayîna bûrsan, îmkân heye ku gelekî lêkolîner di warê kurdolojiyê de bibin pispor.

Televîzyon û çapemeniya kurdî jî dikarin beşdarî geşkirina vê pêvajoyê bibin. Di weşanên xwe de, ew dikarin nimuneyên giranbiha yê lêkolînên kurdolojiyê bidin nasîn. Wekî din, lêkolînerên ku wekî kurdolog tînin nasîn, an kesên ku xwe wekî kurdolog nîşan didin, dikarin lêgerînên epîstemolojîk li ser kurdolojiyê li dar bixin. Epîstemolojî, zanistiyêke rexnegir û ya nîrxandina teorî û metodên zanistîyan e. Bi vî awayî, gelekî pîrsgirêkên kurdolojiyê dikarin zelal bibin.

Bibliyografya

- BAYRAK M. 1994, *Açık-Gizli / Resmi-Gayriresmi Kürdoloji Belgeleri*, Özge yayınları, Ankara, 602 r.
- BENNINGSEN A. 1960, "Les Kurdes et la kurdologie en Union soviétique", *Cahiers du Monde russe et soviétique*, n°3, Paris, r.513-530
- BLAU J. 1991, *Kürtçe / Türkçe, Kürtçe / Fransızca, Kürtçe / İngilizce Sözlük*, Sosyal Yayınlar, İstanbul, 341 r.
- CHYET M. 2003, *Kurdish-English Dictionary - Ferhanga Kurmancî-Înglîzî*, Yale University Press 846 r.
- FARQÎNÎ Z., 2000, *Türkçe-Kürtçe Sözlük*, Enstituya Kurdî ya Stembolê
- MOKRI M. 1963, "Kurdologie et enseignement de la langue kurde en URSS", *L'Ethnographie, Revue de la Société d'Ethnographie de Paris*, r.71-105
- SAADALLAH S. 2001, *Saladin's English-Kurdish Dictionary - Ferhanga Înglîzî-Kurdî ya Selahedîn*, Institut Kurde de Paris - Avesta, 1477 r.

Türkoloji Varsa Kurdoloji de Vardır, Kurdoloji; Kürtlerle İlgili Bütün Bilimleri Kapsar

Martin Van Bruinessen

BİR: Doğrudan bir giriş yaparsak, kurdoloji var mıdır? Varsa neyi kapsıyor?

M.V. Bruinessen: Türkoloji varsa kurdoloji de vardır. Ama kurdoloji derken iki değişik şey ifade ederiz: birincisi, bir bilim dalı olarak kurdoloji; Kürtlerle ilgili bütün bilimleri tarih, edebiyat, dil bilgisi, Kürdistan toplum yapısı ile ilgili sosyolojik ve antropolojik incelemelerin hepsi kurdolojiye girer. Bunun yanı sıra aynı zamanda kurdoloji bilimsel kurumlar demektir; bilim akademileri, eğitim enstitüleri vb. bu anlamda kurdoloji hemen hemen yok, yani çok zayıftır. Kurumlar çok azdır. Eski Sovyetler'de, Sovyet Bilim Akademisi bünyesinde bir Kürt şubesi vardı, yani oryantalistlerin içinde küçük bir kurdoloji şubesi vardı. Batı Avrupa Üniversite'leri de kurdolojiye çok az önem verdiler. Fransa'da Kamuran Bedirhan zamanından beri bir üniversitede küçük

bir şube vardı. Kamuran Bedirhan'dan sonra Joyce Blau orada profesör oldu ve J. Blau emekliye ayrıldıktan sonra, Dr. Christine Allison onun yerine geçti, eğitim üyesi olarak. İngiltere'de bir zamanlar Londra Üniversitesi'nde bir eğitim üyesi (Philip Kreyenbroek) İran lisan ve dilleri çerçevesinde, Kürtçe ve Kürtler'de din üzerinde ders veriyordu. Almanya'da da bir kurdoloji kürsüsü kurma teşebbüsü oldu. Bir sene, 1996-97'de, ben kendim Berlin Hür Üniversitesi Etnoloji Enstitüsü'nde kurdoloji dersleri verdim, ama o geçici bir pozisyondu. Verdiğim dersler, Kürtlerin tarihi, Kürt toplumunda din olgusu, etnik kimlik ve milliyetçilik üzerine teoriler, küreselleşme ve Kürt sorunu gibi konular kapsadı.

Bildiğim kadarıyla şimdi Almanya'da üniversite düzeyinde sadece Göttingen Üniversitesi'nde kurdoloji kurum-

laşmış. Philip Kreyenbroek orada İran dil bilgisi bölüm başkanlığına getirildi. Kendisi Zerdüştlük dini uzmanı ve aynı zamanda İran lisanları üzerinde çalışıyor, Kürt dili ve edebiyatını iyi biliyor, ve Yezidilik, Ehli Hak gibi sinkretik dinlere karşı büyük ilgi duyuyor. Almanya'daki Yezidiler ile çok sıkı ilişkilerde bulunuyor, ve Yezidilik üzerine büyük ve önemli bir kitap yazdı. O da Almanya çapında tek kürdolog denilebilir. Fakat bunun yanında, değişik bölümlerde - tarih, sosyoloji, mimarlık, vs.- son senelerde Kürtler ve Kürdistan ile ilgili magister ve doktora tezler yazıldı.

Fransa'da aynı şey geçerli: Kürdoloji kurum olarak oldukça küçük bir yer alıyor, fakat edebiyat, coğrafya, arkeoloji, siyasal bilgiler bölümlerinde bir hayli tez hazırlanmış.

Ben kendim Holanda Utrecht Üniversitesi'ne 1994 senesinde Orta Doğu lisan ve kültürleri bölümüne atandım. İlk seneler, değişik derslerin yanında Kürtçe (Kurmanci) dersleri ile Kürt tarihi dersini de verdim. Ama üniversite düzenlemeler yaptığında mecburen ara verdim - öğrenci sayısı yeterli görülmedi. Derslerin öyle pahalı sayıldığı için mecburen daha çok öğrenciyi ilgilendiren konular üzerine ders veriyorum. Şimdilik resmen kürdoloji dersleri vermiyorum, fakat yine derslerim içinde Kürtler ve Kürdistana önemli pay veriyorum. Bunun yanında doktora öğrencilerimin arasında Kürtler üzerinde çalışanlar var.

BÎR: Genellikle kürdolojiyle ilgili belgelere baktığımızda daha çok oryantalist gezginlerin yada misyonerlerin anıları ve yazıları karşımıza çıkar. Birincisi bu gezi notları ve

anıları ne oranda kürdoloji kapsamına girer? İkincisi, Oryantalist anlayış çerçevesinde bu belgelere baktığımızda, bu belgelerin doğruluğu ve gerçekliği yansıtmayı yansıtmadığını nasıl anlayacağız, çünkü bir birinin zıttı olan çok miktarda farklı yazılar vardır.

M.V. Bruinessen: Tabii, bu yazılar kürdoloji için önemli kaynaklar temsil ediyor. Bazı gezgin ve misyonerleri de kürdolog sayabiliriz. Ben, Evliya Çelebi'yi örneğin bir yerde "ilk kürdolog" olarak tanımladım. Bazı Batılı gezginler de gerçekten çok önemli ve bilimsel yazılar yazdı, Kürtler üzerine. Örneğin Carsten Niebuhr, 18. yy'da Mardin Diyarbakir yörelerden geçen Danimarkalı gezgin çok değerli gözlemler yaptı. İlk Kürtçe grameri yazan, Musul'da çalışan İtalyan misyoner Garzoni idi, 1787'de yayınlandı. İki yüzyıl sonra aynı yerde çalışan Fransız misyoneri Thomas Bois, Yezidiler, Kürt folkloru ve edebiyatı üzerinde önemli makaleler yazdı. Emperyalist devletlerin ajanlarının bazıları da, çok değerli incelemeler yaptı. Erzurum'da Rus konsolosu Alexandre Jaba, daha sonra Urmiye'de Rus konsolosu Vladimir Nikitine ile Rus Orta Doğu uzmanı Vladimir Minorsky, çağdaş kürdolojinin kurucuları sayılabilir.

Gezginlerin yazıları, bütün diğer kaynaklar gibi, eleştirel bir göz ile okunmalı. Her yazar, zamanının, milletinin, sosyal çevresinin, din veya dünya görüşünün önyargılarını taşıyor. Fakat bu, her kaynak kişi için geçerli, tarafsız kaynak yok. O yüzden, herhangi bir konuyu incelemek istersek, çok değişik kaynaktan faydalanmak gerek. Oryantalist dediğimiz bilim insanları, yazılı kaynaklarla ilgileniyorlar, Arapça, Farsça,

Osmanlıca ve diğer Şark dillerinde yazılmış eserleri inceliyorlar. Bizde, üniversitelerde Doğu toplumlarını araştıranlar arasında bir ayırım yapıyor: oryantalistler daha çok metinleri inceliyor, sosyal bilimciler saha araştırmaları yapıyor, yaşayan insanlarla konuşuyor. Ben kendimi ilk olarak bir sosyal bilimci, bir antropolog olarak görüyorum, fakat bunun yanında çok yazılı kaynaklardan faydalanıyorum. Kürdoloji bence hem oryantalist hem sosyal bilim yöntemleri kullanmalı. İyi bir kürdolog, en azından en önemli kaynakları okuyabilmeli, yani Osmanlıca, Farsca, Arapça, İngilizce, Rusça bilmeli. (Ben Rusça bilmem, Arapçam da zayıf; Ermenice de öğrenmediğim için kendime kızırım.) Minorsky gibi büyük oryantalistlere çok saygı duyarım.

BÎR: *Yani Oryantalizm'e bir bilim disiplini olarak bakabilir miyiz?*

M.V. Bruinessen: Tabi, tabi. Üniversiteler de böyle bakıyor, üniversitelerde Oryantalizmin bölümleri vardır.

BÎR: *Peki bu oryantalistlerin yazılarına baktığımız zaman hem kürdolojiyle ilgili olarak ve hem de başka konularda birbiriyle çok ilişkili şeyler vardır. Bunları nasıl açıklayacağız?*

M.V. Bruinessen: Tabi, tabi haklısınız, fakat Oryantalizm derken siz belki benden başka bir şey demek istersiniz. Ben akademik Oryantalizmden, eski Türkçe ile Şarkiyat'tan bahsettim. O gezi notlarına biz Oryantalizm demiyoruz.

BÎR: *Bağışlayın bu arada bir şey hatırlatmak istiyorum, Edward Said'in de Oryantalizm'le ilgili farklı yaklaşımını biliyorsunuz. Onu nasıl değerlendiriyorsunuz?*

M.V. Bruinessen: Doğru, akademik dünyasının dışında, Oryantalizm sözü başka anlam da taşımış. Sanatta örneğin bir Oryantalizm modası vardı, ressamlar "Şark" motifleri kullandı, müzikte benzer şey vardı (Arabesk tipi müzik gibi), edebiyatta hayali bir Şark - haremiyle, cariyeleriyle, 1001 gece masalları gibi fantezilerle dolu - yaratıldı. Edward Said ise meşhur kitabında bütün bunları ve yanında yine başka metinleri araştırmış eleştirmiş. Onun dediği Oryantalizm, Batılıların Doğu üzerindeki bütün söylem: araştırdığı metinler gazeteciler, politikacılar, gezginler, misyonerler, sanatçıların, yani bütün bunların yazıları; hepsini tek bir bütün gibi almış ve ona "Oryantalizm" demiş.

Daha dar anlamda bir Akademik Oryantalizm vardır. Bizim Sovyet'teki arkadaşlarımız akademik oryantalistlerdir. Bir Ordıxanê Celil, Celilê Celil, Aristova, Jaba (Erzurum'da Rus başkonsolosuydu ve Mela Mehmudê Beyazidî'ye Kürtçe kitaplar yazdırdı ve daha sonra bir kısmını yayınladı ve kısmen de Rusça'ya çevirdi) vardır. Onların çalışmaları akademik bir iştir. Dil bilgisi ve filolojiye dayanarak Kürtçe veya Kürt toplum, tarih ve kültürü ile ilgili yazılı kaynakları araştırıyorlar. Jaba ve sonra Celil ailesi bunun yanında sözlü edebiyat, folklor vs. da toplamaya büyük ve çok değerli çabalar sarfettiler.

BÎR: *Evet bu konu biraz da sosyal bilimlerin disiplini ya da bilim felsefesi çerçevesinde tartışılması gereken bir konu. Çünkü Edward Said'in yaklaşımı ağırlıklı olarak politik boyutlu görünüyor. Ona göre oryantalist bakış, batıların doğu toplumlarını egemenlikleri altına almak için geliştirdikleri*

emperyalist bir yaklaşımdır. Siz de buna katılıyor musunuz?

M.V. Bruinessen: Tabii, Said'in dediği Oryantalizm Emperyalizmin bir ürünü, aynı zaman da Emperyalizmin bir lejitimasyonudur. Doğu toplumları daha ilkel, daha az gelişmiş, Doğu insanları Batılardan daha duygusal, tembel ve insan olarak daha düşük düzeyde göstermekte, bu tür yazılar Emperyalizme güzel bir bahane oluştururlar - tıpkı bazı şoven Arap veya Türk yazarların Kürtler üzerine yazdıkları gibi. Said'e göre, bu Oryantalizm egemen Batı kültürünün fantezisi. Akademik Oryantalizm, yani Şarkiyat, Said'in kitabında pek önemli bir pay almıyor, bütün söylemin küçük bir parçasıdır. Bir Minorsky'e bakarsak, o Çarlık Rusya hizmetinde çalışmış, Rusya adına Osmanlı-İran hudud komisyonunda yer almış, Kürtler üzerine araştırmaları ile belki de Rus emperyalizmine hizmet etmiş. Fakat genel olarak onun yazılarının objektif olduğunu söyleyebiliriz. Yazılarıyla Rusya'dan ziyade, Kürtlerin kendilerine hizmet etmiş. Kürtler üzerine en kapsamlı ilk yazıları o yazdı. İslam Ansiklopedisi için hazırladığı Kürt ve Kürdistan maddeleri uzun zaman Kürt tarihinin en kapsamlı araştırması oldu.

BÎR: *Tekrar Kürtlere ve kürdolojiye dönersek, bilinen kürdoloji belgelerinin ilkleri hangileridir, bu çalışmalar bir bilim disiplini çerçevesinde ne zaman ve hangi araştırmacılarla başlıyor?*

M.V. Bruinessen: Eğer kaynak ile araştırma arasında ayırım yaparsak, Kürdoloji için kaynaklar dört beş bin yıl süresince vardır, fakat Kürdoloji denilebilen yazılar, 18.inci yy'da başlıyor. En

eski kaynaklar, arkeoloji kaynaklarıdır. Bildiğimiz gibi, Kürdistan dünyanın en eski tarım bölgesidir, bir hayli eski halk, medeniyet ve devlet bu topraklarda yaşamış ve hepsi şimdiki Kürtlerde izler bırakmış. Arap ve Fars tarihçilerinde (İslam sonrası) Kürtler üzerine çok şey bulunur; sonra Osmanlı yazar ve arşivleri Kürtler için en zengin kaynak hazinesi oluşturuyor. Sonra İtalyan ve Fransız misyonerleri, Rus ve İngiliz konsolosları, Moltke gibi askerler, diğer seyyahlar da önemli şeyler yazmış. Kürtlerin yanında yaşayan Ermeni, Süryani, Keldani topluluklarının da yazılı kaynakları vardır.

Bunları araştıran ve değerlendiren bilimsel kürdoloji belki 19. yy sonlarına doğru va 20. yy başında Jaba, Minorsky, Nikitin gibi kürdologların disiplinli çalışmalarıyla başlıyor. Onlardan önce tek tek tarih (Hainmer) veya dilbilim (Garzoni) eser çıkmış fakat bugünün kıriterlerine göre pek bilimsel değildi.

BÎR: *Bugün geline aşamada Güney Kürdistan'daki federal yapı ve olası gelişmeler, Türkiye ve İran'daki bazı yumuşamalar kürdoloji alanındaki çalışmaları nasıl etkileyebilir?*

M.V. Bruinessen: Irak'ta bir zamanlar Irak Bilim Akademisi bünyesinde bir Kürt şubesi vardı. Onlar tarih, edebiyat ve dil üzerine çok önemli araştırmalar yapmışlar. Kürt şubesinin (Korî Zanyarî Kurd) çıkardığı dergi çok akademik ve bilimsel bir dergiydi. Şimdi Güneyde üç Kürt üniversitesi var. Öyle inanıyorum ki bundan sonra kürdolojiyle ilgili çalışmalar büyük oranda kurumlaşacak ve daha da derinleşecek.

BİR: *Konu Kürtler ve kürdolojiyle ilgili belgeler olduğu zaman, bunların ortaya çıkması/çıkarılmasının Kürt toplumunda yarattığı etkiler de gündeme gelir. İster istemez Kürtlerde ulusal bilincin ortaya çıkması sorunu da söz konusu olur. Çünkü bu tür çalışmalar, özellikle Kürtler tarafından yapılanları, ulusal bilinçlenmeyle ilgili değil midir?*

M.V. Bruinessen: Evet doğru, doğru. Bu bilinç ilk olarak Şerefname'de görülür. Bir Şerephanî Bitlisi'ye bakarsak, Şerefname nedir? Bir ulusun tarihi midir, ya bir feodal sınıfın tarihi midir? Bir Kürt tarihi ise, demek Şerephan'da bir Kürt ulusal bilincini görüyoruz. Ama, birincisi, Şerefname bir genel Kürt tarihi değildir, Kürt emirlikleri ve mirliklerinin tarihidir. Şerefname sadece egemen sınıfa önem veriyor, eserde Kürt halkı sözü yok. Ehmedê Xanî bize daha yakın, onun kitabında Kürtlük anlamı bazen çok çağdaş görünüyor. Ehmedê Xanî için Kürtler, sadece aşiret reisleri ve mirleri değil, daha geniş bir tabakayı kapsıyordu. Buna rağmen benim anladığım kadarıyla Ehmedê Xanî de çağdaş bir ulus anlayışı tam olarak oluşmamıştı. Biz şimdi Kürtlerden bahs ettiğimiz zaman Kürtler sadece ağalar ve aşiret ileri gelenlerinden oluşmuyor, en fakir ve en yoksul kişileri de aynı kapsama alıyoruz. Bence Ehmedê Xanî böyle değildi.

BİR: *Ulusal bilincin oluşması ve buna paralel olarak ulusal hareketlerin ortaya çıkması birbirini tamamlayan iki yöndür. Bu çerçevede 19. yy Kürt hareketleri ulusal nitelikli miydi yoksa Osmanlı'nın yeni merkezî yetçi politikasına karşı gösterilen tepki miydi?*

M.V. Bruinessen: Tabi, bir Kürtlük

boyutu vardı. Ama bu bilincin kimleri kapsadığı önemli. Örneğin Şeyh Said Hareketi yalnızca bir Kürt hareketi miydi? Kanımca Şeyh Said hareketinin hem dini hem de milli boyutu vardı. Bilhassa Şeyh Said'in etrafında birinci derecede bulunanlar için milliyetçilik önemliydi. Ona katılan aşiret reisleri için belki bilinç daha dar kapsamlıydı ve aşiret mensupları da sadece aşiret reislerini takip ettiler.

Genel olarak Kürtler de içinde olmak üzere Ortadoğu'da ulusal bilinç, birinci dünya savaşından sonra oluşuyor. Ulusal bilinç bizde de o kadar gelişmiş değildi. Fransa'da 19. yüzyılın yarısına kadar Fransızların yarısı Fransız olduğunu bilmiyordu. Bu konuda çok ilginç bir araştırma çıktı, kitabın adı "Köylü Fransız Oluyor". Bu süreç Fransa'da nasıl gerçekleşti, o zaman bir köylü kendi köyünü ve etraf köyleri biliyordu ve belki bir de kaza ismini duymuş, ama daha geniş bir devlet olduğunu ve kendisinin de bu devletin vatandaşı olduğunu bilmiyordu. Bu bilinç okulların açılmasıyla oluşuyor. Zorunlu askeri hizmet, okul ve sonra 20. yüzyılın radyo ulusal bilinci insanların kafasına yerleştirdi. Ve bence aynı durum Kürdistan için de geçerlidir.

Türkler ne zaman Türk olduğunu keşfettiler? O da 20. yy başındadır. Tabi Kürtlerden farklıdır. Türklerin uluslaşması bir imparatorluk geleneği üzerinde oluşuyor, bir devletin uluslaşma aletlerini elinde tutuyor; zorunlu askerlik var, okullar yapıyor, Tevhidî Tedrisat Kanunu çıkartıyor ve artık her yerde Türkçe eğitim yapılıyor. Radyo ve sonra TV devlet tekelinde kaldı. Tabi bu tür

BÎR

aletlerle yavaş yavaş bir ulus bilinci yaygınlaştırıyor. Türkler hep Türk olduğunun bilincinde değildiler. Kürtler de öyle. Başlangıçta Kürt milli hareketi sadece eğitimlilerden oluşan bir hareket idi. Bir tesadüf değil, ki Kürt milliyetçiliği de İstanbul'da başlıyor Kürdistan'da başlamıyor. Ekrem Cemilpaşazade anılarında çok güzel bir şey yazıyor, kendisi İsveç'te okumuş ve Birinci Dünya Harbi'nde Osmanlı İmparatorluğuna dönüyor ve zorunlu askerlik görevini Doğu cephesinde yapıyor. Bir grup arkadaşıyla birlikte Kürt aşiretleri içinde Kürtlük propagandasını yapmak istiyor.

Ve yazıyor "ama ne yazık bizim Kürt aşiret reislerimiz Kürt olduklarını öğrenmek istemediler. Sultan cihat ilan etmiş ve onlar da kendini her şeyden önce Müslüman olarak gördüler. O Müslümanlık propagandası bizim söylediğimiz Kürtlük propagandasından çok daha güçlüydü."

BÎR: *Bize Zaman ayırıp bu röportajı yaptığımız için teşekkür ederiz.*

M.V. Bruinessen: Ben de teşekkür ediyorum ve size başarılar diliyorum.




Kurdolojî ji du Peyvan Pêk Hatiye; "Kurd" û "Zanîn".

Prof. Dr. Celîlê Celîl

BÎR: Mamoste Celîlê Celîl, kurdolojî çi ye û çarçova wê çi ye?

Celîlê CELÎL: Kurdolojî ji du peyva pêk hatiye "Kurd" û "Zanîn" (bi Yûnanî "Logos"). Eger miletek hebe zanîn jî li ser wê çê dibe. Ew zanîna ku bi şeweya zanistî û bi forma nivîskî, li ser kurdan bê dirustkirin, ew bi xwe kurdolojî ye. Çarçova kurdolojîyê gelek fire ye: di kurdolojîyê da zanîna li ser kurdan gelek beşan digre nav xwe: zanîna dîrokê, zanîna li ser ziman, wêje, zanîna etnologî, adet û rabûn û rûniştina gel, di vê çarçovê da jîyana sosyal û aborî û dîyanet e ... her tişt e.



Prof. Dr. Celîlê Celîl

BÎR: Çavkaniyên esasî yên li ser kurdolojîyê çi ne? Pîvana çavkanîbûna wan çi ye? Cenabê we jî baş dizane, ku kurdolojî jî têde, li ser rojhelatnasiyê (oryantalîstîyê) jî herî çavkaniyên kevn, bîranînên gerokan in. Ew gerokên ku hatine li Rojhelata Navîn û Kurdistanê geriyane, destnivîsar

berhev kirine û piştî ku çûne welatê xwe, ev tiştana wekî pirtûk çap kirine. Îro dema ku behsa kurdolojîyê dibe, bêtir bîranînên wan gerok û mîsyoneran tête bîra meriv. Gelo em dikarin nivîsarên wisa di nav rêza belgeyên kurdolojîyê da bibînin?

Celîlê CELÎL: Çavkaniyên kurdolojîyê cûr bi cûr in. Pêşîyê em bêjin çavkaniyên li ser kîjan beşî? Eger li ser ziman be, ji alîkî ve çavkanî bi xwe axaftina gel e û pê ra jî wek çavkaniyên alîkar têne. Û ew jî lêkolînên ku bi nivîskî hatine kirin in.

Êdî, evan lêkolînan ji aliyê kurdan ve hatine kirin, ji aliyê rêwîyan ve hatine kirin yan jî ji aliyê Ewropîyan ve hatine kirin, yek e, ew problem nîn e. Du pîvanên bingehî hene: çavkaniyên zindî, ku gel bi xwe ye û berhemên ku hatine çapkirin, nivîskî ne. Eger ku tu hiltîni dîrok, dîrok jî çavkaniyên wî cûr bi cûr in; dîroka kevn yan jî dîroka sedsala 19 û 20ê, her yek çavkaniyên wê cûda ne. Tu rahêlî yê kevn, divê zimanê mirî û nivîsarên mîxî bizanibî û ji bona lêkolîne kar bînî. Nivîsarên destxetên cûda, nivîsarên ku zanyar û gerokên ereba, aşûrîya, yûnanîya, rûma, ermenîya û yên mayîn nivîsarên xwe di destxetan da hiştine, evana jî çavkanî ne. Eger tu hiltîni dîroka nû destpêka sedsala 19 û 20ê, çavkaniyên van sedsalan diha fire ne. Di nava vê firebûnê da cîkî taybetî digrin nivîsarên rêwîyên ji Awrupayê. Pirtûkên van nivîskaran bi wan zimanan pîrr in. Dewletên kîjana li ser Kurdistanê yan li ser Rohilata Navîn zêde bala xwe dane. Li cêrga van nivîsarvana hene zana-lêkolînan, dîplomat, karkerên leşkerîyê, mîsîyoner û yên mayîn. Wek çavkanî bingehêke pîrr firene rojname û kovarên bi zimanên rojhilatî û Ewropî. Di nav rûpelên wan weşana da gelek gotarên giranbaha hene, ku li ser bûyerên Kurdistanê ne, li ser jîyana

kurda ne; li ser sosyal aborî û civakî sîyasî ne. Xudanê van nivîsaran kî ne? Ew dikare rewşenbîrek be, dîplomat be, karkerê balyozxanê, yan jî rêwîyek be. Hinek nivîsar hene li ser kurdan, ku nivîskarê wana keşîş in, mele ne, yan jî însanê jêhatî ne, ku dîtinên xwe nivîsîne.

Evana hemû belgeyên kurdolojîyê ne. Bona nivîsandina dîroka dema nû û nûtirîn pîrr girîng in wusa jî dokûmêntên ji arşîwên dewletan. Di dema kevn-kevn da arşîv tunebûn. Ji sedsalîyên navîn arşîv têne avakirin, wek arşîva Dewleta Osmanîyê, arşîva Rûsan û yên dewletên Awrupayê. Girîngiya van arşîvan bona kurdolojîyê bêqiyas e; pîrranîya dokûmêntên van arşîvan ji nivîsarên dîplomatan, sîyasetmedaran û gerokan pêk hatiye. Evana çavkaniyên pîrr girîng in.

Di rojname û kovarên mîletên dora me da nivîsarên li ser kurda hene, wan jî nûçeyên derbarê kurdan çap kirine. Lê ev hemû tiştan divê bêne bêjîngîrin. Karê zanyar-lêkolînvana ew e, ku gotar û nivîsaran ji hemû deran berhev bike û wan bi metoda zanistî li bêjîngê bixe û rastiyê jê derxîne. Ya etnologî jî, divê lêkolînan bi xwe di nav gel da bigere, rabûn û rûniştina wî, edet û teqelîdê wî çî ye; rewşa sosyal abûrîyê, peywandîya nava çîn û civakên kurdan veke, divê bizanibe kurd çawa şîna xwe dikin, çawa daweta xwe dikin, çawa xwarin çê dikin, malên xwe çawa avadikin, di mal da çî heye (hûr-mûrê malê), çawa ber û xalî çêdikin û gele pirsên dinê. Dîtinên van kesa çavkanî ne, lê bona zanistîyê divê ev dîtinan ber berhevdana bergêh

fire daynin. Berhevdana nivîsaran divê bi çanda cînanan ra jî bête berhevdan, eşkere kin ka di nav cînanan da çi taybetîya çandê heye, ku ji ya kurdî cûda ye, yanê jî mîna wê ye; çi başîya wê heye, çi xerabîya wê heye.

BÎR: *Dema em basa belgeyên kurdolojîyê dikin, di vê nûqtê da nivîsarên gerokan her gav derdikevin pêş. Di vî warî da, bi giştî li ser Oryantalîstîyê (rojhelatnasîyê) ku ji alîkî ve kurdnasî jî di nav çarçova wê da cî digre, gengeşî heye. Tabî li ser Oryantalîzmê lênêrînên cûda hene. Mînak, Edward Saîd Oryantalîzmê tiştêkî neyînî dibîne. Di vî çarçovê da em dê çi qas bawerî bi van belgeyan bikin?*

Celîlê CELÎL: Bi rastî Oryantalîstî zanistîyek e. Îdeolojîyek pê ra heye yan tune, ez nizanim, lê ez tiştêkî baş zanim, ku her tişt çi dîrok be, çi zargotin û edebiyet û ziman be, divê ser bingeha zanistîyê, bi mêtodolojîya zanistîyê bê nivîsandin. Ez nizanim Oryantalîzm çi ye? Oriyentalîstî, ew zanistîya li ser Oriyentê, Rohilatê. Oriyentalîzm wek bîrûbawarî ez fehm nakim. Heye mêtodolojîya, ku bingeha wî ya zasnistî nîn e, nivîsarên weha têndêntsîoz in û daxwaza nivîsandinê her falsîfîkasîkirina rastîya dîrokê ye, daxwaza sîyasî li dewsa zanistîyê raberî xwendevanan dikin. Oriyentalîzm: zanistîya li ser Rohelatê ye. Tê de manakî gelek fire heye: zanîna li ser welat û gelên Rohelatê. Di vê çarçovê da heger em zanîna ser Rohilata Nêzîk û Navîn didin ber çava, tê da dîroka osmaniyan, tirkan, ereban îraniyan û kurdan û wd. tê fehmkirin.

Gava tu dîroka gelê kurd binivîsî, divê pêşiyê bi hûr û kûr dîroka gelê kurd tu derxî û pê ra girêdayî jîyana Împere-torîya Osmanîyê yan jî Xelîfetê, Împeratorîya Îranê zelal bikî. Di vê meydanê da ka jiyana kurdan çi cî girtîye û taybetîya wê çi ye, divê bê xuyakirin. Nivîsandina dîroka gelê kurd ew bi xwe parçekî oryantalistîkê ye, yanî zanîna li ser Rohelatê ye. Helbet zanistî ne tenê ev e. Şert e, tiştê ku tu lê dikolî, heger ew bûyereke yan jî jîyana aborî û sosyal e, divê tu timê berhev bidî, ka cînarê wan çawa bûne, kurd çawa bûne. Gava tu demeke dirêj hiltînî, divê dînamîka guhestina bûyera, jîyanê, pêşketin û paşketina wan çawa bûye bidî xuyakirin. Çiqas tu fire hildî û kûr bikolî û berhev bidî ew qas tê bigihîjî rastîya zanistîyê. Ev dibe lêkolîna tam, eva meydana zanistî ye. Tabî ligel wî tu yê jîyan û dîroka miletan, çanda cînanan bidî hevdu û ya Awrupayê jî bigrî, ka çi qas digîjîne hev û çi qas ji hev cûda ne, bi çi awayan da em ji meşa dinyayê dûr ketine yan jî nîzîk bûne.

BÎR: *Baş e, dema ku em li agadariyên rêkûpêk bigerin, belgeyên esasî yên kurdolojîyê, ne bîranînên gerokan, em dikarin ji kê bidin destpêkirin?*

Celîlê CELÎL: Bi giranî kurdolojî di destpêka sedsala nozde da cîyê xwe digre. Lê lêkolîn berê jî hebûn. Yê ez dizanim mîsyonerê îtalyanî **Garzonî** lêkolîna pêşiyê raber kirye. Garzonî li Kurdistanê gelek salan maye, li ser kurdan dîtînên xwe li gorî dema xwe bi şewekî zanistî nivîstîye. Gramer

nivîsiye, vokabolerî û ferheng nivîsiye. Lêkolîna zanistî li ser gelan, pêşî ji ziman dest pê dike. Gava tu diçî nava miletekî û dixwazî wî nas bikî û li ser wî binivîstî, divê li serê sêrî da zimanê wî hîn bibî û pê ra têkilî daynî. Ji ber vê ye ku gelek lêkolînên li ser gelê kurd, ji nasîn û xuyakirina zimanê wî dest pê dike. Rêwî û zanyarên ku diçûn nava kurda ku li ser jîyan û karektêra wana bibine nas, tevî ku zimanê osmanî, yan jî erebî û îranî zanibûn, xwe hînê zimanê kurdî dikirin, ku ji kurdan bi kurdî înfomasyonan bistînin.

Zanyariya li ser kurdan: Kurdolojî pêşiyê ji zimanê kurdî dest pê dike û paşê gava sîyaset dest pê dike, li ser rewşa civaka kurda û jîyana sîyasî lêkolîn çê dibin.

BÎR: *Îro hem di nava Kurdistanê û hem jî li dervayê Kurdistanê xebatên li ser kurdolojî di kujan qonaxê da ne?*

Celîlê CELÎL: Belê, kurdolojî bêtir li Awrupayê, li Rusyayê, li dervayî Kurdistanê û ne bi destê kurdan hatiye pêşketin. Îro di Rojhelata Navîn da xebata kurdolojî bi destê dewletan jî tê meşandin. Lê baş ew e, ku êdî kurdan bi xwe dest pê kirîye, dîroka xwe dikolin, ziman û edebiyeta xwe dikolin. Bi taybetî kurdên Kurdistanê Iraqê îmkânên wan zêde bûne û li wê derê xebata kurdolojî pirr pêşve çûye. Li Sovyetistana berê li ser kurdolojî xebatên baş û pirr hejmar çêbûne. Hêjayî gotinê ye ku li meydana kurdolojîyê da zanyarên kurd bi xwe kar kirine. Wekî di jî zanyarên ji miletên cînar jî li ser kurdolojî xebitîne. Îro

Kurdolojî li Rusyayê û li komarên ku berê di nava Sovyetê da bûn, pirr zeyîf bûye, yê hene û aniha jî kar dikin, ew kadroyên berê ne, yê nû çê nebûne. Ji ber vê jî duwaroja kurdolojîyê li ser wî erdî li ber xeterê ye.

Gava ji nava miletekî kadroyên wê çê dibin, timê çand û zanistîya wî gelî pêşve diçe. Îro kadroyên hêja ji nava kurdên Kurdistanê Turkeyayê serî rakirine û dixwezîn bi destê xwe dîroka gelê xwe bikolin û binivîsin. Ji wan ra zanistîya kûr, mêtodolojîya zanistîyê gerek e, ku wek kadroyên profesyonel bixebitin. Pîsporên dilxwaz in; jêhatî ne, digerin û dipirsin. Lê lazim e akademî vebin. Cêrga kurdzana fire bûye: yê kurd û yê ne kurd hene, yê li Awrupayê dixweyin; li Swêdê, li Parisê, li unîversîteyên Almanayê, li Amerîkayê. Lê gava Kurdistanê Iraqê karê xwe bi dilê xwe bimeşîne, îcar ew xebat wê hîn berfireh û kûr bête meşandin. Gava ji nava miletekî kadroyên wê çêbin, timê çand û hunera wî gelî pêşve diçe. Îro ev meş dest pê kirîye.

Demek hebû ji Kurdistanê Iraqê gelek xort û dotên kurd dihatin cem me li akademîyayê dixwendin. Li Sovyeta berê, nêzikî sed merivî hatin cem me bo wergirtina navê dîktorayê.

BÎR: *Baş e, em dikarin behsa politîka kurdolojîyê bikin? Yan jî divê politîka me ya li ser kurdolojîyê çî be?*

Celîlê CELÎL: Politîka kurdolojîyê nabe, em dikarin behsa politîka li ser kurdolojîyê bikin. Çimkî kurdolojî zanyarî ye, Li ser vê mijarê lînêrîna

min ev e: Divê bingeh hebe, enstîtu hebin, fînanse hebe ku kadroyên nû herin û lê bixwînin, yan jî kadroyan bişînin derva bo perwerdebûnê û kamilbûna bi zanistî, wek pisporên kurdolojîyê. Ji alîyekî dî ve polîtîka li ser kurdolojîyê, eger ew bi destê dagîrkeran be, dikare kurdolojîyê bixeniqîne. Polîtîka dinê jî ew e, ku divê kurd û dezgahên kurdî bi xwe cîyê xwe bigrin û karê zanistî bi destê xwe bimeşînin, pêşve bibin.

Mînak Enstîtuya Kurdî ya Stembolê di halekî perîşan da ye, perê wan tineye kitêban jî bikirrin, kurdên me jî, xudanê pirtûkan, pirtûkên xwe dîyarî enstîtuyê nakin, ew jî zêde xwe naêşînin ku pirtûk bo enstîtuyê bicivînin.

Baş e, dezgah heye lê berhem nade, sedemên wî jî hene. Ev xebat bi çelengiya dilxwazan nabe, divê zanyar tê da kar bikin û kar jî divê li ser meydana zanistîyê be, ne yê polîtîkayê. Zanistî ne milkê partiyekî yan dezgahêkî sîyasî û grupekî ye, zanistî li dinyayê da meydana kadroyên akademîsyen e.

BÎR: Mamoste, çî têkilî di navbera bidestxistina belgeyên kurdolojî û tesîra wan a li ser peydabûna bîra netewî da heye? Û di nav kurdan da bîra netewî kîngê peyda bûye?

Celîlê CELÎL: Fikra neteweyî ne bi rêya peydakirina belgeyên kurdolojî çê dibe. Bîr û fikra neteweyî, ji civakê çê dibe, civak çî qas dipije, çî qas hevgerî dibe, çî qas xwenasîn û xwehisîn çêdibe; çî qas cîyê xwe û cînarê xwe di nava dîrokê da nas bikin û xwedî heqê

xwe derkevin, ew qas jî bi tevî wê fikra netewî çê dibe.

BÎR: Îro têgeyîştinekî wisa jî heye ku dibêjin dinya ber bi piçûkbûn û globalîzebûnê ve diçe, bîra neteweyî pîrr ne girîng e, bîr û agadarîya giştî girîng e. Êdî dewletên dinyayê ber bi yekbûnê ve diçin û sînor radibin, daxwazên netewî paşverû ne. Hûn vê çawa şirove dikin?

Celîlê CELÎL: Yên ku ber bi globalîzmê (cîhanîbûnê) ve diçin dewlet û xwedî mal û milk in. Em nebûne xwedîyê mal û milk û dewletê, ku em jî pêvajoya globalîzmê biparêzin û cîyê xwe têda bigrin. Globalîzm bo me wendabûn e.

Gerek pêşiyê em bizanin em kî ne, li nav dinyayê cîyê me çî ye, xwe nas bikin û paşê globalîzmê biparêzin. Mînak, di Yekîtîya Awrûpayê da sînorên peywendiyê ji nû ve tê dirustkirin, ne ku neteweyî radibe, hebûna gelek unsir û saziyên neteweyî berdewam in. Ziman û çanda wan wunda nabe, eksê wî ew li ser xurtbûna xwe mane û wê bimînin. Lê em kurd?

BÎR: Mamoste, heta nûha çî xebata we li ser kurdolojîyê çê bûne û çend pirtûkên we hatine çapkirin û belavkirinê û pirtûkên li ber weşandinê hene yan jî projeyê we yê nû çî ne?

Celîlê CELÎL: Ez wek kurdolog dîroknas im, min diktoraya xwe li ser dîroka kurdî nivîsiye. Piştî ku min xwendina xwe li akademîya Rusyayê xelas kir, vegeriya Erîvanê û min li Akademîya Ermenistanê kar kiriye.


Min çend lêkolînên li ser dîroka gelê kurd amade kirine. Ji ber ku di mala me da evîna zargotinê pîrr mezin bû. Xûşka min folklorî mûzîkayê xwendibû, Ordîxan (birayê min ê mezin) jî filolog bû û li ser zargotinê dixebitî, ez jî tevî wê meşê bûm û bi wan ra min jî berhemên zargotinê berhev kirin û lêkolîn kirin, li ser zargotinê jî gelek pirtûk çapkirine.

Naka jî ev çend sal e, ku ez li ser wêjeya kurdî meşxul im. Tabî dîsan xebat li ser lêkolîna dîrokê û zargotinê jî berdewam dikim. Min sê destxetên kurdî çapkirine. Yek jê *Keşkûla kurmançî* ye. Tê da sî û şeş helbestvan hene. Hemû şairên klasîk in. Pirtûka dinê ew destana *Seyfûlmûluk* e ya Sîyahpûş. Ya sisya *Şêxê Senan* ya Feqîyê

Teyran e, ku şaxekî taybetî bû. Îsal min kitêbek din jî çap kir ser gotinên pêşîyan. Tê da dora 8000 gotinên kal û bavan civandine.

BÎR: *Wek pîrsa dawî dixwazim wê bêjim, eger hûn kurd nebin û bi Dîyarbekirê nizanibin, dema hûn wek bîyanîkî ji der va lê binêrin, gelo xuya dibe ku Dîyarbekir bajarêkî kurda ye?*

Celîlê CELÎL: Ezê ji te bipirsim, eger tu di nava bajêr bigerî û zimanê kurdî di devê tu kesî da nebihîsê, tu yê çî bifikirî? Netewe, bi ziman û çanda xwe, bi qerekerê xwe tê nasîn. Eger kurd van tiştan dîyar nekin û neparêzin, wê çawa dîyar be ku Dîyarbekir bajarê kurda ye?



ŞOREŞA QOÇGIRIYÊ

Îsmail Heqî Şaweys*

Wergerandina ji soranî: Roşan Lezgîn

Îsmail Heqî Şaweys, di sala 1894an de li Mosilê hatiye dinê. Bavê wî efsêr bû. Li Silêmaniyê dest bi xwendina sereta kiriye û li Bexdayê xwendina xwe ya navîn temam kiriye. Dû re, li Stenbolê Herbiye xwendiyê û wek mulazimê duvêm li tevî artêşa Osmanî bûye. Di şerê Balkanan de li Selanîkê dil ketiye. Pişt re vegeyriyaye Stenbolê û di Şerê Cihanê yê yekem de (1914-1918) wek efsêr di artêşa Osmanî de li tevî şer bûye. Di Sibata 1918an de vegeyriyaye Silêmaniyê, ku wê demê di navbera Şêx Mehmûd û îngilîzan de şer hebû, Îsmail Heqî Şaweys jî di nav berxwedana kurdan de cihê xwe digre û dibe nûnerê Şêx Mehmûd û bi îngilîzan re hevdiîtinan pêk tîne. Piştî şkestina serhildanê di sala 1919an de di ser Tebrîzê re derbasî Tirkîyê dibe û di 1920an de bi rutbeya yuzbaşîtiyê di nav artêşa Tirkîyê de tevî şerê Arasê yê bi ermenan re dibe. Û bi rutbeya binbaşîtiyê heta sala 1927an li Şerê Rizgarîya Tirkîyê cih digire. Piştî ku dev ji efsêriyê berdide, diçe Iraqê. Ji wir jî diçe Parisê. Dîsa vedigere Iraqê û di nav artêşa Iraqê de dibe efsêr lê îngilîz wî bi tegebusa suikastkirina qiralê Iraqê tawanbar dikin û ji artêşê tê avêtin. Cardin diçe Parisê. Di çapemeniya Parisê de derbarê doza kurdaiyê de meqaleyan belav dike. Dîsa vedigere Iraqê. Çendekê qaymeqamtiya çend navçeyan dike û ji ber faaliyetên kurdaiyê jî kar tê avêtin. Welhasil, heta dawiya temenê xwe her tim doza kurdaiyê dike û



Îsmail Heqî Şaweys

gelek caran jî cezaya zindanê lê tê birrîn û li zindanên cihê cihê radizê. Gelek gotarên wî li kovar û roj-nameyan belav dibin. Herwiha du kitêbên wî jî çap bûne. Îsmail Heqî Şaweys di 12ê Gulana 1976an de çûye ser dilovaniya Xwedê.

I

Di sala 1920ê Zayînî de serhildana Qoçgiriye dest pê kir û piştî ku şeş sal ajot, li sala 1926an bi kuştina Mûrad Paşayê xayîn re kutayî lê hat. Di vê şoreşê de gundên Qoçgiriye tûşî talan û şewitandinê bûn, xelkê gundên vê navçeyê hate kuştin, jin û zarok tûşî kuştin û talankirinê bûn. Gelek ji serbazên tirk ku bi hoya Kemalîstan şerê wan dikirin jî lê bi wan xweş nebû ku di navbera gelê tirk û kurd de xwîn bête rijandin, çunke azadî û serxwebûna kurdan li ber wan jî hêja bû, lewma jî wan nedixwestin şerê wan bikin. Çunke serhildana vê carê ya gelê kurd ne wek caran bû; Şoreşa Qoçgiriye li ser heq û daxwazên gelê kurd bû. Lêbelê çi heyf ku Kemalîst bêwefa derketin, êriş birin bi ser mal û gundên Kurdistanê de, piraniya wan kuştin, bi hezaran rênçber û gundî û şerkerên wan ên bê sazûman tê de tune û perîşan bûn, ku bi wan re gelek jê beşdarî serhildanê nebûbûn. Bi vî awayî, tirkan bi dirrindetiye dan û dû wêrankirina navçeyên Qoçgiriye, şoreşê mirandin.

**Hinek Zanyarî Derbarê
Êl û Eşîrên Qoçgiriye de**

Akincihên (niştəcih) Qoçgiriye; hemû êl û eşîrên wir ji netewa kurd in û Elewî (Mezheba Caferî) ne. Wek Qizilbaş (Kelawsûr-Kûmsor) bi navûdeng in. Jimara gundên ku ev kurd tê de dijîn 150 ye. Bi karê cotyarî, xwedîkirina pez û dewar mijûl in. Û pê re jî xerîkî çandina baxçe û bostan û

rez in. Qoçgiri, li Kurdistanê Tirkîye dikeve nav beşê rojavayê Kurdistanê. Sînorên herêma Qoçgiriye jî her çar hêlan ve bajarê Sêwasê digire nav xwe û heta li nêzikî bajarê Erzincanê diçe. Xelkê vê navçeyê, ku dikeve nav van her du bajarên, ji aliyê îdarî ve di bin desthilatî û fermanrewayîya van bajarên de ye. Ev her du bajar bi hêza aboriya akincihên Qoçgiriye dijîn. Xelkê herêma Qoçgiriye li navçeyên Zara, Îmraniye, Qerecewêran, Bilûcan, Begpînar û li qezaya Qangalê û nehiyeya wê Qewaq, li qezaya Qurîçay û nehiyeya wê Qozqışle û Alakilîse û heta Alûcere ku Suşehrî jî digre himbêza xwe, pêk tê. Û dîsa, akincih û eşîret û êlên rojavayê Dêrsimê ku ew jî kurdên Elewî ne, kêman zêde têkiliya wan a mezhebî bi hev re heye. Li herêma Qoçgiriye hin gundên tirkan jî hene, ku ew jî dîsa Elewî ne û bi kurdan re hevjiyan û hevbest in û tu cudatiyek naxine nav hev.

Ew herêma ku şoreşa kurdên Qoçgiriye tê de rûda bi dirêjîya xwe nêzikî 150 km. û berahiya xwe jî ji Zara hetanî Alakilîseyê 150 km ye. Encumenekî tirk di raportên dîroka şerî de dibêje: "*Dirêjîya Herêma Qoçgiriye 180 km. ye. Û nufûsa akincihên wir 60 hezar kes in. Ji wana 3 hezar çekdar in. Êlên Qoçgiriye jî; Îboyan, Saroyan, Zazayan, Palûyan, Kertelî, Ameneyan bi navûdeng in. Lê bihêztirînê wana Îboyan in û ev eşîr gelek jêhatî ye. Di serhildana Qoçgiriye de ku li sala 1920ê Zayînî dest pê kiribû, serokên serhildanê Mistopaşazade Heyder Beg û birayê wî Elî Şan Beg, Heçî Rasim, Izet, Mehmûd,*

Koranî Gul Axayan Neqî û Izet, Hesên Eserî, katib û mîrzayê wan Elî Şêr bûn."
 Ê ev peyayên gelê kurd giş tevî serhildanê bûne. Ji vana Heyder Beg midûrê nehiyeya Ecemraniyê bû û birayê wî Elî Şan Beg qaymeqamê bajarê Refahiye bû. Ev hemû serok bihev girtî bûn û wan ji bo şoreşa Qoçgiriye gelek fişek û tîfing amade kiribûn.

Avhewayê Qoçgiriye gelek xweş e, çiyayên wir bilind in, deşt û dol û newalên xwe fereh û ferawan in, li gelfî û serçaviyên wir av û kaniyên xweş hene. Bi daristan û deviyên xwe jî gumreh e.

Şertên Serhildan û Şoreşa Kurdên Qoçgiriye li Herêma Sêwasê

Wezîyet û Pêwendiyên Ermenîstana Qafqasyayê bi Ermenên Tirkîyê re li Hember Kurd û Tirk: Li gor Çardeh Prensîbên serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) Wilson, amerîkî û îngiliz û fransîzan soz dabûn ermenan ku dewleteke mezin û ferawan ku ji Erîwanê bigire hetanî bendergeha Eskenderûnê, ku xwe digihêne keviyên Deryaya Spî, ji wan re ava bikin. Ji berê de van dewletan bi hukumeta Daşnaq a Ermenîstanê û hukumeta Misawat a Azerbaycana Qafqasyayê û bi Gurcistanê re hev girtibûn û ji bo vê mebestê hevkarî dikirin. Li Qafqasyaya Ermenîstanê sînorên Tirkîye û Rusyayê li pêşîya serxwebûna Ermenîstanê asteng bûn, ku lewma jî biryar dabûn ku leşker û artêşên wan li hember Tirkîyê û Yekîtiya Sovyetên Rusyayê xwe amade

bikin. Derbarê viya de di Cenga Yekem de serok û giregirên Ermenîstanê ji dewletên Ewropa û ji Amerîkayê doza alîkariyê kiribûn û wan bi hev re li dijî seltêneta Osmanî hevkarî dikirin. Belam herçendî gelê kurd hez ji nexweşî û dolabgerandinên gelê ermen nedikir, lê nedixwest zilm û zorê jî li wan bikin, herwiha, li sala 1914-15ê Zayînî, dema ku hukumeta Osmanî (Îttihad we Teraqî) êrîş bir bi ser ermenan de û dest bi kuştina wan kir, hingê gelê kurd destê hevkarî û alîkariyê bo gelê ermen dirêj kir. 30 hezar ermen bi jin û mêr, mezin û piçûk ve li gund û bajarên kurdan xwe veşartin, kurdan ji ber tirkên dirrinde şeref û namûs, can û malê ermenan parastin. Belam, digel vana gelê kurd bi xwe jî têdikoşiya û herçend mafê serxwebûna gelê ermen li bal kurdan pir xweş bû jî, lê kurdan jî nedixwest li jêrî destê tirkan dîl bimînin yan bi destê ermenan bigirin û dîl biçin yan jî dîlîtiya ermenan bi dîlîtiya xwe re biguherînin. Ji ber van hoyan bi rastî û durustî gelê kurd ji ber van pîlan û tevgerên Ermenîstaneke mezin û ferawan neçar bûbûn û vê yekê li ser hesabê gelê kurd şepirzeyî anîbû ber derî. Serok û komele û komîteyên siyasî û civaka gelê kurd li Stenbol û Anadolê û li Kurdîstana Tirkîyê bi eşkerayî yan jî veşarî xerîkê xwe rêxistinî bûbûn; dawakar û parêzgarê Kurdîstanê bûn. Ji bo vê mebestê bi îngiliz, amerîkî, fransîz, îtalyanî û yewnaniyan re têkilî danîbûn û ji bo mafên gelê kurd ên dîrokî dawakar bûn, ku di dabêşkirin û parçekirina Dewleta Osmanî de

Kudistan neyête dabeşkirin û dîlkirin û parçe parçe nebe.

Herwekî ku me di serî de jî behs kir, kurdên Qoçgirî û rojavayê Dêrsimê bi hev re ji bo amacên gelê kurd ketibûn nav xebatê û ev kurd li ser wîlayetên Erzincan, Sêwas û Elezîzê zal û desthilat bûn. Lêbelê, di wî şerê li navbera tirk û Rûsyaya Qeyser de xelkê vê deverê tûşî malwêranî, zîrar û ziyaneke mezin bûbûn. Di vî halî de serokên Qoçgiriyan û xelkê Elezîzê li bajarê Stenbolê bi komeleyên siyasî yên Kurdistanê re ketibûn têkiliyê û bûbûn endamê wan komeleyan û bawerî bi hev anîbûn û alîkariya hev dikirin. Bi taybetî di nav komeleya Kurdistan Tealî Cemiyetî de bihêz bûbûn û bi hev girtibûn û ketibûn nav xebatên bidestxistina mafên gelê kurd û serxwebûna Kurdistanê. Bi taybetî ji bo bicihanîna peymana Sewrê ku biryara serxwebûna Kurdistanê Tirkîyê û mafê otonomiya wîlayeta Mosilê tê de hatibû dayin.

Di sala 1920an de gelek ji serokên Dêrsimî û Qoçgiriyan ji bo vê amacê ji bajarê Stenbolê vegeiriyan Kurdistanê û bi hev re li navçeyên Qoçgirî û Dêrsim û Erebgirê dest bi damezrandina teşkilatên bo serxwebûna gelê kurd kirin. Ev li hêlekê, li hêla din jî di sala 1919an de Mistefa Kemal ji tîrsa xîlafeta Osmanî û dewletên mezin ku êrîşî wî û hevkarên wî dikirin, bi veşarî ji Stenbolê reviyên hatin xwe li nav kurdan veşartin. Mistefa Kemal û Kazim Qerebekir ê ku li bajarê Erziromê dima û qumandanê Rojhilatê Tirkîyê (Kurdistan) bû, her

du bi hev re di nav rewşeke şepirze de ketin nav xebatê, çunke di nav tîrsê de bûn; têkçûna tirkan li ber derî bû. Ji vê hindê, Mistefa Kemal û Kazim Qerebekir û hevkarên wan xwe li Kurdistanê penah kiribûn; bi serok û şêxên kurdên Erzirom û Wan û Bedlîs û Diyarbekirê re dixebitîn da ku hêza Bergirîya Millî (Millî Mûdafa) û hîzbên bi vê tîmtêlê yên Kemalî di nav dilê Kurdistanê de daynin. Bi vî awayî bajarê Erziromê wek paytexta Kemalîstan hate zanîn. Di 23ê Têmûza 1919an de di kongreyê de, li pêş hemû serokên gelê kurd vê rastiyê tesdîq kirin, ku gelê kurd xwedî heq e, Kurdistan welatê kurdan e, hemû mafên gelê kurd ên netewî hene, ku Tirkîyê ji du mîletî pêk tê; yanî kurd û tirk. Piştî kongreyê biryar dan ku her du netewe xwedî konfederasyonê bin û serbixwe bijîn û dê li hember dijmin bi yek giyanî Tirkîyê û Kurdistanê biparêzin, eynî mîna Awusturya û Macarîstanê.

Guftugoya Mistefa Kemal bi Mistopaşazade Elî Şan Begî re li Sêwasê

Wek ku me got, meseleya Kurdistanê û Ermenîstanê bi hev re derketibûn holê û gelê kurd metirsîyek peyda kiribû. Bi taybetî di nav kurdên Erzirom, Wan, Bedlîs û Diyarbekirê meseleya ermenan jî tîrsek çêkiribû, çunke li Erîwana Qafqasan komareke bihêz pêk hatibû û dewletên mezin piştgiriya wan kiribûn. Dîsa, komarên Azerbaycan û Gurcistanê li dijî Rûsyaya Sovyet û

Tirkiyeya Osmanî bi komara Erîwanê re hevûdin girtibûn û êrîşî kurdan û tirkan dikirin. Ji aliyekî din jî, bi wan re, siyasîyên Îngilîz û Fransîz û Amerîkî jî bo pêkanîn û bicihkirina peymanaya Saykis Bîko li Erzirom û Sêwas û Meletiyê û Erebîrê jî bo qezenca xwe li dijî gelê kurd di nav tevgerê de bûn, li Helebê û li tevayî Sûriyê jî bo zindîkirina projeya Cester a ku jî bo qezenca dewleta Amerîkayê dixebitî, di nav tevgerê de eşkera de bûn. Ji vana jî wêdetir, şîrketên Amerîkayê jî bo madenên Kurdîstana Tirkiyê û jî bo kirîna neftê, li bajarê Erziromê bi general Kazim Qerebekir Paşa re di nav guftugokirinê de bûn. Û dîsa, ji bo vê amacê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) li bajarê Stenbolê di binî re alîkariyê didan kemalîstan.

Di van rojên wisa de, li 7ê Nîsana 1920î Mistefa Kemal Paşa bi Elî Şan Begê Mistopaşazade re li Sêwasê di nav guftugoyê de bû. Mistefa Kemal dixwest ku Elî Şan Begî îkna bike, ku siyaseteke dewletên mezin heye ku li dijî kurd û tirk e; xwestina wan ev e, ku Tirkiyê bidine yewnan û ermenan. Kurdîstanê jî di nav ermen û ereben de dabeş bikin û piraniyê Kurdîstanê bidine ermenan. Lewma jî gelê kurd û gelê tirk di talûkeyê de ne! Û Mistefa Kemal daw lê dike ku di têkoşîna wan a li dijî xelîfe Wehdedîn de, ew alîkariyê bidine wan. Mistefa Kemal soz dide Elî Şan Begî, ger ew bi ser bikevin Tirkiyê dê bibe dewleteke konfederatîf a ku di navbera kurd û tirk de ye. Bi vî awayî, Elî Şan Beg jî dide zanîn, ku xelkê Qoçgirî û Dêrsimê jî ji ber van şertan ketine rê û

li ser rîya heqên meşrû yên gelê kurd jî ew metirsî hene!

Elî Şan Beg û hevalên wî herçendî jî van pêşniyaz û beyanên tirkan bi guman bûn û jî kirinên tirkan piştrast nebûn jî, lêbelê ev guftugo li ber wan grîng bû. Lewma jî ketin nav hewldanan û li ser peymanên ku Mistefa Kemal bi kurdên Erziromê re pêk anîbûn lêkolînan çêkirin. Di encama vê têkiliyê de Mistefa Kemal fikrê Elî Şan Begî û hevalên wî fam kiribû ku ew jî dizanin amerîkî û Îngilîz xwedî du dewletên hevjiyan û dîndaşê hev in û dijminê Îslamê ne, nabe ku kurdan û tirkan bikine qurbanê ermenan û li Rojhilatanavîn ev du gel, yanî kurd û tirk nemînin.

Wexta ku di 17ê Êlûla sala 1920an de tirkan bi alîkarî û fedakariya gelê kurd dawî li şerê Daşnaqên Ermenîstanê anî û jî metirsiya wan xwe rizgar kir û jî Erdehan û Igdîrê bigire heta bi nêzîkî Erîwanê xistin bin desthilatiya xwe, hingê di heman salê de Elî Şan Beg û hevalên xwe vegeriya bûn nav kurdên Qoçgirî û Dêrsimê û li Vacixê kombûna xwe pêk anî. Bi awayeke dîrûdirêj li ser wê guftugoya ku bi Mistefa Kemal Paşa re kiribûn, sekinîn. Herwiha bîrûbaweriya Kemalîstan a li hember kurdan û dîsa li ser bîrûbaweriya kurdên Erzirom û Wan û Bedlîs û Diyarbekirê jî nîqaş kirin. Di dawiyê de gihan vê encamê ku serokên kurdan li ser esasê damezrandina konfederasyona kurd û tirk bi kemalîstan re li hev hatine. Lê di encamê de kurd bûne du beş: Hinekan xwestin ku pêwîst e gelê kurd bi tenê ji bo îstîqlal û serxwebû-

na Kurditanê hewl bide xwe û meyla hinekan jî ew e, ku divêt kurd bes ji bo xodmuxtariyeta (otonomî) Kurdistanê têbikoşin. Ev xal li Meclisa Enqerê (Büyük Millet Meclisi) jî di navbera nûnerên gelê kurd de hate munaqeşekirin û bû sedemê reaksiyonan û xirecir û zirtepirtan.

Axir di encamê de Mistefa Kemal dozê li 72 numayendeyên gelê kurd kir û emr û ferman da wan ku ew daxuyaniyekê ji serokê Amerîkayê Wilson re û herwiha bo Parisê bişnin û bi hemû dewletên Ewropayê bidine zanîn, ku kurd naxwazin Kudistaneke serbixwe ava bibe û ew dixwazin bi tirkên re bijîn û ew dê piştgiriya tirkên bikin. Îcar, li ser vê yekê di 29ê Nîsana sala 1920î de Elî Şan Begî li gor armac û peyman û daxwaza serokên kurdên Sêwas û Qoçgirî û Dêrsim û Elezîzê têlgrafêke dîrûdirêj şand Stenbolê. Bi hêza komela Cemîyeta Tealî kopiya vê têlgrafê ji siyasetmedarên dewletên mezin re û ji dewletên hevpeyman ên Ewropayê re û ji sefir û qonsolosxaneyên dewletên Ewropî yên li Stenbolê re şand, ku di vê têlgrafê de nivîsandibûn, "*Mistefa Kemal Paşa bêyî ku ji 72 numayendeyên gelê kurd bipirse û raya wan bistîne, wî ji ber xwe ve ev daxuyaniyê ji dewletan re şandiye, ku qaşo serxwebûn û îstîklala Kurdistanê ne hewce ye. Wî ev helwestê û vî karî bêyî dengwergirtina gelê kurd û bêyî xebera serokên gelê Kurdistanê kiriye.*" Di vê têlgrafê de serokên kurdan ragihandibûn ku "*Em kurd bi xwîn û çek alîgirên serxwebûna Kurdistanê ne.*" Û dîsa dabûn zanîne, "*Kurdên ku vê yekê dixwazin ji keviya robarê Qizilirmaqê bigire, ji bajarê Sêwasê*

heta bi Mosilê, hemûyê Kurdistanê Tirkîyê; bajarên Elezîz, Diyarbekir, Bedlîs, Wan, Erzirom û Sêwasê ne. Ji bo amaca jîn û jiyana Kurdistanê em doza mafên xwe yên dîrokî dikin û ji bo parastina van mafên xwe, em bi xwîna xwe amade ne ku giyanê xwe feda bikin."

Li ser vê raportê Mistefa Kemal Paşa û Kazim Qere Bekir Paşa şepirze û serserem bûn. Parlamena "Büyük Millet Meclisi" bi carekê re çelqiya û têk çû. Û bi vî awayî gelê kurd di nav tirkên de ket rojevê. Di encamê de serokên kurdan li navçeyên Qoçgirî û Dêrsimê li hev kom bûn û ji bo şoreşê dest bi amadekariyan kirin.

II

Kurdên Qoçgiriya li navçeya Yelîce li şûna Cihê Nezîrgaha Hesên Baba kombûna xwe pêk anîn û bi navê Zilfeqara Îmam Elî sond xwarin. Sêv felq kirin û her serkirdayek felqekî jê xwar, ku ev li gor rewîştê baweriya wan dirûşma peymanbestinê bû. Wan serkirdayetiyên kurdan biryarê dan ku ji bo rizgarî û serxwebûna Kurdistanê dest bi têkoşineke sext bikin. Hemû çekhilgirên Dêrsim, Qoçgirî û Erebgirê ku 3 hezar kurdên çekdar bûn, ji bo vê amaca wan a pîroz li navçeyên Qoçgiriya amade bin, ji ber ku Qoçgirî nêzîkî bajarê Sêwas û Erzincan û Elezîzê ye. Ji ber vê yekê tirkên li van navçeyan qutifîn û ketin nav hawar û gaziyan. Hawara xwe gihandin Mistefa Kemalê xwînrej da ku wan ji êrîşên kurdên şoreşger biparêze.

Di Temûza 1920î de kurdan avêtin

ser hemû navend û qereqolên leşkerî yên ku li derûdora Sêwas, Kanga, Danişmend û Zarayê bûn. Hemû rût kirin û dest dan ser çek û cebilxaneyan. Hingê waliyê Sêwasê Reşîd Paşa neçar ma ku di Tebaxa 1920î de Elî Şan Beg ku bi eslê xwe ji Refahiye bû, bike qaymeqamê Refahiye û birayê wî Heyder Begî jî bike midûrê nehiyeya Ecemraniyê. Çünke leşkerên Paşo Axa navçeyên Sêwas û Elezîzê perîşan kiribûn û li wan navçeyan cih jî tirkan re teng kiribûn û riya Gîresûn û Şebîn Qere Hesarê bi carekê xistibûn dest û meşa hatûçûna di navbera Gîresûn û Sêwasê birrandibûn.

Banga Serxwebûna Kurdistanê

Kurdên Qoçgiri û Dêrsimê biryara xwe dan ku Vacixê bikin paytexta şoreşê û dubare sond xwarin. Elî Şan Beg bi serkirdayetiye re yek bû û hev-girtiyê wan bû. Biryara şoreşê bi vî awayî bû, ku divêt şoreşê li Dêrsim û Xozat û Refahiye rakin piyan, çünke li wan navçeyan berpakirina şoreşê wateya xwe ev bû, ku hemûyê Kurdistanê digire nav xwe û pêk ve netewa kurd giş tê de ye, lewma jî Dêrsim-Vacixê wek paytext danîn.

Divêt Kurdistan Serbixwe be

Komeleyên siyasî yên kurd, bi taybetî Kurdistan Tealî û Teawun Cemiyetî bi yek dengî doza serxwebûna Kurdistanê dikir. Pêta agirê kurdaiyê bi carekê re berz bûbû û xof xistibû nav dilê hemû dijminên kurdan. Hemû kurdên dilpak û bişeref;

cotyar, pale, rencber, gundî û bajarî, xwende û nexwende, dewlemend û xizan giş bi hev re ji bo yek amacê bi yek dilî, ji bo doza herî pîroz a jiyana xwe, ji bo serxwebûna Kurdistanê hişyar dibûn.

Di 18ê Kanûna pêşî ya 1919an de ambador (balyozê berê ye Stockholmê) Şerîf Paşa, ku têkoşerekî kurd bû, bûbû nûnerê kurd û ermenan û xwe gihandibû kongreya Parîsê.

Di roja 30ê Kanûna pêşî ya 1919an de kurdan û ermenan di Kongreya Sewrê de li dijî xelîfe Wehdedîn ji bo doza mafê kurd û ermen hevûdin girtibûn.

Di encama vê têkoşîna kurd û ermen de Peymana Sewrê di navbera Bîranya, Amerîka, Fransa, Îtalya û Osmanîyan de hatibû girêdanê. Li gor vê peymanê serxwebûna Kurdistanê û mafên ermenan hatibûn îmzekirin.

Yekem Raperîn

Di Kanûna navîn a sala 1920an de kurd ji bo rizgariya Kurdistanê raperiyan. Serokê êla Şadiyan Paşo Begî bi tevî 15 serokên din ji Refahiye çû qezaya Vacixê ku li tevî kurdên rojavayê Dêrsimê bibin. Heyder Begê Qoçgiri di wê kombûnê de, ku ji bo amaca pîroz a kurdaiyê pêk hatibû, axiftinekê kir û wisa got,

Hedefa me rizgarî û serxwebûna Kurdistanê ye. Ey kurdino, pêwîst e ku hemû êlên me, çi mezin û çi piçûk, gundî û bajarî, sunnî û elewî; hemûyê kurdan bi hev bigrin û bi yek dil û bi yek zimanî banga rizgariya Kurdistanê biqîrin: Têkoşîn bo Rizgariya Kurdistanê! Ji ber vê yekê, ji bo gihastina

vê amaca pîroz pêwîst e di nav me de çî nexweşî û nakokiyên ku rûdabin, em wan bidine hêlekê û ji bo yek têkoşînê; ji bo rizgariya Kurdistanê pêwîst e ku em xwe bi sextî birêxistin bikin. Divêt ku em komîteyekê ji nav xwe hilbijêrin û bişînin Enqerê da ku li wir ev nûnerên me li gor Peymana Sewrê û li gor biryarên kongreya Erziromê û li gor Destûra Millî ya doza serxwebûna Kurdistanê xebatê bikin û van mafên me bi dewletên Ewropayê bidine zanîn.

Birayan, pêwîst e ku li hember hukûmeta Enqerê em bi yek dil û yek zimanî tevbigerin û di doza serxwebûna Kurdistanê de em neyêne xapandin!

Kemalîstên dirrînde çawa ku bi rewşa van kombûnan hesiyar, ew jî ketin nav tevgerê û têlgrîf û raport ji dewletên Ewropayê re şandin û tê de sond xwarin ku ew têlgrîfên ku wan berê şandibûn bi navê kurdên Kurdistana Tirkîyê hatine şandin û niha jî wisa têne şandin, ku di wan têlgrîfê de wisa ragihandibûn, ku qaşo ji bo kurdan serxwebûna Kurdistanê ne lazim e, kurd naxwazin ji tirkan cihê bibin. Di vê ramanê de kurd bi hev re hevdeng in. Û navê hemû serokên kurdan tê de nivîsandin û şandin ji Cemîyeta Tealî û Teawuna Kurdistanê re. Herwiha kopiyên wan jî ji hemû balyozxaneyên dewletên Ewropî yên li Stenbolê re şandin û dîsa, ji hemû siyasetmedarên Ewropayê re jî şandin. Bi vî rengî, derew û hîleyên kemalîstan dubare derketin holê û bîrûbaweriya kurdayetiyê li hemû cîhanê belav bû.

Êrîş

Di roja 30yê Tebaxa 1920an de

kurdan dest bi êrîşê kirin. Di wê êrîşê de yekîneyeke cendirmeyên tirkan rût kirin û dest danîn ser çekên wan û ew bêteref hiştin. Bere bere li wan navçeyan leşkerên tirk perîşan bûn; gelek rêyên ku wan tê de hatûcûnê dikir, hatin girtin. Akincihên (niştecih) tirk ên li van navçeyan xwe spartin hukûmetê. Bi vê timtêlê, bi teq û tûqan du meh bihurîn.

Kuştin

Di encama rûtkirina wê yekîneya cendirmeyan de, taximeke piyade bi tevî 2 topên çiyayî û 12 mîtralyozan di 2ê Teşrîna pêşî ya sala 1920an de ji Sêwasê, qaşo bi niyeta ku dê biçine Erzincanê derketin ser rê, lê li beyabananan ketin dû hêzên çekdar ên kurd. Pêrgî şervanên Zalim Çawîş û Qareman Husên Axa yê Şadiyan û Izet Begî hatin, ku 230 şervan di maîyeta wan de bûn. Herwiha, her du hêz li hember hev ketin nav şerekî giran. Ew leşker, digel ewçend çek û cebîlxaneyan ku di dest wan de bû, nekarî xwe bigihêne armaca xwe, ku ew jî ev bû: tohîlanîna wan êrîşên kurdan bû, ku li gelek deveran dest danîbûn li ser çekên wan. Vê yekîneyê piştî ku zaîyat û kuştîneke zêde mezin xwar, bi çî halî be jî, axir xwe gihande Zarayê. Û li wir bi tevayî tevliheviyekê deranîn ku nekarîn pê re serî derxînin.

Digel viya jî, dîsa kurdan nedixwest xwîn bête rêjtin da ku neçar nebin û Seyîd Rizayê Dêrsimî doza vekişîna çekdarên ku tevlihevîyê derxistine li wan neke, çünke bi pêwîstiyê nedizaniyê; ango şoreş dest pê bibe, lê

hîn wan bi giştî xwe birêxistin nekirine û amade nebûne!

Di roja 25ê Teşrîna pêşî ya sala 1920î de kurdên Qoçgirî û rojavayê Dêrsimê vê têlgirafa li jêr şandin Enqerê.

Li gor Peymana Sewrê, li navçeyên Diyarbekir-Elezîz - Wan - Bedlîs - Sêwas -Erzincanê, pêwîst e ku Kurdistanêke serbixwe bête damezirandinê, lewre hukumet û xîlafeta tirk a li Stenbolê dibêjin ku Kurdîstana serbixwe navêt. Herwiha, kongeryên Erzirom û Sêwasê jî dibêjin ku serxwebûna Kurdistanê navêt!

Serokê êla Qoçgirî: Mihemed Taqî
 Ji seyidan: Elî Şêr
 Ji serokên Dêrsimê: Mûnzûr, Mehmûd, Seyîdxan, Mistefa

Serokê Eselan: Mehmûd

Wext, zivistaneke pir dijwar bû. Berf û bareneke zêde dibariya. Hukumeta Enqerê bersivê nedabû têlgirafa wan; dixwest îro-sibe bike heta ku firsendekê bi dest bixîne û derba xwe dawêşîne wan! Di vê navberê de kurdên Erebgir û Meletiyê jî xwe dan pişta Qoçgirî û Dêrsimiyên. Leşkerên kurd her ku diçû bihêztir dibûn û Enqerê ji tirsan ta girtibû.

Şoreşgerên kurdan bernameya xwe wisa danîn: Dê Alaya Kurd ya pîroz bête hildan, çekdarên wan ji Refahiye herin Erzincanê, ji Xozatê herin Egin û Elezîzê, ji Zarayê herin Celaliye û Sêwasê. Ji bo destpêkirina van êrişan jî qewlê xwe bo serê bihara 1921ê danîn.

Em bêne ser Reşîd Paşa, waliyê Sêwasê. Ev waliyê dirrînde li hember hêza kurd ket nav hewldanên propagandayêke berfireh. Hemû ajan û nokerên xwe xistin nav tevgerê û wan

jî gotinê wisa belav kirin, ku qaşo biryara danîna Hukumeta Kurdistanê ji aliyê Mistefa Kemal Paşa ve hatiye dayîn, lewre jî qet hewce bi şoreş û xwînrijandinê nake! Hingê pê re jî çend roşinbîrên kurd kirin wek nûnerên Meclîsê û li navçeyên Qoçgirî û Dêrsim û Erebgirê belav kirin ku ev e, Hukumeta Kurdistanê bi xwe hate danîn û saz bû jî! Û bi şerefa hukumeta Tirk!!! û bi serê Mistefa Kemal Paşa!! sond xwarin ku ev e, mafê kurdan hate dayîn û dayîna mafê kurdan çêbûye û çûye!

Lêbelê vê propagandayê li ser serokên Qoçgirî û Dêrsimiyên hiç havilekê nekir. Li nav xelkê deng belav bû ku çend roşinbîrên kurd netewa xwe bi kursiyekê firotine û bûne nokerên dijmin û pişta xwe dane kurd û Kurdistanê.

Mistefa Kemal ê ku bêtî peymanekî xwînîmij û dijminê kurd, gelek hewl dida xwe ku zorê li Seyîd Rizayê Dêrsimî û Elî Şan Begê Qoçgirî bike, her çawan bibe jî divêt ku ew bi nîfûza xwe kurdan vekişînin aliyê wî ve û wan 72 nûnerên kurd jî teşwîq dikir ku Seyîd Rizayî li ber bixînin ku ew berdevkên hemû Kurdistanê ne, lêbelê van her du lehengan bi tu awayî îtîbar bi Mistefa Kemalî nekirin û neketin nav xeletiyân.

III

Desteya Amojgarên (Mîsyoner) Mistefa Kemal...

Bi hêz û alîkariya waliyên Sêwas û Elezîzê amojgar (mîsyoner) li pey hev ketin nav tevgerê û di nav xelkê de

belav kirin, ku Mistefa Kemal û Meclisa Enqerê hukumeta Kurdistanê ye, lewre jî pêwîstî bi şoreşê nîn e! Û van desteyên amojgariyê her tim digotin, ku kurd nezan in û zû dixelitin! Ji hêlekê ve jî van kemalîstan bi hemû hêza xwe dixebitîn ku navê kurd nehêlin û meseleya Kurdistanê ji rojevê bête hilanîn. Lêbelê, li hember vê pîlana nû ya kemalîstan kurdên Qoçgiriye jî wisa bêdesthilat û bêdeng nesekinîn. Wan jî Desteyên Rîspiyan (Pîr) pêk anîn û ji bo pêşilêgirtina propagandayên kemalîstan desteyên wan ên rîspiyan li Kurdistanê geriyar û bi hemû hêz û şiyana xwe fikrê kurdariyê belav kirin. Gelek caran li saz û tembûr û sentûrê didan û distriyan û li ser meseleya kurd û Kurdistanê qise dikirin.

Desteyên Rîspiyan kurdan vê banga li jêr dikirin:

Osmanî ji heyama seferberlikan heta bi îro zilm û tadeyê li me dikin. Wan îxanetê bi dîn û mirovayetiye re kiriye. Di nav me de dubendiyên mezhebî yên wek Elewî û Sunnî pêk anîne. Wan li hemberî kurdan û pîrê me Îmam Elî û Bektaşê Welî zilm kir, tovê kuştin û wêraniyê li nav Kurdistanê çandin.

Li hember vê yekê stûxwarkirin kufir e! Bêdengbûn şerm e!...

Bav û dayikên tirk xwe dane aliyê bêdengiyê û dûr ji imana pak, li hemberî kurdan helwest digirin û ferman didine; ger em doza mafê xwe dikin, ew cerd diavêjin ser me û meyla çetetiye dikin!

Li hemberî zordariyê stûxwarkirin kufir e! Bêdengbûn şerm e!... Mêr ew e ku dest bibe xwe!

Ka hela bala xwe bidinê, bê hela Dîwana Orfî çiqasî kurd dane kuştinê! Serê zarokên kurdan jêkirin. Çavên xwe girtin û bêdengbûn dibe? Qanûn û şeref û

namûs û mafê kurdan ne di bala we de ye?!

Bala xwe bidinê, çawan talankirina malê kurdan li xwe helal kirine! Çawan bi hezaran kurdên bêstûc û bêguneh xistine bendixaneyan! Bi hezaran kurd ji warên wan dane koçkirinê û gundên Kurdistanê şewitandine.

Çendî bêdîn û bêwijdan in!...

Li şûna ku mafê kurdan bidin, her çî helwesta xirab heye dikin; mêrkuştin, talankirin, gundşewitandin û bêqanûnî tev ji karên wan in.

Bi hev bigirin! Îro roja rizgariyê ye. Roja azadiyê ye. An jiyar an mirin!

Kurdino, duwaroja kurdan di destê we de ye. Di riya rizgariya Kurdistanê de pêwîst e ku em canê xwe bidin. Ji viya melerizin, ji mirinê metirsin! Şîretên Ehmedê Xanî bînin bîra xwe ku dibêje, "Em sikkayên xwe çêbikin, em alaya xwe hil bikin!"

Li hemberî zordariyê stûxwarkirin kufir e! Bêdengbûn şerm e!...

Rabe! Rabin! Rabin!...

Bi vî awayî li ber vê propagandaya desteyên amojgarên Mistefa Kemalî ku ji bo xelitandina kurdan her tiştî dikirin, desteyên rîspiyan kurdan jî bîrûbaweriya şoreşê belav kirin da ku pêşî li propagandaya ne rewya ya kemalîstan bête girtin.

Şoreş

Di 4ê Adara 1921an de serokên navçeyên Qoçgiriye; qumandan û rêvebir û şerkeran Sadiq Begî kurdan serokê leşkerên şoreşa kurd.

800 leşkerên kurd ku di bin serokatiya Elî Şêr û Mûnzûr Îbrahîm de bûn, çûn bi ser Îmraniyê de. 400 ji wan li ser pîrê Îlîçşeytanî ji wan veqetiyar û berê xwe dane Dîwîrekê,

400ê din jî berê xwe dane Tirklo. 300 şervanên din jî, ku di bin serokatiya Qere Îbo û Tilîk de bûn, wan jî çavdêriya şerê wan dikir. Li pişt wan jî, 2 hezar kurdên bêçek, kirin şeş mil û ew jî di bin serokatiya Ezemet û Taqî Begê kurê Rifet de bûn. Karê wan jî ev bû, ku kuştî û birîndaran hildin, şervanan peyda bikin, li pey fişek û çekan bigerin û peyda bikin û li hawirdorên Boxaza Wêran, Qeredaş, Maden û Kemûçeyê hatûçûnê bikin... Û bi vî awayî bikarîbin Kemaxê û çar-alîyên bajarên Erzincan û Sêwasê bikine bin çengê xwe.

Di heman demê de waliyê Sêwasê desteyek amojgar pêk anî û ji bo damirandina şoreşa kurd şand Hafîkê, lêbelê vê desteyê qet nekarî havilekê bike û neçar berepaşkî vegeyriya...

Tirkan ji Erzeromê û Baybûrdê ji Alayîya 11. du bulug piyade bi tevî 2 batarya topên çiyayî şandin bi ser Erzincanê de. Van leşkeran dikarîbûn Erzincanê dagir bikin.

Di bin serokatiya Mehmûd Begzade (Beko) de 200 şerkerên kurd êrîş birin bi ser Refahiyê de û rizgar kirin. Hemû leşker û cendirmeyên tirk ên li wir dîl girtin, çekên wan jî wan stendin, wan bêteref kirin û şandin Sêwasê. Ew Alayîya piyadeyên ku ji Qere Hesarê dihat bo alîkariya leşkerên şkiyayî yên tirk, ji aliyê şerkerên Qareman Nûrî ve hatin şkandin û bi vî awayî Zara jî ket destê kurdan.

Alaya Kurd Hate Hildan

Roja 2yê Adara 1921ê Kurê Rifet û Palewan Husên û Aşûr nameyek ji qumandanê Îmraniyê re şandin, ku 3

bulug leşker di bin fermandariya wî de bûn. Di nameyê de nivîsîn ku "*Ger tu dixwazî şer bikî, were derveyî bajêr!*" Lêbelê, qumandanî bersiv neda. Wan jî ajot bi ser de û ji serê sibehê heta bi nîvrojê pevcûnê ajot û di encamê de bajarê Îmraniyê ji aliyê şoreşgerên kurd ve hate rizgarkirin. Mîralay Xalis Begê ku qumandanê leşkerên tirk bû, li Îmraniyê hat kuştin û leşkerên tirk giş hatin dîlgirtin, çekên wan jî destê wan hatin stendin û Alaya Kurd li Îmraniyê hate hildan û li şaneşinan li ba bû... Di encama vî şerê mezin de 10 şoreşgerên kurd şehîd ketin û 20 jê birîndar bûn. Piştî bidestxistina vê serketinê şerkerên kurd ên ku ji navçeyên Sêwas û Erebgir û Erzincanê ne, êdî dikarîbûn çûnûhata nav mal û zarûzêçên xwe bikin.

Dr. Nûrî Beg

Dr. Nûrî Beg, yek ji roşinbîr û têgihastî û têkoşerên dilşewat ên netewa kurd bû. Ev camêrê cîgerşewat di warê dîplomasiyê de yek ji rêvebirê şoreşa Kurdistanê bû. Gelek kes ji xizmên wî û çend birayên wî di doza kurdayetiyê de şehîd ketibûn. Û di nav *Komela Kurdistan Tealî û Taawunê* de jî gelek bawerî bi rola vî kurdî hebû.

Hukumeta Enqerê jî gelek lê dixebitî da ku vî têkoşerî desteser bike, lê nedikarî, çunke ew li Kurdistana Rojavayê gelek bi navûdeng bû...

Şoreşgerên kurd her çî raport û belgeyên ku bidest dixistin, didane destê Dr. Nûrî û herwiha wî jî wan rûber dikir û bi vî awayî di famkirina

pîlan û bîrûbaweriya kemalîstan de gelek sûd jê werdigirt. Lêbelê, rojek ji rojan Dr. Nûrî û çend kurdperwerên din ve hat girtin. Wan xistin bendîxaneyê û dest bi îşkencekirineke pir sext û dijwar kirin. Ji ber vê yekê şoreşgerên kurd di roja 8ê Adara 1921ê de bajarê Sêwasê tevlîhev kirin. Leşkerên tirk şepirze bûn û şikiyan. Li ser vê yekê, Mistefa Kemal û wezîrê karê hundir ferman dan waliyê Sêwasê ku ew dest ji Dr. Nûrî berde, heta ku şer aloztir nebûye û bi vî awayî jî şoreşger neajone bi ser Qeyserî û Enqereyê jî, hingê hukumeta Enqerê nekeve nav xetereyê. Û ji hêleke din jî, tirkên Qeyserî û Enqerê yên ku li dijî hukumeta Mistefa Kemal in, nekevin nav tevgerê. Bi vî rengî hew mabû ku Mistefa Kemal têketa nav lepê sê hêzan ku ew jî: Hêza kurd, tirkên li dijî hukumeta Mistefa Kemal û yewnanî bûn. Ji ber ku Seyid Rizayê Dêrsimî jî piştî Dr. Nûrî digirt, lewre Meclisa Enqerê ji vê rewşê şepirze bûbû.

Dêrsim Ket Nava Tevgerê

Roja 9ê Adara 1921ê ji Vacixê 1700 çekdarên Dêrsimî dan nav kejeberfên Mûnzûrê. Berfeke zêde dibariya û rê hatibûn girtin, lêbelê Dêrsimiyên tiştê kiribûn piyên xwe ku ew jê re dibêjin "hedik". Ev hedik, wek ku perçeyek ji wan be, wisa bi piyên xwe ve girê didin ku êdî ji bo wan meşa li ser berfê hêsan dibê.

Vî leşkerê mezin xwe gihand Kemaxê. Qaymeqam û serkirdeyên leşkerê tirk û rêvebiran dîl kirin. Ew

kurdên ku mela hukumeta Enqerê dikirin jî girtin û wan dan Dadgeha Dîwana Herbê ya Kurdî ku li Îmraniyê hatibû danîn.

Vêca, leşker ber bi aliyê Firatê ve meşiya û hilfiriyan pira Îlîçseytanî. 100 leşker ji wan ji bo desthilatiya vê pirê bi cih bûn. Bi vî rengî leşkerên Dîwirekî û Celalî û Hafikî bi hev ve hatin girêdan...

Serokên leşkerên Dêrsimê ev bûn: Elî Şêr, Bira Îbrahîm, Misto Beg û Mehmûd Axa.

Roja 10ê Adara 1921ê Elî Şêrê Qoçgirî, Dêrsimî Qoçzade û Bira Îbrahîm bi 200 leşkerî ve hatin nêzîkî Kemaxê û bajarê Şeşkopirdê girtin. Qumandanê artêş û cendirmeyên tirk bê şer dîl hate girtin. Hingê hukumeta tirk dixwest dengê vê şoreşê veşêre û tiştên ku ew dê bîne bi serê Kurdistanê ve, bila Ewropa û cîhan pê nebihesin! Ji wê çendê desteyeke amojgaran ji bo propagandakirinê şandin herêmê û ji aliyekî ve jî xwe ji bo êrîşkirinê berhev kirin. Waliyê Sêwasê di roja 12ê Adara 1921ê de têlgirafek bo serokên Rojavaya Dêrsimê şand ku tê de doza vê kiribû: Qaşa derbarê şoreşa Qoçgiriye de raya wan çi ye? Û herwiha doz li wan dikir ku ew ermenên li bal xwe teslîm bikin.

Wan jî bersiva telgirafê bi vî awayî da:

Ji Waliyê Sêwasê re - 14 Adar 1921

Em bi dilekî paqij bîrûbaweriyên xwe bi awayê ku li jêr e, pêşkêş dikin:

1. Di pevçûn û xwînrijandinê de, ne berjewendiya kurdan û ne jî yê tirkan heye.

2. Li gor biryarên Mistefa Kemal Paşayî yên li kongeryên Erzîrom û Sêwasê divêt

ku di demek zû de cografyaya Kurdistanê bihête cihêkirin.

3. Divêt ku bi biryara hukumetê Kurdistan ji aliye îdarî, aborî û perwerdeyê de serbixwe be û di nav sînoren Tirkîyê de lê bête mêzekirin.

4. Divêt ku ew siyaseta kone ya Xîlafeta Osmanî ji nuh ve li ser Kurdistanê neyête zindîkirin. Pêwîst e mafê kurd bête nasîn û çawa li tirkan tê mêzekirin wisa li kurdan jî bête mêzekirin û di karûbarên dewletê de kurd jî beşdar bibin.

5. Hêza heyf li hember kurdên Qoçgiriye encameke xirab derxistiye holê. Di bin barê baca giran de ne ku bi tenê kurdên Qoçgiriye, jiyana li me gişan tahl bûye. Em kurd tevde bê dibistan û bê nexweşxane û bê doktor in. Şerê Cihanê mal li kurdan wêran kiriye, lewma jî pêwîst e ku Kurdistan bête avadankirin.

6. Pêwîst e ku hemû hepsî bêne berdana nabe ku leşkerê tirk bi çavên dijminane li kurdan mêze bike û narewa xwîne birêj!

7. Ew ermenên ku li bal me ne, tevê wana zarok û jin û pîr in û bê çek in. Xwe avêtine bextê me û bêguneh in. Lewre jî em dê wan nedin destê we!

Îmze:

**Serokatiya Rojavayê Dêrsimê
Wêneyek ji bo Mistefa Kemal Paşa
Encumenê Millî**

Waliyê Sêwasê ji vê bersivê wisa têgiha ku Dêrsimî ji bo serxwebûna Kurdistanê rabûne û bi vî awayî rabû vê weziyetê ji hukumeta Enqerê re nivîsî. Bersiva Enqerê jî ev bû, ku pêwîst e ew nehêle Dêrsimî beşdarî vê şoreşê bibin û rê nede ku ev şoreş belav bibe! Li ser vê talîmatê waliyên Sêwas û Elezîz û Erzincanê ketin nav tevgerê û leşkerên xwe zêdetir kirin.

• Hakîmê Zarayê Îzet Begî xeber gihande Eli Şêr Begê Dêrsimî ku, "Her

çawa bibe jî divêt ew 70 siwariyên şerker amade bike... Û bila Qoçgirî jî qezayên Refahiye û Qurîçayê rakin piya; Îmraniye û Zara nekevin destê dijmin, çunke di roja 31ê Adara 1921ê de ji Amesiye, ji Tabur-5ê bulugek û ji Alayî-13 jî 2 bulug û bataryayeke topên çiyayî şandine Sêwasê. Siwariyên Alayî-53 jî herwiha hatine nav bajarê Sêwasê."

Desteya Amojgar

Çend desteyên amojgaran ji Sêwas û Elezîzê berê xwe dan navçeyên rojava û rojhilata Dêrsimê. Li gor destûr û baweriya elewîtiyê dest bi şîret û amojgariyan kirin da ku tevgera rizgariya kurd vemirînin. Wan ev digotin, ku yanî tirk jî elewî ne û elewî jî Îslam in. Û bi taybetî Mistefa Kemal Paşa bi xwe jî dibêje, "Ez elewî me û kurd im. Û ez ji vê jî kêfxweş im. Ger dijmin were Enqerê, ez dê bi xwe û leşkerên hukumeta Tirkîyê re, em dê bêne Dêrsimê. Di nav çiyayên asê, bi beş û xweşik ên Dêrsimê de kurd û tirk dê bi hev re bişînin û li wir bimînin. Piştî derkirina Îngilîz û Fransîz û amerîkiyan ez dê hukmê zatî bidime destê kurdan, lewma jî ev xwînrijandin îro ji bo her du aliyên jî ziyane."

Amojgarkirina bi vî rengî ji bo vemirandina şoreşê û sarkirina kurdan propagandayan belav dikir. Mistefa Kemal bi riya waliyên Sêwas û Elezîzê xeberê belav kiribû ku ew hukmê xwe yê zatî dide Kurdistanê û Dêrsimê dike wîlayeteke navendî. Vê propagandayê xweş kar kir û mixabin kurdayetî sar bû.

Weziyeta Taybet

Ji bilî desteya amojgariyê desteyeke din jî ku ji berpîrsên îdarî, siyasî û

leşkerî pêk dihat di bin serokatiya Şefîk Begî de ji aliyê Mistefa Kemal ve bi taybetî hat pêkanîn. Ev komîteya taybet ji Enqerê bi rê ket û roja 15ê Adara 1921ê giha Sêwasê. Piştî çend rojan, ev komîte çû gundê Boxaza Wêran û bû mêvana Heyder Begî, ku wê demê gelek serokên kurdan jî li wir bûn. Şefîq Begî ji wan re got ku "Ez bi fermana Mistefa Kemal Paşa hatime. Gelek silavên wî ji we re hene. Vê nameyê bo we û Heyder Begî şandiye, ku tê de dibêje, 'Hukmê biryara danîna Kurdistanê hatiye dayin. Şerî rawestînin. Zimanê Kurdî dê bibe zimanê resmî. Aborî tê cihêkirin. Hebûn û maden û sermayeya Kurdistanê dê ji bo Kurdistanê bêne xerckirin. Rêvebirên Kurdistanê wê hemû kud bin'."

Di encamê de Heyder Begî baweriyaya xwe bi van gotinên vê heyeta Mistefa Kemal anî û bi van şertan qayil bû. Serhildan û cengê da rawestandî. Amojgariyê û gotinên heyeta hukumeta Enqerê ku digotin, ew hukmê xwe didin Kurdistanê, bi vî awayî kurd sar kirin û şerê Qoçgiriya dane rawestandî.

IV

Pîlana Loyd George

Dr. Nûrî Beg ku bi fermana Mistefa Kemalî ji zindanê hate berdan, hingê ew birin ber waliyê Sêwasê Reşîd Paşayî û walî jê re got ku "Begê min, doktor. Tu mirovekî xwendê û xwedî dîplomaya bilind î. Di warê ramyariya siyasî ya cihanê de tu xwedî agahî yî. Ca di vê dema ku yewnanî êrîş dikin bi ser tirkên û hukumeta me ya millî de, ku ev hukumeta tirk û kurd e, tu ferq di nav me de nîn e, şîn

û şahiya me yek e, gelo di demeke wisa de ev rewa ye ku kurd xebera ewropiyan bikin serê xwe, bi hukumetê re şer bikin û doza cihêbûnê li me bikin?! Ma hûn ji bo avakirina hukumeta Kurdistanê şerê me dikin?!!

Em binihêrin li pîlana Loyd George. Tirkan di pileyê reş û tarî de nîşan dide û dibêje, 'Divêt ku ev reşî bikêrikê bête keritandin û spî bibe!' Ev zilam niha wezîrê karê derve yê Brîtanyayê ye. Brîtanya û Amerika û Fransa û Îtalya dibêjin, 'Ji Edirneyê heta bi Qafqasan, li naverasta Deryaya Reş em dê Ermenîstaneke Mezin durist bikin. Em dê Edirne û Stenbol û Dardanel (Çanakkale - R.L) û Ezmûrê jî bidin girek-yunan. Kurd û tirkên jî em dê bikine nokerên xwe...' Dê mizgeftên me ji xwe re bikine dêr. Nabe ku kurd jî mîna erebên ku bi gotina Lawrens Frîwyan kirin, ew jî bi ya wî bikin. Em, wek Tirkîye, baweriyaya me bi mafê kurdan heye û em dê mafên wan bidine wan. Piştî paqijkirina dijminan ji ser xaka welêt, bi fermana Mistefa Kemalî em dê xodmuxtariyê bidine Kurdistanê û "Büyük Millet Meclisi", yanî Meclisa Tirkîyê jî dayina van mafan qebûl dike, lewma jî pêwîst nake ku kurd şerê me bikin û meydanê li me teng bikin, çunke piştî şerê bi biyaniyan re dê her tişt bi îrade û xwestin û arezûya kurdan çêbibe.

Doktor, gelek xizmet û hezkirina te ji bo Tirkîyê heye, qîmeta te jî xuya ye, her tişt ji bo te amade ye, bi tenê kurdên ku şerê me dikin tu meyla wan meke..."

Li ser vê yekê Dr. Nûrî Begî ji her wextê zêdetir ji siyaseta Tirkîyê ket nav gumanan. Û çawa ku ji zindanê derketê derve bêhtir ji carên berê ket nav têkoşîna biserxistina Şoreşa Qoçgiriya. Roja 13ê Adara 1921ê li gundê Boxaza Wêran serokê heyeta amojgariyê Şefîq Begî fermana Mistefa Kemalî ji Dr. Nûrî û hevalên wî re xwend û bi awayekî dîrûdirêj

behsa xodmuxtariyeta Kurdistanê ji wan re kir û gelek jî li dijî şerî qise kir. Hingê Dr. Nûrî Begî bersiva Şefîq Begî da û got ku *"Pêwîst e ku hûn dev ji tevgerên leşkerî û propagandayên reşkir û neheqîyan berdîn, mafên îdarî yên derbarê kurdan de belî bikin, ew xodmuxtariya ku hûn ji me re behsa wê dikin naxwe bi resmîyetê beyan bikin û bila Meclisa Tirkîyê bi eşkerayî biryara wê bide û rojname binivîsin û bila biryara hukumeta Tirkîyê ya ji bo kurdan li tevayî cîhanê belav bibe. Ger na, em ji gotinan bawer nakin, çunke mêrkujî û talankirina zemanê osmaniyan her liber çav e!..."*

Vê axiftina Dr. Nûrî Begî tesîreke bi têhn li ser serkirdayetiya kurd kir û ev bawerî ji wan re çêbû ku rawestandina şerî ya ji hêla Heyder Begî ve baş nîn e û dê ev ji bo kurdan bibe destpêkirina rojên reş! Herwiha, pê re jî xwestin ku wê desteya amojgaran dil bigirin, lêbelê dîsa jî roja 22ê Adara 1921ê endamên heyetê vegerandin Sêwasê, çunke ew mêvanên Heyder Begî bûn û dilgirtina mêvanan eybeke mezin bû li bal kurdan. Di vê demê de hukumeta Tirkîyê jî, ji bo qirkirina kurdan xerîkî pîlaneke mezintir bû.

Leşkerên Tirk

Piştî guftugoyên Dr. Nûrî Begî, navdêr artêşa Enqerê ketin nav tevgerê. Tabûra Siwarî-14. û Lîwaya-13. li pey hev şandin Sêwasê da ku bajarên Elezîz û Erzincan û Sêwasê ji xetereya êrîşên kurdan biparêzin.

Heyder Beg û Serkirdayên din ên Kurd

Di serî de pîlana wan a vê carê ev

bû, ku ji Sêwasê bi Enqerê re bikevin têkiliyê, lêbelê Heyder Begî ji ber dilpakîya xwe bawerî bi soz û gotinên Mistefa Kemal anîbû, lewre jî bi vê qayil nebû ku kurd bi ser hukumeta Enqerê ve êrîş bikin. Ji ber vê yekê, Heyder Begî vê pîlana han derxistibû pêş.

Leşkerên Fransayê li Ruha û Eyntab û Aramê (Maraş?) saz bûbûn. Rawestiyabûn ku bi pêş ve werin, lêbelê kurdan nedixwest ku ew bêne nav Qoçgiriyan, çunke ji dora Eyntabê bigire heta bi Sêwasê ew herêm bi giştî ketibû jêrî desthilatiya Qoçgiriyan. Elî Şan Begzad, Izet Beg, Mehmûd Beg û Ezemet Aşkî, van her çar qehremanan serkirdayetiya şoreşgerên Qurîçay, Bilûcan, Zara, Hafîk û Sêwasê dikirin. Di hin deveran de jinên kurdan jî di nav şoreşgerên Qoçgiriyan de beşdarî dikirin; karê tedawîkirina birîndaran, temînkirin û amadekirina zexîreyê û heta ku şerê bi tîfing jî dikirin.

Di wan navçeyan de kurd bi giştî bi ser ketibûn û wan deveran bi giştî kiribûn jêr destê xwe. Şoreşgerên kurd di hatûçûnê de Alaya Kurd hildikirin û Marşa Dêrsimê ya Kurdayetiyê dixwendin, lewma jî eşqa têkoşina ji bo Kurdistanê li nav dilê hemû kurdên vê deverê vêdîket. Lêbelê, fransizan ku dîtin kurdan şoreşeke bi rêkûpêk rakirine piyan û Alaya Kurd hildane hingê tirs kete dilê wan, lewre jî rabûn di bin re bi tirkan re ketin nav guftugoyan.

Kemaliyan di 18ê Adara 1921ê de li wîlayetên Trabzon û Gumuşxane û Şebîn Qere Hesar û Sêwasê hereket dan destpêkirin. Ji ber ku kurdên

navçeya Zamarîgê jî azadîxwaz bûn hingê hatûçûna di navbera bajarên Erzincan û Xarpêt û Kemaxê de qedexe kirin û têlên telefonê jî birrîn. Ji aliyê hukumetê ve li bajarên Erzincan û Sêwas û Xarpêtê rewşa awarte hate îlankirin. Bi vî awayî li her derê û ji her aliyê ve kuştinê dest pê kir. Kurdan bi banga "Ya Heq! Ya Elî!" êrîş birin bi ser leşkerên tirk de û di nav vê hemû germahiya şerî de kurdan sirûda rizgariya Kurdistanê diqîriyan. Di 20ê Adarê de li navbera Zara û Qibulheyayê kurdan posteyeke hukumetê girt û dest danîn ser gelek belge û fermanên hukumetê. Şerkerên Seyîd Hebas ku 100 tifingçî bûn, ajotin bi ser leşkerên tirk de yên ku ber bi Kemaxê ve diçûn. Ev leşker li ber wan şikiya û 100 kes jê hatin kuştin û yên mayî ber bi Erzincanê ve vekişiyen.

Şeva 22ê Adarê şerkerên Zalim Çawîş û Izet Begî bi ser navçeya Sincan a bi ser qezaya Dîwirekê ve girtin û şerkerên tirk ên li wir xwe dan dest û teslîm bûn. Bi vî awayî navçeyên Armûdan, Dîwirek û Çelinqayayê bi carekê de ketin jêrî destê kurdan. Leşkerên tirk di vî şerî de perîşan bûn û ketin bin destê kurdan.

Vêca, kemalîst dîsa ketin nav dekulolab û fenûfûtan; efûya giştî îlan kirin. Di vî şerî de kêm zêde tirkên Azerî jî alîkariya kurdan dikirin û li Meclîsê jî dest birin xwe.

General Nûredîn Paşa

Hukumeta Enqerê vî navî lê kir û

Liber ew e ku meqamê hezretê milukane bi umuratê cuzî îşxal nekira li mewlel alîkarî bo ew meqamê bilind bi suretê qetî memnu e, heçî kes xîlafê vê îlanê hereket bike ceza tete dayîn.

Rojî Kurdistan

naîbê hikumetê Kurdistan hate tayîn kirin.

2- Ji zîrek û minewerên Kurd Macîd Efendî bo midurê hendesexane û Sidiq Efendî bo katibê hendesexane tayîn kirin.

3- Tewfîq Efendî, Ezîz Axa tayîn bûye bi memurê enbar û mexazeyê eskerî û polis.

4- Ji erbabê îqtîdar û senet Şakîr Muçrim Efendî tayîn bû bi mifetîşê fenê telgiraf û muamelatê poste.

Xuda li hemûyan mibarek biket û hemû aliyên muwafiq bike.

Reîsê pişder cenabê Abas Axa û cenabê Şêx Emîn, Şêx Qadir Sindolan û ji ruesayê namdar cenabê Bayiz Axa û Axayê Qerenî Axa û axayên din yên navdar li piştî ku bi tamamî li hizurê milûkane îktisabê feyz û merhemet girt û bo mewqehê xwe teşrîf kirin.

Li Encamê:

Yunanî Ji Tiraqayê Diçine Derve

Derseadet: 24 Teşrîna 1- herekatê texlîyekirina Tiraqya teqerîben tamam bû, ew ciyên ku ji teref turk ve bo îdareyê problem teşkîl dikir. Mendubê samîyan dewletên îtîlafê jî îştirakî Refet Paşa kirîye.

Qabîneya Taze yê Îngiltere

Li ser îstifakerina Mîstir Lewîd Corc bi telgirafêk ku ji Londra ve bi tarîxê 24ê Teşrîna Ewel 338 hatiye qebîneya Îngiltere ji van zatan teşekul kirîye.

Başwekîl	Mistir Bonarlo
Wezîrê Xariciye	Lord Gurzon
Wezîrê Malîye	Mistir Baldon
Wezîrê Mûstemlekad	Doq Of Dînfonşîr

Paşrez	Terlayê Dêm
Malaxerat	"
Bax	"
Guherêz binawerêş	Terlayê Beraw

Donimî	Mîqdarê firotinê
30	biitibarê pênc beşêk beş
"	"
21	"
6	"
21	"
6	"
6	"
6	"
6	"
12	"
12	"
12	"
6	nisfî beitibar pênc beş yek beş
12	"
6	"
24	temamî

Ew beşên ji vê zewîya ame ku aîdê bi Emîn Mela ye, piçkile û cûreyê mewqîyên wê li ser de hatiye nûsîn û li dî çar ta waqî e bi muqabilê telebî Mela Seîd ji 2300 rupîye û diwazdeh ane mesrefê muhakeme û resumê îcrayê tete firotin û bo îhaleyê moleta 30 roj wezhê muzayedê alenîye kira. Her kî taleb e, bila bi sedî deh temînat musteshîben mûreecat bi daîreyê îcra yê Silêmanî û delal Tewfîq Axa bikit.

4 Teşrîna Sanî 338
Memurê îcra
M. Wehbi

Li metbeya hikûmet li Silêmanî tete tabkirin.

Dîwana Mehwî

Dîwana şîrên şairê meşhur Mehwî Efendî ku ji 82 sahfê pêk tete li metbeaya Silêmanî hatiye tabkirin. Nusxeyê wê bi du rupî ye. Eshabê zewqê selîm(xwediyê zewqa saxlem) û muhîbanê edebiyata kurdî vê fîrsetê nefewitînin. Mureecat li metbeaya hikûmet tete kirin.

Midurê Metebea
Ebdulmecîd.

Îlan:

58-338

Hisseyê malum ê Şêx Qadir Miftî ji van araziyan û aşî ku li gundê istîlê waqî e bo îhaleyê qetîye yê bi mucîbê (114) madeyê qanuna îredat panzde rojî din wezhê muzayedeyê alenîye tete kirin. Her kî talib e, bi sedî deh temînatê digel muraceat bi daîreyê îcra yê Silêmanî û delal Tewfîq Axa biket.

30 Teşrîni ewel 338
memurê îcra
M. Wehbi

Îlan:

123-338

Mewqiyê wê	Nevê wê
Binawerêş	terlayê biraw
Deşta hermî"	"
Qewlê Zîye "	"
Darçejnê	"
Nawbokan	"
Sersêr	Rezdêm
Nawzoran	"
Kolfire	"
Baxkurdî	"
Binawerêş	Dêm Tarla
Lebîreser gehrîz	Terlayê Biraw
Lebîrenaw Bokan	"



Sahîfe:1

Muherrîr

Elî Kemal

Rojî Kurdistan

Sahib îmtiyaz û midîr mesul

M. Nûrî

Bedel abone:

3 mang êk, 6 mang du,
salêk çîwar rupîye ye.

Îlanat bidîrîk
3 ane deh sînîrî

Bo hemû şitêk mirecat
be midîr mesul kira

bo xaric ucretî posta
îlawe dekirî

Rojî Kurdistan

Tarîxî întîşar
15 Tîşrînî sanî 1922
Silêmanî

siyasî, edebî, ictimayî gezeteyek resmî ye
heftêyê carêk derdiçî

Nusxeyê be aneyek

Nusxeyê be aneyek

Sal:1 Jimare: 2 [Çîwarşeme] 2 Rebiûlaxir 1341 22 Teşrînî sanî 1338(1922)

Bi taybetî eve çend sale ku cenabê Hezretî Melîkê Kurdistan yanî "Melik Mehmûdê Ewwel" bo seadet û teraqîya vê milletê her cûre fedakarîyê ixtiyar kir, heta ev car bi amalê xwe ku seadet û teraqîya ev weten û milletê nail bû û ev millet jî li saya himmetê wetenperwerane yê muşarun ileyhiye ve geyişte rojên seadet û azadîya xwe her bimînî Melîkê Kurdistan.

M. Nuri

Ji Necmeyê ve

Yekkirina Hukumeta Estenbul û Enqere

Londire: 20ê Teşrîna Ewel - li gor xeberên ku li Parêse ji xezeteyên Estenbul ve hatiye wergirtin, ku turk hez dikin hukumetê Enqere û Estenbul bikin bi yek û ew ferqê ku li navbeyna wan da heye bo helgirtina zatê şahane erz kirîye ku îtiraf bi hukumetê Enqere bike. Çinku li Turkiyê da her hikumetê Enqere haizê nifuz û seltenetê meşru ye.

Kemalîyan meclîsê sulh ê Lozanê qebûl kirîye. Estanbul 30ê Teşrîna Ewel Kemalîyan muwafaqetîya wan kiriye ku meclîsê Sulh li Lozan îniqade bike xezeteyan. Zor û ehemîyet didin bi qebûlbûna Refet Paşa bo huzurê şahane û muşerref bûn û ziyareta bi qederê çar seet wiha yeqîn bûye ku nifuzê şexsî û mewqîyê zatê şahane zêdetir bi qewet kirîye.

Serbr û Deyaxa Qewmê Kurd

Qewmê Kurd teqerîben çar hezar sal li pêşya mîladê da li şerqê Dicle yanî li mewqîyê hazir da her bûwe û zor defa jî îspata mewcudiyeta xwe ya mîllî kirîye.

18 esir li pêş mîlad da bi mewcudiyetekî pîrr û întizamekî fewqelade Keldanistan îşxal kiriye û çend esrêk bi kemalê debdebe ew cîyan îdare kiriye û li wê da asarê medenîyetê tesîs kirîye. Paşê ji teref asurîyan ve bi hicumêkî zalîmane ew cîyan ji wan hatiye sendin û mewqîyê wî yê xweş hatiye îşxal kirin.

Li dawîya ev çend esrêk li jêr îdareyê minawebeyê asurîyan û keldanîyan mawete û piştî ketiye destê Îran. Li paş çend esrêk din jî ketiye destê Yunan yanî Îskender û warisên wî. Piştî Roma û li dawîyê tekrar Îran û li zihurê îslamîyet da ketiye destê eczayê mutemîmeyê Îslam. Û li zemanê Ebasîyan da Hûlago, Qerekoyinî, Alê Celayîr û Turk.

Li gel ev hemû înqilabên tarîxî da ku li jêr Pêyerdowê Cîhangiran şerq û xerb da perîşan bûn ku eger ev muhacemetê daîmîye bi ser hikumetêkî muazem de bihataye wekû Romaya Şerq, ne lisan û ne navê wê li rûyê kaînat da nedima. Qewmê necîbê Kurd mewcudiyeta xwe ya maddî û lisanê xwe yê mîllî muhafeze kir û ji hemû fîrsetên bi îstîfade îdîayê heqê jîyan û azadîya xwe kiriye. Qehremanê pîrr namdar û hukumdarê pîrr feal û alîcenab ê wan hebûye. Weku Selahedîn, Kerîm Xanê Zend û saire.

muhtacê rehetî ye muhatacê hîç tiştêkî
din nîye.

Yunan Li Tirakiyê da Neman

Estenbul 29ê Mine: Ew eskerê Yunan ê
ku li Tiraqya da mabûn îşev bi şimen-
difer(trên) hereket kirîye, bi çûyina ev
eskeran li Tiraqyayê da eskerê Yunan
namînê. Ev cara yekemîn e ku simenî
alayek jendirmeyê turk daxilê Tirakya
dibê.

Elî Kemal û Kemalîstan

Sernûserê xezeteyê *Peyamê Sebah* Elî
Kemal, ku li demek berê wek dişminê
kemalîstan bû, daîma li aleyhê Quwayê
Millîye neşriyat dikir, bo wê heta li
meqaleyek da gotibû eger turk Îzmîrê
îşxal bikin ez qelesa xwe dişikênim û
nivîsandinê terk dikim.

Li dawîyî da ku orduya mizafer a
kemalîstan îzmîr ji wan girte yekî ji mil-
letperweran bo îfayê waad kirî, kaxizêkî
bo wî nusf bû, wî jî îstifa kir. Bo îsmekî
meçhul û runiştiye.

*
* *

Ey bira ger tu tealiyê milk û millete meraq
Ray heqîqet bikre pêş û bidere ber şeqê nîfaq
Paydarê milk û millet îtîhade îtîhad(yekîtî)
Em ucuzê fitneye wa lazime bîdeê telaq
Xuda şewî kurdî roj gêra be teşrîfê Şehî
Tac bexşê alihîmet nutfeê sahib beraq
Ruhê xot ger bibi bedelê serfê qudumêkî keme
Muhyî şer'ê şerîfe û naciê Kurdê Îraq
Ro le qabî Kibriya û fexrê alem keyn bilên
Xainê kiwîr bî be hîsseki banga qet waqewaq
Ey waten biçare gêt royê beser çû roj bid
Paytextê hezretî şahike sahibê tumturaq
Al û wala xot birazîntewe heq te bilî

Reîsê Qabineya Yunan Hatiye Heps Kirin

Reîsê qabineya Yunan (Qaloqropolos) bi
kuştina yunanîyek li Anadolî têtê îtîham
kirin ji ber wê li Atîna hatiye hepskirin.

Murexisê Misir Diçin Bo Meclîsê Şerqê Qerîb

Qahîre: 31ê Teşrîna Ewel hikumetê
Misir dawa li hikumetê Brîtanya kirîye
ku Meclîsê Sulh ê Şerqê Qerîb da cî bo
wê hazir bikirê, hikumetê Brîtanya jî vî
heqê bi meşru zaniye, murexes hatiye
şandin û tesdîq kirîye.

Fikrê Emrîka li Derheq Meclîsê Lozan da

Paris: 31ê Teşrîna Ewel li ser
dawetkirina Emrîka bo Lozan sefaretê
Emrîka cewabêkî mufesilî nusîye. Li vê
cewabê da muhafazayê Cemiyetên
Xeyriye û şeairê dînî(şiyarên dînî) û bi
hîmayeyê eqeliyat weku (hiquqê mil-
letên piçuk) weya miletêk ku hesabîl
mecburîye li daxilê hikumetêkî xeyrî da
mabîte û hûriyetê tameyê ticaret û
serbestî weku milekanî Estenbul û
sîyasetê serbestî yê behar îqrarê wî
kirîye.

Lord Gurzon û Çareseriya Meseleya Şarq

Londra: 29ê Mine bi xisûsî li ser
meseleya şerq Lord Gurzon vê qiseyê
kirîye: Hikumetê Brîtanya ew hendê ku

Memleketimdir, meskenimdir, medfenim
Kimse Kürdistanıma yan bakmasın
Akmıyor çağlayanlar Kürd için
İstemez min ba'di asla akmasın

Şadi ye, iş e, text e, cejne nî'mel îtifaq
Sa werin emca be merdî destî yek bigrin hemû
Rîyê muxalif ba nemînî firsete ehd û mîsaq
Fuziya wurd ziban û zikrî qelbit bî bilê
Îtifaq îtifaq îtifaq îtifaq

Îlan:

Nimreyê dosya: 507

Ew xanîyê ku li mehleyêk Gewîje
waqî ye û pêşî bi tarîxê xasî û xanîyê
Tewfîq Efendî û erseyê xanîyê
Evdirehman Axa û terfê rastê bi terîqê
xasî û terefê çepî bi xanîyê Evdrehman
Axa û piştta wî bi xanîyê Hecî
Evdirehman Qeredaxî bi sînora e û
navbeynê Tewfîq Efendî kurê Mehmed
Axa sakînê meheleyê Gewîje û Açıxan
keça Ehmed a gird e, xelkê meheleyê
meskure miştêrek e û li dêl keşif çünke
xeyrê qabilê teksîm kirîye qerarê wî
hatiye dayin ku bi sûretê bey'e îzaleyê
şûyuh û paş tenzîlê mesarif esmanê
hasilê li navbeyna şîrîkan teksîm bikirê.
Ji tarîxê neşrê vê îlanê ve bo îhaleyê ewil
bi midetê çil û pênc roj vazîhê mizayede
hatiye kirin. Heçî kesê talib be, dibê
pêşînen ji sedî deh pê temînat bidet û
miracat bi mahkemeyê bidayetê
Silêmanî Qasim Salih û mûnadî Tewfîq
Axa biket.

15-ê Teşrîna Sanî 338
wekîlê reîsê şer' û edil.

Ehmed Muxtar

Îlan:

Nimreyê dosya: 514

Li ser iqmeyê de'wa ji teref Ehmed
kurê Nadir Çawîş li xisûsê sêsed û
pence rupî ye li eleyhê Salih kurê
Mustefayê Şems, meheleyê Serşeqam li
neticeyê tehqîqat da tehqîq kir ku, mud-
deyê eleyh merhum Salih mehelle
iqametê wî mechul e li ber vê qerar hate

**Ehmed
Fewzî**

*
* *

Ji teref cenabê şairê navdar Ehmed
bikeve bo xezeteyê Rojî Kurdistan.

Şikir Xuda dekem ke geviştine weqtê çak
Ta şew nirwê bangê nîda nebûwe rojê pak

Sibhan bo ziyayewe sedê Skenderî
Etraqê kurdî girtuwe em roje pake pak

Hemdî

Şair-i vatanperver Refîq Hilmi
Efendi terafından gönderilmiştir.

Buzlu dağlardan düşen şelaleler
Her biri fewareyê semîn gibi
Damensiz cebelde(eteksiz dağda) **laleler**
Dağ bir dıl dir birer şirin gibi

Ah Kürdistan meftunum sana
Pek güzelsin dılrıbasın ey vatan
Senden akdes bir diyar olmaz **bana**
Nerde dünya, nerde cennet, nerde **sen**

Çağlayanlar fişkırır her köşeden
Dağlar hem zîr hem balasına
İşte bunlardır letafet bahşeden
Asyanın cenet-ül me'vasına(cennet mekânına)

Bir şebî mehtab yüksekten kamer
Dağların atlas cebînî üstüne
Ferşi nur eyler iken sandım sema
Nazil olmuştur zemini üstüne

**memurê tapu
Faîq**

Li muhendixaneyê ardî Bombay û Xiştê Kal û tenekeyê çînko tête firotin. Ewê talib be, divê muraceat li muhendixaneyê biket.

Midirê muhendixane

Ewê talib be li muhendixane fêrê seneet û otomobiliçiftî bibêt bi şertêk xwêndewar bêt bo qeydbûnê divê mura-
cat bi muhendixane bête kirin.

Midirê muhendixane

Tarîxî, edebî, ictimayî, fenî û romanî muteedidim heye bi fiyatî ehwen difiroşim. Ewê talib be, bila muracat biket.

**Etar
Qadîr Axa**

*Li metbeya hikumet li Silêmanî tête
tabkirin.*


dayin. Bi terîx û îlana teblîxatê pê îfa bikirê eger 18yê Kanuna Ewel 238 roja duşem a bîzzat bi xwe yan wekîlekî wî yê qanunî li mehkeme hazir bin û xiyabenî mehkemeya ruyet tête kirin.

**18-ê Teşrîna Sanî 338
wekîl Reîsê Şer' û Edl
Ehmed Muxtar**

Hejmar-27

Li meheleyê Kiwîje da xaniyek ku sehwen bi du reqemê tehrîr û bi 16 û 17 - 36 reqemê hatiye terqîm kirin leda tehqîq yek xanî ye û bi 16-36 reqem û 772 teselsûlê mureqem textên wî ji çar û deh eywan û hewşê pêkhatî ye û ceb-
heyê li alîyê rêya giştî û 14-36 xanîyê weraseyê Emîn Ebdulah Yesar, 20-36 xanîyê Nesîm Mela Elî û 9-21 xanîyê Heme Emîn Elî Xelef, 20-36 xanîyê Nesîm Mela Elî û 16-20 arse xanîyê kûrê Emînî 26-20, xanîyê Osman Beg û 14-36, xanîyê weraseyê Emîn Ebdulah sînor xaniyek bîna li îlm û xeberê heyetê îxtariye û raporê keşif bi bêtapu mudeyê 30 sal bêproblem li tehtê tesserûf û mûlkî Muhyedînê kurê Xefur dabûye mer-
hum Muhyedîn bi mucîbê hucetê werasetê mahkemeyê şerhîye yê Silêmanî ku bi tarîx 26 sifir 341 û 1945 nimreyê da saleke berê wefat kirîye. Werasetê bi îtibar du par her yekî parek bi Ehmed û Mihemed kurên wî munhasîr e, li paş wefata Muhyedîn heta halê li tesserufê Ehmed û Mihemed da bûye. Li ser muracatê waqîa jinûva bîna wê tête tapukirin. Li vê xanîyê da heq û îdâyêkî her kesî heye heta mudeyê 30 rojê din ligel ewraqê musbet da mura-
caat bi daîreyê tapuyê Silêmanî bike. Ewel defa ye tête îlankirin.

13 Teşrîna Sanî 338



Sahîfe:1

Muherrîr
Elî Kemal

Bedel abone:
3 mang êk, 6 mang du,
salêk çîwar rupîye ye.

Bo hemu şitêk mirecat
be midîr mesul kira

Rojî Kurdistan

Sahib îmtiyaz û midîr mesul
M. Nûrî

Îlanat bidîrîk
3 ane deh sînîrît

bo xaric ucretî posta îlawe dekirî

Roj Kurdistan

Tarîxî întişar
15 Tışrîni sanî 1922
Silêmanî

siyasî, edebî, ictimayî gazeteyekî resmî ye
hefteyê carîk derdîçî

Nusxeyê be aneyek

Nusxeyê be aneyek

Sal:1 Jimare:3 [Çîwarşeme] 9 Rebiûlaxir 1341 29 Teşrîni Sanî 1338

Em ku unsurekî muhîm ê îslamî ne, em bi anane û zimanê xwe terbiye û îdara xwe bikin, mudetekî zû em zêdetir pê xizmetê îslamiyetê dikinê. Eger bi zimanek dî û ananatêk xaricî bêne terbiye û îdare kirin, ne bo alemê Îslamiyet û ne jî bo Îslamiyet feyde temîn nake.

Li bîdayetê îslamiyet da qewmê necîb ê ereb bi ananatê erebîyet û bi amal û mefkureyê millîyetî fikrê wan terbiye û tenmîye dike. Bo azmê metîne têdikoşin li zemanek cuz'î da şuleyê(ronîya) îslamiyetê li şerq û xerb da belav bûbe û bo alemê Îslamiyet û însaniyet, gelên asar ê xeyriye mucîbî hişt.

Her ew ereb û her ew qewmê necîb bi ananatêkî xaricî bihata îdarekirin bi tedricê amal erebî ji fikirê wan biçûya, ew wext ne fatîhên Endulûs û ne debdebeyê seltenetê Abasiyan li bîr diman. Bînaenaleyh em rica dikin, weku em seadet û tereqîya Îraq û qewmê necîb ê ereb temenî dikin, hûn jî pêşkevîtin û seadetê me arzû bekin.

Qale

Ey em mişfîq ey wetenê pak û muhterem
Nemut mebe ewende girîftarê derd û xem

Nemut minale bîrsîye mebe aciz û pişyu
Lade le rû nîqabê xem mihnet û elem

Şikir û sipasî zid yekta bike bedil
Emro ke boy be sahib hebîş û sipa û îlim

Nemut minale beyse îtir weqtê îşrete
Weqtê tiluê kewkebê(derketina stêrka)
îqbalê millete

Şikir Xuda dekem ke weten biwî le xem riha
Azade bûyî le qeyd hem mihnet û cefa

Şikir Xuda weten ke qise û waad û min hemû
Dêm hate dî nema le dillim da îtir eza

Li xezeteyê jimar 738ê Îraq da bi unwanî menşur El Huzb-ul Hur-ul Iraqî û jimar 743ê da bi unwanî Meclîsê Îdareyê Kurdistan beyanatêk me dî û ji teref Arif Saîb Efendî ve li jimara du yê Rojî Kurdistan da cewabêk baş bo wî dabûyeve.

Belam ev beyanat aîdê Kurd û Kurdistan e, lazime hemû kurd û watan-perwer beramber ev fikra Hîzb-ul Hûrr hissiyatê xwe yê watanî beyan bike. Çünke waten maderê mişterek ê me hemûyan ne û îstirham li Hîzb-ul Hûr-ul Iraqî dikim ku vê beyanatê suê bi neyînî teneqîşin. Çinku mexsedê me beyanê heqîqet û midafaayê hiquqê meşru(rewa) yê xwe ye. Malume her qewmê ku fehîm û îdraqw wî bibî arzuya wî ya hûriyet û sadetê heye, me jî bîlfîl ev arzuya xwe îspat kiriye.

Hîzb-ul Hûr-ul Iraqî berîya ku dilê dostên xwe bi beyanata xezete rencîde bikin, eger bo îtîhadê erebîyet û tenzîma îdareyê xwe bixebitin, hem bo Îraq hem bo alemê Îslamiyet feyda wê zêdetir dibe.

Hîç derxatir nakin? Ku evro esrê netewetî ye û me jî bo vê rojê muqedes zor fedekarî kiriye û dikin.

Eceba nizanin ku komelgayê xeyrî mutecanis hîç wextêk qewmîyetêkî mutehîde teşkîl naket.

Bi kemîyetî rîyazî jî musbete du tişt ku li eynî cins nebî cemî qabil nîye û eger qabil bî hasilê cemeekî her ew du tişt e. Ku weha bî kurd her kurd e, ereb jî her ereb e. Belam ligel qewmê necîbê ereb da daîma pevgirêdaniya me ya dînî û îslamî ji hemû qewmêk zêdetir e û heta dinya baqî bî ev pevgirêdanî her mewcud e.

Îslamiyet jî hîç wextêk millî ya ku tealiyê îslamiyet têda mewcud bî, red nekirîye.

Estenbul 8 mine: Refet Paşa evro cewabê sefirê Şikago daye û gotî: “Her çi ruesayê muslimîn heye kamîlen razîne ku meseleyê xîlafet û hikumet ciyawaz bigîrê û gotî heyecanê umumî yê îslamî ku 3 sal e dewam dike, hemû bo hasrê hiquqê xîlafet bûye. Bo hikumetê Turk û hihkumetê Enqere jî dair bi muwafeqet û terafdarê vî fikrê kullî telxîrafên muhim wergirtiye.

Londin 7 min e: Axa Xan bo mux-abirê têlî ekspirêsê nûsiye tayina xelîfe qet bi weraset nebûye, bi întixabê bûye û xelî jî kirawe.

Û muhtemele heyetêkî Hindî bişînî Awrupa bo ew heqâfquetê ku li zemanê axir da ceryan kiriye.

Û muhtemele misliman Kongra-nîsek teşkîl bikin û li vê Kongreanîsê da qewanîne xîlafet wazîh bikin û bi fikrê Axa Xan bo ev meclîsê Misrê bi minasib zaniye.

Londin 8 mine: Mixabereyê têlî telgiraf nûsiye sultan li paş ev wuquatê ku ceryan kiriye, niyeta wî heye ku li xeyrî Turkîya li memleketêk Îslam da da bicî be. Mesela weku Hind.

Estenbul: Îlxayê îmtiyazatên ecnebî hate îlankirin û qewanîne gumrik û resmê temetû li ser ew canîbê ku li Estenbul da danîştûn tetbîq kira û destkîra bi cem û cebayetê resumat weku gumrik li ser ew tarîfeyê ku li menatiqê ena duwelî da carîye û ev resm pênc mîslê resmê qedîm e.

Şikir xuda ke dêmê wetenê mihrîban xom
Ber îş û xoşî û ferh û îşret û sefa

Awat binde hate dê îtir nema xemim
Şikir Xuda ke pir terb û zerq û xermim

Emro weten ke rişik çimnezar cennete
Şamî be eynî subhê munîr û seadete

Feslê hemu bihare şewî roj roşne
Îşe, nişate, xoşîye, şewqe, musere (şadî)

Cehd û sayîye (xebat) bikewn bedil û ruh îtir hemû
Emro zemanê sayî ye (xebat) ne wextî etalete

Ey zadekan şabê weten ehlî marîfet
Hengamê sayî ye û kûşîşe (Mehmûde) aqîbet

Elî Kemal

Ji xezeteya “el asîme” ve:

Estembul: 6ê Teşrîna Sanî 338
Îsmet Paşa daxilê Estenbul bû.

Estembul 7 mine: li ser raporêk ku bi tarîxê 23 Eylul 338 ji teref îtilaf ve razî neyin bi îşxalê Estembul ji teref kemalîyan ve û eskerên dagirkerên hevpeymanan dibî heta nîhayetê sulh li Estenbul da bimîne ve.

Le mubaheseyêk da ku li navbeyna heyetê îtilaf û mimesilê Anqere Hamid Beg da ceryan kiriye û tirawe her çend heyetê îtilaf arzu nakin ku mudaxeleyê umurê daxilyeyê Turkiya bikin. Feqet mudaxeleyê nîzamê Estenbul heta li jêr îşxal da bî, bi emrêkî waqef dizanin.

Bilhassa Bağdat tarihi olan "Zeylê Gulşenê Xulefa"ya bakılsın. 1180 tarihiyle elli müteakip olan senelerde Şawîzade Muhamet Beg'in azamiyla kaç defa Baban ve Süleymanyelilerin yiğitlik göstergelerine arz-ı ihtiyaç edilmiş. Acemoğlu Muhamet ile Ibn-i Halil'in Bazvi Nahlileri kırdırılmış, Bağdat'ı muhasaradan kurtarmışlardır.

Vezir Süleyman Paşanın başını kestiren kim? Abdulah ve Davut Paşaları Bağdat'ın kürsi-i wezarete oturtan kim idi? Bu hakaik-i tarihiye karşısında kürdlüğe karşı hakk-ı hakimiyet idiasında bulunmak sarıh bir hakka tecavüz etmesine demek değildir?

Kürdlükte hiçbir şey yoksa şecaat-i fitriye(doğal yiğitlik), izzet-i nefsiye vardır. Bu iki hasret dolayısıyla hukukuna kimseyi tecavüz ettiremez.

Hüseyin Nazım

Rojê Kurdistan

**ceride-i muhteremesinin meslek-i
tecditperveranesi karşısında
acizane bir seciye-i şükran**

Tecedud-i ruh(ruhun yenilenmesi) milleten

kopan aşkı sadettir

Tecedud-i asrı hazır ilm û fenî ile ibadettir

Tecedud-i hakka doğru itila esbabını

ihzar(hazırlama)

Eden bir fikri alidir mukades bir diyanettir

Tecedud-i feni takdis ile mükeder var ise idrak

Tecedudperveri imha-i kanun cehalettir

Tecedud öyle bir distur-u uzmadır ki

mevzuu

Serapa lutfi quran-ı mecide bir dehalettir

Tecedud-i aliyane su-i tevsirle pek düşmüş

Ve illa gayesi her karda tetbik-i hikmettir

Tecedud bir havay-i saftır sarı olur fikre

Her kavim, kavmiyetin her ferdi kendi milli çıkarları ve vatanının gelişmesini arzu eyler. Bu arzunun gerçekleşmesi için her vadiden koşar, her yola başvurmaktan geri kalmaz. Fakat bu koşuş ve temesükün(bağlanma) bir zemin-i hak ve hakikatın takibiyle yürütmezse şahra-i maksudiyetî kaçırmış olur.

Evet yükselmeyi daima erdemle elde etmek lazımdır. Mufazelet ise doğru yoldan ayrılmak, şanında değildir.

Filhakika bir zaman Kürdistan teşkilat-ı mülkiye itibariyle Bağdat'a bağlı idi. Fakat bu bağlılık bir özel ve milli bağlılık değildi. Ancak teşkilat-ı mülkiye itibarıyla bir kanuni bağlılık ve milliyet idi.

Nitekim Bağdat merkez-i hilafet-i Abasiye olduğu zamanlar bilcümle aktarı islamiye aynı rabita ile Bağdat'a bağlı idiler. O halde kainat Irak'tan ve Irak kainatan ibaret olmak gerekti.

Şimdi mevzubahis olması lazım gelen mesley-i rabita-i idariye(idari bağlılık meselesi) değil. Cinsiyeti kavmiyedir. Kürdistan tabiri lafziyesiyle de anlaşılıyor ki kürdür. Kürdlükle Araplık arasında bir mücaneset-i irkiye ve unsur-ıye yoktur. Ancak mücaneset-i diniye var ise de unsuriyet tabir-i istişaiyesi karşısında ayrılığa uğratılmak isteniliyor.

Vakian necabet-i kavmiye îtibarıyla hakk-ı ruchañiyetiniz vardır. Fakat bu ruchan diğer kavimleri kandırmak için bir ruchan demek değildir. Bitabî her kavmin kendisine mahsus tarihsel gelenekleri vardır. Bu gelenek itibariyle sosyal alanda her kes kendi makamını takip etmelidir.

kanî sifre û zemînê Hamid Efendî mehdud bi bêtapu li tesorufê mewqufeyê meskute piçkule da bûye û sî sal ji pêşiyê heta niha bi navê weqfê tesoruf kiriye li ser teskîreyê memurê îcraya Silêmanî ku bi tarîxê 16yê Eylul 338 û 157 nimro ye. Micedidê bi navê weqfê meskuteyê piçkule û mûtewelî Ehmed Kurê Ebdulah Axa rebtê tapu dikirî bi vê zemînê ra her kesê elaqeya wî hebe, heta mudedê bîst rojên din mureceat bi daîreyê tapu yê Silêmanî bike, duwem defa ye têtê îlan kirin.

16 Teşrîna sanî 338
memurê tapu
Faîq

Li metbeya hikumet li Silêmanî têtê
tabkirin.

Teceddud eskilikten çikmadir bir ref-i külfettir
Teceddud yıkmadir adet-i bimanay-ı i'sarı
Teceddud naşır-i eftar-ı ahraran-ı ümmettir
Teceddud naikane bir devirmektir hürufatı
Teceddud sanki ruy-i arza isticlabi cennettir
Teceddud bir tecavüzdür hudud-u vehme cüretle
Teceddud tatlı rüyalarla mali bir hakikattır
Teceddud bir nişandır inkılab-ı fikre her yerde
Teceddud en sahihi bir eserdir ruhu milletti
Teceddud! Barekellah! Böyle bir nam-ı bilind elbet
Delil-i zendgidir, mahi û mubnay-ı zillettir
Teceddud her güzellikten alır makul bir hise
Teceddud adeta gül deste-i tefsir-i zinetir
Teceddud cehl-i istiklafidir ilmin hakikatında
Fakat pek saib olur öçke bu da bir eski adettir.

Süleymaniye
Refiq Hilmî

Îlan:

Li ber ew e ku xezeteyê Rojî Kurdistan li 15ê Teşrîna sanî 338 da întişar kirîye. Lazime zewatê muhtereme yê abone ji vê tarîxê ve hesabê xwe rabigrin. Yanî întişara vê xezeteyê ew tarîx îtîbar pê dikirên û bo hesabê bedelê abone kerem diferron. Înşala mehmanê me qisur nakrî û dê muntezem xezeteya wan bête teqdîm kirin.

Midirî mesul
M. Nuri

Nimro: 27

Daxilê nahîyeyê Serçinar li dikanê pan yek parçe zemîn hatiye veqetandin ku bi zemîn kanî sifir e û şerqê wê bi ew kanî pan û binawanê ciyê Kak Ahmed, xerb û cinubê wî bi çem xiralyeşa wurawe. Dawud Bulaq şimalê bi ciyê

Bang Heq


Yekem n Rojnameya ore a Kurdistan

Dr. Kemal Fuad

Wergerandina ji soran : S. Verroj


Eger *Kurdistan* (Qahîre, 22.4.1898) yekemîn rojname-ya kurdî bêt, *Bangî Heq* yekemîn rojname ye ku ji aliyê bizotneweyekî çekdar yê kurd ve tête belavkirin. Ev Rojname piştî ku Şêx Mehmûd (1882-1956) Silêmanî bicî hiştîye (seretayê Adara 1923), ji aliyê "Qerargaha Umûmî ya Oeduya (Baregayê Giştî yê Leşkerî) Kurdistan" ve li şikevta Casene (nizîkê Surdaş) hatiye çapkirin. Tenê sê jimar jê derçûne. Nûha jimara 1 û 3 li ber destê me ye. Jimara 2 her bi destnûsî maye. Wek di gotarekî Edmons da derdi-kevêt, wî bi temamî jimarên ev rojname û rojnameyê Rojî Kurdistan daye bi kitêbxaneyê Zanistgaha Kambrîç.

Tiştêk di vê karê başê vî bîst û pênc salên rabirdû da li belavkirina kurdî da berçav dikevêt, ji nû ve



Bangî Heq, hej: 1

belav-kirina govar û rojnameyên kurdî yên pêşve ye². Ev kar destpêka wê ye ku ev rojname û govaran ji nemanê rizgar kir, neslên(qirnên) nû bi dewlemendîya edebî ya pêşiyên me zêdetir aşna kir û serçavîyekî girîng û bawerpêkirî xistine ber dest ku bo lêkolîna zimanzanî û edebî û mêjûyî û komeleyetî û siyasî û htd... bûhayekî wî yê taybetî heye. *Bangî Heq* yekem rojname ye ku ji aliyê hêzekî siyasî yê çekdarê kurd ve tête belavkirin. Ji ber vê, kêmfîya jimar û rûpelên wî, bo zêdetir şarezabûn û têgeyîştina rastî ya derbarê bizotneweya (tevgera) Şêx Mehmûd û armancên wî, belgenameyekî girîng e. Rojname û govarên me yên pêşiyê, gelek aliyên veşartî bo me aşkira dikin û zanyariyên binirx dikine berdestê me li bareyê komelga kurd û Kurdistan û bizotneweyê rizgarîxwazê neteweyê kurd da. Çinku serçavîya destê yekem in, bi taybetî derbarê ew serdeman ku têde hatiye belavkirin, min jî bi nîyaza derxistina aliyekî dî yê bizotneweya rizgarîxwazî ya neteweyê kurd û sirûşt û armancên wan yên di serdema bîstan da, li serçavîyên xo da ji bona sedemîn salroja rojnamegerîya kurdî, bifirset zanî ev bas pêşkeşê xwendewarên kurd bikim.



Bangî Heq, hej: 3

Jimara yekem a *Bangî Heq* roja pêncşeme ya 11yê Şabana 1341/28-ê Adara 1339(1923) bi du rûpel (21x33 cm) derçûye, li beşê serî yê rûpela yekem da bi pîtên gewre hatiye nûsîn: *Bangî Heq*, li tenişt rast û çepê navê rojnameyê hatiye nûsîn "Tarîxê tesîsî 28ê Mart 1339" li jêrê wî "Naşîkî bi top û bomba serefiraz e Bangî Heq", "siyasî, edebî, ictimayî, xezeteyekî resmî ye û li qerargaha umûmî ya Orduya Kurdistanê tête çapkirin",

"xaye û amaca wî bidestxistina huqûqê kurdan e", (sal 1, jimar 1, pêncşema 28ê Mart, 1339 11 Şeahbana 1341). Hemû jimarên wî pêkhatiye ji yek gotar, ew jî pêkhatiye ji ronîkirin û hewall û rageyandin. Her rûpelêk wî ji du stunan pêkhatiye. Bo wê baştir ew e, xwendevanên berêz ji naveroka ev du jimaran agadar bin, li xwarê em naveroka ev du hejmaran bi rênûsa nû belav dikine. Binîyaza berawirdkirinê (rûbirûkirinê) jî wêneyê herdu jimaran dixine berçav.

Naveroka jimara-1 û rûpel 1:

"Bismîllahîrrehmanîrrehîm"

1- Li beyannameyê pêşî ku bi tarîxa 8ê Adar 1339 hatibû nûsîn, bi dûr û dirêj me beyan kiribû ku mexsed û xaya me seadet û selameta Îslam û qewmê necîb ê kurd e. Em bi du rabite birayê yek in, ewelen Îslam in, duyem hemû kurd in, ev du rabiteyan me weha yekdil û yekemal kirîye ku hiç kesek bi hiç sedemek nikara me cihê bikete, em ji ezim û mecahedatî millî yê xo feraxet nakin.

2- Wextê ku teyareyên îngiliz bajarê Silêmanî bi bomba bombarduman kir û mal û mindal û aileyê bê guneh û bê deshelatê vê milleta mehsum agirbaran kir, mahiyet û manaya mewaîd û muawenetî îngiliz bi temamî mealum bû. Ev zulm û welîşet di vê esra medenîyet da bo meanaya însanîyet û beşerîyet şaibeyekî fecî(tirsnak) û xwînrijane ye. Ev trajediya, mesulê wê hinek memurên îngiliz e ku tabihê hewa û

hewes û îctihada nerast û nebaş seqîmeyê wan bi xwe bûn, elbet zeman hesabê eve dibînê. Ev trajediya ku weha biser bajarê Silêmanî hatiye û ev tecawiz hêştta biser gundên ev milleta hejar digere, em bo neşir û îlana vê feraxet nakin. Hikumetê mutemeddiyene eva negirte semhî îhtîbar elbet rojê "xîret ullah" diête, xeleyan qehrî munteqîmî îlahî tecellayî settarî uyunî(çavan) besîret û îbret dibê. (wela tehsebenellahe xafilan emma yeamel- uzalimun/ hesab neke ku Xwedê ji emelê zaliman bêxeber e).

3- Belê! Beazê memuranê îngiliz bi xisusî li Kurdistanana cenubê siyasetekî zor seqîmyan girt. Meqsedê emelê wan ev e, ev kurdê mezlum, ev unsurê îslamê qehr bikin. Dîyar e kurd, ezim û îmana wan qayim e, di rêya Îslamîyet û bê seadetî da xwe ji hiç fedekarîyek nade alî, elmehdulla bêqewet û bêqudret nîn e, ezim û îmana kurd, bi ewn û îneyetê barî, bedxuhan û munafiqîn meyûs û sernigun dike(wela tehzen innellahe meana/ xemgîn nebe bêguman Xwedê bi me ra ye).

4- Evro roja xîret e, roja miruwet e, orduya Kurdistanê, bi qumandan û heyetê zabitan û efradê xwe ve îltihaqê min kir. Teref teref mucahîdên bajar û quwayê millîye yê kurd li îhzaratêkî mutewalî da xerîk û meşful in. Ême heta ruhê me li bedena me mabê, bo rizgarî û bilindkirina îslamê û mîlletê kurd bi ezim û îmanekî temam serfê îctîhad û meqderat dikin. Piştî me sipart ruhanîyetê hezretî kaînat qayim e(Hesbunellahu we nîmel wekîl, nîmel mewla we nîmel mesîr/ Me xwe

si part Xwedê û ew wekîl û mewlayê me ye, alîkarî bi wî dibe).

5- Ehlê bajarê Silêmanî û tabihên wê û hemû qewmê kurd emîn û tetmîn bin ku em li ser seadet û xêrê wan in. Bi qiseyên beazê munafiqîn û bedxwahan, Îslam û kurd exfal nebin. Hiç wextêk bo mîlletê xwe zerera me nabê. Eger beazê bedxwahan û xudpendan bi zimanê me ve malumat firoşî û qiseyên pirûpûç kir, baweriya xwe pê mekin. Ev newaane ji xwe dûr bixine. Evanê bi vê tehrê bi van fesadiyan teaqîbê menfeatê xwe yê şexsî dikin, mustewcîbê nefret û cezana, li Orduya Kurdistanê da ciyê ew newaane nî ye.

6- Weku min hîss kirîye ehalî ji teşkîlata çeteyê me kevtine şubheyê. Mucîbî şubhe û terredud hiç nî ye. Ew çetana bo muxalîf in mutemerrîdînî hiquqê kurd teşkîl kirawin, dikevne fealiyet, ev çetana qîsmen eyan û qîsmen mechul û penha ne, xaye û emelê ev çetan eynî xaye û emelê Orduyê Kurdistan e, meatufî seadet û îstîxlasê qewmê kurd e.

7- Înşaala qerîben fewz û nesretî Îslam û kurd xwe diniwênê, tewfîqat ji xwudawendî alîyane ve ye, xwe li ser heq û xêra Îslam û kurd layê me nada û me muwefeq bike amîn!..."

**"Baş Qumandan û Melîkê
Kurdistan"
Mehmud**

Bi vê cûre jimara yekem ya rojname kotayî diêt. Jimara duyemîn weku me di serî da bas kir li ber dest nî ye. Edmons di vê gotara xwe da dibêje ku destnûsekê kevtîye destê wî

belam çap nekirîye, çunke birêvebirê çapxaneyê dawa înzaya nûserê gotaran û rezamendiya Şêx Mehmud kirîye li ser çapkirinê. Her weha dibêje, ku naveroka wê diçe ser naveroka jimara yekem.

Jimar sêyem ya *Bangî Heq* roja pêncşeme, 26ê Şabana 1341/12yê Nîsana 1339(1923) derçûye. Beşê serî yê rûpelê yekem, her wekî yê jimara yekem weha ye, ev der bi vê cûreyê dest pê diket:

"Tebrîkê Remezana Mibarek"

"Bi şerefa hatina (ew meha remezanê ku quran tê de nazil bûye), *Bangî Heq* hemû alema Îslam tebrîk dike. Xwa mîlletî kurd weku eqwamî saîre li cehl û esaret serefîraz û bi kemalê sirur û muwefeqîyet naîlê amalê mîllîye yê xwe û hiquqê sîyasî û medenîyê xwe bike. Amîn bi hurmetî sîd elmîrslîn."

**"Bo Qumandanê Mifrezeya
Heştem ê Piyade"**

"1- Teref teref muraceat bi me tete kirinê ku heyetekî mudafeayê mîllîye teşkîl bikin, li ser arezû muraceatê mutewalîyeyê mîlletê kurd, ev heyet zaten ji xwe ve teesîs kirîye.

2- Heta nika li teref sahibekî xîret û muruwet 7000 û ji teref zatekî dî ve 3000 rupe û ji teref zatekî sisê û çar her yekê barê şekir bi navê Ordû û mucahîdan û quwayê mîllîye yê Kurdistan teberûa kirîye. Ev zewat neşir û îhlanê navê xwe muwafiq nebînî, ji teref erbabê xwe ve

mealume, âmêlê Salih bê mukafat namînê. Jixwe ev mîllet dê Îslam û kurd bigeynê bi heq û îstîqlala xwe.

3- Bo meclîsa wekaleta mudafeaya millî tealîmatêk gîraye qelem, sûretê bi pêçraweyê rewane kira. Ev esasen bo îsrahê û sadetê Îslam û kurd ter-cîhê hemû muşkilatek me kirîye. Li ser me wacîbe hemû arezûyekî mîlletê Îslam û kurd bicî bihênin. Li ber vê hûn jî bi mewcibê vê tealîmatê bikine fealîyet (wemen nesru îlla mîn îndîlah/ alîkarî tenê jî Xwedê têt).

**Baş Qumandan û Melîkê
Kurdistan
Mehmud**

La 2:

**"Tealîmata bo Heyetê
Mudafeaya Millîye"**

"1- (Teawenû elêl birrî wetteqwa)-
sedeqellahul ezîm.

2- Heyeta mudafeaya millîye meçul e, zewatên vê heyetê yekdu jî nas nakin, hemû mîlletê kurd azayê vê heyetê ye.

3- Ev heyet meclîsekê wê ye wekaletî heye. Reîsê vê meclîsê qidemlî Yuzbaşî Seîd Ebdulrezaq Efendî (qumandanê mîfrezeya heştêm) ye, azayên wî Mistefa Efendî Hacî Heme Seîd qomîser û wekilê zabit Îbrahîm Efendî ye, katibê vê heyetê Mihemed Begê Hesên Beg ku katibê xestexaneyê Silêmanî ye.

4- Eshabê teberruya nav û şuhretê wan daxilê defterê teberruaat nayê kirin, li defterê teberruaat jimara muteselsîl wezh dikirê, teberruaat li

jêr ev jimareyê têtê qeyd û tesbît kirin. Ewê hez bike ligel ev jimareyê da nav û şuhretê xwe qeyd dike.

5- Muqabilê teberruaat mutleqen jî teraf Meclîsa Wekaleta Millî meqbuzek dikirê. Di vê meqbuzê da nav û şuhretê wî têtê nûsîn û dibit numreyê muteselsîlê wî. Ev meqbuz li ber dest xwedîyê xeyrat û teberruaatê dimînê, binçoçanê vê meqbuza ku li Meclîsê Wekalet dimînête nav û şuhretê wî nabe, numreyên muteselsîlê li ser dibe.

6- Ev suretê ku meamele pê têtê kirin, xwedî teberruaat dereceyê hemîyet û muruwetîya wan li jêr numreyê muteselsîlê xwe da alîycab têtê neşir û îlan kirin ku di vê îlanê da navê xwedîyê xeyrat mealum nabe, lakin li nik xwe kifayet mealum dibe.

7- Bo Orduya Kurdistan û muc-ahîdan û quwayê millîye yê Îslam û mîlletê kurd hemû tiştekerk û teber-rua têtê girtin, weku pare, hesp, hêstir, eslehe, ceberxane, camane, kilaw, kiras, derpê, qumaşê cil, çaket, pantol, dulaq, gorewe, kewş, suxme, bataniye, kaym, mijqalî, çît, destesirr, heta derzî, deju, şekir, çay, kawrr, berx, ron, bir-înc, savar û nîsk, nok, ard, ceh, paç, bêll, xakenaz ... alx.

8- Teberruaat jî teref Meclîsa Wekalet ve têtê wergirtin û dixine enbarê, jî pênc rojê defayek Meclîsa Wekalet defterekî teberruat tenzîm û teqdîmê meqamê baş qumandanê Orduya Kurdistan dike.

9- Ji terefê Meclîsa Wekalet ve defterekî muntezem yê teberruat qey-dêkî enbar bê xeta û sehwa têtê tertîb û tenzîm kirinê, ev li jêr mesulîyetîya

reîs û katib e, azayan ji azayê feall meadude.

10- Evro roja xîret e, roja murwet e, çakî(başî) û xirabiya evro wenda nabe, li dinya û axîret hesabê wî tête dîtîn, (Wemen yeamel mîsqale zeretîn xeyren yere. Wemen yeamel mîsqalê zeretîn şerren yere/ Kî misqalê zerre xêr bike dê bibîne. Kî misqalê zere şerr bike dê bibîne) -sedeq ellah-ul azîm-.

Baş Qumandan û Melîkê Kurdistan Mehmûd

Jimara sêyem jî bi vê cûre kotayî dihêt. Serinc û têbinî li ser naveroka her du jimaran û gotarekî Edmons hel digirin bo derfetekî dî.

Ew hende li derbarê ew du jimarên Bangî Heq e, bifeyde dizanin navê ew rojnameyan jî bihênin ku berfîya Bangî Heq li Silêmanî derdiçûne, ligel henek serinc û têbinî li derbarê gotara Edmons -ew e ku li xwarê ve me navê wê hênaye, nasîna ew rojnameyan û xwendina wan pîrr girîng e bo zanîna di derbarê encama Yekem Cengê Cîhanî, ku li Kurdîstana xwarû hatibû meydanê, bi taybetî bo têgeyîştina sîyaseta îngiliz li derbarê meseleya kurd û zanîna ew bîr û baweriyên wê serdemê ku di nav komelên xelkê Kurdistan da belav bûn:

Piştî têkçûna îdareya yekem a Şêx Mehmûd, ku dawîya nemana dewleta Osmanî li kotayîya sala 1918 li Silêmanî hatibû damezirandin, bi dil girtina Şêx Mehmûd li Derbendê Baziyan(19/6/1919) û birêkirina wî ya bo Bexda û paşê bo Hindîstanê³, îngiliz hatine nav bajarê Silêmanî û

hemû celebên karûbarê wan girte dest xwe. Bi niyaza propaganda bo sîyaseta xwe û dijraberfîya nifuzê turk li nav kurdan, rojnameyekî bi navê *Pêşkewtin* belav kirin. Yekem jimara vê rojnameyê li 20/9/1920 û jimara dawî (118) li 27/7/1922 da derçûye, her jimarek pêkhatî bûye ji çar rûpelan (21x33 cm), hefteyê carek yan du car derçûye, ev jî wek "têgeyîştina rastî" (Bexda, 1918-1919). Mécerson serpereştîya wê kirîye, ku ew dem hakimê sîyasî yê îngiliz bûye li Silêmanî. Naveroka vê rojnameyê ji du beşan pêkhatî ye; rageyandin û propaganda sîyaseta îngiliz. Gotarên zanistî û edebî û hunerî û dengûbas jî belav kirîye. Çend jimarên kêr yên vê rojnameyê li kitêbxaneyê Silêmanî têne parastin. Ligel biryara vegeyîna Şêx Mehmûd bo Silêmanî, derçûna wî rawestayê.

Piştî rawestandina *Pêşkewtin*, *Bangî Kurdistan* derçûye wek organê **Cemiyeta Kurdistan** di 21/7/1922 da bi serokatiya Hacî Mistefa Paşayê Yamulkî (sala 1932 koçê dawîyê kirîye) hatiye damezirandin. Yekem jimara *Bangî Kurdistan* li 2/8/1922 derçûye, her jimarekî wê ji 4 ta 6 rûpelan pêk hatiye(21x33 cm), li hefteyê carekî derçûye, di çapxaneyê hikumet da li Silêmanî hatiye çapkirin. Jimara sêzdemîn di 3/11/1922 da derçûye, piştî wê derçûna wê hatiye rawestandî heta 8/6/1923. Li cîyê wê *Rojî Kurdistan* derçûye bi serpereştîya M. Nuri (Şêx Nuri Şêx Salih 1898-1957) wek organê îdareyê duyemîn yê Şêx Mehmûd. Yekem jimara vê rojnameyê di 15/11/1922 da derçûye, jimar û

gewreyîya rûpelên wî her wekî rojnameyê pêşî bûye, di heman çapxane jî da hatiye çapkirin ku pişt ra bûye çapxaneya Şarewanî(beleidiye). Ligel vala- kirina Silêmanî ji aliyê Şêx Mehmûd ve derçûna wî hatiye rawestandî. Jimara panzdemîn(15.) di 3/3/1922 da derçûye. Êdî Şêx Mehmûd bajar bicî hiştîye û *Bangî Heq* li derve derxistiye, wekî ji serî da me bas kir. Bangî Kurdistan carekî di her li Silêmanî yek jimar jê derçûye(j-14.) Di rûpela yekem yê vê jimarê da weha pê nîşan diket, ku derneçûna li maweyê heşt mangên rabirdu da ji ber hinek hoyên taybetî bûye: "Ji ber hinek sebeb û mewanih li paş nûsxeyê (13.)weha hatiye nûsîn, me munasîb dît ku teatîlê neşriyata wê bikin. Nûha musteayenen bîlala xezeteya *Bangî Kurdistan* kevte saheya întîşar". Belam bêguman derneçûna li vê maweyê da ji ber wê bû ku gorîn di rojnameya Rojî Kurdistan da hatiye kirin, wekî di rûpelê yekê yê jimara yekem ya Rojî Kurdistan da hatiye ronîkirin.

Carekî di jî 3 jimar Bangî Kurdistan jê derçûye, ev car li Bexda (1-14,28/1,2-14, 2/15, 3-14, 10/4(1926). Ev hemû jimar bi çar rûpelan derçûne. Êdî bitemamî derçûna wî hatiye rawestandî.

Her di vê serdemê da rojnameyekî di li Silêmanî derçûye ku navê wî *Umîdî Îstiqlal* bûye. Rêbaza vê rojnameyê wek yê Rojî Kurdistan bûye. Di van deman da derçûye ku Îngilîzan bo maweyek Silêmanî bicî hiştibû. Jimara yekem di 20/9/1923 da derçûye, dawîyê jimara (j-25) di 25/5/1924 da derçûye. Ji Nûseran:

Ehmed Sebrî, Refîq Hîlmî, Hisên Nazim, ev jî bi gewreyîya Rojî Kurdistan da çar rûpel derçûye.

Piştî wê, Silêmanî jî wek navçeyên di yên wîlayeta Musil xiraye ser dewleta Iraq, rojnameyê *Styanewe* wek rojnameyêkî hiqûqî derçû (j-1, 18/8/1923, 4 r.); vê car *Styan* û *Jîn* ji aliyê Pîremêrd(1868-1950) ve, ku paş koça wî ya dawî jî, derçûn berdewam bûye. Temamê jimarên Rojî Kurdistan û Bangî Kurdistan ji aliyê mamosta Xeznedar ve ji nû ve bi çapa ofsêt ligel pêşekî û serinc û têbinîyên pêwîst da hatiye belavkirin⁴, eve jî erkê sermilê xwendewarên kurd asantir dike bo zanîna derbarê ew serdema Kurdistan û ew bîrûrayên li Kurdistana xwarû hebûn.

Hemû xwendewarên kurd yên ku li derbarê Kurdistana xwarû zanîna wan ya rasteqînî kê m bit, ji kotayîya Yekem Cengê Cîhanî ta navarasta bîstan, ku ev dem xwedî cihekî girîng e li mêjûyê gelê kurd da, divêt çavlêgerînek li vê rojnameyên wê demê bike, çinku rûdanên wê demê hatine tomarkirin û gelek zanyarî tê de heye, ku ronahî di- xine ser derbarê wê dema Kurdistan û mêjûyê bizotneweya rizgarîxwaz a gelê kurd di wê pileyê da û ew boçûn û rêbazên di wê serdemê da li Kurdistana xwarû xerabî dikiran pêkhatibûn ji:

Yekem/ rêbaza ser bi turk, ku navê wan bi "caxwar" derketibû⁵. Evana hestê ayînî yê kurdan bikar dihêna, wek gelekî musliman dijî Îngilîzê "kafir û xeyrêdîn". *Duwem/* rêbaza ser bi Îngilîz, ku ji layê wan ve weha bû, bo geyîştina bi armanc xwe

dostayetiya kurd û îngiliz pêwîst e ⁶. *Sêyem/ Rêbaza ronakbîran*, ku pirraniya wan efser û xwendewar bûn, bitaybetî ewên pêş ceng li Estenbul xwendibûn û ligel "îngilaba Osmanî" (1908) da jîyabûn. Evana, ku bi "munewer" hatibûn nasîn, bîrûraya wan wek yê turk û îngiliz nebû, bi şêwe, ji hukmê Şêx Mehmûd jî razî nebûn, armanca wan Kurdistanek serbixwe û pêşkevî bû. Cemal Îrfan, ku li seretayê Kanûna Yekem a 1922 da hate kuştin, nûnerê ev rêbazê bû. Şêx Mehmûd di navbera ev sê rêbazan da mabû, dixwest li jêr serkirdayetiya xwe tiştek bo kurd pêk bihênêt, belam nedizani çawan. Ji layekî ve hestê hevrabûna ligel turk pêre hebû û ji layekî dî ve bîra wî ew bû, geyîştina amanca dostayetiya îngiliz pêwîst e, ji ber wê carna helwêstê zor bi bedî dikirêt.

Heta wê demê mitumirrê îngiliz ligel turkan berdewam bû li ser wîlayeta Musil, belênî bo serbixweyiya kurd dida û Turkiyayê bi meseleya kurd ditirsand. Demek li pey Peymana Lozan ligel rêkevt(1923), meseleya kurd ne ku her di sîyaseta îngiliz da nema, belku ewperî zebr û zengî bikarhêna bo bizor dagîrkirina Kurdistanana xwarû, kirina beşek ji dewleta taze dirust bûyî ya Iraq û yarmetîdana bo serpankirina hemû bizotneweya azadîxwazê gelê kurd û ligel dewletên derûdor peyman bestin da ku hemû jî çend bendekî bo serkut kirina kurd terxan kira bû. Wek di peymanana Sedabad(1937) û peymanana Bexda (1955) da bedî dikirêt.

Di vê rojnameyê da navê gelek

nûserên wê serdemê dikevin berçav, ku gotar û hênraweyê ciwan û rêkûpêk nûsîne, bedaxewe(mixabin) di mêjûyê kurd da wek pêwîst heqê wan nehatiye dayîn. Pirraniya xwendewaran her navê wan jî nebîstine, bo nimune: Ehmed Sebrî, Ehmed Fewzî, Hisên Nazim, Şêx Nurî Şêx Baba Elî, Mistefa Şewqî û gelêkî din.

Di destpêkê da rojnameyan gelek girîngî daye dengûbasê nav xwe û cihanî û bi hewallên beşên dî yên Kurdistanê. Bitaybetî Kurdistanana Îran ku wê serdemê bizotneweyekî bihêz bi serokayetiya Simaîl Xanê Simko tê da hebû, bo nimune binêre ev çend beytan, ku li dawîya hewallek da li derbarê Simaîl Xan ve hatiye belav kirin:

*"Bikêşe xengerêt Simko bide neare heta Turan
Selameke ji şahiran ku yar e bo hemû kurdan"
Nîhayet de bi Qacaran ku ciyê Qacar li Turan e Welê
ciyê Pehlevî û Fursan tamamî mulkê Îran e"
"Deşa Dêbokîriyan hellsin ligel Mengur bi azane
Bibestî rîyê Fîrarî şa, esîrî kin bi merdane"⁷*

Edmons di gotarekî da dibêje: "ligel Şêx Mehmûd taqîkirdina wan a duwemîn jî serkevtî nebû ...⁸ Û pê nîşan didet ku Şêx Mehmûd ji xwe ve Silêmanî bicî hiştîye, ne ku bo parastina bajar ji bombardumana hêza hewayî ya îngiliz. Bi hîç cûreyêkî jî basê bombardumana Silêmanî û dewrûberê wî naket, ku çend car ji aliyê hêzên hewayî yê îngiliz ve hatiye bombardumankirin û zîyanê gewre li daniştwanên wî kevtîye. Di jimara yekem ya Bangî Heq da basê ev bombardumanê tête kirin, belam dana navê hinek ji karbidestan bi gunehî, ne

ku sîyaseta îngiliz beramber bi kurd "mesulî îhtimalê vê karesatê ye, hinek memurên Îngiliz e ku tabihî hewa û hewes û suey îctîhadatê seqîmeyê xwe bûn, ev elbet zeman hesabê wê dibîne...". Ev jî wek Rojî Kurdistan hêvî bi îngiliz nebirîye. Ev wahîme heta êsta jî berokê bizotneweyê kurdî bernedaye. Hêzên çekdarên kurd li hemû dewr û zemanek da, bi hemû serkirdayetîya xwe ve, amade bûye bo gotûbêj û rêkewt ligel dagîrkerên Kurdistan da bike, hêvîya wan jî weha bûye ku daxwazên wan li serdestê ev dagîrkeran da dête dîyin! Şêx Mehmûd li vê derbarê da gileyîyê lê nagirêt, Kurdistan wê demê pirr cûda bû ji yê nûha, kurdayetî jî xwediyê ew hemû ceribandinan nebûye.

Derçûna *Bangî Heq* gorînekî çawa bû li bizotneweyê kurdayetî da? Bo yekem car bizotneweyekî çekdar yê kurd li ser rûpelên rojnameyek hewall û rageyandinan belav dike. Ji vê zêdetir jî sernic radikêşe ew e ku Şêx Mehmûd li tenişt "Orduya Kurdistan" û duyemîn jî "hêzên bergirê millî" yê evro digirêteve. "Teşkilata Çete" jî bi pê ew erkanê li jimara yekem a *Bangî Heq* da bo wan dîyarî kirîye, -ewe digirêteve ku evro jêra dibêjin "pêşmergeyên nav bajar" ew çetane bo muxalifîn û mutemerrîdîna hiquqê kurd hatibûn teşkil kirin... Qismen eyan û qismen penan, xaye û emelê ev çetana eynî xaye û emelê Orduya Kurdistan e..."- J/1, r. 3. "Çete" gotinekî turkî ye, ji desteyek rêgir û cerde ra dibêjin, belam bê guman li vira da bi vê manayê bikar nehatîye. Edmons li dawîya gotara xo da dibêje "navê rojnameyê bi wî mebestê hatiye

danîn ku manayekî ayîni bibexşêt, heq li tesewûf da xwe digirêteve."

Ji bilî van rojnameyan, berhemên şair û nûserên kurd li vê serdemê da, bi taybetî ew ên bi çavekî rexnegirane seyrê rûdanan kirine, wek Ehmed Hemdî Begê Sahêbqiran(1878-1936), Şêx Mehmûdê Xalis(1874-1025), Şukrî Fezlî (1870-1926), Cemîl Saîb (1887-1951) û htd. ... Serçavîyekî binirx in bo zanîn û helsengandina Kurdistanê li wan rojan.

PÊRRIST: *Bangî Heq*

J.	Mêjûyê derçûn	Babet	Nûser
1	28 Mart 1339	Beynamane: Hemû mûmîn biran e	Bap qumandan û Melîkê Kurdistan Mehmud
3	12 Nisan 1339	Îlaweya cerideya <i>Bangî Heq</i> 'jim. 1': tealfinat e bo heyeta mudafeaya millî.	Bap qumandan û Melîkê Kurdistan Mehmud
		Bo qumandane mîfzezeya heftem ê piyade.	Bap qumandan û Melîkê Kurdistan Mehmud
		Tealfinat e bo heyeta mudafeaya millî.	Bap qumandan û Melîkê Kurdistan Mehmud

Têbînî û Serçavî:

(1) Binêre:

C.J.EDMONDS: A Kurdish Newspaper: "Rozh-i Kurdistan" -journal of the CentralAsian Society, Vol. XII, part I, p. 89/90 London, 1925.

(2) Ev salên dawî yê vê govar û Rojnameyê kurdîyane çapkirawetewe:

- Dr. Kemal Fuad, Kurdistan yekemîn rojnameyê kurd(1898-1901), Bexda, 1974.

- Mihemed Emîn Bozarlan, Kurd Teawîn û Teraqî Xezetesi(1908-1909), Stokholm, 1998.

- Cemal Xeznedar, Rojî Kurd 1913, Bexda, 1971.

- Elî Nacî Kake Heme Emîn Etar-Sîrwan Bekir Samî, Pêşkewtin Yekemîn Rojnameyê Silêmanî(1920-1922), Hewlêr, 1998.

- M. Emîn Bozarsaln, Jîn, kovara kurdî-tirkî(1918-1919), Upsala, b. 1, 1984 û b. 2, 1985, b. 3, 1986, b. 4, 1987, b. 5, 1988.

- Dr. Kemal Fuad, Kurdistan yekemîn rojnameyê kurdî "Dereyê Sêyem" (1917-1918), Silêmanî, 1998.

- Dr. Ferhad Pîrbal, Kovarî Kurdistan(1919-1920) Estemûl, Hewlêr, 1998.

- Cemal Xeznedar, Rojî Kurdistan(1922-1923), Bexda, 1973.

- Cemal Xeznedar, Bangî Kurdistan, Bexda, 1974.

- Mumtaz Heyderî, Peyze (1926), Hewlêr, 1985.

- Dr. Cemal Nebez, Yekîtîy Têkoşîn(1944-1945), Stokholm, 1988.

- Cemal Nebez, Govarî Niştîman, Temûzî 1943-Mayis 1944, Stokholm, 1985.

- Refîq Salih û Sidîq Salih, Nizar(1948-1949), Silêmanî, NîsaNî 2000.

- Dr. Abdelfetah Elî Botanî, Elhiquqe rastî(1959), Dihok, 1998.

- Ebdulla Zengene, Jiyaneyew Silêmanî, Hewlêr, 2001.

Eme ceqe le serlenwê çapkiraneyew "Hawar, Jiyana Nu, Stêr, Heqîya Welat, Ronahî, Çiya".

(3) Le sereta da Şêx Mehmed hukim dira be îhdam, paşan hukmekey gora be de sal bendî û durxistinewey bo Hîndîstan. Durxistinewey şêx mehmed nebuwe hiyê aramîy le Kurdistan, leber em hoyewe bo tirsandinî turkekan, îngilizekan Şêx Mehmedyan berella kird û rêgayan da begerêtewe bo Silêmanî, Şêx Mehmed le 30/9/1922 da geyîştewe Silêmanî, basî geraneyew Şêx Mehmed bepiroweçûnî bedur û dirêjî le Bangî Kurdistan da nusrawe (J-9, 8/10/1922). Pêş ewe be çend hefteyêk îngilizekan silêmanyan çolkird û îdareyan da be Şêx Qadirî biray Şêx Mehmed, ke helbijêrdira be serokî Encumenî Millî(heman roj-

name J-6, 18/9/1922). Le 10/10/1922 da Şêx Mehmed yekem kabîney hikumetî xoy be serokayetî Şêx Qadirî biray damezirand(heman rojname J-10, 15/10/1922). Di wan deman da tenya çend efserekî Îngiliz mabûn, ewên din berabera Silêmanî vala kirin, Emca hêzên hewayî yê Îngiliz dest bi bombardumana Silêmanî û dewrûberê wî kir, di destpêka Martî 1923 da Şêx Mehmed bajar bicîhişt, wekî ku di serî da me bas kiribû.

(4) Bexda 1973, 1974.

(5) Mamosta Hawar Elî: "Carêk min ji Toftîq Wehbî pirsî ew cil û xwarek ji kûve hatîye, wî gotî kabirayek hebû(herçend kir navê wî nehate bîr) zor dem heraş bû, ser be turkekan bu, propagan-day bo dekirî, çaketekey hemîşe xwar bu, layekî da deket. Îtir her kesêk ser be turkekan biwaye benawî ew kabrayewe pêyan ewt cil xwar" - kuêrewerey û bîrewerey, la 95, Lendon 1974.

(6) Êsta jî zor kes, bigre zor partî û rêkxiraw, lew baweredan ke bo serkewtinî meseley kurd debêt zahêzêk piştîwanîy lê bikat.

(7) "Bangî Heq", J-9, la. 6,8/10/1922. Le jimareyêkî tîrî "Bangî Kurdistan" da lebarey Simkove em hewalle belawkirawete: "Simko û Ecem, bîna le exbarî Estemul xezetey Alrafdan nûsiyewe ke lêşkirî Simko daxil Tebrîz bûwe. Wezareti Tehran le xewfa telebî muawnet û îmdaadî le firqey yazdehemî Bolşewîk(Rusye) kir-duwec.

"Seba helse dexyat him biro bo çawî lay Simko

Bilê tawî bida espi heta Tebrîz û Qaşlan ko"

"Hemû kîrmanî Kîrmanşah be awatî be can û dil

Sine hazir hemu xelqî delên bo lêşkirî Simko"

(J-5, la. 5, 4/9/1922). J-10, la 4, 15/10/1922 hewallî dagîrkirdinî Şarî Urmêy) belawkirdotewe lelayen Simko we. Bem beyteş kotayî be hewalekey hênawe,

"desa kurdan be qurbantan hemu yek bin weku şêran

rehabin ta xuda bika le zulmî dayînî îran"

(8) heman wutarî pêşû.

Bo hemû şitk
muraceet be qerar-
gahî umûmî dikirit.

Bangî Heq

Îlanatê bediryek 3
ane desînirî.

Tarîxa tesîsê
28 Mart 1339

Naşkî be top û bomba serefraze
Bangê Heq

Siyasî edebî ictimai xezeteyekî resmîye
le qerergahî umûmî

Erduwê Kurdistan tebih dikrî
Xaye û emelî istihsalî huqûqê kurdane

Sal 1, Jimare 1, Pêncşeme, 28 Mart, 1339 11 Şaban 1341

Bismillahirehmanirehîm

[*Înnemel mumînîne ixwetun*]

1- Le beyanemey pêşûke be tarîx 8 mart 1339 numra bû, dûr û dirêj beyaneman kirdibû ke ême meqsed û xayeman seadet û selametî îslam û qewmê necîbî kurde. Ême dû rabite birayekin. Ewela islamin, saniya hemû kurdê em dû rabiteye êmey weha yekdil û yek emel kirdiwe ke hîç kes be hîç lûnî ême yek ciwî nakatewe, le ezm û muahedatê milliyey xoman feraxet nakeyn.

2- Weqtê ke teyarey îngilîz şarê Silêmanî be bomba bombardimanî kird û mal û mindal û eyalê bêguneh û bêdesthilatî em millete masûmey agir barîn kird, mahiyet û manay muwaîd û muawenetî îngilîz be tewawê malûm bû. Em zulm û wehşete lem esrê medeniyet da bo

manay însaniyet û beşeriyet şaibekî fecî xunrêjaneye. Em fecayieê mesûlî, ihtîmal bazî mamrînê îngilîz ke tabîê hewa û hewes û sûê ictîhadatê seqîmey xoyan bûn. Eme elbet zemanê hesabî deyîn. Em fecayie ke wa bi ser şarê Silêmanî hatiwe û em tecawize dekrî ême bo neşr û îlanî feraxet nakeyn. Hukûmatî mutemedine eme nekiriye semîê îtibar. Elbet rojî "xeyretullah" dîte xulyan, qehrê munteqîm îlahî tecellî settarî uyûn bisîret û îbret debî.

[wela tehsebennellahe xafilen emma ye'melûzzalimîn]

3- Belî bazî mamûranê îngilîz le xusûs Kurdistan cunûbî siyasîtkî zor seqîmiyan girt, meqsed û emelî emane, em kurde mezlûme em ûnsûrê îslame qehr û tedmîre, hal bo kurd, ezm û îmaniyan qaîme. Le rê îslamiyet û seadetê xoy le hîç

fedakarîyîk lanade, elhemdu lillah
bêewt û bêqudret nîn, ezm û îmanê
kurd, be ewn û înayetî barî xuwahan
û munafiqîn mayûs û sernikûn deka.

[wela tehzen innellahe meana]

4- Evro rojî xeyrete, rojî muru-
wete, ûrduwê Kurdistan be qumandan
û heyetî zabitan û efradiweê iltihaqî
minyan kird, teref teref mucahidîn şar
û quway milliyey ekrad, le îhtisarekî
ku mutewelîda xurîk û meşxûwan,
ême heta rûhîman le bedenima mabî
bo îstixlas û îtilalî islam û milletî kurd,
be ezm û emanîkî tewaw serfê ictihad
û muqedderet ekeyn, piştiman be
xowa û ruhaniyetî hezretî fexrê kainat
qaime [hesbunellahu we nîmel wekîl,
nîmel mewla we nîmennesîr]

5- Ehlê şarê Silêmanî û tewabî û
hemû qewmê kurd emîn û mutmeîn
bin ke ême li ser seadet û xeyrî ewanîn
be qisey bazî munafiqîn û bedxuwa-
han, îslâm û kurd ixfal nîn, hîç wextî
ême bo milletê xoman zereêman nabî.
Eger bazî bedxuwanan û xodpesendan
be zimanî êmewe malûmatfiroşî û
qisey pîrr û pûçîyan kird, bawerîyan
pê mekin. Em new'ane le xotan dûr
bixinewe. Emane ke bem teheriye
efsadatê tehqîmî menfîetê şexsiyey
xoyan dekeyn, mustûciyî nefret û
cezan le ûruwî Kurdistan da çî ye em
new'ane nîye.

6- Wekû hesm kirîwe: ehali
teşkîlat çitey ême kewtinewe şub-
hewe. Mûcibê şubhe û teredud hîç
şeye em çistane bo muxalîfîn û mute-
meridînê huqûqî kurd teşkîl kirawin.
Dekewne fealiyet. Em çitane qismen

eyan û qismen mechûl û penahin.
Xaye û emelî em çitane eynî xebebe û
emelî ûrdiwê Kurdistane, matûfê
seadet û istixlasê qewmê kûrdane.

7- Inşallah qerîben fewz û nusretê
îslâm û kurd xuyî denûwîti, tewfîqat
le xudawendê alimiyaneweye xuwa li
ser heq û xeyrî îslâm û kurd, le eman
nada û muwefiqîman bika amîn....

Başqumandan û Melikî Kûrdistan
Mehmûd

Îlaweyê Cerîdeê Bangê Heq
[jimare - 1]

Te'limate Bo Heyetê
Mudafeê Millîye

1- (Teawenû elel birri wetteqwa)
sedeqellahul ezîm

2- Heyetê mudafeê millîye
mechûle, zewatî em heyete yektirîş
nanasin, hemû milletî kurd azay em
heyeteye.

3- Em heyete meclisîkî wekaletî
heye. Em meclise reîsî Qidemlî
Yuzbaşî Seyid Ebdurrezaq Efendî
qumandanê mufrezeê heştêm.
Azakanî Mustefa Efendî Hacî Heme
Seîd Qomîser û Wekîlî Zabî Îbrahîm
Efendî ye. Katibê em heyete
Muhemmed Beg Hesên Begî katibî
Xestexany Silêmanîye.

4- Eshabê teberû naw û şihretîyan
daxilê defterê teberûat nakirî. Le
defterê teberuat jimarey muteselsil
wazîh dekirî, teberuat le jêr em jimare
da qeyd û tesbît dekrî, ewî arzû bika

ligel em jimare da naw û şihretî xoy qeyd deka.

5- Muqabilî teberuatê mutleqa le teref meclisê wekaletê mudafeey mîllîye meqbûzîk dedirî, lem meqbûze îsm û şihret denûsrî û nûmrey muteselsilî debî. Em meqbûze be dest eshabê xeyret û teberuanewe demînî, bin qoçanî em meqbûze ke le meclisê wekaletê emniyetewe naw û şihretî hisawî nabî, nûmroy muteselsil li ser debî.

6- Bem sûrete ke muamele kira, eshabê teberuatê derecey hemiyet û mirwetiyan jêr nûmroy muteselsilî xoyana îndel îcab neşr û îlan dekirî ke lem îlanewe eshabê xeyrat nawîyan malûm nabî, lakin le xoy keyfiyet malûm dibî.

7- Bo Orduwî Kurdistan û muc-ahidîn û quway mîllîyey îslam û mîletî kurd hemû şitîk terk û teberû dekrî wekû pare, esp, êstir, eslihe, cebxane, cisamane, kulaw, kiras, derpî, qumaşê cil, çaket, pantol, dolaq, gorewî, koş, sixme, betaniye, kilîm, misqalî, çit, desteser, heta derzî, dizo, şekir, çay, kawir, berx, rûn, birinc, sawir, nîsk, nok, ard, caw, paç, bîl, xakinaz..... ila axirî.

8- Teberuat le teref meclisê wekaletwe werdegîrî û dextrîne enbar. Be pênc roj defeyek meclisê wekalet defterîkî teberuat tenzîm û teqdîmê meqamê Baş qumandanê Orduwê Kûrdistan deka.

9- Le teref meclisê wekaletewe defterîkî muntezem teberuat û qey-

dîkî enbarî bêxeta û sehiw tertîb û tenzîm dekrî. Eme le jêr mesûlî reîsî wekalete azakan le azay feale mahdûd.

10- Emro rojî xyrete, rojî muruwete, çake û xerape emro kom nabî, le dinya û axiret hesabî debînî, [femen ye'mel misqale zerretin xyren yereh, we men ye'mel miaqale zerretin şerren yereh] sedeqellahul ezîm.

Baş Qumandan û Melikê Kûrdistan
Mehmûd

Bo hemû şitîk
muraceet be qerar-
gahî umûmî dikirit.

Bangê Heq

Îlanatê bedirêk 3
ane desînirit.

Tarîxa tesîsî
28 Mart 1339

Naşkî be top û bomba serefraze
Bangê Heq

Siyasî edebî ictimaî xezeteyekî resmîye
le qerergahî umûmî

Erduwê Kurdistan tebih dikrî
Xaye û emelî istihsalî huqûqê kurdane

Sal: 1, Jimare: 3, Pêncşeme, 12 Nîsan 1339, 26 Şaban 1341

Tebrikî Remezanê Mubarek

Be şerefê hulûlê "şehrun remezen-
allezî unzile fihîil qur-an" [Bangê
Heq] tebrîkî hemû alemê islam deka.
Xuwa milletê kurd wekû eqwamê
saire le cehal û esaret serefraz û be
kematê surûr û muwefeqiyet nailê
amalê mîlliyee xoy û huqûqî siyasiye û
medeniye bika. Amîn, bi hurmetî
seyidil murselîn.

Bo Qumandanê Mufrezeê Heştem Piyade

1- Teref teref mureceet be ême
dikrî ke heyetîkî mudefeê mîlliyee
teşkîl bikin. Li ser arzû û mureceat
muteweliyey mîlletê kurd em heyete
zaten le xoyewe tesîsî kirdewe.

2 - Heta êsta le teref sahibîkî xeyret
û muruwet 7000 û le teref zatîkî

tirewe 3000 ruype û le teref zatîkî salis
û rabih her yekî barî şukur be nawî
ordû û mucahidîn û quway mîlliyey
Kurdistan teberû kirawe, em zate neşir
û îlanî nawî xoyan muwafiq nebînî, le
teref erbabê xoyewe malûme, emalê
salihe bêmukafat namînî xowa em
millete îslam û kurde bikeynî be heq û
îstiqlalê xoy.

3 - Bo meclisî wekaletî mudafeê
mîlliyee te'lîmatîk gîraye qelem suretî
be piçrawebî rewane kira. Ême esasen
bo îstrahat û seadetê îslam û kurd ter-
cîh hemû muşkilatî ke man kirdiwe li
ser ême wacibe hemû arzûyîkî milletî
îslam û kurd bicî bihînin le ber eme
êwenîş be mûcibê em te'lîmane bi-
kewne fealiyet. [we mennesrul emen
indellah]

Baş Qumandan û Melikî Kûrdistan
Mehmûd

**Te'limate Bo Heyetî
Mudafeê Millîye**

1- (Teawenû elel birri wetteqwa) sedeqellahul ezîm

2- Heyetê mudafeê millîye mechûle, zewatî em heyete yektirîş nanasin, hemû mîlletî kurd azay em heyeteye.

3- Em heyete meclisîkî wekaletî heye. Em meclise reîsî Qidemlî Yuzbaşî Seyid Ebdurrezaq Efendî qumandanê mufrezeê heştem. Azakanî Mustefa Efendî Hacî Heme Seîd Qomîser û Wekîlî Zabîb Îbrahîm Efendî ye. Katîbê em heyete Muhemmed Beg Hesên Begî katîbî Xestexany Silêmanîye.

4- Eshabê teberû naw û şihretîyan daxilê defterê teberûat nakirî. Le defterê teberuat jimarey muteselsil wazîh dekirî, teberuat le jêr em jimare da qeyd û tesbît dekrî, ewî arzû bika ligel em jimare da naw û şihretî xoy qeyd deka.

5- Muqabilî teberuatê mutleqa le teref meclisê wekaletê mudafeey mîllîye meqbûzîk dedirî, lem meqbûze îsm û şihret denûsrî û nûmrey muteselsilî debî. Em meqbûze be dest eshabê xeyret û teberuanewe demînî, bin çoçanî em meqbûze ke le meclisê wekaletê emniyetewe naw û şihretî hisawî nabî, nûmroy muteselsil li ser debî.

6- Bem sûrete ke muamele kira, eshabê teberûatê derecey hemiyet û mirwetîyan jêr nûmroy muteselsilî xoyana îndel îcab neşr û îlan dekirî ke

lem îlanewe eshabê xeyrat nawîyan malûm nabî, lakin le xoy keyfîyet malûm dibî.

7- Bo Orduwî Kurdistan û muc-ahidîn û quway mîllîyey îslam û mîletî kurd hemû şitîk terk û teberû dekrî wekû pare, esp, êstir, eslihe, cebxane, cisamane, kulaw, kiras, derpî, qumaşê cil, çaket, pantol, dolaq, gorewî, koş, sixme, betaniye, kilîm, misqalî, çît, desteser, heta derzî, dizo, şekir, çay, kawir, berx, rûn, birinc, sawir, nîsk, nok, ard, caw, paç, bîl, xakinaz..... îla axirî.

8- Teberuat le teref meclisê wekaletwe werdegîrî û dexrîne enbar. Be pênc roj defeyek meclisê wekalet defterîkî teberuat tenzîm û teqdimê meqamê Baş qumandanê Orduwê Kûrdistan deka.

9- Le teref meclisê wekaletewe defterîkî muntezem teberuat û qeydîkî enbarî bêxeta û shiw tertîb û tenzîm dekrî. Em le jêr mesûlî reîsî wekalete azakan le azay feale mahdûd.

10- Emro rojî xyrete, rojî muru-wete, çake û xerape emro kom nabî, le dinya û axiret hesabî debînî, [femen ye'mel misqale zerretin xyren yereh, we men ye'mel miaqale zerretin şer-ren yereh] sedeqellahul ezîm.

Baş Qumandan û Melikê Kûrdistan
Mehmûd

Umîdî Îstîqlal

Weşana Agadarî ya Sêyem Hikumeta Kurdistana Cenûb


Sidiq Salih

Wergerandina ji soranî: S. Veroj

1- Pêşîne û Mêjûyê
Sêyem Hikumeta
Kurdistana Cenûb:

1/1- Duwem Dewrê
Hukmê Rasterast yê
Îngiliz li Silêmanî:

Piştî peywendîya di navbera Şêx Mehmûd û Îngilizan da bi temamî çirya, roja 3/3/1923 Silêmanî bi firokeyên Îngilizan hate bombardumankirin, Şêx bi neçarî beyanîya roja di(3/4) zû bi hêzên xwe ve bajar terk kir û çû navçeya Sûrdaş.¹ Belam Şêx Heme Xerîb ligel Riza Beg û Evremaxanê Ehmed Paşa da, bi piştgirîya Kerîm Begê Fetah Begê Hemewend, li wê maye û maweyekî di bi navê Şêx hikm li Silêmanî kir.²



Ew wefdê Şêx ku (3/3) bi serokatîya Şêx Qadirê birayê wî û endametiya Mistefa Paşayê Yamulkî û Ehmed Begê Fetah Beg û Kerîmê Eleke û Heme Axayê Evremansa çûbûye Kerkûk bo çareserîya kêşeyek ligel îngiliz da, (3/21) geyîşte Bexda û Şêx Ebdulkerîmê Qadirkeremî jî li pey wan çûye. Hênri Dobs yan ewên dî, her çî qas lêxebitîn li ser şandina rawêjkarekî îngiliz bo Silêmanî, hîç tiştek li derbarê paşerojê pêşnima nekirine. Roja 3/23-ê jî bi "Melîk Feysel" ra çavpêkevîtinê kirin.³

Herdu stûnê "Koy Kûl" û "Frontîer Kûl" li 3/8 bidawî hat, yekem ji Mûsil ve bo Hewlêr û paşê Kerkûk, duyem ji Hewlêr ve bo Rewandiz, saz kirin. "Koyê" roja 5/4/1923-ê hate girtin. Hêzên livîn(colîn) ên Rewandiz şeva 20/4/19 "Spilk" ê bicî hişt û Rewandiz jî 22/4 bi bê bergirî dagîr kirîye û Seyîd Tehayê Nehrî kiriye qaymeqam⁴.

Baregayê Şêx sereta li Qemçûxê hate danîn, ji vê derê birine şikefta Casene⁵. Ew çanteyê posteyê navbera Rewandiz û navçeya Cizîra Kurdistanê bakur ku kevte destê îngilîzan, perdeyê li ser namegorîna Şêx ligel Ozdemîr da rakir, derxist Şêx bitema ye, bihevkarîya Hêzên Rewandiz û Seyd Ehmedê Xaneqa û Nazim Begê Neftçizade yê turkxwayî mebhûsê pêşî yê Kerkûk li Encumenê Mebûsanê Osmanî da, hêriş birîte ser Kîfrî û Kerkûk û Koyê heta Bîangirê. Êdî Seyîd Ehmed 6/3/1923 destgîr bû û hate dûrxistin bo Bexdayê. Nazim Beg jî ji Kerkûk hellat⁶ û bi mezbete ve hate Casene. Reşîd Şewqî efserekî şoreşê bi navê Şêx şandiye cem Şêx Ebdulayê Esker û bo wî nûsiye ku bi siwarî û

pîyadeyên xwe alîkarî bidet bo hêrişbirina bi ser Kerkûkê, û nekir⁷.

Ozdemîr ku fermandeyê hêzekî turk li Rewandiz bû, geyîşte şikefta Casene û Şêx dît, da biçête ser Hewlêr û Koyê û Kerkûk û Kîfrî û Xaneqîn. Piştî vegerya ciyê xwe. Ebas Axayê Pişder û Xefurxan, bi qiseyên Şêx, hatin agadarkirin ku yarmetiya Ozdemîr bikin bo vekişin û biçine Îran heta bigeyne Turkîya⁸.

10 leşkerê kurd: Îzzedîn Topçî, Emîn Rewandizî, Elî û Ezîz Kurdî û Reşîd Şewqî û Ezîz Hikmet Qezaz û Mecîd Tuarşî û Nurfî Beg û Faiyîq Kak Emîn û Xalid Seîd, hev girtin û hewl dan ku Şêx li turkan biteqîne, lê hewldana wan serî negirt. Turkxwayên dewra Şêx li hember wan dujminî kirin. Dîsa dev jê berdan⁹.

Ew makîna çapê ku pêştir Mêcer Son anîbû Silêmanî û wan jî guhestibû bo Casene, du jimarên rojnameyê *Bangî Heq* bi wê hate çapkirin. Şêx ku çûye Sûrdaş, serî li Pişder da bo bidestxisna komek û piştgirî.

Her weha li Adara 1923-ê jî Babekir Axa bi nameyekî ve şand cem berpirsyarên îngilîz û dawayê ji wan kirin ku mercê xwe bo berqerarkirina aştî zelal bikine. Belam ewan danûsandinên li ser çûna Bexdayê kirin¹⁰. Heman mang(23/3) Mîr Zeydî birayê Melîk Feysel serî li Hewlêr û Kerkûk da. Navçeyên dorberê Kerkûk, wek derkevt, bi germî ji Hewlêr zêdetir piştevanîya serxwebûna temamê kurdan kir¹¹.

Firokeyên îngilîz 8/5/1923 beyannameyan bi ser Silêmanî û navenda qezayên wî da dareşandin, ji bo ku hikumet nîyaziyeta Silêmanî bigirête û

wî li rûda rabiweste, cezayê qurs didate. Dîtin û nêrîna nûnerê bala yê îngiliz û hikumeta Iraq li ser wezhê pîrr cîyawaz bû: Li gor Hênri Dobs weha bû, heta ku Şêx azad be, hiç îdareyekî Silêmanî mayîna wê çareser nabe. Bo vê eger neyê kuştin yan neyê dîlgirtin, baştir ew e ku em bi gel ra rêk bikevin. Heçî hikumetê Iraqê ye jî, rageyandina wî ya 25/12/1922 ê ku bîrûraya xwe dîyar kir. Tê da mafê kurd nebû, bo pêkanîna hikumetê kurdî di çarçova Iraq da û sûr bû li ser tund bestina Silêmanî bi Bexda ve¹².

Şêx Roja 10/5/1923 Salih Zekî Sahêbqiran bi name ve şande Koyê û ji wê ve jî birîye Bexda. Nûnerê bala Elmindub Elsamî bi name bersîva wî daye ku yan bête Bexda bo qisekirina li ser dahatûya kurd, yan biçite cem efserê sîyasî nek ew hêza îngiliz ku hêrîşê Silêmanî dikir, Şêx milî neda¹³.

Hêza nû ya îngiliz 14/5/1923 geyîşte Çemçemal. Şêx her wê rojê nameyekî bo fermandeyê stunekê îngiliz li Kerkûk nûsî ku ji Çemçemal neyête pêş ve. Roja 15/5-ê jî Casenê terk kir û bi rêya "Şêx Bax" da çûye Mawet û Şarbajêr, û dawîyê li wê tê "birince"ya Hewraman niştêcî dibe¹⁴. Wê demê biruskeyekî bo hemû balyozên bîyanî şande Tehran û nerezayîya xwe tê da derbirî dijî çewsandin û serkutkariya îngiliz û ji wan dawa kir ku yarmetî bidinê¹⁵.

Hêzên îngiliz ketin Cûlan û berve Silêmanî birêketin, 16/5 geyîştin Serçinar(ciyekî havîngeh ê Silêmanî ye). Roja pêştir (15/5) bi firoke name bo malmezînen bajar belavkirin. Ew jî 16/5 çûne Serçinar. Edmonds heman rojê ligel ew sergewreyan hate nav

bajar. Ehmed Begê Toftiq Beg kire ser-pereştê giştî yê dayreyan û Şêx Qadir bû berpirsê asayîşa giştî û Mecîd Efendî jî bû rêvebirê pêşî û teşkilatê polis birêxiste. Ew hêzan destê wan di komala navçeyên dewrûberê Silêmanî û bi taybetî Sûrdaş û Merge da hebû. Paşê piştrast bûn evcar di 28/5 da çûne nav bajar¹⁶. Li wê demê jî duwem dewranê hukmê rastewxo yê îngiliz li bajar da destpêkir.

Her ew mang nûnerê bala ev beyannameya resmî di rojnameyên Bexda da belav kirîye: "em dizanin Şêx Mehmûd gelek name şandiye û der-xistîye ku layengirê hikumet e û hej ji xizmeta wî diket. Di bersîvê da ji wî ra gotine: eger bête Bexda, li ser muhale-fetkirina li hember hikumetê tûşî ceza nabê. Rê jî didinê ku ligel xêzana xwe li Bexda dabinişe. Wê demê li vira bi rêz mamele bi wî têtê girtin û bo wî azadî têtê dayin, demêkî hewl nedet bi bê molet li Bexda têtê bicîkirin"¹⁷.

Roja 2/6/1923 Abid Elmihsîn Elshahdunê serekwezîr û Sebîh Neşetê emîndarê paytext û Korniwâlîsê rawêjkarê wezaretê navxwe bi firoke hatine Silêmanî ta ku bajêr wek lîwayek ji rûyê îdarî ve bixine ser Iraq. Hênri Dobs jî 2/6-3ê geyîşt. Ligel malmezînan û serokên kurd kombûn. Bo wan derket ku kurdê Silêmanî navên hiç deshelatêk hikumetê Iraq li serê wan da hebê. Bo vê biryar dan bimênête heta çareserîkî jê re bibînin ku hemû layekî pê razî be. Edmonds 2/6/1923 pêşniyarê wan kir ku encûmenêkî îdarî yê kurd bi serokayetiya gewreyekî bajar ku bi dilê nûnerê bala yê îngiliz û Melîk Feysel be, bête damezirandin. Kurdî zimanê resmî yê

lîwa Silêmanî û Silêmanî jî lîwayekî Iraq be û pareyê ji bac girtinê dihate komkirin bo rêxistina karûbarê birêvebirina lîwa bihata terxankirin û xerc-kirinê. Nûnerên lîwayê jî bişandina encumenê nûnerên Iraq û bo wan nabê ku sonda layengirî û dilsozîya bo melîk Feysel nexwin¹⁸.

Ew pêşniyar roja 3/6 di kombûna wêfdeke û gewreyên bajêr da hate berçav xistin. Aliyê kurdî biryara pesendkirinê da, eger nûnerê bala pê qayîl be, bimercek hêzên wê demê hindê ji wan dê di bajar da bimênete heta asayîş û nîzam berqerar dibin. Nûnerê bala bi mayîna ew hêzan razî nebû¹⁹, çinku hikumeta Brîtanya dupat kiribû ku divê hêzên nav Iraq kêmbikin bo şeş fewc. Ji vê pêve stunî "Koy" biryar dan ku di navenda Hezîranê da vekêşête. Wêfdeke rêgeçareyekî bo wî nehatiye dîtin, 4/6 çûne bo Bexda²⁰. Her wê navberê Mistefa Paşa Yamulkî hewl da yek hejmara (14) yê rojnameyê *Bangî Kurdistan* bi tenya derbiketeve. Ji nûserên pêşî hevkarîya kesî nebû.

Hêsta hîç îdareyek rêkûpêk nehatabû dabîn(terxan) kirin û kesekî weha jî bo hêza livî danenabûn ku ji encumenê demkî yê birêvebirê bajêr ra gotî: îngiliz sê rojên din diçine bo Kerkûk²¹. Ew jî ji ber ev mesele ye, çinku hikumeta Iraqê jî qeza û nehiyeyên wekî Ranya û Çemçemal û Zabî ji Silêmanî cûda kir û bi Hewlêr û Kerkûkê ve girêdan ta ku tundtir kontrola Silêmanî û navçeyên li jêr îdareya wî bikit, destê xo vekêşa, bajar bi bê îdare û deshelat maye²².

Bû roja 17/6 di "rûniştinek umumî"²³ da nizîkê du hezar kesî

hêzên îngiliz tek tek yan pê bi pê ji bajar vekişyan, piraniya wan bi penî birin berve gundan. Çend boseyek di rê da bo wan şandin, ew jî hatin şêlandin²⁴. Bi vê şeweyê hukmê rastewxo yê îngiliz, ev car kêmbûnê û zêde mangekî(mehekê) nekêşand.

1/2- Rêxistina Sêyem a Hikumeta Kurdîstana Cenûb:

Şêx ku wê demê li gundê "Xemze" yê jorê bajar bû, her zû Kerîmê Feteħ Begê Hemewendî bi hêzekê ve şande Silêmanî, xwe kir hakimê bajar û dawa li xelkê kir ku rêz li asayîş û nîzam bigrin û belav kir ku alîgir û hevkarên îngiliz ceza didinê û tucarên titûnê jî raspard bitevî ku titûna xwe birine li derveyê bajar firotine û şandine pey wan ku baca xwe bidin²⁵.

Şêx bi xwe jî 26/6/1923 geyîste nav bajar²⁶. Ku nûnerê bala bi vê zanî, ev biryarên hanê da:

1- Ji ber vê serî negirt û xelkê bajar bi vê razî nebûn ku Silêmanî bixirête ser Iraqê. Pêwîste Şêx Mehmûd bête ser îdare û cardin Silêmanî biçite rewşa pêşîya hêrişa îngiliz. Bo vê hîç rojek pêwendiyek di navbera Şêx û hikumeta Iraqê da nabê û nûnerê bala li vê derbarê da ferman derdixet û wekîlekî bo karûbarê Silêmanî wek mûfetîşê îdarî yê Kerkûk birêdike, da ku karê wî rêje biket.

2- Bo bêşê serî yê lîwa ku nexirayete bin îdare û kontrola hikumeta Iraq, heman tişt tête kirin. Ew nahiyeyên ku ji Silêmanî hatibûn ciyakirin, kêşeyên girîng ji aliyê mûfetîşê îdarî ve didirêne wezaretaya navxwe û rewşa wan dixirête berçavê

nûnerê bala û wezîrê navxwe, bi rawêjê nûnerê bala karên girîng û yên gewre cî bi cî diket.

3- Divê ji Şêx Mehmûd ra bête gotin êsta waz lê dike bi mercek ji sinûrê navçê navendiyê wêdetir neçe²⁷.

Nûnerê bala evana bi nameyek şexsî geyande Şêx. Her di Temûza 1923-ê da jî bi wî rageyand: rê û şiwên danrawe bo ciyakirina qezayên Ranye û Qeladizê û Çemçemal û Helebce û Qeredax û Sengaw û nahiya Mawet. Nabê Şêx destê xwe jî werbidate karûbarê dahatî yê sadeta sergelî. Eger bo vê riayet neke dê tundtirîn kirin li hember wî pêk werin²⁸.

Şêx pîr pê diçê paşê li dawîya Hezîran û serê Temûza 1923 sêyem teşkîlata hikumetê bi navê Meclîsê Millî(umumî) ji "ruesay dewaîr" û "eşrafê memleket" pêkhênabû, bi vê şeweyê:

**Endamê Asayîyê
(Azayên tabîi):**

Nayibê hikumet û reisê meclîsê Millî û reisê daxilîye:

Şêx Mehmûd Xerîbê Şêx Marîfê Qazanqaye.

Reisê millîye û gumrig:

Seyid Ehmedê Berzençî(merexes).

Reisê mehkemê:

Mela Marûfê Mela Resûlê Sîrê.

Reisê ticaret û mearif û nafîhe:

Hacî Mela Seîd cfendiyê Kerkûkîzade.

Qumandanê eskerê Kurdistan:

Reza Beg.

Eşraf û Bijareyên Ehalî:

Mihemed Axayê Ebdulrehman Axa.

Mihemed Begê Qadir Paşa

Hacî Ehmedê Hacî Kerîm

Hacî Emînê Hacî Ezîz

Hacî Rehîm

Hesen Bîneşê²⁹.

Qele mirovên deshelata ev hikumeta sêyem, di çavpêketina pêşî da, bi giştî berteng û qeware piçûk bû, heta ji serî bigire heta navenda bajar û qezaya Çarta û navçeyên Bazîyan û Pênciwînê vegirt³⁰. Şêx di dawîya Temûza 1923 da dest bi ser qeza û nahiyeyên cîyawaz da girt û bi hêzên mezin rageyand ku van deran bidine bi Melîkê Kurdistan. Belam nûnerê bala bi firoke belavok avête xwarê ku vê red dike û Şêx hiç deshelatêk wî ya biserê xwe nîye û nabê. Şêx bersiva wê daye û kontrolkirina wî ya li ser van deveran berdeyam bû û ji deshelatê pere disend³¹.

Peymana Lozanê roja 23/7/1923 li navbera hevpeymanan û Turkîyeyê da hate morkirin. Êdî dibû Brîtanya û Tirkîya, bipêy duwem birrgeyê sêyem madde, hêla sînorê Tirkîya û Iraq dîyar bikin. Eger nekarîn, dê kêşe bixirête rojeva encumenê Komeleya Netewan. Heta biryara yekcarî jî bête dayîn, herdu hikumet belênî bidin ku hiç hereketek eskerî yan neeskerî nekin ku barodoxa wê demê ya herêma "Wilatyetê Musil" bigorê³². Wata vê, halûbarê Kurdistanê Başûr wek xwe hêştiye, beranber bi kurdên vê parçeyê li stûyê hikumetê Brîtanyayê jî erkêkî weha nema ku bikarin mafê xwe bo damezirandina dewletêk kurdî bikar bîhênin³³.

Destpêka vê dewrê, Ehmed Beg û Îzzet Begê û Usman Pşayê birayê wî û Hamîd Beg serî li Silêmanî daye, ligel alîgirên Melîkê Kurdistan hevdtin kirine. Şêx³⁴ 15/8/1923 karbidestên Îngiliz agadar kirin ku Tofîq Celal bi berveyê nahiyeya Urmawa û Hesen

Begê Begzade yê Cafî jî bi yarîdedere serokê hoza Caf danave³⁵. Ji ber vê guya Şêx destî werdayete ser navçe û qedexa kiriye. Bajar û bi taybet bare-gayekî şêx roja 16/8/1923, ji froke bi Bombayê 220 pawendî ku bo yekemîn car li mêjû da tete bikarhênan bobarduman kirin. Şêx yad da li ser wê tiştî nerazîbûna xwe bo nûnerê bala dîyarkir³⁶.

Her wê rojê jî, Şêx Heme Xerîb bi hêzekê ve çûye nav Helebce, begzadeyê Caf hîç xogirîyekî li ber wan da pê nekiriye. Deshelata Îngiliz tenya li beşekî Warmawaya xwarû û li zincîre çiyayên beranber navçeyê Helebce da maye ku bi Kifriyê ve hatiye bestin³⁷.

Şêx çendîn nameyên din bi Şêx Evdilkerrîn û Şêx Evdilqadirê Sengaw û Seyid Ehmedê Berzencî û Şêx Heme Xerîb da, bo nûnerê bala şande Bexda, dawayê jî wê kirine ku nûnerekê xwe bişîne bo Silêmanî. Di Tîşrîna Yekem a sala 1923 da bi nameyê 1/10 ê xwe ve du kes bo Bexda birê kir. Hênîrî Dobs 12/11/1923 weha ciwabê wî daye, divê bête Bexda ku em çarenûsa Silêmanî bi hev ra bipeyvin³⁸.

Roja 20/9/1923 yekem jimara roj-nameya *Umîdî İstîqlal* li Silêmanî hate derxistin û heta 15/5/1924 ku bîst û pênc jimarên wî hatin belavkirin û bû zimanê fermî yê sêyem hikumeta Kurdistana Cinûb. Îngilizan dawîya Eylûla 1923 hêzek taybetî ya siwarîyên gerokî saz kir ku ji 120 polîsan pêk hatîbû, heta dema pêwîstî hebê dê li her beşekî liwayên Kerkûk û Silêmanî da bikar bihêrin³⁹.

Brûskeyekî nûnerê bala li 7/12/1923 tete bo Edmonds, têda pêşniyar kiribû ku Hêza Asmanî ya Brîtanya

wan ji dawîya bombardumana Silêmanî agadar biket, çunku Şêx çend carêk şertê sepênrawanî şikandîye, guya belge jî gelek in ku nîrîne dijê wî jî hene⁴⁰. Ehmed Beg û Îzzet Beg ku bi pele vegeryane bo Helebce, roja 16/12/1923 ligel dayika xwe Adîle Xanê Edmonds li gundê "pisarkan" a xwar li "bitxane" dî⁴¹. Bi vê, peywendiyên ligel Îngiliz da damezirandîye.

Silêmanî û bi taybetî milê Şêx roja 25/12/1923 bi firoke hate bombardu-mankirin. Mereşal Sîr Con Salmondî serkirdeyê Hêza Asmanî ya Brîtanyayê li Iraq bi xwe bi firokeyê mala Şêx bombe kir û dergayê wê yê derveyê ji ber kevt. Du firokeyên wan nizîkê Serçînar û li derbendê Taslûce teqîn pê kevt û nişteve. Şêx yê yekemîn parast û duyemîn bi destê Kerîm Begê Hemewend hate şikênanandin. Her ew firokeyên Îngiliz û efsere sîyasî şevêkê ji bona cejna ji dayikbûna Mesîh bi xwe ahengê girtin. Firokeyên wan li wê heta Adara 1924an çendîn carên din bo hêriş û çavtirsandinê li asman bi fişegên ronîkirinê manewra kir⁴².

Desthelatdarên Îngiliz di Adara 1924 da fermanberê medenî û polîsên xwe bo damezarandina îdareyê şande Helebce. Hêzekî Şêx hêrişê bajêr kir, siwarên Cafî Ehmed Begî şikandin. Dîsan desthelata Îngiliz bi dawî hênan heta gundê Warmawa. Belam leşkerê Şêx Xurmala û Warmawayê bakûrê li hemberê wî jî girt. Êdî ji 1/10/1922 şûnda li Helebce hîç efserekî sîyasî yê Îngilizî nemabû, heta Edmonds di 21/4/1924 da bi firoke geştiye wê derê⁴³.

Şêx Qadirê Hefîd ev dewre ji Şêx Mehmûd dûr kevt; Tîşrîna Yekem a 1923an li gundê Sêwsênan ji Edmonds

ra gotibû wê xwe bo endametîya encumenê damezirandina "Almeclîs Altesîsî/ Meclîsa Damezrêner" bipalêwê⁴⁴. Birastî ligel Îzzet Beg û Mîrza Ferec û Ehmed Begê Tofîq Beg û Mihemed Begê Fetah Begê Caf da bi endamê ew encumenê hate helbijardin ku roja 27/3/1924 hatibû kirin, 26/7/1924 ê jî li dawîya temambûna erkan helweşeya⁴⁵.

Rîyasetê malîye yê hikumeta Şêx li destpêka 1924 pûlê xwe çap kir bo rêvebirina karûbarê resmî yê daîreyan: yek û heşt aneyî, bo tapoyê jî pênc rûpîye ye. Paşan pûlê çar rûpîyeyî, rûpî û nivî û yek rûpîyî jî derxist⁴⁶. Bîra pûl derxistin ê Ehmed Xoce bû, û xwe bi encamê geyand. Şêx Letîfî jî gelek yarmetî da bo wê, nêva pûlan bo wan kûn kir û qeraxî bo wan dirust kirin⁴⁷.

Rîyasetê malîye her ew maweyê xerîkê amadekirina birrêk zêde altûnên sikedar û bêsike bû heta li sinuq da bi barimte(îpotek) dabûnê û banqa not (emlet werqît) beranber bi vê altûnî çap bike û bixête bazarêve⁴⁸. Belam dîyare li dawîya rûdanên li wê û bitaybetî topbaran û dagîrkirina bajar ev projeya wan helweşandîye.

Roja 20/5/1924an pîrr zêde beyanname bi ser gelek navçeyên jêr deshela ta Şêx da hate berdan, hêrîşa bombardumankirina wan hemûyan têda kiribû. 22/5 Şêxî jî bi name agadar kir ku bi xwe û çekdarên xwe ve bajar terk dikin. Êdî bo bîyan û birrîniyan rû bi Qeredax û Sengaw bicî hişt û dawîya bombardumanê hate⁴⁹.

Silêmanî di 25/5/1924an da carekî dî hate bombardumankirin. Ev car jî, ji bîst hezar kesên daniştvanên bajar, tenê 700 kes lê mane. Ewên din derbederê gundan bûn û piştî çar mangên din ji

wê hilkişiyên ew jî vegeryane cîyê xwe⁵⁰. Ehmed Xoce ku wan rojan hatibû nav bajar, dîtibû: "Li hemû serban û malan billêseyê agir helestê, xanî wêran û kavil bi ser hev da rûxabûn, bajarê çol û bêxwedî. Li jêr bomba û mîtralyozan da jin û mindal û pîr ketibûn deşt bi bê xûrek û aw û bi pêxwasi"⁵¹.

Şêxî her hewla destvegirtinê dabû bi ser ew navçeyan da, ku ji wî ra qedexe kirabûn. Piştî bombardumana bajarî jî, karûbarê kem û zor li girêjene bir. Duwem car nûnerê bala biryar da ku bi hêza pîyade Silêmanî dagîr biket. Ewe bû retlekî eskerê erebî yê Iraq bi piştevanîya hêza polis û hêzekî livî yê asûrî û Hêza Asmanî ya Brîtanya, roja 19/7/ 1924 Silêmanî vebigre, û Çaman kiriye serpereştê îdarî yê bajar⁵², li wê demê da Şêx li pêş çend rojêk Silêmanî terk kiribû⁵³. Li wê demê jî tomara jîyana ev sêyem hikumeta Şêx, bi temamî jihev bûye.

2- Cîyê "Umîdî Îstîqlal" di Rojnamevaniya Kurd da

2/1- "Umîdî Îstîqlal" rojnameyekî kurdî ye, wek lê hatiye nûsîn, siyasî û edebî û komelayetî û resmî yê heftane bûye, li Silêmanî derçûye. Gerçî negotibe jî, belam ji qiseyên Ehmed Xoce û wek bi xwe jî niwandîye, zimanê fermî yê sêyem hikumeta Kurdistana Cinûb bûye bi serkirdayetîya Şêx Mehmûdê gewre⁵⁴.

Lijneyekî ku pêkhatibû ji Ehmed Xoce û Macîd Mistefa û Adilê Şêx Qadirê Qazî û Seyid Ehmedê Berzençî û Sebrî Kakereş li mala Îzzet Begê Osman Paşa kom bûne, çend navên wek (Kurdistan, Umîdî Îstîqlal, Weten,

Serkevtin, Yekîti ...) hatine pêşniyar kirin. Qadir Axayê Pişderî nav sêcar raykêşaye, her "Umîdî İstiqlal" derçûye. Bo vî ew navî lê danîne⁵⁵.

Bi vî şeweyê piştî rojnameyên *Pêşkevtin*, *Bangî Kurdistan*, *Rojî Kurdistan* û *Bangî Heq* dibite pêncem rojnameyê navçeyê Silêmanî û piştî her sê xulî rojnameya "Kurdistan" a dayik û rojnameyên navçeya Silêmanî û "Rojî Kurd Şewî Ecem" û "Jîn" û "Têgeytiştina Rastî" jî dibite yazdemîn rojnameya kurdî di mêjûyê rojnamevaniya kurdî da.

Naveke nediyar ku bi vê terzê xetê farisiyê "tehayiq" nûsîye. Ev du dêrre (misre) şîhrê Şêx Nûrî Şêx Salihê (j. 9) li jêr hatiye nûsîn, bi vê awayê dawî lê anîye:

*"Xudaya beyse îtir laberî deycûrî îzmîhlal
Talûey pê bike xurşîdî rojî pakî îstiqlal
Legel xuliyayî hîcretda beserçû umrî şîrînîm
Desa nobey wîsale ah! Ey umîdî îstiqlal".*

Mêjûyê koça wî, wek pêrewî rojgareke, li derçûn da li ser nûsîye, yekem jimara wê li sala 1339-ê romî (1923), jimara dawî (25)-ê 1340 ê romî (1924) derçûye.

Xoce Efendîzade Ehmed Sebrî birêvebirê berpîrs û sernûserê jimarên (1-3) û Refîq Hîlmî yê (4-13-) û Hisên Nazim yê (14-16) bûye. Jimarên (17-25) navê kesekî bi vê wezîfeyê bi ser da nîye.

Qewareya rojnameyê (21x33cm.) û tekst bi giştî (17x27,5 cm) ye. Hemû jimarên wî çar rûpel in û bi du stun hatine çapkirin ku her yek ji wan ji 29 rêz kemtir nîye, jimara (17) nebê ku pênc rûpel e. Ango serhev 101 rûpel in.

Tîrajê rast ya her jimarêk nayête zanîn ku çend e. Ehmed Xoce li du cî û demên ciya ciya da gotîye: "yekem

jimar ji çar hezar liban (daneyan) pirrtir hatiye firotin", yê din "hezar dane jê hatine çapkirin"⁵⁶. Li wê demê da ew du jimar bo Silêmanî ye û rojane daniştîyên wê dewrî 20 hezar kesî derbas nabin, û ne ku her roşinbîrê perox xwendine, belku xwendewarê wê jî tê de jimar yekcar kê m e, em bi pîr dizanin. Tenanet zehmata jimarekê xwe ji pêncsedî da be jî.

Rojnameyêke bi pileyê yekem li navçeyê Silêmanî hatiye belavkirin û daneyên wî geyştîye derve wek Kerkûk û Kifî û Bexda⁵⁷ û Helebce. Nîrxê her daneyekê wî yek "ane" bûye. Abonetiya beşdarîya bo 3 mang du û 2 mang çar û Silêmanî jî heşt "rûpî" bûye.

2/2- Ev rojname li çapxaneyê şarevanîyê dihate çapkirin ku pêştir Mêcer Son anîye Silêmanî û li mala Faris Efendîyê Ewreman Axa danaye û rojnameyê *Pêşkevtin* pê derxistiye; piştra jî *Bangî Kurdistan* û *Rojî Kurdistan* her li Silêmanî û *Bangî Heq* li Şikevta Casenê bi wê dihate çapkirin.

Ew şarezayîya çapxane ku Mêcer Son yekem car li serdema hukmê rastexo yê îngiliz li Silêmanî (19/6/1919-5/9/1922) fêrê çapê kiribû û pêgeyan-dibû, dewrê duyem hikumeta Kurdistana Cenûb (10/10/ 1922-3/3/ 1923) çapxane wan birêve dibir, bi vê şeweyê: Şêx Ebdulmecîdê Şêx Arif-birêvebirê çapxane, Mihemed Edîb Ezîz- sermuretîb, Mihemed Tofîq-muretîb, Mihemed Teyîb- makîneçî⁵⁸. Evana, wek di qiseyên Ehmed Xoce da derdikevê, di "rûniştînek umûmî" yê roja 17/6/1923an da ligel îngilizan û du hezar kesî da wan bajarê Kerkûk bicî hiştibû.

Ji çapxaneyê mîlekê derhênra bû, westa Salih Silêman çexmaxsaz li du roj da dirust kirîye. Şêx Mihemed ji birrî 60 rûpî, 200î daye. Mihemed Zuhtî Taqe kesêkî şareza yê çap û îş pêkerê makîna çapê bû⁵⁹, bi xwe tenê tîprêzî, rêxistin û çapkirina rojnameyêk bi çend rojek da cîbicî dikir, û bi yek rojê jî radikêşa. Ku yekem jimar derçû, Şêx wî bi 150 rûpî xelat kir û mûçeyê wî ji 45 kire 100 rûpî. Şêx bi dengvedana rojnameyê, biryar da ku çapxaneyek gewretir ji Elmanyayê bihêne⁶⁰. Belam ji ber gorîna rewşê ve, biserneket.

Çapa rojnameyê, bi miqayesekirina du komelên cîya yê hemû jimaran, rûn û ciwan niye. Çapxaneyek mandû û firrek bê xizmet bûye, cî guhartin û barkirina ji Silêmanyê ve bo Sûrdeşt û anîna ji layê îngilîzan ve, zêdetir makîneyê zêdetir kevin kirîye. Bo wê li vira û li wê çapekê kall a dabirr dabirr bûye û derneçûye. Reng e rola merekebê wan jî di wê da hebûbê. Ehmed Xoce di yekem jimarê da nîşan bo wê kirîye ku: "Di vê înkîlabê dawî da ji ber vê hînek qismên makîneya çapê hatibû seqatkirin, mudetekî întîşara xezetê teatîl bûbû, vê carê bi wasîte û hîmmeta çend westayan hate çêkirin". "Atzar"ekî (j. 16)yê jî ronî kirîye ku: "Di vê navbeyna pêşiyê da makîneya met-bea çepell bûbû, ji ber wê întîşara xezeteyê dereng xist heta ku hate pakkirin".

Cîyê bas e, tête zanîn ku çapxane heta 8/11/1923ê, her Ehmed Xoce birêvebirê wê bûye⁶¹. Pê naçê heta ew wezîfê li ser wî bûbe, çunke wek bi xwe jî nûsiye ku rojname teslîmê bi Refîq Hilmî kirîye, çûye navçeyê

Baziyan û li dawîya bombardumana Gulana 1924an vê car hatîye⁶².

2/3- Rojname heftane bûye. Bi giştî her heft rojê carêk derçûye. Belam çend jimarên wî derengtir derçûne: (J. 15) dawîya 35 roj, (j. 17) dawîya 21 roj, (j. 18) dawîya 16 roj, (j. 19) dawîya 11 roj, (j. 23) û (25) dawîya 14 roj. Mêjûyê derçûna wan bi vê awa ye:

Jimar:	Mêjûyê derçûn:
1	20/9/339
2	27/9/339
3	4/10/339
4	11/10/339
5	18/10/339
6	25/10/339
7	1/11/339
8	8/11/339
9	15/11/339
10	22/11/339
11	29/11/339
12	6/12/339
13	13/12/339
14	20/12/339
15	24/1/339
16	31/1/339
17	21/2/339
18	9/3/340
19	20/3/340
20	27/3/340
21	3/4/340
22	10/4/340
23	24/4/340
24	1/5/340
25	15/5/340

Dereng ketina (j.15) ji hoyê şilejanî weziyeta bajar bûye, dawî bi bombardumankirina firokeyên îngilîz di 25/12/1923 da hat. Êdî ji wê gavê ve barudoxekê zêdetir rû li nêaramî û têkçûnê kirîye. Ne ku ev rojname, belku daîreyên bajar jî heta maweyek îş û karê wan bi derengî ketîye⁶³. Bilî ji vê, pakkirina çapxanê jî hoyek bûye⁶⁴.

Derengketina herdu jimarên(17, 18), jiber destkêşandina Hisên Nazim (birêvebirê berpirs û sernûser bû) di 20/1/ 339 (1943) da, pîrr dem tê de derbas dibe⁶⁵, ku rojnameyê bêxwedî hêştîye, heta karhelsûrênêkî dî bo wî hate terxan kirin, bi wî çûye. Dereng derçûna jimarên (23,25)ê jî, dîyar e jiber bi temamî alozbûn û danemezrîna bingeha sîyasî ya navçeyê bû ku asoya paşerojê neroşintir û guvîşîn û êrîşa îngiliz jî li ser tundtir bûn.

Rawestina rojname bi xwe jî li (j.25)ê di 15/5/1924 da bi dawî tete. Bê çend û çawan ji ber bombardumana qurs a roja 25/5/1924ê li ser bajar da bûye ku hemû cimûcûl û çalekiyên bajarî bi rojnameyê ve bo maweyê çend mangek kem û zor hatiye ragirtin, li pişt çend hoyên dî karekî kirîye ku wezîyeteke asayî bibête û zemînê xweş bike bo dagîrkirina bajar di Temûza wê salê da, dawîyê jî her wê rûdaye.

2/3- Navê Aşkere yê Nûseran Evana Bûn:

- 1- Ehmed Xoce
- 2- Refîq Hilmî
- 3- Hisên Nazim
- 4- Ehmed Fewzî
- 5- Ehmed Faîz
- 6- Zêwer
- 7- Arif Urfî
- 8- Fayîq Zêwer
- 9- Adîl Efendî
- 10- Bêxud
- 11- Reşîd Kaban
- 12- M. Z jî dibe Mihemed Zuhdî bûbê.

Pirraniya pantayê nûsîna rojnameyê, birêvebirê berpirs û sernûser bi xwe zêde kirine. Beşdarîya nûserên din kêm bûye: Ehmed Fewzî 3 helbest, Ehmed Faîz 1 nivîs, Zêwer 2 nivîs û 1

helbest, Arif Urfî 2 helbest, Fayîq Zêwer 1 helbest, Adîl Efendî 1 nivîsa 2 elqeyî temam nikirye, û Bêxud 1 helbest, Reşîd Kaban 1 nivîsa 2 elqeyî, M. Z 1 nivîs.

Balkêşî ew e ku gelek ji nûserên pêşî yê herdu rojname yê *Bangî Kurdistan* û *Rojî Kurdistan* li vira navê wan nî ye, bi taybet Şêx Nûrî Şêx Salih û Elî Kemal Bapîr ku destpêkê pêkve nûserê beşên kurdî û farisî ya *Bangî Kurdistan* bûn û dawîyê Şêx Nûrî bûye xwedî imtiyaz û birêvebirê berpirs û Elî Kemal jî dibe nûserê *Rojî Kurdistan*.

Refîq Hilmî, wek agadariya serdemek, li çîyekî bîranînên xwe da bideq nûsîye: "Piştî hatina Şêx Mehmûd bo Silêmanî, *Bangî Kurdistan* beyanekî dî belav kirîye. Ev car li çîyê vê rojnameyê da *Umîdî Îstîqlal* hate belavkirinê. Hin nûserên ev yaddaşa ligel biwêjê navdar Şêx Nûrî Şêx Salih ku ligel Elî Bapîr Axa(Elî Kemal) ji nûserên *Bangî Kurdistan* bûn, dibêje sazkirina karûbarê nûsîna *Umîdî Îstîqlal* min girte estûyê xwe. Li dawîya navbeynekê jî bi xwe bûm mudir û sernûserê rojname⁶⁶. Ku wan çî nav dane hîç nûsînek wan li rojnameyê nayê dîtin. Ronî jî nîye sebebê wê çîye û bo çî beşdarî nekirine, eger hebûbê, aşkira nebûye.

2/5- Her çîqas rojnameyek kurdî bûye, belam jimarên(9,14,17,18,25) beşê turkî(turkçe kısmı) û jimarên (13,14,15,16,20) ê jî beşê farisî (qismet farsî) hebûn. Bi taybetî Hisên Nazim xwestîye beşê erebî jî pêkbîne, hîç erebînûsek hevkarîya wî nekirîye.

Rojname demek berpirsê wî Ehmed Xoce bûye(j. 1-3), li wê (5, 10) rûpel (5, 3 r)ê bo hewalên derve û bi

taybet Türkîya û Brîtanya û Îran û Iraq, (2 r.) bo hewalên navxwe, û (75, 2 r.)ê bo agadarî (2 r.) û gotar, (25 r.) û bo şîr terxan bûye.

Li serdema berpirsariya Refîq Hîlmî(j. 4-13), li wê (4, 35) rûpel e: kê m û pîr (19 r.) bo gotar, (3 r.) bo gotarên wergêrandî, (3 r.) bo şîr, (5 r.) bo hewalên derve û (5, 1 r.) bo hewalên navxwe, (1 r.) bo beşê turkî(gotar) û ewên din jî (2 r.) bo agadariya daîreyên hikumetê bûye.

Ew ên ku Hisên Nazimî serkarîya wan kirîye (j. 14-16), li vê (7, 10) rûpel e: kê m û pîr (3 r.) zêdetir bo gotar û (5 r.) bo hewalên navxwe û (3 r.) bo hewalên derve û (25, 1 r.) bo beşê turkî û (1 r.) bo beşê farisî û (25, 1 r.) wî jî bo agada, hatiye çyakin.

Jimarên din jî(17-25), li vê (4, 33) rûpel e: Bigîştî (17 r.) zêdetir bo hewalên derve, û (5 r.) bo beşê farisî, û (7 r.) bo gotarên siyasî (3 r.) bo gotarên dînî û komelayetî û (1 r.) bo beşê farisî û (5 r.) bo beşê turkî û ew ên din jî (5 r.) bo agadariyan hatiya çyakin.

Serçavîya ev wûrde hewalên derve ku berdewamî dihat belavkirin, roj-nameyên Îran (Heyat, Şefeq Sirx) û Mûsil (Alamil) û Kerkûk(Nemce) û Bexda (Bexdad Tayms, Alraq) bûye.

2/6- Ehmed Xoce ku di vê sêyem hikumeta Şêx da bûbû katibê daîreyê tehrîratê milûkan, nexşê berçav ê çakkirin û bigerxistina çapxaneyê, piştî derxistina hewalan li jimarên *Umîdî İstiqlal* da hebûye. Bo vê, wek birêvebirê berpirs û sernûser, ev kar û xebata di vê rojgara aloz da giranbiha û gewre bûye, heybet û şanekî berz bo hikumeta Şêx peyda kirîye.

Ev çend nûsinên kê m ê navborî,

têkra(navendî) siyasî û bi taybet li ser meseleya kurd bûn. Di gotara "Metbûat û Zibanî Kurd"⁶⁷ da, xwestîye bersîva vê pirsyarê bidate: Kurd bo çi heta nûha musteqîl nebûne, ji vê layî ve qabil in yan na?

Nivîsîye: "Mealesef ne pêşîyên me sermayeyekî millî bo me bicê hiştîne û ne neslê hazir ê kurd muqtedîr bûye ku bikare bi lîsanê xwe heta alîmê dînî yê îbtîdayî tedwîn bike. Hal ev e li nav alemê medenîyet û millî da wasiteyê nasîn û tefrîqê enasir ziman e, ziman elbete bi sayeys qewaîd tereqî û bi sayeya metbûatê ve tete tedwînkirinê. Ji ber vê mesela ziman û metbûat ji hemû mîlletê zêdetir bo unsurê kurd lazim e".

Pê bi pê çend hoyên waqihî û dirustî bo bikarnehênana kurdî û nebûna hikumeta kurd hênaye ku nîşanê agadariya pêşwext û wûrdebîr û sengînî û birûrayên minasib û bikêrhatî: illet ji nebûna zimanê kurdî adem mewcudiyetê hikumeta kurd bûye. Ev sebeb jî bêqabilyetîya qewmê kurd etîf nakirête, manîh bo hikumeta kurd, muhîte îqlim û mewqiyê cografî yê Kurdistan e. Ewelen tebîet beşxêkî weha nedaye bi eraziyê Kurdistan ku sebebê yeketî û îstiqlaliyeta Kurdistan bêt, weku Nîlê Misir, Dicle û Firatê. Dîyare Kurdistan herçend zeman zeman hatibe îstîlakirin û mearûzê teruzatê xarîce bûbe jî, feqet hîç wextêk mearûzê îstîlayekî umûmî û berdewam nebûye heta ku kurd mecbûr bibe îthadekî umûmî tesîs bike wekî îstîlaya Rusya ji teref Tataran ve. Wekî mealûm e, tarîxen Kurdistan kîjan şax û dax û mîlletê kurd bi ekseriyet bi pîrranî mazû û darfiroş û yan şivan in. Ji ber vê di

navbeyna Kurdistan û eqwamî mute-cawîre da tîcaretekî wasîh û munasebetekî daîmî nebûye. Rabîhen eraziya Kurdistan wekî min erz kir, daîmen musleîdê tefreçe û cîyê jîyîna kurd bûye".

Bi raya wî, ev hal û bar, zemîna xoşker nebûye bo dirustbûna dewleta kurd: "Mîlletê kurd di nav ev hemû şertên nemusaît da her ew hende pê kirîye ku lîsan û adetên xwe muhafaza bike. Feqet hikumetek pê teşkîl nekiriye". Ji ber vê jî êrîşên tund girtîye, pêşyan ku ji ber wê kelepûr û deskevtek mezin bo neslên nû bicînehiştîye heta bikaribê li ser pîyê xwe rabiweste û biniya paşeroj dane. Bi min weha bû eger piştûpiştî newekane ku her yekî wan karek biket, erkek bo yê n pişt xwe qurstir(zehmettir) û li danehatû nebe: "muheqeq eger di kadroyê me yên berê da fikra evroyîn bibûwaye, ew jî tûşî ev pelepîrrûkê û hawarê nedibûn, em wekî kurrê bawê xwe li ser beşê xwe dadiniştin û evro hikumetekî me yê musteqîl dibû, di jiyaneke serbestî da raman dikir, li vê halê etalet û paşkevî da beşê me yê zîndî nedihat xwarin"⁶⁸.

Ev xetabarkirina(kadroyên me yê n-qedîm) bo ev roja kurdewarî, cûre helwêstekî azayane û hişyarane û hewlek bûye bo helsegandina rabirdû û têgeyîştina wê serdemê bi mebesta dîyarîkirina pêwîstî û erkên qonaxek.

Refîq Hîlmî, ev dewre ji Eylûla 1923 ve, birêvebirîya (Edadîy Mehmuđî) dane wî. Destpêkê ev wezîfe bi îradeyê şahane, li 1/10/1923 da cîyê Ehmed Xoce girtîye:

"Bo cenabê Refîq Hîlmî Efendî,

Ehmed efû kirawe li ber ewê ku îşê min ê kitabê bi wî heye, *Umîdî İstîqlal*

tewdîh bi cenabê te kirîye, lazim e hûn îdare bikin û hemû hefteyek xezeteyek întîşar bike êdî husnî xizmeta te metlûb e.

1-ê Teşrîna Ewel 39
Mehmud"⁶⁹

Refîq Hîlmî ceribandinek wî ya pêştirîn di rojnamevanî da hebû: Dema ku qutabî bûye ku bi şîr û nivîsîn hevkarî bi rojnameya "Huaded" û kovarên "Kukîb Miharif" û "Tecded"ê Kerkûkê kiriye. Piştra di sala 1921ê da nûserekî bikêr yê rojnameyê "necime" bûye ku ji alîyê deshelatdarên îngiliz ve bi tirkî li Kerkûkê dihate derhênan. Heta sergotarnûsînî tê da dahênaye û sebareti bi rûdanên gewre yê n wê demê yê n navçeyê bi taybet Turkiya nivîsiye.⁷⁰ Evca bûye nûserê "mehrî"ê beşê turkî yê rojnameya *Bangî Kurdistan* heta (j. 6).

Di hemû hejmarên dema wî da, bigiştî sergotara wî hebûye, naveroka basa wan hatîbû terxankirin bo meseleyên girîng ê n wê demê: wek şertên navxwe yê kurd û şirovekirin û nîrxandina wan, ji alîyê ve pêşkêşî birûraya xelk û roşinbîr û nûserên kurd kirin û ji alîyê din ve sîyaseta îngiliz û turk û dahatûya Kurdistana Başûr "Wilayetê Mûsil".

Bizîrekane rexne jî li eqliyete mirovî kurd girtîye, nivîsiye: "Kurd ji ber vê ye ku teesubê îslamî ne, ji turk jî û ji ereb jî zêdetir daîmen mexlubê esebiyete dînî dibin"⁷¹ "Kurd pîrr bedbext e, pîrr ser bifelaket e, yekane sebebê felaketên wê jî, ji dijminên xaricî zêdetir navxweyî ye"⁷².

Wek azadîxwazekî jî, tenê li vê der-

barê na, di hemû warî da, layengirê azadîyê bîrûraya wan derbirîn bûye û bangewazî bo vê kiriyê: "Lazime evro li Silêmanî metbûat û eftar fewqelade serbest be û hemû têgeyîştvanê mîllet bê qeyd û şert serbestîya wan temîn bikirê heta li tehtî rîyaseta cenabê Melîk da bi programekî qethî û faîdebexş cemîyetekî ehrar teşekul bike bo xatirê evê ku hem bo anî bi silah mudafeya me bibêt û hem îdareyê mutlaq û mustebîddane di memleketê me da xeyrê qabilî teşekul be."⁷³

Refîq Hîlmî bi rastî bo wê çûye ku çareserî û yeklayîbûna sîyasî ya kêşeya kurdî bi herî girîngirîn meseleya xwe û rojnameyê zaniye. Bo vê ji her birêvebirêkî di zêdetir girîngî bi vê alîyê daye û xebat li ser kirîye. Rupelên ew 10 jimarên 23yan, wate %65 zêdetir, bo gotarên sîyasî hatiye terxankirin.

Hisên Nazim, di demekê kurt ê wezîfedariya xwe ya li vê rojnameyê da, têruanîn û arasteyekî ciyawazî hênaye rû. Di yekem rûnîkirinê da "ifadeyê xisûse"⁷⁴ bidirust weha têgeyîştîye ku "meanayî xezete, meselekî xezeteçî newazişkirina mîzacê qewmî û rrehnumayê menfîh ê wetenîyet e! Mealum e ku xezete wekilê qesd, tercumanê fikir, awazê lîsanê umûmî ye! Ev wekalet, ev tercumanî û awaz li mecrayekî bêteref û sefyetî rûhîye da cereyanê pê dikirê! Eve jî emrêkî tebîhî ye! Madam ku wekalet wekaletê umûmî ye, awaz awazêkî qewmî ye bi goreyê mîzac û berjewendîya umûmî întîşar pêkirin lazim e!"

Wê demê bo balkêşandin û bidesthênana piştevaniya gelên derûdor, di rojname da duristkirina beşên erebî û tirkî û farisî bi pêwîst rêçav kiriyê: "ji ber wê lazime em muafiqê

lîsanî hemcîwar bi kurdî, erebî, turkî û farisî bin û binûsin. Bi vê wesîleyê jî muhebbet û semîmîyeta bi dorberê me ra zêdetir celb û teyîd bikin".

Belam xala cîyê lê hûrbûnê ew e ku xwe li qereyê sîyaset nedaye, nûsibûye: "tearuzê sîyasî nakim, behs û meqalatên ku muzîr be bo sîyaset û selametiya memleket qebûl û dercî nakim ji xeyrê hewadîsatê mehalî û muqtebase. Esasê programa teaqîbê tereqîyê mearîf teedî menfîtê edebî, îqtîsadî û îctîmaîyî(civakî) yê memleket". Li demêk rojnameyek zimanê hal ê hikumetekî piçûk ê ser navçeyekê beşekî welatê xwe da hebûye ku hêştaya çarenûsa xwe ya sîyasî belada nexirabû û ji vê rûyî ve nakokîyekî qurs di navbera wî û bitaybet karbidestên îngiliz da hebû.

Ev, ji vê bernameyê exlaqîyê diyar e, peyamekî komelayetî hebûye, çakkirin û binyatdanîna komelgayî ji bîngêh ve ji her karekî din pêştir û girîngtir bûye, parastina "şerefa qewmî"yê bestîye bi "îtîhadî û muhebetekî mûteqabile, yanî muhasede û munafese terk bikin û bi muhebetekî yekwîcudane meşexul bi muaşeret û wesaitê meîşetê xwe bin"⁷⁵. Kemûkurîya vê alîyê jî weha nişan daye: "bo terbiye û nişûnê qabilîyeta fîtarîye yê me ne dar eltehalîm û ne dar elsinaayêkê me heye! Ji ber wê exlaqê me yê qewmî her bi xamêtî li xalê fîtarî da mayete! Eve jî bê îş û karî hêştine! Û bi wasîtayê bê îş û karî jî ve bi muza-yeqê meîşet girîftar in. Her bi wasîtayê ev bê îş û karîyê, ku me hemûyan çav birîye xîzmet û meaşî hikumetê"⁷⁶.

Hisên Nazim bi hişekî jîrane ve bangewazî bo yekgirtin û xoşewîstî û îşkirin kirîye, ku peyamekê pîroz û

şaristanane bûye. Belam pêşxistina xwendewarî û abûrî û komelayetî, di helûmercê sîyasî û aloz ê wê rojê da ku kurdewarî bigiştî xêlekî û nexwêndewar û barê abûrîyê şer ê komelayetî jî darizaw û yeknegirtî û parçeparçe bû û pê bi pê beşê herî zêde yê amraz û pêwîstiyên cîbicîkirina ew gorankarîyê jî, her li zemînê li bar û darayîyê ve bigre ta kesên şareza û yê din, ferahem nebûn, karekî giran û estem bûye. Her ev têrwanîne cîyawaz jî, wek kak Kemal Reuf Mihemed rastî pêkve, karêkî kirîye ji sê jimar zêdetir li rojname da namênête ⁷⁷.

Adil Efendî di vê nûsîna roşinbîrî ya berz da kêmanîya rojnameyê ku gotarêkî du elqeyî yê temam nekirawî bi navê "Bûn û Jîyan bi Serwetewe ye"⁷⁸ tê da heye, heldigirê ku basê wê bikirê. Bi min şik naye kesî dî li rojnamevanîya kurdî da heta ew demê alîyê li meseleyekî weha girîng kirbête. Bo wê li warê xwe da danîsçe ye.

Mebesta wî ew bûye bibêje hîç hoyên me nebûne, kurd bêsamanî û bêdarûbarê abûrîyetî ku nehêştîye em bikine serpê û xwe rabigre û qewareyekî serbixwe bo xwe pêk bihênê: "milletêk jî her bi serwet, mewcudiyet, ahenga civakî, û beqa û temîna lewazimî mumkin dibe". "Milletek çend serwetdar bê ew hende qîmetê civakîyetî (îctîmaîyetî) ya wî muhîm e. Ew hende qabîlyeta wî ya îctîmayî nayête înkarkirinê. Milletê bêsêrwet taqet û qudretê wan ê civakî nabe. Ku weha bû, li pêş hemû tiştek da bo tezyîd û îstîhsalê serwet xebat îcab dike. Serwet binaxeyê millet înşa diket. Serwet heta mutezaîd bê înşa wê hende mehkem û metîntir e".

"Mearîf û ticaret û senayî û ziraet" jî bi mayê peydakirina saman tête danîn, ewanê belavê hokarê gorîna komelga bûye. Temaşa bikin nûsîye: "eqwamî îctîmayî heta negeyîştin ronahîya perwerdeyî, heta kamilî di perwerdeyî da peyda nekir her di nav hesarê wehşet da esîr bûn. Ew pêşketina sîyasî, ticarî, senayî welhasil zemanê ku îqtîsadî hazirê hemû destkevîyên perwerde nebê, çi ye?". Ticaret menbayê serwet e. Milletek çiqas hiquqê wî yê ticarî gewre û wasîh bî ew hende qabilyeta wî yê îctîmayî mîsoger e. Çunke ticaret yek ji erkên heyatî yê millet e". Mixabin basek netemamî hêlayete, elaqeyên din nehatine belavkirin.

Jimarên (18-25)ê rojnameyê, nayê zanîn kê serpereştîya wê kirîye û karûbarê nûsînê raperandîne, li gor ewanê pêş xwe, bigiştî cûreyêk bêserûberî û bernameyî û kêm pêzî ji naveroka wan ve dîyar e, bi vê şêwe ye:

Gotar ku nivê rastî piraniya jimarên pêştir êv wê girtîye, li vê dawîyê kêmanî bûyete û araste û hêlekî roşin û diyarkirî tê da xuya nakirê. Heta carna weha hebûye dabezîyeta astêkî sade gêraneve. Hewalên derve ji nivê rûpelan zêdetir dagîr kirîye. Agadarîyan bi qeware bûne ku du ew hende zêdetir, 16 jimarên pêşî li serhev 6 rûpel bo wan hatiye terxankirin, lêbelê ev 9 jimarên dawî 5 rûpel e. Dûr nîye, ji ber bêbabetî, mebest pê pirkirina beşekî ku ji hemû rûpelan zêdetir bûbe.

Nivîs bi pirranî babetê wan kurt in, bihûrî nahatine rêkxistinê û bicî kirin. Carûbar hewalên kurt û hûr tenanet di jimarekî jî da bi darriştinêkî dî ve hatiye dubarekirin, yan bi du beş hatine nivîsîn, bo nimune: "Nexoşîya

Wînzelos" û "îstifaya mîsyoy Wînzelos" li (j. 18, r. 3) da û "Sîqutî Qabîneya Belçîqa" û "Îstîfa qabîneya Belçîqa" li (j. 19, r. 3) da, "hereketê Şahê Îran" û "Cîmhurîyeta Îran" li (j. 20, r. 2) da, "ehwalê Îran" û "li meclîsê mebûsanê Îran" di (j. 21, r. 3) da.

Jimara nûser û şaîrên beşdarbûyî ji kêmbûye. Ev her çar nav tê da nûsîne: Arîf û Zêwer her yekî 1 şîr, Reşîd Kaban nûsînekî du elaqeyî, M. Z hûrde babetek. Xwedîyê nûsînên din nayêt zanîn. Ku pêda biçê ev cîyawazî dibin nîşanê wê, ku li vê maweyê da rêvebirê rojname yekê şareza nebûye, berde-wam birêve bibit, bo vê bi taybetî rûpelên jimarekî pêş û paşê wê jê kevîne û berûvajî hatiye pêvekirin. "Etzar"î di (j. 17, r. 3) da dîyar kirîye ku "ji ber kîşretî meşxulîyet ev car xezeteyê me berûvajî hatiye tebihkirin, ji ber wê îstirham dikeyn ku hûn qusûrê me efû bifermûn".

2/7- Zîmanê nûsînê heta jimara (16), bi taybet yê Ehmed Xoce û Refîq Hîlmî û Hisên Nazim, bigîştî tokme û rewan û darêjraw bûye, li rûyê helbi-jardina babet û honan û berçavxistinê ve, selîqe û behrê rojnamevanîyê tê da reng didateve, taybetî jî layê Refîq Hîlmî xwedî muzakereyek pêştirê pişek e û Hisên Nazim xwedî roşin-bîrîyekî Osmanî têkel bi giyanî neteweyî ye.

Refîq Hîlmî di demekê da carinan bixavî û xeyalî zîman şil kirîye û bi mebestên xwe ve dirêj kirîye. Hisên Nazim bi pêçewane ve, eger zîmanekî cîyawaz be jî, ji ber pirr bikarhênana gotin û zaravayê erebî û osmanî, amêz û req û qurs e, heman demî çirrupir û sengîn û bi naverok û pirr manayê dirêj

dadirê têkda xirayete law e. Zîmanê jîmarên (17-25), ji ber nebûna qelem-bidestê tiwane, pirr sadetir û kêmbarubar e, kalûkirçî û bêpêzî têda têtê dîtin, selîqê rojnamevanî jî pê ve kiz e, ji ber wê wek rojnameyekî zîmanê halê hikumet xuya nake.

Rênûsa rojnameyê jî, her ji wê bêtir, seretayî û sade ye, pîtê erebîyê bi taybetî wek (sa, ta, z, ş,...) bê perwa bikarhênane. Ser û bor û zêr û ziber pirrî caran nebûye, dibê bi zanîna pêşwext dîyarî kirabin. Pîtên dengdarên wek(ê, o) û yê qalind ê wek (rr, ll) nîşanê wan yê cîyakirinê nebûye.

Ji bilî vê, zîmanê ku hatîye bikarhênan wek rojnameyek li hember bikarbidestên îngiliz û hikumeta Îraq e ku dijminê sersextê wê hikumeta kurdî bûn. Bigîştî nerm û niyan û damezîrawe li peyv û risteyê pirr tund û dijêw û cergîr bidere. Nûsînên wî jî, wek peyamekî rojnamevanî, zêdetir rûyê qiseyên wî li xelkê kurd bûye, nek ji bo derve, layenek ve hander û amojgarîker û rê nîşander bûye.

2/8- Rojname di helûmercekî yek-car aloz û neroşnî ya mêjûyê kurd da derçûye. Ku çî hendê hewal û rûdanên ji layek ve girîng ê navxo ku şîrazê weziyeta wan têkdaye, ji layekî dî ve çarenûsîn û pêwendîdariya bi pîrs-girêka giştî ya kurd, her tê da nahatiye nîşankirin, yan wek bi pêwîst nexistine ber bas û lêkolînê. Bi du nimuneyan berçavkirina wî bi pêwîst dizanim:

1- Ew çend birr û madeyên peymanan Lozan ku pêwendîya wan bi çarenûsa Kurdistana Başûr "Wîlayetê Mûsil" ve heye û li (j. 1.) da hatiye belavkirinê, hîç qiseyekî li ser nehatiye kirin. Di wê demê da mimkun bû vê peymanê biki-

rana projeyê damezirandina dewlata kurdî li wêrê, lê rêya bo pêvegirêdana parçeyê başûr bi Îraq ve xweş kir.

2- Dûr û nîzîk hiç hewalekî taybet li ser beyanname berdan û herdu bobardumana rojên 16.08.1923 û 25.12.1923 yê nav bajarê Silêmanî bi firokeyên îngilîz tê da nebûyete, demek nêr-amîyê xistîye bi bajar ve, ew a dawîyê bûye hoyê 35 roj derengketina rojnameyê!

2/9- Rojnamevanên wê demê yê Îraqê jî, ji aliyê teknîkî û hunerîyê ve, gelek ji yê Kurdistanê bilindtir û pêşkevîtîr nebûne. Çunke kesên gelek jêhat û şareza li warê çapxane û keresteyê baş û guncaw di her du alî da nebûne⁷⁹. Bo wê *Umîdî Îstîqlal* ji aliyê teknîka rojnamevanî ve ji yê serdema xwe paşkevîtîr nebûye. Hinde (ewqas) heye, ji ber wê li rewşa neasayî û pîr kêşe û dijberî da derçûye, ne makîneyekî baş ê çap û ne taqîmekî temam serderkirîyê li hunerê çapkirinê hebûye, bê kemukurrî nebûye, derhênanê hunerekî sade bûye. Bitaybet bi miqayesekirina ligel rojnameyên kurdî yên wek *Pêşkewtin* û *Bangî Kurdistan* û *Rojî Kurdistan* ê pêş xwe da ku her li Silêmanî û bi heman çapxane hatine çapkirin, ev çapekê natemam û neşîrîn bûye, deqê stunî rûpelên hêndey yektir û heman jimarê kevin tê da nebûye.

Reng e bo rojnameyekê kizî û kem û kurtî ya vî karî, ji ber ew hoyan e, bîzehmetî peydakirina merekeb û pîtên çapê û kaxîzê, ji ber ewê ku di nav Silêmanî da nebûn û ji derveyê dianîn, ew qas zêde nedikarîn bigrin.

2/10- Encam:

1- Rojnameyek yekhêlî û fikrê wî aşkîra û dîyar nebûye. Bîr û boçûnên birêvebirên berpîrs bironî pêve bedî dikirê. Ligel wê jî da, moreke gîştî ya neteweyî û niştîmanî li ser hebûye. Di jimara (17) da li dawîyê, bi wê naverokê ve, weha dernakevê ku organê hikumetek bûbê. Seqamgîrnebûna deshelata hikumetek li ber bêdarûbarê hokarê navekî û pîrrbûna karîgerîya hokarê derveyî û neroşniya asoyê paşeroj di wê demê da, ji wê rûyî ve nexşê wan ê berçav hebûye.

2- Derxistina wê rojnameyê jî bi kurdî, tekoşîna ew rastî ye ku ziman li wê qonaxê da hoyekî girîng ê xwenasîn û xwe nasandina kurd bûye bo bîyanîyan.

3- Gotarên bi taybet sîyasî û kemtir komelayetî yên pîrrmana, pantayîyekî pîrranîya wan jimaran girtîye ku birêvebirekî wan ê berpîrs ê nasyar hebûye. Ew jî dirêjepêdana hewallên pêştir ê aliyê me bi xwe û bitaybetî yê *Bangî Kurdistan* û *Rojî Kurdistan* bûye, binaxeyê gotara nûsînê pitir kirîye.

4- Derxistina rojnameyekî weha di wê rojgarê nazik da û bi zimanê kurdî, her çawan bê û bi tevî kêmasiyên wî, xwe bi xwe da hengavekî jîrane ye, belgeyekî dî yê zindîtiya hişyarîya neteweyî ya roşinbîran û giragîrên kurdî yê serdema xwe ye.

**Naveroka Jimarên
Umêdî Îstîqlal:**

Jim: 1

Babet

Sultanî Sabîqî Türkîya Efû Dekirê..
Lozan û Lahîqekani îtîfaqnamey
Texlîyey Erazîy
Türkîya: Hidudî İraq..
Xeraîb ..
Royaştinewey Eskerî Îtîlafî Türkîya ..

Nûser

Umîdî Îstîqlal

Teşkilatê Meclîsê Umûmî ..
Ziyaret..

Îrade

Melikê Kurdistan Mahmud

()

Ehmed Sebrî

Îlan ..

Îlan ..

**Umîdî
Îstîqlal**

Tertîbat û Teşkilatê Hazîre bo
Muhafezeyê Hiqûqî Millî ye

Kurd

Jimar: 2

Babet

Bo Hizûrî Hezretî Melikê Muezam..

Reîsê Meclîsê Millî û Reîsê

Daxîleyê Xerîb

Bo Cenabê Reîsê Meclîsî Millî û Reîsê
Daxaliye ...

Melikê Kurdistan Mahmud

()

Kurd

Teîn

Giftugoyîkî(xelwetî)?: Heqîqî.. **Umîdî Îstîqlal**
Li Xezateyê Estanbûkewe..İran û Turk..

Jimar: 3

Babet

Îhtîzar

Besîe îtir ..

Metbuat û Zîmanê Kurd /1
Navbeyna İnan û Türkîye
Li Meclîsê Lozan da Meseleyê Mûsil..

Cenabê Refîq Hilmî Efendî..

Merheba Ey Umîdê Îstîqlal/şihir

Jimar: 4

Nûser

Ehmed Sebrî

Ehmed Sebrî

Babet

Bo Biraderên Wetan

Terbîhî Xezelî Edîbê Muhterem

Cenabê M. Nûrî Efendî

Gerîna Sead Zexlûl Paşa

Hewadîsê Türkîya û Reayeyê Ecnebî

Ebas Hilmî paşa Li Estenbul da

Şirketê Cister û Teşebupata wî li Turkeya da

Teşrif ..

Hewadîsên Kerkûk

Lutfî Xuda Mewahîbî Rehman Mearîfe/Şihir

Ehmed Fewzî

Kurdistan/2

Qerarê Meclîsê Millî û Efûya Ali Milûkane

Bimin çi?

Hewadîsê Daxilî

Teayîn ..

Îbqa ..

Ehmed Sebrî

Zêwer

Jimar: 5

Babet

Bo Wetan Cudekan

Ya Pîrî Terîqet/şihir

()

Hesbehâl/şihir

Îcreatî Beledîye

Ey Muneweran û Hemîyetmendân

Ehmed Faîz

Nûser

Refîq Hilmî

Refîq Hilmî

Ehmed Sebrî

Ehmed Fewzî

Umîdî Îstîqlal

Jimar: 6

Babet

Bê Mewzûey

Biterz Qedma/ şihir

Ziyareta Xelîfey İslam

Neşrê Xezete

Qumandanên Îtîlaf Ji Estanbûl Diherin

General Harîngton Li Estanbûl Royîşt

Ezîmetî Hezretî Melikê İraq bo Mûsil

Cimhurîyeta Türkîya

Mîadî Muzakere Derheq bi Mûsil

Taymsê Bexda

Hewadîsê Daxilî

Ezîmet

Muherrîr

Qisey Evro

Nûser

Refîq Hilmî

Refîq Hilmî

Ehmed Fewzî

Jimar: 7

Babet

Elxan Haf
Şihri Zemanê/şihir
Xeberatê Erebe
Xeberatê Türkiya
Xeberatê İnan

Texmîsî "Bitarz Qedma"/ şihir **Arif "Urî"**

Jimar: 8

Babet

Bûn û Jîyan Be Jerweteweye/1 **Adil Efedî**
Texmîsî Rubaiyî Mewhwî Efedîyî Merhum
Ehmed Fewzî
Qewmîyet Le Fewqî Kullî Şitêkeweye
Erebî Şîhr/ wergêdirawe
Hikumetî Millîye Faydey Çîye **Refîq Hilmî**

Jimar: 9

Babet

Melik Feysel: Hikumetî Erebe Bo Turk
Zerere Ya Nefea **Refîq Hilmî**
Miqalee Mexsusê: Kerkûk Û Hewalîsî Ahalî
Refîq Hilmî
Mihirtmesnk Nezar Diqetlirîne
Hewadîs
Tercemey Kelamî "Seadî" Seadî Şîrazi/ wergêranî :
A Ş

Jimar: 10

Babet

Türkîzim, İngilîzçî, Wetenperwer Çîn Û Milletî
Kurd Beçî Malwêran Bû? **Refîq Hilmî**
Mûsil Kililî Şerq Ewseta (Wergêdirawe)
Abide Bo İsmet Paşa
Qezay Otomobil
Medalîyey Kemalîye
Hikumetî Elman Memuran Kem Dekatewe
İxtîlal Le Bulxariya Û Xelîhkirdinî Kral Boris
Mîstefa Kemal Paşa Le Xwar Qanunewe
Şahî İnan Le Bexda

Jimar: 11

Babet

Şîasiyat: Muşabehet **Nûser**
Muşkîley Musil **Refîq Hilmî**
Texmîsî Leser Xezelî Wafî/Şîhr **(Wergêdirawe)**
Bûn Û Jîyan Be Şerweteweye **Adil Efedî**

Jimar: 12

Babet

Şîasiyat: Heq û Heqîqet **Nûser**
Îrtihalî Muesîf **Refîq Hilmî**
Bolşewîkêti Le Estembûl
Haşimî Û Riyasetî Wezera
Heleb
Exbaratî Türkiya
Hewadîsî Türkiya
Serdî Eazemî Sabîqî İngilîz
Hewadîsî Şerq: Exbaratî Türkiya

Jimar: 13

Babet

Heleb û Kurdistan **Nûser**
Türkiya İtîhamî xiyaret **Refîq Hilmî**
Ehwalî Türkiya
Qabîney Tazey Êraq
Kurdîş heqî jîyanî heyê **Zêwer**

Jimar: 14

Babet

Îfadey Mexsûsî **Nûser**
Xeberatî türkîya **Hisên Nazim**
Roma: Feyzan
Suferay Ecnebî Merkezîyan Neqil Dekirê bo
Enqera
Hikumetî Enqere Mehkemey İstîqlal bo
Estanbûl Denêrê
Umîd İstîqlal Türkçe Qısmî: **Hisên nazim**
Haware le dest elxaq bedgoyan û muzewîra
Hisên nazim
Qisim Farîsî umîd îstîqlal: **Hisên nazim**
Xeberêkî Exîr
Li turkyada rojî cumhe teatile

Jimar: 15

Babet

Bo Cenabi Mudiri Umdî İstîqlal

Reisê Daxilîye Iraq

Bedexlaqî Baeytî Bê Îşûkarîye **Hisên Nazim**

Telsiz Telgirafî Turkyâ

Turkyâ Ligel Polonya İtîfaq Dekâ

Nihayetî Texlîyey Estanbûl

Muzakerey Elman Û Ferense

Ferense Derheq Be Elman Şubhey Heye

Îcraatî Mehkermey İstîqlal

Xesaratî Zelzeley Japon

Kolonêl Macan

Umîd İstîqlal Turkçe Qismî: Hasbihal

Hisên Nazim

Jimar: 16

Babet

Zemanî Xeflet Royî Weqtî İntibah û Têbesurre

Hisên Nazim

Le Starey Îranewe:

Lem Zistaneda Bolşewîk Herekat Dest Pê Dekat

Qahîre

Meclîsî Tehaluf

Qisem Farîsî Umîd İstîqlal: **Hisên Nazim**

() **Umîdî İstîqlal**

Yareb Çe Etş Ayn Kaftade Dircihan Şed/Şîhr

Bêxud

Aetzar

Jimar:17

Babet

Ax Bo Bedbextî Kurd

Şerê İngiliz Û Efxenîstan

Mûsil

İxtîlafatî Serhedî

Sûey Qesd Be Mistefa Kemal Paşa

Menhî Firoştîni Esîfhe

Muahedey Turk Û Macaristan

Muellîmîni Fransewî Bo Osmanî

Qabîney Emele

Umîdî İstîqlal

Nexoşiy Wenzelos

Le Estenbûl Mumesîlî Bîranya

Protestoy Elmanya Bo Ferense

İstîhfay Musyo Wenzelos

Le Bîranyada Emeley Bêiş

Emrika Le Îranda

Mister Xandî Texliye Kira

Nûser

Kurdêk

Çetey Le Felestîn

Teyare Le Îran

Wenzelos Detiwanî İstîhfâ Bikat

Hisên Nazim Efendî

Silêmanî Û Eraq/Turkî

Umîdî İstîqlal

Umîdî İstîqlal

Jimar:18

Babet

Londre

Elmanya Î Ferensa

Êraq Û Qabîney Emele

Turkyâ Û Awistrya

Le Meclîsî Lordekanda Muahedenamey Lozan

Bo Meseley Mûsil Murexesekanî Turk

Meclîsî Eskerîy Turkyâ

Le Beynî Estanbûl Û Paris Postey Hewayî

Muzakerey Mûsil

Le İngiltere Teqînî Bomba

Mîsir

Hîndistan

Bo Dûr Welatîyekan

Duey Xalisanew/Şîhr

Bo Mektebliyekan

Îlhan

Silêmanî

Zêwer

Midirîyetî Edadî

Qumandanî Merkez

Jimar: 19

Babet

Neft Û Şemendofrî Îran

Le Meclîsî Awamda Wezhiyetî Qabîney İngiliz

Le Turkiyada Mumesîlî Tazey Bîranya

Ferense Û İngiltere

Cemhuriyetî İran

Reisî Cemhuri Emrika

Hikumetî Bolşewîk

Resmî Emîtihey Elman Le İngiltere

Tax Û Mucewheratî Îran

Meseley Boxazekan

Cemhuriyetî Bulxar

Meclîsî Mebhûsanî Êraq

Nusqî Daxliye Naziriy İngiliz

İxtîlal Le Kîna

Siyasetî Musteqbelî Mîsir

Londre

Estanbûl ..

Pûlî Taze Le Turkiyâ

Siqûtî Qabîney Belçika

Mûzakerey Mûsil

Muahedey Lozan

İstûhfayî Qabîney Belçika

Belçika Û Feranse

Nûser

Nûtqî Mistefâ Kemal Paşa
Xelafetî Îslamiye û Ereb
Tebhîdî Xanedanî El Ujman
Bombarduman
Lebeynî Qelasêwke û Sûrdaşa Şerr
Pûlî Tazey Kurdistan

Jimar: 20

Babet **Nûser**
Qesîdey Medhîyan û Duay Xalisanem
Mihemed Arif "Urfî"

Le Xezetey Heyatî Îranewe..
Mektebî Teyare
Le Beynî Turkîya û Elmanya
Hereketî Şahî Êran
Muahedey Lozan Le Meclîsî Lordekanda
Cemhuriyeyî Êran
Ekserî Brtînya Çe Weqtî Le Êraq Derdeçê
Le Yonanda Çî Heye
Teşebusatî Maliye
Ciwab Midîr Şefeç Sirx/Farisî
Pûlî Kurdistan
Biço Axa Tê Bigeyêne
Îlan
Îlan

Jimar: 21

Babet **Nûser**
Sîyasetî Britanya Derheq Êraq û Felestîn
Meclîsî Mebhûsanî Brîtanya
Muzayegey Maliye Le Feranseda
Texlîyey Mehbûsînî Estanbûl
Mûsil Le Enqereda
Bombarduman
Ta Wabê Hewa Debêt
Daîr Be Meseley Efxanistan
Le Ezmîrda Meclîsî Ekserî
Le Yonanistanda Çî Heye
Elhwalî Êran
Be Teyarey Herb Dewrkirdinî Erz
Le Meclîsî Mebhusanî Îran
Le Arnawudda Birsîyeyî
Le Mabeynî Ferense û Brîtanya
Îtalya û Muahedenamey Lozan
Feranse Bo Tefregey Îslam Seay Dekat

Jimar: 22

Babet **Nûser**
Muşahedanî Xeribe
Brîtanya Le Feranse Emîn Niye
Weliehdî Êan Seray Xoy Terk Dekatewe
Le Rusyeda Japonyekan
Emrîka Zemanî Herb Lêk Dedatewe
Le Beynî Dû Refîqa Muhawere **M: J**
Îlan **Daîrey Polîsxane**

Jimar: 23

Babet **Nûser**
Heyat Çilon Serf Bîkrê/1 **Reşîd Zekî**
Le Nezer (Mîster Fişer)Da Muahedenamey Lozan:
Meseley Turkîya û Mûsil..
Le Turkîyada Çî Heye
Ciwabî Xezetey Eleraç
Îrtical

Jimar: 24

Babet **Nûser**
Elmanya Tefîşatî Ekserîye Qebûl Nakat
Reşîd Zekî
Le Dewaîrî Resmîyey Feranseda Reddî Ciwab
Reîs Nuzarî Êran Reza Xan
Le Turkîstanda Îxtîlal
Îxtîraekî Mudhîş
Muzakerey Mûsil Çe Weqt Dest Pê Dekat
Îltîhaqî Sûdan Be Mîsir
Beyanatî Sultan Abdulmecîdxan
Xelîfe Abdulmecîdxan Le Siwid Dadenîşê
Emrîka Deh Mîlyon Dolar Qerz Be Êran Deda
Heyat Çilon Serf Bîkirê/2
Le Beynî Japonya û Emrîka
Daîr Be Meclîsî Rûs û Brîtanya

Jimar: 25

Babet **Nûser**
Tesdaqî Muahedenamey Lozan
Feranse û Yonan
Xeberatî Bexda
Sîyasetî Partiyekan û Bolşewîk
Meseley Mûsil
Xeberatî Daxilî
Umîd Îstîqlal Türkçe Qismî: Tayarelerden Sukre
Tayarî
Îstîqlal:(Aşûrî-Faerşke)

PERAWÊZ Û SERÇAWEKAN

1. Si. Cî. Edmund, Kurd û Turk û Ereb, Tercûmetu Circîs Fehullah, Bexdad, 1971, s ,275
2. D. Welîd Hemdî, Elkurd we Kurdistan Fil Wesaîqîl Bîrtaniye, London, Bela, s, 170
3. Heman Serçawe, l, 169
4. Kurd, Turk û Ereb, s, 287, 288, 289, 292
5. Helo, Ruwun Kirdneweyek derbarey Hendîk Le Basekanî Çîm dî, Beyan, "kovar" Bexdad, j: 5, Kanûnî duwemî 1971
6. Elkurd wel Kurdistan Fil Wesaîqîl Bîrtaniye, s, 168
7. Beserhatiwe Kaka Reşîd Şewqî "Serguzeste" l, 49, destext.
8. Heman serçawe laperew, Ehmed Xoce, Çîmdî, b, 2, Silêmanî, 1969, l, 19-17
9. Beserhatuef Kaka Reşîd Şewqî, l, 49
10. Kurd, Turk û Ereb, s, 296
11. Elkurd wel Kurdistan Fil Wesaîqîl Bîrtaniye, s, 170
12. Kurd, Turk û Ereb, s, 294
13. Elkurd wel Kurdistan fil wesaîqîl Bîrtaniye, s, 17-171
14. Kurd, Turk û Ereb, s, 296, Çîm dî, b, 2, l, 31
15. Elkurd û Kurdistan..., s, 170, Çîmdî, b, 2, l, 33 - 36
16. Kurd û Turk û Ereb, s, 296, 297, 301, 304
17. Elkurd û Kurdistan .. , s, 172
18. Heman serçawe, l, 174
19. Heman serçawe, l, 174
20. Kurd û Turk û Ereb, s, 301
21. Heman serçawe, l, 304
22. Elkurd û Kurdistan... , s, 174
23. Ew şarçolkirdiney ewane le naw xelkî ew kate û rojnawewanî serdemeke da be " Riwiştine ûmûmiyeke" nasirewe. Bo ew birwane: Hacı Mustefa Paşa, "Jiyan" "Rojname" Silêmanî, j, 18, 27, Mayıs, 1926, l, 1
24. Kurd û Turk û Ereb
25. Elkurd û Kurdistan
26. Çîmdî, b, 2, l, 44, 45
Belam Edmündiz, nûsiyewe, 11/ 7, geyîştinewe " heman serçawe, l, 309" Şêx, be qisey Ehmed Xoce, kele, "Xemze"y nizîkî şar bûbî, hiç rê tê naçî, 24 roj diway golkirdinî Silêmanî, le layen Îngilizekanewe çuwîbîte naw şar, le katêk da serkirdekanî wek Seyid Muhemed Efendî û Kerim Beg û Şêx Heme Xerîb Zo Xoyan, giyandûwete şar nawiyan le tomarî xercî huzeyran be ewawey şarewanî Silêmanî da hênrawe. Hiç kosp û hoyekey gewrey-iş bo em direng çûwîney Şêx le arada nabînim "birwane: dengî dehol le dewir xoşe, "jiyan" j, 7, 4, mart 1926 û, elkekanitîrî
27. Elkurd û Kurdistan.. , s, 175 - 176
28. Heman serçawe , l, 176
29. "Umîdê Istiqlal" "Rojname", Silêmanî, ja, , 20 Eylul 339
30. Çîmdî , b, 2, l, 47, 55, 57, Kurd, Turk, Ereb, s, 309
31. Elkurd û Kurdistan, .. , s, 177
32. Eddîktor, Fazil, Huseyn, Muşkulatul Musil, t, 2, Bexdad, 1967, s, 38 - 39
33. Kurd, Turk û Ereb, s, 272
34. Heman serçawe, l, 332
35. Elkurd we Kurdistan .. , s, 178 - 179
36. Kurd û Turk û Ereb, s, 313, Elkurd û Kurdistan, .. s, 177
37. Kurd û Turk û Ereb , s, 313
38. Heman serçawe, l, 326, Elkurd we Kurdistan..., s, 177 - 178 , Yaddaştekanî Şêx Lefîf ê Hefîd le ser şorişekani Şêx Mehmûdî Hefîd, Kemal Nûrî Me'rûf Saxî kirdiwetewe, ç, 1, Dihok, 1990, l, 11 - 112
39. Kurd û Turk û Ereb, s, 316
40. Heman serçawe, l, 332,
41. Heman serçawe, l, 335
42. Heman serçawe, l, 338, Kemal Mezher, Galtew Geltep û Gemekanî Nêwan Şêx Mehmûd û Firokewane Îngilizekan, "roşinbîrî nûwî" "govar", Bexda, , j, 136, 1990
43. Kurd û Turk û Ereb , s, 34, 341
44. Heman Serçawe, l, 327
45. Ebdurezaqul Husnî, Tarîxul Wezaretul Iraq, t, 5, l,c, Beyrut, 1978, s, 205, 227
46. Umîdê Istiqlal, j, 19, 20/3/ 1340, j, 20, 277 3/ 1340
47. Çîmdî, b, 2, l, 52 - 53
48. Umîdê Istiqlal , j, 20, 27, 3/ 1340
49. Kemal Mezher, Geltew Gep we Gemekanî Nîwan Şêx Mehmûd, we Firokewane İngilizekan û, Çîmdî, b, 2, l, 58, 60
50. Kemal Mezher, Geltew Gep we Gemekanî...
51. Çîmdî, b, 2, l, 58, 59
52. Kurd û Turk û Ereb, s, 348, Tarîxul Wezaretul Iraq, c, 1, s, 272, EbdulEzîz Yamulkî, Keşful En Bexdul Weqaiqîl Iraq, l,c, Bexdad, 1907, s, 12, 20
53. Çîmdî, B, 2, L, 64
54. Çîmdî, B, 2, L, 50
55. Kemal Mezher, çîmçîk, le Mêjûwî yekem Çapxaney Kurdî le Şarî Silêmanî, Rewşenbîrî nûcî j, 7, Teşrînî yekemî 1979
56. Heman serçawew, çîmdî, b, 2, l, 52
57. Çîmdî, b, 2, l, 52
58. Cemal Xeznedar, Rojî Kurdistan 1922 - 1923 , Bexda, 1973, l, 62
59. Cê bas e, Ehmed Xoce le heman Bergî, Çîmdî, l, 49, 50, 52, da nawî em taqe çapkirey rojnamekey be "Mihemed Zihni" hênawetewe. Naşê be heley çapporanê, çünke çuwar car bew şêweye nûsrae. Keçî le lay berêz Dîktor Kemal Mezher, wek lew tareyda nîşanî dawê, tuwiye ew nawe " Mihemed Zuhdî "buwe. Min pişt bestewwû bem zaniyariyewey diway, emyanim be durustir zanî û cêm

- kirdiwe. " Mihemed Zihni" nasirawiniye. Herçî
 "Mihemed Zuhdî ye kesikî nasraw bûwew,
 dewranî duwem hukûmetî Şêx Mamostay
 Qutabxaney "E'dadî Mehmûdî" bûwe birwanc. Cenal
 Xeznedar, Bangî Kurdistan, Bexda, 1974, l, 110,
 60. Dr. Kemal Mezher, Çimçik le mêjûwî yekem
 çapxaney Kurdî le şarî Silêmanî
 61. Umîdê İstiqlal , j, 8, l, 1
 62. Çîmdî , b, 2, 55 - 61
 63. Birwanc em wîtare: Sidîq Salih, şarewanî
 Silêmanî we Xercî Kîştanî Sêyem Hukûmetî
 Kurdistanî Cinûbî, "Kurdistanî Nûwî" "Rojname"
 Silêmanî , j, 2305, 17/ 11 2000 we, j, 2307, 19/ 11/
 2000 we , j, 2308, 20/ 11 / 2000
 64. Umîdê İstiqlal, j, 16, l, 4
 65. Umîdê İstiqlal j, 17, l,4
 66. Refîq Hilmî, Yêddast, beşî duwem / b, 5,
 Hewlêr, 1988, l, 10 - 107
 67. Umîdê İstiqlal j, 3, l, 2 -3 we, j , 4, l, 3
 68. Umîdê İstiqlal, j, 5, l, 3
 69. Nahîde Refîq Hilmî, Refîq Hilmî we
 Rojnmaenûsîn, Rewşenbîrî Nûwî, 130, 1994.
 70. Yaddast, beşî duwem / b, 4, l, 143 - 149
 71. Heleb û Kurdistan, Umîdê İstiqlal, j, 13, l, 1 - 2
 72. Heq û Heqîqet , Umîdê İstiqlal, j, 12, l, 1
 73. Hukûmetî Milliye Faîdey, Umîdê İstiqlal j, 8, l, 4
 74. Umîdê İstiqlal, j, 14, l, 1
 75. Zemanê Xeflet Rûyî Weqt, Întîbab ê Tebsure
 , Umîdê İstiqlal "j, 16, l, 1
 76. Bed exlaqî Baisî Bî îş û kariye, Umîdê İstiqlal,
 j, 15, l, 2
 77. Kemal Reûf Mehmûd, BE Bekgewe,
 Xwindinewikî rastî rojnamewan Huseyn Nazim,
 "Nivar" govar Silêmanî , j, 2, Hawîni 1998
 78. Umîdê İstiqlal, j, 8, l, 1, 2
 79. Refîq Salih, govarî Diyarî Kurdistan " 1925 -
 1926" Lêkolînewey Newşîrewan Mustefa Emîn û
 Sidîq Salih, Silêmanî , 2001, l, 57 - 58
 80. Eger çî Em Lêkolîneweye taybet be Umîdê
 İstiqlal c belam le ber ewey ke j , 14, y "Bangî
 Kurdistan we jimarekanî Bangî Heqîş legel em
 rojnameye da çapkirawenetewe. be pêwîst zanra
 jîyanemey nûseraniyan binûsrî û pêrist bo
 babatekanîşman bikrê.
 81. Kemal Reûf Muhemed xwindineweyikî nûyî
 Hefîdzade Şêx Mehmûd, "raman" govar Hewlêr, j,
 31, Knûnî Duwemî 1999, tarîxil Wezaretil İraqiye,
 c, 1, s, 274, we, c, 3, s, 73, 134, we, c, 6, s, 32, we,
 c, 9, s, 69, m, Hawar, Şêx Mehmûdê Qereman û
 dewletekey xuwariwî Kurdistan, b, 2, Linden,
 1991, l, 782 - 783

Wergerandina ji soranî: A. Meretowar

Bedelê abone be 3
mang du rupyê,
be şeş mang 4,
be salîk, 8 rup ye

Midîrê mesûl:

Xoce Efendîzade

Ehmed Sebrî

UMÎDÎ ISTIQLAL

Be dîrîk 3 ane de stîrîte.

îlanat : be dîrîk 3 ane
distîrît

Xudaya bese êtir labîrî diçûr izmihlal:
Tulûte pê bike xurşîd û belk îstîqlal
Legel xulyay hicret be ser çû umîrşîrînim:
dema nûbeê wisale ey Umîdê Îstîqlal

Û hemû şîtk muraceut
Be midîrê xezetey dikrî

*Siyasî, edebî, ictimaî xezeteykî resmî ye
Hefteê carîk derdîçî*

Nusxeykî be yek ane defroşrî

Tarîxê intîşar: /20 Eylûl 339
Silêmanî

Sal 1, jîmare 1, Pêncşenbe, 9 Sefîrul Xeyr 342, / 20 Eylûl 339

Sultanê Sabîq Turkiya Efû Dekirî

Estanbol 22 Mine - Ji ber peymanana Sewrê, ku îmze kiribûn, Sultanê berê yê Turkiyeyê, digel Serokwezîr Damad Ferîd Paşa, ji efûya giştî ku piştî şanewavkirina peymanê hatibû îlankirinê, îstîfade nakin. Şamilê ewan nabe xeber dane Enqereyê..

Necme/30 Axustos û 83 jîmare mewadê peymanana Lozanê û lahiqeyê wan.

Îtîfaqnameyê Texliyeyê Erazîyê Turkiya û Hudûdê Iraq

Bexdad Taymîs - Lehul muqtem we werikrufuwe li ser xusûsê texliyekirina erazîyê Turkiya û hudûdê Iraq û rewşa nû ya boxazan piştî peymanana Lozanê, lahiqeyên wan ku feyde tê de heye, li jêrê hatiye nivîsandinê:

Ew ên ku îstîfa kirin, murexesên hukûmeta Italya, Frense û Bîrîtanya ku niha hin eraziyên Turkiya di bin dagirkirinê de ye, û murexesê Meclîs û Wetenî ya Enqereyê ku digel milleta xwe dixwazin sulh bibe ji bo ku tedbîra muwefeqiyetê bigrin.

Texliyeya Eraziyên ku Hatine Dagîrkirî

1. Li gor weqtê wê hingê ku hukûmeta Enqereyê bi wasîteya wan murexesan ku li Estenbolê bûn, pêşkêşî hukûmeta Muttehide kirin, ne peymanana Lozanê û ne jî heqdayinan qebûl kiriye. Orduya dewletên mutehide, dê dest pê bike texliyekirina wan eraziyên ku di bin dagîrkirina dagîrkeran de ne, û ev meseleya texliyekirinê, qene Behra Mermere û Boxazê Estenbol çiqas aidê quweta eskerîye û behriye ya Italî, Frense û Îngiltere ye.

2. Texliye wê di şeşê mehê de biqede.

3. Di wê texliyeyê de, ew eşyayên ku bûye yê Türkiya û ew eşyayên menqûl û ne menqûl ên Türkiyayê ku halê hazir bi destê wezîfedarên îtilaf da ye dê bête teslimkirin. Peymana Giştî ya Türkiyayê, meseleya musadere û weziyet û enwaê van lexiw dike. Gava ku vê muameleya weziyetê rakirin, dê li ser vê xusûsê zabitnameyekê tenzîm bikin. Ew zebitname jî di meqamê sinda dibe, wezîfedarên dagirkeriyê, ewan eşyayên Türkiyeyê ku pere bin, şirketa Osmanî û şeşsên haiz, dê bi temamî îade bikin. Ew ferz û muamele jî ku di navbera wezîfedarên dagirkeriyê û şeşsên madiye da mutabiq kirine, şertên xwe yê teneswiyeyê dikan.

4. Bi mûcibê wê îttifaqnameyê ku di / 30 Teşrîna 918 de li medrasê eqdê û heta wekû niha meqbûl bûye, wan salên huriyetê ku aidê Hukûmeta Osmanî bû, - Zirhli Sultan Suleyman - daxilê hemû sileh û muhîmat û sair hemû tiştên din li Hukûmeta Türkiyayê îade kiriyê.

5. Mudetê texliye yê ku di xalên vê peymanê de hatine beyankirinê, ji bo îttifaqnameya eskerî, ya Mudanya ku di Teşrîna Ewil 922 de hatiye qebûlkirinê, bi destê wezîfedarên Türk û îtilafên muşterek tedbîrên ku lazim in dê bêne girtinê, ku di zerfê vî mudetî de dev jê berdin, di hemû bûyerên ku biqewimin de dibe ku bibin. Ji bo îtinaya texliyeyê meseleyên din ên ku bûyina wan muhtemel be, bi wî şertî ku wezîfedarên türk, li wezîfedarên îtilafî guhdarî bikin û hel û fesla meselayan bikin.

6. Hukûmeta Türkiyeyê qebûl kirye ku tebayê wan hukûmetan li ser hukûmên wan întizarî neke ji bo tedbîqkirina peymanê sulhê û îmze kir ku jê îstifade bikin. di ehkamên xalên "69, 77, 72, 91"

û ew mudeta muayeneyê ku di xalên " 72, 91" de ye, mulahezeya wê nayê kirinê, ji ber ku dest pê nehatiye kirinê û bi dawî bûye.

Necme / 3 Eylûl 339 jimare 831

Hukûmeta Tûrkiyeyê teehud dike ku adetê ehkamên xalên " 137, 138, 140" bike û vê mewadê li pêşiya xalên " 75, 81, 87, 102, 103, 102, 157" .

Hudûdê Iraq û Tûrkiyayê

7. Hukûmetê Turkiya, ji Îngilîz dipên ku peymanê Behriyeyê bikeve tedbîqê û li gorî xalên 3, 20 hidûdan rast bikin.

Di vê xusûsê de her du duwêl teehud dikan ku qitamî hîç hereketê nekin ku weziyet biguhere û ev her du hukûmet, neqreyê ewil ên xalên "20, 3," ku li ser rewşa muzakereya hudûdê Iraqê ye, bixine ber nezerê piştî qedandina texliyeyê jî pê bikin ku ehkamên xalan ji destê wan bikeve muzakereyê ku muwafiyeta her du la xiretetve nû mank.?

Xeraîb

Ji bo tabîna istiqlaliyeta qewmê kûrd, destpêka herba ûmûmî heta niha, deh hezar qurbanî da. Bêhesab jî talanî bû.

Niha malûmatê mîlet ev hukûmeta meşxûl bikare qûtezan elbete edalet, rêka xwe edzûtibewe? Xuda kerîm e.

Umîdê Istiqlal

**Rûniştina Eskerê Îtîlaf
Li Tûrkiyayê**

Ednan Beg, ji Wekaleta Hukûmeta Tûrkiyayê teblîx kir ji murexesan re îtîlaf li Estenbolê ku peymanê Lozanê di / 23 Agustos 331 de resmen xitab şandiye. Ew roj destpêka mudetê texliyeyê ye.

24 Mine - Piştî wê telgirafê, ku ji Estenbolê hatiye, şeva 24ê Mine hol caran 3 papûrê Îngilîzan esker neqil dike ku dest bi texliyeyê bike. Texliyeyê temam kir û piştî xeberekê ku di wê tarîxê de ji Maltayê hatiye, dide nota rûpyal sofîrîn. Papûrên behra muhîta Etîlasê ve çûne Londrayê.

Ji eşrafên muteber ên Silêmanî, cenabê Hacî Melame Efendî bi raya temamê tucaran bû reîsê ticaretê. Riyaseta mearîf û nafîe tayîn kir. Bi navê kurdan niyaz Kubadî muwefeqiyetî dike.

Teşkilata tedwîra umûrê memleket, bi raya meclisa ûmûmî dike. Ev meclis, di jêr riyaseta naibê hukûm de teşekul dike. Hesbul zom Hezretî Melikê muaezem li huzûra xo de ictima pê kir.

Ev meclis ji van ruesa, eşrafên memleket îbarete e ku li jêrê hatine nivîsandinê.

Azayên Tabîî

Reîsê Daxiliye:

Şêx Muhemed Xerîb Efendî

Reîsê Maliye û Guymrukê:

Seyid Ehmed Efendî

Reîsê Mehkemeyê: Marûf Efendî

Reîsê Ticaret û Mearîf û Nafîyê:

Hacî Mela Seîd Efendî

Qumandanê Eskerî:

Riza Efendî

Eşraf û Muntexibê Ehalt:

Hacî Mela Seîd Efendî

Muhemed Axayê Ebdurehman **Axa**

Muhemed Beg Qadir Paşa

Hacî Ehmed Hacî Kerîm

Mela Huseyn Efendî

Hacî Îbrahîm Axa

Hacî Emîn Hacî Ezîz

Hacî Rehîm

Hesen Binewş

Tertîbatê Daireya Mulûkan

Yawer û Serkatib:

Cenabê Seyid Ehmed Efendî

Katib:

Cenabê Ehmed Besrî Efendî

Zabtî emîr:

Cenabê Mulazimê Ewel Macid Efendî

Qumandanê bolûkî muayenet:

Cenabê Muhemed Efendî

Heyata din ji paşî digrin.

Mamûrê Mesrefên Daireya

Mulûkan:

Şerîf Axa

Midûrê Misafirxan:

Seyid Axa

Serxedeme:

Şemseddîn

Ji bo wezîfeyên cûda

Îlaweya wezîfeyên eskerî, midîriyeta emniyeta ûmûmî, bi cenabê qidemlî Yuzbaşî Seyid Riza Efendî hatiye ter-cîhkirinê.

Ziyaret

Xebera roja cimeyê, ji rojên din pêştir e, çi kesê bixwaze ziyaretê bike, divê mureceet bi .. serkatibê Hezretê Melikê muazem bike. Mêvan jî tabiyê vê programê ne.

Umîdê Istiqlal

Îrade

Li itbaya xizmetkar û memûrên min, her kesê xedîr an neheqiyekê kir, bê teredût bi serbestî bêt mureceet bi dîwana herbê bike, amirê wirê, li dîwana herbê doz dîke, kesên ku li millet û ehalî xedîr an neheqiyê bike, bi cezayê şedîd tê cezakirinê.

**Melikê Kûrdistan
Mehmûd**

Di van încilabên dawî de li hember van hinek qismên makîneya çapê "seqet kiribû, mudetîkî xezete nikaribû neşra xwe bikira, vê carê bi wasîteya kar û himeta çend westeyan çap kir û destê tealî mizgînî bi neşra xezeteyê kir. Bi xwestina hemû biraderên kurd û hevraman bi wasîteya Umîdê Istiqlal, ji ber wê neşra heqîqet û mudeaya huqûqê çapê hêjayî iftîxarê ye. Ji bo alîkariya hemû xebêrdaran li ser vê xusûsê spas dikim.

Ehmed Sebrî

Îlan

Mamûrên daireya limûdiwaebî seet ji yekê (1) sibehê heta seet 5an û saet ji 7 an heta saet deh û nîvê (10. 30) rojê, li daireyê li ser wezîfeya xwe ne, îfaya

wezîfeyê dîkin. Her mamûrê pişt vê dewam û îlanê hereket bike, yomîya wî tê birînê û heta ceza jî tê dayînê.

Îlan

Ji roja teşkilata hukûmeta hazir a millî heta di hudûd erbeey (çarem) xwe de, bi qederê serê zerreyê ji aliyê yek şexsekî ve hîç tu kesek xeir û neheqî û tecawizî huqûqê hîç kurdekî nekiriye. Di rojên pêş de jî, em umîdwar in ku ji ber tertîbatekê ku tişteki weha were meydanê hîç haletek ku milletê kurd pê biêşe çê nebe.

Umîdê Istiqlal

**Tertîbat û Teşkilatê Hazire Bo
Muhafezeya Huqûqê Milliye**

Her bi vê halî, bi Umîda Istiqlalê, ji bo heqê heyatê û îhyayê xaka pak a muqedes a Kurdistana xwe, fesa û heta axirê nefesa xwe xebat û kar bikin bi mexasimên me neşir dîkin.

Kurd

Îlan

Xaniyek ku li mehela Guwij e li waqîe etrafê erbe ye bi xaniyê Hacî Ebdullahê Beqal û Seîd dariniş û Kerîm Efendî û Şeqîm mehdûd e muştêmilatê ibarete li jorê, du ode yek eywan û textaniyek erte û hewşek û bi tapû û milkê Reûf Efendî kurê Circîs û Ehmed kurê Reûf Efendî û Seîd Heme Elî Lîfe dîr û Reûf kurê Seîd Heme Elî û Esmê û Eşmse keçên Seîd Heme Elî Lîfedîr weledil keşf ew xanî ye. Çûnkî

qabiliyeta teqsimkirinê tune. Mucibê finûnên mexsûs bû. Îzaleya şuy û firoşitinê piştî tenzîl mesarifê itmanê hasil ê beynî şureka teqsim bikerî li tarîx iazerê bo ihaleya ewil elel usûl wezih mizayide kirawe, her kesê bo kirînê talib e ligel sedî deh temînat bo pê mureceet bi muhakemaya bidayetê Sileymanî qismê sulh û munadî Tewfîq Axa bike.


Îlan


Bo wanên ku xezeteyan bo enwerî û waneyê xoyan talib abone bin, lazim e pêş ve sewa mungêk û paşê şeş mang pare bişînin ku meel iftixar navê wan qeyd bikin.

15 Eylul 339

Reîsê Mehkemeê Bidayetê Silêmanî

Marûf





Zarê Kurmancî

25/5/1926-23/7/1932

(Yekemîn Kovara Kurdî ya Bajarê Rewandizê)

Amadekar û Pêşekî: **Dr. Kurdistan Mukrîyanî**

Wergerandina ji soranî: **S. Veroj**

Sereta

Di dawîya Şerê Yekemîn ê Cîhanî da, di encama bi ser çend dewletan da dabeşkirina Îperatorîya Osmanî da biryar ew bû ku kurd li başûrê Kurdistanê xwedî deshelatekî navçeyî bit.

Huznî Mukrîyanî eve bi fersend dizane bo ku bi hoyê çapxaneyê xwe destek bidate roşinbîrê kurd, bona vê di sala 1925an ji Bexda vediqete û sala 1926an da li Rewandiz nişteci dibe û ew amêrî çapê ku bi xwe ra hênabû, tê da dadimezrêne û navê çapxanê *Zarê Kurmancî* lê dadinêt.

Her ligel cîbûna Huznî li Kurdistanê, hewlê derhênana koverekî bi zimanê kurdî daye. Li encam da bi pê nûsîna jimar 4261 30 Adara/1926 ê ya wezaretê navxwe ya Bexda moletê derhênan koverekî mangane komelayetî,



Husên Huznî Mukrîyanî
xwedî û sernûserê kovara Zarê Kurmancî

mêjûyî, hunerî û wêjeyî yê kurdî bidest dixat, bi mercêk babetê ramyarî tê da neye belavkirin û li basêk da nedivêt ku bibête hoyê ciyawazî û dûperrîya dînî û neteweyî ... (binêre paşkoy jimare 1).

Huznî navê kovarê jî her bi navê çapxanê *Zarê Kurmancî*** danîte, her çi qas li rualet da wateya *Zarê Kurmancî* digeyenêt¹ jî, belam di naverok da wateya(jîn û girîn û zarî kurd) dibexşînêt, herwekî Hamilton di nixandinek derbarê berhemê da bi wateya duyemîn dide nasandin².

Huznî hoyê damezirandina çapxaneyê bi vê cûre ronî diket:

Li cîyê metbea hebê xudperestî naye firotin, li cîyê ku ew hebê, metbea nabê. Ev serdema em têda dijîn, serdema

serkevtin û berzbûna îlim û fen e, serdema teelîf û kitêb û neşrê mearif û çapemenî ye, xwendina wan jî her bi çapxane dibêt. (jimare 23, rûpel 3, 1930).

Çapxaneyê Zarê Kurmancî yekemîn çapxaneyê kurdî tete jimartin, ku kurdêkî bi pare û pûlê xwe kiribêt û li Kurdistan da damezirandibêt û her weha ev çapxane, ku di sala 1948 da ji aliyê Gîw Mukrîyanî yê birayê Huznî Mukrîyanî ve navê *Çapxaneyê Kurdistan* tete lêkirin, bi tementirîn çapxaneyê kurdî tete danîn, ku heta nûha jî her li ger da ye.

Huznî Mukrîyanî xwedî îmtiyaz û birêvebirê *Zarê Kurmancî* bûye. Ebdulrehman Gîwî birayê wî heta jimara (16)yê sala 1929 birêvebirê kargêrîya kovarê bûye, her wekî ji wî(bo agadarî) hatiye, ku li vê jimarê da çapkirîye û dibêjit:-



** Hemû jimarên kovara *Zarê Kurmancî* û kovara *Rewandîz* li salên (1977-1983) li aliyê Kak Etar Heyderî bûn, weha diya re berê li dawîya malawayîkirina bavê min behîştî Gîw jê xwestibûn, dawîya pênc sal piawane emanetê wî bo bine-mala Mukrîyanî hate vegerandin.

¹ Huznî nûsiye: - sebebê resîsê *Zarê Kurmancî* eve ye, ku xizmetê luxatê kurdan û tarîx û edebiyat û sinhet û fen neşir bike û li musteqbel da kitêbên kurdî çap dîke.. jimar(1), 1926.

² Hamilton bi vê şeweyê jêrû lêkdawetewe: - *The Cry of the Kurdish*, 1937.

(... Ebdulrehman mudirê îdare yê vê kovarê ye, îlaqê xwe ligel min qethî kir û heqekî wî biser me ve nemaye, bi navê *Zarê Kurmancî* her kî çi bidirête em qebûl nakin. (xwedîyê Zarê Kurmancî - Mukrîyanî)³).

Huznî di demekê weha da kovara *Zarê Kurmancî* bi zimanê kurdî li Rewandiz derxistîye, ku kurd di tarîyê da dijîyan, xwendewarên zimanê kurdî pîrr kê m bûn, zimanê kurdî li rewacê nebû, raje kirina bo nav pey dakirin destî nedida, serbarê wê jî her wekî li nav birewerîyên Huznî dîyar e, pîrraniya desthelatdarên kurd ligel dewleta Iraq bûn ji ber wê piştgirî û palpiştîya wan nebû. Dijî wî diwestîyan û roj



nebû dûçarî rûşe û gêçelanî nekin. Belam xelkê bajarê Rewandiz bi xwendewar û nexwendewar ve rêz lê girtîye û pê xoş bûne, nîrxê wê zanîne. Her çi qas liber bê deshelatîyê nekarîne li dema tenganî da yarmetî bidin, belam helwêsta wan a dostane û kurdane beramberê nîwadûye, her wekî ji vê skalayane dîyare, ku bi dehan kesîtyên bajarê Rewandiz wek danan bi rewîştî çakî Huznî mor kirîye. (binêre paşkoj jimare 2,3).

Kovara *Zarê Kurmancî* bi zimanê xelk bû, dawakarê komelgeya kurdewarî li çakkirina barê aborî, komelayetî, roşinbîrî û bikarhênan zimanê kurdî li

³ Gîwî Mukrîyanî bi vê core basê dabirîna xo ji kakî, li *Zarê Kurmancî* û li Rewandiz diket: - (... bende bi pê biryarekî, ku li navbera min û kekê min da bû, çûme Seblax, dawîya çend mangêk min dest bi hatûçûnê kir û li Tewrêz dest bi serbûm bi dest eceman ve û .. Neçar bûm li wê derê dest bi firotina nav mal û reşe welaxê xo kir û min kelûpelê wêne girtin bi wê pêk hêna. Li Seblaxê min dest bi wênegîrî kir û min pol(klas)êkî taybetî bo fêrkirina zimanê Frensî li wê damezirand. Dikarim bi vê du hoyan ve waney niştimanperwerî û kurdayetî bi hemû şewê piyawêk û lawêk bidim û bi pişeyê wênegîrî û mamostayetî dikarim malê Seblax birêve bibim û hem car caran yarmetîki bidim bira bêkes û awareyan jî û heta ew dem ali Îran bûm li kêşe kêş azarêk da rabiward, ku venagêrêteve. Ku wate hayê belavkirina wê(bo agadarî) ye her bo wê bûye. Ku li Îranê da ew hende azar nedin û bibête belgeyê ewê, ku hiç bendîwarêkî be kakî li Kurdîstana Iraqê da nemawe.

navçeyê Kurdistan da, bigre heta ramyarî biwêrane xistiye rû, bo vê wek deshelata çarem rahiştiye qelem. Ev helwêsta merdane ya Zarê Kurmancî beramber bi kêşeya neteweyê kurd way li dewleta Iraq kirîye, ku li 28/1/1929 da nûsîna jimare 107-ê araste biket û ewê agadar bike ku li jimara(16) da babetekî sîyasî belav kirîye û ev jî ligel rewî kovara we da naguncêt(binêre paşkoy jimar 4).



Husên Huznî Mukrîyanî

Huznî daxistina *Zarê Kurmancî* û ragirtina belavkirina *Zarê Kurmancî* û bo deshelatdarên kurd wisa dibêje û li bîrewerîyên xwe da nûsiye: "bi her cûreyêk be ku muteserîfê Hewlêr bû Celal Baban, Reza Beg(qaymiqamê ew sala Rewandiz bû-Kurdistan) û hawrazanî bûne mayey ew e, ku Celal Beg Baban kovara *Zarê Kurmancî* girêde, ku jimara wî ya dawîn (24) e. Bi wî jî nerawesta Emîn Zekî Beg Wezirê Eşxal, ku ji bona telifan zor bi penahî lem dua bû û bi xerabî basê telifa kitêbên wî kiribû, Celal Baban jî ev kirîye waste û ji ber wê handa, dikir ku kovara min girê bida".

Deshelatiya Iraqê heta li dawîya koça dawî kirina Huznî jî (20/9/1947) her destê xwe ji Huznî û kovarê helnegirtiye û di 17/8/1949 da nûsîna bi jimara 1473ê araste kirîye û dawa lê kirîye, ku dest ji belavkirina kovarê helbigire, eke na, bi pê yasa dê siza bidinê. (binêre paşkoyê jimar 5).

Yadkirina Zarê Kurmancî

Li nav pirranîya herî zêde ya ew berhemên ku di warê rojnamenûsî da hatine çapkîrî û yadê kovara *Zarê Kurmancî* kirîye, ka çi her di kîjan dîrokê da yan jî wek gotar⁴ û lêkolînê⁵ çêbûye.

⁴ Ji van berheman:

- Ebdulcebar Mihemed Cebarî, 1970, *Mêjîyî Rojnamegerîya Kurdî*, Silêmanî.
- Cemal Xeznedar, *Ji 1973 va Berê Rojnamegerîya Kurd*.
- Dr. Îzedîn Mistefa Resul, 1973, *Hewl El-shaft El-kurdî*, Bexda.
- Dr. Kemal Mezher Ehmed, 1978, Şûna "Têgerîştina Rast" *Li Rojnamegerîya Kurdî da*, bexda.
- Werya Caf, 1998, *Karwana Rojnamegerîya Kurdî*, Hewlêr.

Her weha li nav rojname î kovarên wek: *Birayeti*, *Altaxî*, *Xebat*, *Hawkarî*, *Iraq*, *Karwan* û ... ji bona salvegera rojnamegerîya kurdî da hendêk car îşk xiraweteve *Zarê Kurmancî* jî.

⁵ Ji van lêkolînên, ku li ser *Zarê Kurmancî* hatiye kirin: -

- Remziye Sabir Mihemed, 1993, *Huznî Mukrîyanî, Nîuser û Rojnamenîs*, nameyek wek beşêk ji pêwistiyên piley(macister) li edebê kurdî da pêşkêş bi kolecê Zankoya Selehedî kirîye, Hewlêr.
- Mintaz Heyderî, 1979, *Sereuyê Lêkolînek- Huznî Rojnamenîs-*(paşkoy Iraq, jimar 32)
- Mintaz Heyderî, 1999, *Zarê Kurmancî ya neteweperwer nîşanê mezin ê pêgrew e*. Kovara Hewlêr, jimar 1-2.

Zarê Kurmancî, dezgehek e ku pîrr girîngî bi roşinbîrîya kurdî daye û kargêrîya wî li ser hişyarkirina kurd da hebûye⁶.

Bi xwe beramber bi kêşeyêk herî mezin e, ku xwe berpîrsê kêşeya (pîrs-gîrêka) neteweyî zana ye, bo vê Huznî xwedîti bi hoyê şandina kovarê bo derveyê welat li şarezayan û rojhelatnasan û daw û dezgehê wek Komeleyê Gelan, dengê resen ê kurdî geyandiye bi cîhan. (binêre paşkoj jimar 6 û 7).

Her ji vê rewange ve ji bo Zarê Kurmancî pêwîstî bi lêkolînek zanistane ya serbixwe heye û pêştirîn babete bo têza diktorî ye.

Zarê Kurmancî û Şiwên û Dema Derçûna Wê

Hemû jimarên Zarê Kurmancî, ku birêti bûn ji 24 jimar li şaroçkeya Rewandiz hatine çapkirin û belavkirin.

Huznî xwedî çapxane û xwedî îmtiyaz ê kovarê arezû kirîye, ku belavkirina wê mangane bêt, belku hindêk car umîdê wî bi vê hebûye, ku heftane bêt, belam ji vê perî va hatûnete pêşî her çendîn hewl daye rahî nebû û ew wate ji alî wî ve nehatîye dîyin ku kovarekê mangane amade bikit û pexşî bikateve, her wekî li vê xişteyê (tabloya) jêrîn tete berçavkirin.

Xişteyek Jimar û Dema Derçûna Zarê Kurmancî

Jimara Kovar	Roj û Mang û Sal	Sala	Jimara rûpelan
1	12-yê Zî Qeade 1344 25-ê Eyara 1926	yekem	26
2	10-ê Muherem 1345	yekem	24
3	14-yê Sefer 1345	yekem	24
4	19-yê Rebîha Yekem 1345	yekem	24
5	17-yê Rebîha Duyem 1345	yekem	24
6	15-yê Cemada Yekem 1345	yekem	24
7	28-ê Cemada Duyem 1345 3-yê Kanuna Duyem 1927	yekem	28
8	20-ê Pûbat 1345 20-ê Pûbat 1927	yekem	20

⁶ Her li vê warî da Celal Begê Dergeleyî, ku xwe bi damezrenêrê hîzba Estêrey Hîwa (1939) dide nasîn û dibêje: ... Wê demê qutabxaneyan rola sereki li belavkirina roşinbîrî û xo pêgeyandin digirta, belam çapxaneyê Zarê Kurmancî mamoste Hisên Huznî Mukriyanî û birayê wî mamoste Gîw Mukriyanî wek binkeyekî mezin ê roşinbîrî li şarê hewlêr û her weha Seyid Teha Fîndî yê Şemzîni li Rewandiz karîgertirîn serçavey roşinbîrî ya me bûn li wê serdemê da. (Kovara hewlêr, jimar:9 sala 2001, rûpel 57).

9	1-ê Manga Qurban 1345 2-yê Huzeyran 1927	yekem	24
10	3-yê Muhêrem 1346 3-yê temuz 1927	Duyem	24
11	17-yê Rebîha Yekem 1346 14-yê Eylûl 1927	duyem	20
12	2-yê Şebaban 1342 25-ê Kanûna duyem 1928	duyem	16
13	7-ê Bêwal 1346 29/3/1928	duyem	16
14	6-ê zî Hece 1346	duyem	16
15	11-yê Tîpîrîna Duyem 1928	duyem	24
16	25-ê Receb 1347 7-ê Kanûna duyem 1929	duyem	12
17	1-ê Remezan 1347 9-ê Bûbat 1929	sêyem	12
18	12-yê Bêwal 1347 28-ê Adar 1929	sêyem	12
19	17-yê Zî Hece 1347 27-ê Ayar 1929	sêyem	12
20	2-ê Rebîha Yekem 1348 7-ê Axostos 1929	çarem	18
21	8-ê Zî Qeade 1348 6-ê Nîsan 1930	çarem	20
22	2-yê Nî Hece 1348 30-ê Huzeyran 1930	pêncem	16
23	7-ê Muhêrem 1349 4-ê Huzeyran 1930	pêncem	12
24	23-yê Temuz 1932	heftem	12

Zarê Kurmancî û Hoyê Derneçûna wê ya Mangane

Hoyên derneçûna Zarê Kurmancî bi şeweyê mangane, her wekî li diruşmê kovarê da hatiye diyarkirin, ev in:-

1- Dûrîya bajarê Rewandîz ji binkeyê bajarên bazirganî, bûye astengê bi destxistina pêdiwîstiyên çap bi asanî, ji wana kaxîz, ku çendîn car bûye hoyê dereneketin û belavkirina kovarê, ji ber wê di çend jimarên Zarê Kurmancî da amaje bo wê hatiye kirin. (jimar 9, rûpel 12, sala yekem 1927. Jimar 12, rûpel 15, sala duyem, 1928).

2- Ew kurdên ku wê salê di nav dewleta Iraqê da berpîrs û deshelatdar bûn, destê yarmetiyê bo wê dirêj nekiriye, belku bûne lemper li ber pêşçûna wê, bi pêçewane xelkê nedeshelatdar û çend roşinbîrek, ku hindêk car piştewanîya me kiriye, me diyar kirine wan wek mînak (binêre pîntî jimara 4-ê ev base).

3- Sermayeyê wan yê herî girîn tenê rojname û kovarên abone bûne, yên kurd bi şeweyekî giştî pêwîstî şandina abonetiya bo Zarê Kurmancî paşgo xistiye (binêre paşkoşê jimara 7) û gelek car li ser rûpelên kovarê da hatîye baskirin û tika ji xwendewaran kirîye, ku heqê abonetiya xwe bo wan bişînin, her wekî li jêr li ser vê babetê hatîye tika kirin gotin:

Em ji hemû hemîyetmendên kurd tika dikin û li ber gewre pîyayan diparêneve, ku ev 3 sal e rojname û kitêban bo wan dişînin, pareyê wan bo me birê bikin, heta nûha çend car me îlan kirîye û bo wan çend kaxez nûsîne, ku mizê (heqê) abonetiye bo me birêkin, ev ji bo teesûf û xîretê kurdayetî gelek şaşî ye, yên ku xwe bi kurd dizanin rojnameyekî wan ê millî heye bi wê xweyîti nakinê. (jimar 12, rûpel 12, sala sêyem, 1929).

4- Li rûyê aboriyê ve bi ti awayê ji aliyê dewleta Iraqê ve pareyekî bo me nehatiye şandin û yarmetî bo me nahatiye dayin, tenê dema ku serok wezîrê Iraqê Cefer Eskerî, di serdanekî bo Rewandiz da ku li dawîya manga Huzeyran û seretayê manga Temuz a sala 1927an da çêbû bû, sed rûpî bo xweyîyê çapxaneyê Zarê Kurmancî beşxandiye:

(... Hezretî Fexamet meabî sed rûpîyan bi navê komegî û yarmetî bo kovara Zarê Kurmancî fermû. (jimar 10, rûpel 23, sala duyem, 1927)

Li vira da pêwîste hêsta bo beşxandeyî û hestê netaweyî yê ew gewre mirovên kurd bikim, ku Huznî minetdariya xwe bo wê yekê aşkira kirîye, bi xwe ew yarmetîdana darayî ye, ku daye wan bo ewê tiştê çapxanê pê bigirêt. Weha dîyare behîştîyan Emîn Rewandizî û Sebrî Beg Nêrawayî Silêmanî rolêkî diyarîker li komkirina yarmetîyek da girtîye.

Huznî li Derbarê Tîpê Taze yên Çapxanê Dinûsit:

(Ev herfên taze, ku di vê jimarê da têtê dîtin ji Misirê hatine xwestin û heta geyîştine Rewandiz çend mangek derbas bûye. Ji ber vê bû, ku Zarê Kurmancî li vê midetê da derneçûye. (jimar 5, rûpel 23, sala duyem, 1928).

Geyîştina tîpên taze bo çapxaneyê Zarê Kurmancî hêviyek dide Huznî, bo vê ewê bibêjît:

(... Umîd dikim, ji vê layî ve rojnameyê me dê bi rêkî derkevê û belku bibite hefteyî jî (Heman jimar rûpelê pêşî).

Listeya navê ew kurdên ku yarmetî daye:

(Paranewe û minetdarîkî aşkira)

Hurufatê pêşî ku me pê kar dikir, hemû kes ji wan bi gilî dikir; belam bihemt û tekoşîna gewre û mihterem a cenabê Emîn Findî Rewandizî û hemt û xîreta meblhusê Silêmanî cenabê Sebrî Beg ve herfên taze yê ku hun di vê jimarê da dibînin ji Misirê ve hatiye celb kirin û heta geyîştine Rewandiz çend mangek pêre çû; ji ber vê bû ku Zarê Kurmancî di vê midetê da derneçûye.

B Î R

Li xîret û tekoşîna gewrepîyayên meharif perwerên kurdan umîd dikim, ji vê layî ve rojnameyê me dê bi rêkî derkevê û belku bibite hefteyî jî. Em ji hemû xwendewarên xoşewîst ên Zarê Kurmancî etzar û tikaya lêborînê dikin.

Beyana memnuniyet û tika kirina zêde bo ew hemîyetmendan dikin ku bo me kerem kirîye û ev deste herfên taze yê yarîdeyan anîne, her bijîn meharif perwer û berzî welat.

Lîsteya navê ew gewreyên ku yarmetî dane:

Li Rewandîz:

	Rûpiye
Seîd Meslah Efendî qumandanê şibane	10
Gewreyê şar Mihemed Elî Axa	5
Şêx Ebdilla Efendî	10
Qazî Cenab Mela Sîhd Efendî	5
Mistefa Efendî Emîn Sînduq	5
Midirê daîre Seîd Ebdille Efendî	10
Midirê balak Ewnî Efendî	5
Ticar Sîhdê Hacî Qadir	2
Mihalim Gelale Salih Fexrî	2
Tehsildar Şêx Mistefa Nûrî	10
Qumandanê mintiqeya Kanîyareş Tofîq Beg	3
Yusif Axayê Herkî	2
Zebu Axayê Herkî	2
Tehsildar Bradost Mela mistefa	2
Midirî mal Celal Beg	5
Midirê Bradost Yunis Sebrî Efendî	<u>5</u>
<i>Gîştî</i>	<u>83</u>

Li Bexda

	Rupiye
Mebhusê Silêmanî Sebrî Beg	20
Milazim awlî Emîn Efendî Rewandîzî	100
Mistefa Efendî Hemed Efendî	7
Ebdila Ezîz Efendî	5
Mebhusê Kerkûk Mihemed beg Caf	5
Tofîq Wehbî BEg	5
Reşîd Arif Beg	5
Xelef Şewqî Beg	5
Fayîq Efendî	5
Hemîd Cewdet Efendî	10
Mistefa Behcet	2
Bergdir û Beşîr Efendî	2
Sidqî Efendî	1
Mehmud Emîn	1
Hisên Efendî Emîn	<u>1</u>
<i>Gîştî</i>	<u>172</u>

Zarê Kurmancî û Hunerê Rojnamevanî

Jimara yekê kovara Zarê Kurmancî di 12-yê ZY qeade 1344 beramber bi 25/5/1926 M. da û jimara dawîyê jî li 23/7/1932 hatiye belavkirin, li serhev da hemû jimarên wê li navbeyan şeş sal û du mang da derçûne ku bîst û çar jimar bûn.

Li ser bergê derve yê jimarên 1-3 bi vê şêweyê kovar bi xwendewaran daye nasîn:

[Kovarekî îctîmayî, tarîxî, fenî û edebî ye]

Belam li jimara 4-ê sala yekem- jimara 5-ê sala duyem- 11-yê Tişrîna Duyem- 1928 pênasa xwe bi vê cûre hanîye:

Kovarekî îctîmayî, tarîxî, fenî û edebî ya mangane ye, li jimara 16 yê sala sêyem 1929- jimara 20ê sala çarem-7/8/1929 weha nasandiyê:

Kovarekî îctîmayî, tarîxî, fenî û edebî kurdî ye muweqeten⁷ mangê carêk der diçê. Jimara 21-ê li 6/4/1930 da rêkefte - jimara 23-ê li 4/6/1930 da rêkefte û bi vê cûre pênasandina wê kirîye.

Kovarekî îctîmayî, tarîxî, fenî û edebî kurdî ye, mangê carêk derdiçê.

Di jimara dawî da, ku jimara 24 e, û di 24/8/1932 da hatiye belavkirin hîç pênasiyekî kovarê nekiriye. Di jimara 5ê sala yekem heta jimara 7ê sala duyem ligel bi elif û bê, bi latînî jî navê kovarê hatiye nûsîn: ZARÎ KIRMANJÎ.

Di jimara 1ê sala yekem heta jimara 5ê sala duyem rûpelê yekemîn ê kovarê wekî berg derhênaye, di jimara 5ê sala yekem ve gorînekî ji cûreyê derhênana hunerê klîseyê bergê wê kiriye û hindêk caran jî bi rengê sor, sewz û ya şîn hatiye çapkirin.

Di jimara 16 yê sala sêyemê da her tenê yek ji çarê rûpelê yekem bo nasandina kovarê hatiye terxankirin û sê çareyekê dî gotara têde hatiye belavkirin. Qewareyê kovara Zarê Kurmancî(28x20 cm) babetên li pantayî (23x16 cm-ê) yek stûnî û hindêk caran jî li du stûn da belav kirine.

Serdêrê piraniya herî zêde ê babetan bi rastê dirşî û reş weya bi xoşnûs ji layen Huznî bi xwe liser darê kewet hatiye helkirin û çapkirin.

Destrengîniya Huznî li klîseyê rûpelê yekem ê kovarê û ew wêneyên ku hindêk car li ser rûpelê wê dihate belavkirin, derhênanekî hunerî yê hêja bi kovarê bexşîye.

Hewal

Zarê Kurmancî nirxekî zêde bi belavkirina hewalan daye. Hewal her cûre bûne: aborî, komelayetî, zanistî, roşinbîrî, kargêrî û ... Ew hewalên ku navçeyî bûn ji aliyê birêvebirên kovarê -Husên Huznî û Evrehman Gîwî ve dihate

⁷ Di jimara 17-yê sala sêyem rêkewtî 9-ê Şubata 1929 li birêtî muweqeten nûsrawe "Isa".

komkirin yan nameyên taybetî bo wan dihatin, hewalên derveyê welat ji belavkirîyên navxwe û derve da dihatin wergirtin û serçevîya wan jî li palpişt da dihatê tomarkirin.

Eger ji alîyê zanistî ve hewal bihata nûsîn, hewal belavkeranê Zarê Kurmancî wê helbisengandana, ji hemû alî ve dihatê rêçavgirtin, dama ku bikêr û babeta rûdanê digirêne bo wê karîgerê dîyarkirî bi xwe li vê serdemê da hebûye û bo evro jî bûye bi jêderêkî bawer pêkirî.

Di Zarê Kurmancî da jimare nîn e, ku hewala xorawxora têda nehatibe belavkirin, hindê car hewalan çend rûpelan digirtin, bo wêne di rûpelê 8, 12, 7,2 4, 26-ê jimara (1) da 29 hewalên navxo û derve hatine belavkirin.

Her çî merivekî navdar ê kurd û nekurd ji nêv welat û li derveyê welat da serî li Rewandiz dabe, Zarê Kurmancî wek hewal, sedem û dema hatina wî belav kirîye. Bo mînak, ew kesayetîyên kurdên jêrû ku navê wan di Zarê Kurmancî da hatiye:-

Seîd Ebdulla Rewandizî-mulazim. (Jimara 2, r. 21, sala yekem. 1926) kak Mistefayê Îranî, Elî Efendî yê memurê Koyê, Zeynelabidîn Beg Musenîfzade-Kerkûkî. (jimar 3, r. 24, sala yekem, 1926).

Ehmed Beg muteserîfê Hewlêr, Mistefa Efendî mufetîşê mearîf, Şêx Eladînê Zînwê, Fehmî Begê Zirkî. (jimar 6, r. 23, sala yekem, 1926).

Mistefa Efendî mifetîşê mearîf, Elî Serwet Beg(jimar 4, r. 15, sala duyem, 1928).

Ji bîyaniyan navê Kaptan Çepen- serpereşê kargêrî rêgaûban(jimar 2, r. 21, sala yekem, herweha jimar 5, r. 23 sala yekem û jimar 4, r. 15 sala duyem, 1927).

Kolonêl Utilîks- nayîbê mifetîşê polisê Y M. (jimar 9, r. 24) û kesên dî.

Zarê Kurmancî hewalê serdana Şêx Sidîqê birayê Şêx Ehmedê Barzanî û Seyid Teha, Qaymeqamê ew sal ê Rewandiz bi vê cûre baskirîye: “teşrifê anîna zatêkî gewre û xoşewîst”:

Cenabê fazil û murşîdê kamil hezretî Şêx Sidîq birayê hezretî Şêx Ehmedê Barzanî xuda ragêrawê wan bike, hîmet û bereketê wan li ser murîdên hazir bit, bo dîtîna û ziyareta hezretî Sidîq Teha teşrifan hate Rewandiz nizîk pênc seatêk li dewlet xaneyê hezretî Seyid Teha da bi wan ra sohbet kir û edayê mehebet û dostaniya wan bicî hêna û piştê ber bi Barzan ve çûn. Xuda hemrahî wan bê.

Ev cûre mewedet dayimî bê li nav serokan û gewre gewreyên Kurdistan da.(jimar 2, rûpel 21, sala 1, 1926).

.....
.....

Rêportaj

Di Zarê Kurmancî da çendîna hewal hatine belavkirin, ku ji rûyê şewazê nûsîna rastîya ew rûdanan ve tîşkî xistiye ser û bi vê şewe sîrnîc rakêşîye û pêşkêş bi xwêneran kirîye ku eve diçîne nav xaneyê rîportajê. Bo mînak, hewala

damezirandina yaneya fermanberan li Hewlêr, bûye babetêkî dîyarîkirî yê rîportêjê kovarekê û gote nûnerê Hewlêr - Mearîf Beg Cîlûk⁸ û honraweyekî bêkes, ku her ji bona wê honandiye û li wê derê xwendîye û hatiye belavkirin. (jimar 5, rûpel 18, sala duyem, 1928).

Serdana serokwezîrên Iraqê- Cefer Eskerî bo Rewandiz (30/6/1927), rîportajêkî pîrr dewlemend ê zanyarî pêre hatiye kirin. Li vê geştê da komelêk ji gewre merivên bajar pêşwazî li wan kirîye û li çavpêkevîna serokwezîran bi qutabiyên Rewandiz ra pîrr cextî li ser xwendina quran kirîye, heta qûtabî bi vê hoyê fêrê zimanê erebî bin, çunke her wesa li Rewandiz da xwendin bi zimanê kurdî bûye.

.....

.....

Hatina miteserîfê Hewlêr Ebdulhemîd Beg di 1/6/1930 da bo Rewandiz babetêkî dî bi pêzî rîportaj bûye. (jimar 23, rû. 12, sala pêncem, 1950).

Daxuyan:

Li kovara Zarê Kurmancî da çend cûre daxuyanî li berçav dikevin. Ku daxuyaniyên roşinbîrî ji yê cûreyên din zêdetir in. Ji vê barî ve daxuyanî bo berhemên bîrî yê nûserên kurd û berhemên bîrî yê berpirs û xwedî kovarê ku her weha bo kovarê bi xwe kiriye (jimar 2, rû. 21, sala yekem 1926).

.....

Zarê Kurmancî û Hunerê Wêje

Hunermendên wêje: Gotar, honraw, çîrok û ... Li kovara Zarê Kurmancî da bi pirranî hatiye belavkirin û bi hoyan ve zanyarîkî baş yê mêjûyî, komelayetî, zanistî, hestî û nestê biwêjên serdema pêşû, ew serdema ku kovar jî têde hatiye weşandin berçav dikevin ku bi gençîneyekî binirx ê wêjeyê kurd têne jimartin.

Gotar

Komelêk gotarên mêjûyî, zanistî, komelayetî û ... di kovara Zarê Kurmancî da hatiye belavkirin, ku bo ewsa pîrr binirx û pêwîst bûn û li vê tak û tera babetan bûn, ku bi zimanê kurdî hatine belavkirin û bo îro jî jêderên bi sûd in.

Gotarên mêjûyî li pîrraniya jimarên Zarê Kurmancî da hatine peşkirin û bi xameyê birîştî Huznî Mukrîyanî hatine nûsîn.

.....

.....

Agadariya li ser mindal- Bahsekê perwerdeyî ye, ku şeweyê amojkarî û hiş-yarkirina bi ser da zal e û tê da rênimayî dayikan bo rastî binyada perwerdekiri-

na ji rûyê agadarbûna pak û berêzî, xerakê, dama nivîstinê, kutanê û ... (jimar 16 û 17, rûpel 11 û 9, 1929).

*Perwerdekirin û pêgeyandina afret(jin) pêwîste*⁸ - Gotarek komelayetî ya binirx e, ku gelek babetên li xwarê bo perwerdekirina afret daye, bo pêgeyandin weha pêşniyaz kiriye ku xwendinge bo afretan bête vekirin û mamostayên jin bo wan bihênin ta fêrî xwendin û bi warên di yên jîyan bin. Ji aliyê Zarê Kurmancî ve fêrbûna afret bo zanist, huner, perwerde çewaniya rabûn û rûniştinê ve. Erkêkî pêwîst deyete qelem, çunke her bi wê core afret dikarin mindalekî jîr û hişyar pêşkêş bi komelê bikin û millet pêş bixin(jimar 8, r. 4-5, 1927).

Li paş ew gotaran jî hindek gotar hatine belavkirin, ku çend kesiyetiyên ji wan tête baskirin bi rêgez kurd bûn, belam li ser roşinbîrê ereb hatine hesabkirin. Ji wan; Şêx Mihemed Ebde - miftî dîyarê Misir û Alîşê Teymur(jimar 21, r. 6-7, 1930).

Honrawe(Helbest)

Di pîrraniya herî zêde ya jimarên Zarê Kurmancî da çend rûpelên wê bo belavkirina helbestên kurdî hatiye terxankirin, di jimara 2yê sala 1926 heta jimara 17yê sala 1929 da goşeyekî xurtbûyî bi navê "Xoşxwanî" û li jimara 21, 23, 24-ê jî da li jêr navê şîhrê munewer da quncikekî ji honraweyê biwêjên⁹ serdema xwe û serdemên pêştir pêşkêşî bi xwendewaran kirîye.

Naveroka honraweyên ku wê demê hatiye belavkirin ew hestên ku li serdema derçûna Zarê Kurmancî da jiyawin bi şeweyekî serî neteweyî bûn, hewla berzkirina asta hestê neteweyî kurd daye, xelkê hişyar kirîye bo ku ewê dawayê mafê xwe yê rewa bikin û li berxwedan da berdewamî hebin, li heman demî da rexne jî li van helbestan girtîye, ku heta vê gavê jî her bi xet û xalên ji nav wan helgirtîye û agadarî ew warê nazik nebûn, ku kurd tê da peyda bûye, her wekî Newroz, navek ev gilî û gazindê pêşkêşê hestiyarê xwe kirîye:

(... ti mîlletekî di heye li esrê fen û îlm da, li zemanê îrfan û sinhet da şair pîrr hoşekanî li paş hemû rabiwardinek li şîhr da bas mujgan û çavê kall û lêvê all û ... bikin? (Newroz, jimare 24, sala heftem, 23-yê Temuz 1923 r. 11).

Helbestên têde bi şewezarê Baban, Mukîfyan, Soran, Hekarî, Hewraman û ... hatine nûsîn û bo pîrraniya bajarên Kurdistan hatine birêkirin.

.....

Çîrok

Çîrok li Zarê Kurmancî da bi du şeweyê; honraweyî û pexşanî hatine belavkirin. Bigiştî çîrokan bi xameya bihêz a Huznî hatine nûsîn û bi şeweyekî

⁸ (Bo wergirtina zanyarî li ser ew gotara birwane: Dr. Kurdistan Mukriyanî, 1995, 1998. rengdanewey doza jin bi navê jinê ve li nav rojnamegeriya kurdî da. Heimifey û Hewlêr.

⁹ uşey(biwêjan) li jimar 19 -yê Zarê Kurmancî da bo (şuera/şîhray) bikar hatiye. 1929.

serekî jî rengdana rûdanên rojane yê komelga kurd bûne û bi şewazêkî wêjeyî yê sade û hêsan xirawnete rû.

Zarê Kurmancî dahatina cejnê bi fersend zanîye bo ewê çîrokek li bareyê çawaniyeyî peydakirina cil û bergê cêjn li sê jimarên (1), (2), (7) da wek zincîre belav dikate û çîrokekî ji wan bi dîyalekta kurmanciya jorû nûsiye.

Huznî biserhatî du kerwêşkî bi honrawe vegotiyê, ku çawan kîselok xwestiyê yek ji wan bo xwe zewt biket û bikete jina xwe, di vê çîrokê da mebest dîyarkirina bindestîya vê mîletê ye, ku bi zorî ligel neteweyên deshelat ên dî ne, hevrêze bi wan ve hatine girêdan, her wekî çawan kurd bi kotek bi ereb û ecem û turk, .. hatine zeliqandin. (*jimar 6, r. 19*).

Di çîrokekî dî da Huznî bi honrawe pend û amojgarîyek pêşkêşê xwendewaran diket ew jî vegotina biserhatîya guhdîrêjek e, ku çawan li wê demê da, ku rû bi rûyê şerek dibêt, keleşerek dixwênêt û şer li ber dengê wê li wê derê namînit, guhdîrêj weha dizanêt ku şerî ji tîrsa wê çûye, bo vê pirr zil dibêt û berve şûna şer dihere û cûteyek lê didat û şer jî bo vê digêrêteve û penceyek li şanê(milê)wê didet û ker dikevête ser erd.

Mebest ji veğerandina wê rûdanê ev e ku her kes sinûra tiwanîya xwe bizane, bo wê ew hinde hêz û azayîya xwe tevbigere, ku tiştê weha wek guhdîrêjekî li ser wî da neyêt. (*jimar 9, rûpel 19*)

Di çîroka “*be mîwedar û beranî tê degen*” da Huznî hewl daye bi rêya berûbûmê mêweyê daran bawkêk li kesayetî mindalên xwe bigat. Dema ku bav pênc hermê gulawî dîinête malê û biser jin û her çar kurê xwe da dabeş diket û piştire ku li ser cûreyê bikaranîna hermêyan li her çar kurê xwe dipirse ji vê derxistin, ku tevgera wan li jîyan da çawan dibêt û bi vê pêye têrwanîna xwe bo wan rûn dikate û rênimayî bo wan dikat. (*jimar 10, rûpel 19*).

Zarê Kurmancî û Kêşeya(Pirsgîrêka) Zimanê Kurdî

Ziman girîngtirîn mercê(şertê) neteweyê kurd e û keresteyekî bihêz ê têkelbûna mirovê kurd e bi yekudu ve, Zarê Kurmancî ew şert bi başî kirîye.

Li wê serdema ku Zarê Kurmancî dihate belavkirin, di Rojhelat da gorankarîyekî temam ji rûyê deshelatdarîyê ve çêdibû, ku li encama têkçûna împaratorîyeyîya Osmanî hatibû meydanê û ji mîratekî çendîn dewlet jê hatibû dirustkirin. Hêzên Awrupayî jî deshelatîya xwe li ser ew dewletên taze peydabûyî da peydakiribû, belam rêya wan bi vejandina zimanê neteweyî ew netewan dabû, ku dewleta xwe bi wî pêkhênbûn.

Li wê demê ji aliyê Komeleya Gelan ve biryar hatibû dayin, ku di başûrê Kurdistan da zimanê kurdî bibête zimanêk resmî, belam ew hinde karî pê nekiribû, piştguh kiribûn, zimanê erebî li şûna wî bikar dihat, Zarê Kurmancî li derbarê ev kêşeya mezin bibû têgeyiştina gelê kurd û wek deshelata çarem piştgirîyekî temamî bo bicîanîna wê mafê rewa yê kurdî kirîye.

Di salên bîstî yê sedeyê rabirdu da zimanê kurdî li seretyê belavbûnî da bû, belam pîrr li ser xwe bû, çünke zimanê deshelat nebû, xwendewarên zimanê kurdî jî pîrr kêr bûn. Zimanê nûsîn ê kurdî jî bi şeweyekî serekî zimanê honrawe bû, belam kovar derhênan pêwîstî bi nûsîna gotara komelayetî, ramiyarî, zanistî, abûrî, mêjûyî û ... hebû. Bo wê erkê rojnamenûsî wesa ji rûyê ziman ve pîrr giran bû.

Di Zarê Kurmancî da çend gotarên binirx li derbarê mêjûyê dêrîn ê zimanê kurdî hatiye belavkirin, ji wan ew gotarên ku li vê berhema girîng a du nûserê kurd ên sedeyê nehemînê zayînî-Bînuşad û Masîsuratî didivêt, ku li derbarê rez çandîn û bîstanvanî û darxurma û çawaniyetîya dozîneweya aw. Girîngiya vê basê li wê daye, ku bi 'elîfbêyekî taybet, ku bo zimanê kurdî danîne, nûsîne, Zarê Kurmancî cûreyê elîfbêya wê belavkirîye. Ev deng û bas ji berhemekî erebî wergirtîye, ku bi navê(şewq elstham fî mehrefat remuz el aqlam)î nûser -(Ehmed bin Ebu Bekir bin Uşît el nebtî el kadanî) ye¹⁰.(jimar 18, rûpel 2 û 3, sala sêyem, 1929).

Mistefa Şewqî ji Bexdayê ve gotarekî li jêr serdêr/manşêta "*ziman û nûsîna me*" bo Zarê Kurmancî birêkirîye, nêvbirawa hoyê nexwendewarîya pîranîya kurd bo ew vegeandîye, ku hema her mîlletêkî hatiye nav kurd bifirûfêlê û li pîrranîya nûsînê xwe da belavkirîye, îca li ber ewê bi zimanê kurdî nebûye, pê sitem bûye bi zimanê bîyanî bixênêt û dibêje: "Mîlletê kurd li ber xoşewistîya zimanê xwe bêzî nehatiye û bi etkî zaniye bi zimanê xeyrî fêrî xwendin û nûsîn bêt". Her li vê gotarê da nûser amaje bo wê dike, ku weha li nav kurd da zanayên pîrr jêhatî derketine, belam bi zimanê xwe nenûsîne, ji ber vê başîya wan bo kurdan nebûye. Mistefa Şewqî cext li ser vê dike, ku pêwîste kurd fêrê zimanê xwe bêt û zimanê wan ji hemû zimanên dî bêtir ji layê wan ve xweştir bêt û dawa diket, ku li Kerkûk û Dihok û Akrê û Amêdî û Zaxo da bi zimanê kurdî bixwênin. (jimar 21, rûpel 5, sala çarem, 1930).

Bi pênûsa Hoşeng Kurdî gotara "*li xaka Kurdistan da zimanê kurdî bo çi nebête zimanekî resmî*" hatiye belavkirin. Nûser ji wê dewam dike, ku Komela Gelan biryar daye ku li hemû navçeyên Kurdistan zimanê kurdî bibête zimanekî resmî, fermanber hemû kurd û kurdîzan û kurdnejad bin û li xwendehegehan da jî bi kurdî bixwênin, ku çi serpereştyarên qutabxaneyan ereb bûn, xwendin li bajarê Hewlêr û Kerkûk û Dihok û Zaxo û Akrê û Amêdî û Şengar bû bi erebî û li Silêmanî jî da nivê wê bitirkî û erebî û nivêkê dî bikurdî dixwênin, mameleyê rojane jî li daw û dezgeyan da bierebî ye. Nûser bi hîç cûreyek ewe napejirînêt ku zimanê erebî bibête zimanekî resmî di Kurdistan da.(jimar 12, rûpel 9, sala pêncem, 1930).

¹⁰ Gîw Mukrîyanî heman ew zanyarîya li jorê di berhema(Gîwname 1960) û (Ferhengê Mehabad 1961) da belav kirîye, li wê demê da kak Hemeyê Mela Kerîm bi wê bersîva wê da, ku ew du bira(Huznî û Gîw) bizorî mêjû bo kurd dirust dikin, belam li vê dawiyê da ku bi hoyê Yasîn Xeylanî - li Elmanya danîştîye- rûnûsekî wê **kitêba Ehmedê bin Uşît bo min şandîye, ew kesê xwe dijî Gîw kiribû peydakir daye û ji wê peşîman bûyeve.**

Huznî bi dewam li gotara “mektebên Kurdistanê ji dêlva serkevtinê beravajî diçêt” da bi şeweyekî serekî li hoyê nexwendina zimanê kurdî li xwendagehên li Kurdistanê da diket, ku bo kemtir xemê mirovên desthelatdarên kurdî digêrênê, her wekî bi xwe li qutabxaneyê Şeqlawe da bûye û yek tîpê kurdî nekevtîye berçavê wî, ji vê rûyê ve gilîyekî baş arasteyê mudirê nahiyeya Şeqlawe kirîye.

Her li vê gotarê amaje(nîşan) bo daniştina Komeleya Gelan li manga Tişrîna Duyem a sala 1928 da kirîye ku bizorî xwendina erebî li şûna zimanê kurdî li Kurdistan da hatiye bas û di raportek da arezû nekirina kurd bo fêrbûna zimanê erebî bi vê şeweyê hatiye dîyarkirin:

“... cûrek kurdên cenûb li tehsîl kirina luxatê erebîyê lê mubalat in ku hîç îstîfade lê nakin” (jimar 22, rûpel 22, sala pêncem, 1930).

Li gotara “xwendin û mearijê Kurdistan li musbetê umum da” gilî û gazindê kurdan li piştguh xistinî, bikarhênana zimanê kurdî li Kurdistan da di Komeleyê Gelan da xiravete rû, çunke cêgirî muetemedê samî li daniştinekê Komeleyê Gelan da waye bi baş zanîye, ku zimanê erebî li Kurdistan da bête xwendin feyda wê ji bo kurdan pîr dibêt.

Zarê Kurmancî merdane bersîva ev gotina neşayiste(nelayiq) yê cêgirî birêvebirê karûbarê îngilizan li Iraq daye û nûsîye: Ger bi karhênana zimanê erebî di Kurdistan da ji ber dîn bêt, ev zanayên Kurdistanê di mizgevtan da ji hemû zanayên erbistan bêtir ji zimanê erebî û zanistî agadar in û nûsîna wan zêde jî di vî warî da heye, eger mebest jê zanistîya hevçerx bêt, li hîç demekê da kurd sûd ji zimanê erebî wernegirtîye û eger amanca xwendina seretayî û navendî bêt, bila mindalên kurd li piştî xwendinê zimanêkî awrûpayî fêr bin çêtir e. (jimar 23, rûpel 1, sala pêncem, 1930).

Ew berhelsitîyê kurdan ji bo nepejirandina wan a bo xwendina zimanê erebî li Kurdistan da weha kir, Nûrî Seîd(Serokwezîrê wê salê yê Iraqê) gotî wê bidat, ku weha biryara hebûna zimanê kurdî bi zimanêkî resmî li Kurdistan da bixate kar û ji bo vê yekê her çi gewre merivê kurd heye telgirafê xoşhaliya xwe beramber bi karhênana zimanê kurdî li Kurdisatan da bo wî şandine û ji wî ra supas kirine. (jimar 22, rûpel 11, sala pêncem 1930).

Her wekî li van gotarên pêşîyê û ji gotarên belavkirî yên din dîyar e, Zarê Kurmancî dakokêkî temamî li bikarhênana zimanê kurdî li Kurdistan da kirîye, ligel wê jî da bayexî bi layenê dî yê zimanê kurdî daye, wek rênûsa kurdî û hewl daye ku binke û binemayekî bicê bête danîn, her wekî bi vê cûreyê jêrî xistiyete rû: **“qaedeyên ku di kovara Zarê Kurmancî da hatine qebûl kirin bo nûsînê amee ye:- Herfa (5) elamatî sire. W(w) elamatî bure wek “but”:- “xut” herfa “y” elamatê jîre. -wek “eydî” belan li şertêkî da herfên e; u; y li eslê kame nebin.** (jimar 7, sala pêncem, 1927)

Zarê Kurmancî hewlekî li rade biderî daye, bo ewê bi zimanekî paraw ê kurdî binûsêt û ligel wê zimanê nûsîn ê kovarê bi dîyalekta kurmancîya naverast

B Î R

bûye, belam li heman demî çendîn çîrok, gotar û honrawe bi dîyalekta kurmançîya jorî, hindêk car jî honraweyên(helbestên) bi hewramî û lorî jî belav kirîye. Di zarave bikarhênan da bo dîyalektên dî yên zimanê kurdî, zimanê Zarê Kurmancî pê dewlemend kirîye.

Zarê Kurmancî hewlêkî azayane daye bo yekgirtina zimanê kurdî û belavbûn û vejandina wê, her weku li gotara "Hîwî" da berçav dikevêt, li vê gotarê da Hîwîyê ew xwestîye, ku xwendewarên kovarê hevbeşî bi dan û sendin û alogorîkirina bîrûrayê xwe li ser çend babetêkî zimanvanî da bikin her wekî ew babetên ku li vê gotarê da kirîye, ku komele cînavê kurmançîya jorî û kurmançîya naverast bas kirîye. (jimar 4, rûpel 1, sala yekem 1926).

Li jêr da em ferhengêkî bo raberîhevkirina wan didin, ku Zarê Kurmancî li perawêz yan jî li nêv kevane da mana wan dîyar kirîye:

firok	: teyare	çax	: zeman
çerxegerî	: mîkanîkî	miroyanî	: însanî
kehrebay wergir	: îcabî	gel	: mîllet
kehrebay berdan:	selbî	nêwekî	: mabeyn
xudan	: sahib	cirîwe	: luxet
hebûn	: mewcudiyet	roçwan	: qamus
qencî	: fezîlet	zanîn	: îlm
bepêçewan	: balhkes	kar	: sinhet
gîya û gol	: nebatat	hogirî	: îctîmayî
diraw	: pare	belaw	: neşir
lat	: feqîr	be wirî	: dîqet
bersitga	: meebed	cutyarî	: felahet
şivan	: şivan	pît	: herf
tuv	: awedan	wite	: kelîme
hun	: êwe	pênasî	: cografya
ramîsan	: maçkirin	kulîn	: sinduq
nik	: kin	çîrok	: hîkayet
neyaretî	: dujminatî	miro	: însan
biwêjan	: şuera	tîkil	: tac
zar	: mindal	herfçin	: musehîh
serkot	: meqale	nûser	: muherr
kuvar	: mîcele	pert	: neşir
Firîn	: tîran	hurge-bangyarî:	nadî
serok	: rosa	wênetî	: temsîlî
padşae	: celalet meab	dîdewan	: keşafe
		belên	: weed

Zarê Kurmancî Doza Neteweyê Kurd

Her bîst û çar jimarên Zarê Kurmancî ji kitêbekî bi nirx a bîra neteweyê kurd tête jimartin. Çirok û honrawên wê helgirê bîra netewî ne, gotaran heta ewên komelayetî û hunerî û zanistî qelayî neteweyê bi berda kiraye, hewalan ewan in, ku sûd bi bîra neteweyî digeynin, ziman û şêwaza nûsîn bi zimanekî neteweyî nûsiye û hemû rêzeyên gelî li xwe komkirîye.

Li derbarê doza me ya netewî da gotarek bi navê “*heqê êsta(nûka) û heqê me yê pêşî*” balv kirîye. Nûser ew helwêsta merdane ya ku kurdan beranber bi turkan li mêjû da, nişan daye diênêteve yad, ku çî padaşekê giştî bi jinavbirina kurd dirawete û bo ev rastiye jî li sêdaredana bihiştî Ebdulsalam Barzanî li Musil bi wêne diênêteve. (jimar 1, rûpel 6 û 7, sala yekem, 1926).

Di gotara “*redîye bo wekîlêkî millet*” da serzenîştî nûnerên milletê kurd li perleman da diket, çunke min hîç rolekî wan a berçav nedîye bo parastina mafê milletê kurd û têkoşan û serberzîya mirovê kurd. Helwêsta bêhelwêstîya nûnerên ligel nûnerên şûnên dî da berawird (miqayese) diket, ku li encumen da çawan li pey nav û bidesthênana jiyaneke asûde û bênîgeranê milletekê ku liberamber şêr û pilingan radest in û li meydana şer da êrîş dibine ser top û tîfing, ku çî nûnerên kurd rola xwe bi vê cûre naniwênin û bo kurd hewl nadin, bo vê Zarê Kurmancî bi mikrobî çandûn û labirdinyanê weha bi pêwîst zanîye, ji niwêjê ferztir zanîye. (jimar 9, rûpel 22 û 23, sala yekem, 1927).

Zarê Kurmancî bo vê dê xwendawar û her weha nûnerên kurd li doza neteweyî ya xwe agadar bikate, biryara lijneya navdewletî, ku li rojnameyê “*Elweqat Elbexdat*” jimar 4247 li 18-yê Remezana 1344 da li jêr serdêrî (manşetî) “*lamir kızıyet kurdyet*” da li 25-ê Adara 1925 da made bas kirîye û belavkirîye, weha li jêr ve kurteyekî jê hatiye wergerîn digirin:-

Lijneya Sinûrên Nêvdewletî li ser biryarêkî, ku Encumenê Gelan bien-camî dawa ji dewleta Brîtanya kirîye, ku dibêt li navçeyê Kurdistan da hikumetêkî navçeyî damezirînêt û li rajeyê kurd dabêt û hemû kargêran kurd bin û mamelekirin bi kurdî bêt û li qutabxaneyan jî kurdî bête xwendin û ...

Wezîrê musteameratê Brîtanya li 3yê Eylula 1925 da li beramber encumen da gotarekî xwendîye û di vê gotarê da amaje (îşaret) bi biryarên Lijneya Sinûrên Nêvdewletî û her weha biryarên Encumenê Gelan dawê û gotîye: pêwîste ew biryar bicî bihênin û hikumetê Iraq birastî hewl bidat bo wê ku kurd serbest û azad bijîn, herweha ew jî aşkira kirîye, ku weha [eger hemû rêgezên Iraq mafê xoyan nederêtê ew memleket netiwanê xwe bijiyenêt û ...] (jimar 10, rûpel 4-2, sala duwem, 1927).

Li gotara “*hemû liwayê Kerkûk kurd e*” da ev hatiye baskirin, ku Kerkûk bi her sê qeza û nahîye û hemû gundên xwe ve kurd in, tenê çend gundên turkmanî têda heye.

(Duzxurmatû, Daquq, Beşîr, Tirkelan) û ew jî li senterê du nahîye ne û

gundên dewrûberê wan her kurd in, ku ligel evê jî da xwendin bi zimanê turkî û erebî ye û ew xwendingehên kurdî yên ku Mister Rayl bo kurdan li Kerkûk damezirandibû, navê “tekîye”yê lê danîbû, li paş nemana Rayl daxira û her çend hewl bo vekirinê hate kirin jî bê sûd bûye. (jimar 19, rûpel 10, sala sêyem, 1929).

Li Komeleya Gelan li Cinîwe nameyekî taybet bo kovara Zarê Kurmancî hate pêşkêşkirin, têda ko nûsîna danîştina Encumenê girtbûwe xwe, bo wê ew layenên ku peywendî ya wan bi kêşeya Irqê ve heye û bi taybetî ew pintaney bendîwarîyan bi doza kurd ve heye li kovareke da belav bikirête. Ku nûsîneke danîştina şanzdemîn Komeleyê Gelan girtîye, ku li 6-26/20/1929 da li Cinîwe kombûne. Li vê basê ku tê da hatîye, kotayî pêhatina întîdabî Iraq û ji ber vê çend pirsyarêk ji aliyê serokê Komeleya Glean -Markuys Tîdolî pêşkêşî Mister Burdîlun- cîgirê berpirsê Brîtanya kirîye, ji wan: Çawaniyeta pêwendîya navbera kurdan û ereban, aya umîd dikête ew pêwendî, berve başîyê hinek gav bavêjin? Aya li perleman da yekbûnekî serbixwe yê nûnerên kurdan heye yan her yek ji wan têkelê bi hizbêkî erebî ne? (jimar 21, rûpel 18 û 19, sala çarem, 1930).

Lavij

Mar Basellios Şimûn

Transkrîba ji Suryanî: Dr. Felat DILGEŞ

Nivîskarê vê lavijê, Mor Basellîos Şimûn, Mafriyamê¹ Turabidîn e. Ew bi xwe ji gundê Betmenemê ye, loma bi awayê Mor Basellîosê Betmenemî jî tê zanîn. Gundê Betmenemê di navbera Hezex (Îdîl) û Midyadê de dimîne. Mor Bassellîos Şimûn, zanayek bi nav û deng ê Dêra Sûryanî ye. Wî ev lavij di sala 1740an de nivîsî. Di sedsala ku dijî de, bi zanabûna xwe ew di nav zanayên sûryanî de, yê herî berbiçav û navdar bû.

Ev lavij ji kitêba bi navê Kafo Dehabûbê (ku bi kurdî bi mana Destegul e) hat girtin. Kitêb di sala 1981an li Manastira Mor Gabriêl hatiye çapkirin. Amedekarê kitêbê Mor Julîus (Yeşûh Çîçek), niha Metranê Awrûpa ya Navîn e. Di kitêbê de, xên ji lavija Mor Bassellîos

Şimûn, çar lavijên bi zimanî sûryanî yên din jî hene, ku ev lavij jî gellek kevin in û di nav civata Suryanî de bi nav û deng in.

Mor Bassellîos Şimûn, xên ji vê lavijê hin kitêbên teolojîk jî nivîsandine: *Merkepto Droze (Merkeba Siran)*, *Zeyno Di Tawdîto û Sakro Di Haymonuto (Çekê Îman û Baweriyê)*, *Teoloxîya (Teolojî)*. Xên ji zimanên suryanî û kurdî, wî bi zimanê Erebi jî kitêb nivîsîn.

Sedemê ku wî ev lavij bi kurdî nivîsî, di nav xelqê hêla Tur-abdîn de bi sedan salan e ku weha tê gotin: Abdal Axa, li gundê Betmenemê dijîya û ew bi xwe axayê gund bû. Belê Abdal Axa zilamek zalim bû. Xulamek wî yê suryanî heye ku dixwaze bi keçika kirivê xwe re bizewice. Belê li gor baweriyaya Xirîstiyani zewaca kirivan çenedibû. Çaxê ku xulam ji bo ku bi keçika kirivê xwe re bizewice serî li

¹ *Mafriyam*: Li gor baweriyaya Xirîstiyani, serokê dini yê herî mezin û desthilatdar.

Mafriyan da, Mafriyan jê re got ku ew nikare bi keçika kirivê xwe re bizewice.

Li ser vê yekê xulam çû xwe avêtê Abdal Axa û jê xwest ku navberkariyê bike. Belê Axa bi xwe jî nikaribû çareyekê bibîne, çimkî ev adetek dînî bû. Hingê Axa bi vê yekê gellek aciz bû û rabû serî li Mîrê Cizîrê, Mîr Mihemed da. Belê hê mîr beriya dest bavêje pirsê, hin mirovên Abdal Axa yên ku ji Mor Bassellîos Şimûn aciz bûn, çûn û fesadiya wî li ba mîr kirin. Wan dixwest ku bi awayekî Mor Bassellîos Şimûn bikujin.

Abdal Axa û zilamên xwe ji Mîr re weha gotin: "Mîrê min, gava ku ew hat, tu ji bo xwarinê goşt bidiyê û jê bixwaze ku lavijekê bi kurdî bêje. Çaxê li hember te derket, hingê em dixwazin tu wî bikujî." Çimkî serokê suryanî yên dînî goşt nedixwarin û bi kurdî jî lavij nedigotin.

Gava ku Mor Bassellîos Şimûn hat dîwana mîr, mîr ji bo xwarinê goşt pêşkêş kirê. Belê Mafriyan li ser goşt dua kir û bi awayê ku tê gotin goştê ber wî bû xwarina ji sebze. Piştî ku wî xwarina xwe xwar, Mîr jê xwest ku lavijekê bêje. Hingê wî dest pê kir û ev lavij got. Wî ev lawija xwe, wek dayikeke ku li ser zarokê xwe yê mirî şinê digirinê bi dilşewatî got. Hingê kêfa mîr pirr ji vê lavijê re hat, dilê Mîr li ser wî gellek nerm bû û heskirinek kûr li ba Mîr ji bo wî peyde bû.

Piştî vê yekê Mîr hurmetek gellek mezin ji Mor Bassellîos Şimûn re nîşan da û diyariyekê da wî. Belê mixabin kîn û nefreta Abdal Axa ya li hember Mor Bassellîos Şimûn hê bêtir zêde bûbû. Çaxê Abdal Axa dît

ku mîr rûmeteke mezin da Mor Bassellîos Şimûn û bi ser de ew xelat kir, hingê Abdal Axa ew kuşt.

Ev lavija ha, cara yekem bi herfên latînî di hejmara 25an a Hawarê de tê weşandin. Ya rast, piştî ku min karê transkrîbsiyonê qedand, hingê ez pê hesiyam. Ez rabûm û min her du tekst rûbirû kirin. Min bi jêrenotan, 17 malikên pêşî dan ber hev û cihêtiyên wan nîşan da. Belê dû re min dev ji vî karî berda. Çimkî lavij bi jêrenotan tije dibû û bibê nebê vê yekê ji bo xwendevan dijwarî dianîn pê. Bi ser de du- sê malik bi tevahî cihê bûn û hema bêje di her malikê de çend cihêtiyên biçûk hebûn.

Celadet Bedirxan, di her eynî hejmara Hawarê de, wergera Lavijê ya bi fransî jî çap dika. Di jêrenotê ku li binya lavijê nivîsandiye de, Celadet Bedirxan diyar dika ku wî ev lavij ji sê tekstên suryanî girtiye û cihêtiyên navbera wan bi jêrenotên binî nîşan daye. Li gor ku em ji jêrenota Celadet Bedirxan fêm dikin, ewê di hejmara 26an a Hawarê de benedike xweser li ser lavijê binivîse, belê ne di hejmara 26an û ne jî di hejmareke din de Celadet li ser lavijê nanivîse. Di kovara Ronahiyê de jî, ku wek zêdehiya Hawarê dertê, li ser lavijê tiştek derneketiye.

Hem Celadet Bedirxan û hem jî Mor Julius, her malikek lavijê wek pexşan nivîsandine, belê min bala xwe dayê ku di nav bendên lavijê de qafiyê hene, loma min bi awayê helbestkî nivîsand. Bi vî awayî çêtir tê xwendin û fêmkirin.

Helbet ev lavij, hem bi naveroka

xwe û hem jî li gor dema ku hatiye gotin an nivîsîn(1740), tekstek gellek girîng ê kurdolojiyê ye. Ji alî bawer-mendek suryanî ve nivîsandina lavijê, bi serê xwe hêjayî lêkolînê ye. Bi awayekî berfirehî nirxandina vê lavijê, xebateke akademîk a dûr û dirêj dixwaze. Çimkî ev lavij, li gel navero-ka xwe ya dînî ya dewlemend, xwedan kûrahiyeke edebî ye jî.

Ji demên dîrokê yê gellek kevin ve, di dema ku ev lavij hatiye nivîsîn û heta salên 1980an, zimanê kurdî li Kurdistanê, ne tenê zimanê gelê kurd, belê zimanê peyvîvîne yê suryanî, ermenî, cihû, ereb û tirkî bû jî. Em jî vê lavijê û hê gellek berhemên din jî fêm dikin ku kurdî di nav van gelên Kurdistanê de, wek zimanek edebî û nivîskî jî hatiye xebitandin.

Di karê transkribsiyonê de, me bi tu awayî dest neda awayê gotinê, ango gramerê, peyv çawa hatibe gotin û nivîsîn, me wusa nivîsî. Ev tekstê ku di sala 1740an de hatiye nivîsîn, cardin di xizmeta edebiyatê, pisporên zimanê kurdî û kurdologan de ye.

Not: Min karê transkribsiyonê, bi alîkariya pisporê zimanê suryanî Zekî Aydin kir. Ez jî wî û sebra wî ya bi rojan re sipasdar im.

Lo ev çi deng e û ev çi heydan e²
 Û ev çi gûr gûr e li ezman e,
 Dengê nafir û zirne û borizan e
 Hin dibêjin qiyamet e,
 Û hin dibêjin axirzeman e.

Lo dengê³ sitrûh û boqilnefir ji ezmana hatiye,

Erd û ezman hejilhan, deng kete gohê mirîya,
 Û ruh ketin bedena û kewna vê⁴ qiyametê
 bi se ser wa bariya,
 Hêşîn bûne weka geyayê, ê ku⁵ bihar lê hatiye.

Lo însano cahilo⁶, berê xwe bide ezmana,
 Çiqas hêşîn e û seyr bike li gerê, di felekê⁷
 ,hemû stêrkê di rengin e.
 Û sibhan bike ji Xudanê keremê, ê gu⁸ (ku)
 li⁹ hewa êxistin û danine.
 Belê heyf û xebînetî min tê li husn û cemala di wan,
 Gu paşkê, wê bikevin halê ku em pê ketine.

Lo wî dibêjin axir zeman e,
 Erd û ezman wî¹⁰ bi hev ketine,
 Û dolabê felekê sist bûne.
 Û stêrk hejliyan û tedarika xwe li ketinê kirine.

Heyf¹¹ û xebînetî min tê li şîneya,
 Ruhan û gulçîçek we¹² li va¹³ beybûn û sosina,
 Ku¹⁴ xemlê xwe avêtin weka masiya,
 Li bejê hişk bûne û mirine.

Lo wextê barî teala li dinê bibînî¹⁵,
 Deftera xêr û gunchê min bînî,
 We¹⁶ li ber alimê milyaketê bixwînî,
 Wey li min bênefero, wekî¹⁷ min li

4 Dikare bi awayê "Kunefa". "kewnefa" jî bê xwendin. Di tekstê Hawarê de "xunava" ye

5 Di tekstê Hawarê de "ko"

6 Di tekstê Hawarê de "Lo merovo, nezano"

7 Di tekstê Hawarê de, "di vê felekê"

8 Gu: Ku, pêvgirêka "ku."

9 Di tekstê Hawarê de "ew li hewa..." ye

10 Di tekstê Hawarê de "wî" tune

11 Di tekstê Hawarê de "Belê heyf..."

12 we: Û. Di lavijê de hem pêvgirêka "û" û hem jî "we" hatiye bikaranîn.

13 Di tekstê Hawarê de "pelên beybûn..."

14 Di tekstê Hawarê de "Yên ku..."

15 Di tekstê Hawarê de, "peve bine..."

16 Di tekstê Hawarê de "û..."

17 Di tekstê Hawarê de "wekê..."

2 Di tekstê Hawarê de "heydedan e"

3 Di tekstê Hawarê de, "Lo ma dengê..."

huzûrê¹⁸ bikşînî,
Ezê çî cewabê ruhê xwe bidim?
Tu Xwedê û mêra dihebînî¹⁹.

Lo dengê bilind ji ezmana hatiye²⁰,
Go bilezînin, mizgînî ji miriya re bibin.
Bila ji tirba rabin û xemlê xwe wergerin,
Weka kulilkê di rengîn e.
Lê bihara qiyametê hatiye, berve²¹ herin,
Lê milyaketa xwe qasidê wî kirine²².

Lo dengê xafil²³ ji ezmana hatiye
Me haj jê tunîne²⁴,
Go mirîno ji tirba rabin lê qiyameta heq li
yeqîn e²⁵.
Xwe ji axê û ji ritamê dawêşînin
Û xemlê belgê²⁶ qiyametê wergerin
Û serê xwe hilînin weka zîlika giyayê di
hêşîn e.

Lo dengê nafîr²⁷ hatiye ji ezmana,
Û ji heybeta felek hejihan, stêrik rijihan.
Yeqîn weqata²⁸ ku qiyayê bilind bihelin û
ber û behr bibin meydan e.
Û heşîr û mahşûr bên ku heft pê li pê²⁹
bikevin,
Yeqîn hakim niyeta xwe bike dîwan e.

Lo ma wekî qiyamet bi³⁰,
Û barî teala hakim bî,
Û Mixayel gilîhçî³¹ bî,

Û Cebrayil şehde bî,
Û alem bê huzûrê³²,
Û Azraîl dawêçî bî,
Û alîk jê buhuşt bi³³,
Û alihdin dojeh bî.
Way li min gunehkaro,
Bi wê saetê bêmaferê,
Gelo halê min wê çî bî?

Lo ez hawara xwe ji Xwedê re dişnim,
Gu dojeh xopan³⁴ bibê û bihdimê³⁵ ku ez
bi çava nebînim.
Lê ne bes e derdê dinê û xema mirinê, ku
ez her dayim³⁶ dibînim;
Lê zêde jana dikirê dojehê ne yê xêrê bî, gu
dayim dilê xwe pê dikewînim³⁷.

Lo wey³⁸ li serê min bî,
Wekî min³⁹ li huzûrê bikşînin,
Û deftera xêr⁴⁰ û gunehê min bînin,
We li ber civatê bixwînin
Û min dest bi dest⁴¹ bikin,
We bi⁴² dojehê ve bişînin.
Xwezî ez nebûwama
Û min ew saet nedîtiya
Ku min bi ser zemherî ra dojehê ve
dalînin⁴³.

Lo sitêra sibehî hilatî û qawî dilezînî,
Destê xwe li ba dikî û dengê xwe di hilînî,
Go: Lo însano⁴⁴ birev tobe bike,
Lê milyaketa bi kezêb li pey me dikudînî.

18 Di tekstê Hawarê de "min bikşînin hizûrê"

19 Di tekstê Hawarê de "Lo tu mêran û Xwedê dibîni"

20 Di tekstê Hawarê de "dahatiye"

21 Di tekstê Hawarê de, "pê ve"

22 Di tekstê Hawarê de "Lê milyaketê di xwe kirine
qasidê di we"

23 Xafil: nayê zanîn

24 Di tekstê Hawarê de "nine"

25 Di tekstê Hawarê de "heqelyeqîn"

26 Di tekstê Hawarê de "û xeml û belgîhê di ..."

27 Ji nivîsara sûryanî wek "nifîr" ji dikare bê xwendin.

Di tekstê Hawarê de "nefir" e.

28 Di tekstê Hawarê de "weqatê di wan..."

29 Di tekstê Hawarê de "pê li pêkî..."

30 Di tekstê Hawarê de, "bê"

31 Gilîh: gîli. Gilîhçî: Yê ku gilî dîke.

32 Di tekstê Hawarê de, cihê vê rêzikê guherî ye.

33 Di tekstê Hawarê de, ev rîz û ya dû wê tune.

34 Xuban, xuyan

35 Hidam, hidomo(Bi Sûryanî): Hilweşîn, hidmbeyto:
mala te xera be.

36 Di tekstê Hawarê de "dayim" tune.

37 Di tekstê Hawarê de, ev rîza jêrin weha ye: "Ji tîrsa
jana dojehê ez dilê xwe pê dikewînim."

38 Di tekstê Hawarê de, "weylek"

39 Di tekstê Hawarê de, "min bi kezêb..."

40 Di tekstê Hawarê de, "deftera di gunehên min"

41 Di tekstê Hawarê de, "destedesta"

42 Di tekstê Hawarê de, "bal"

43 Di tekstê Hawarê de, "... ko min dahilînin zêzemîna
dojehê de."

44 Di tekstê Hawarê de, "merovo"

Go⁴⁵ : Heçî tobe nekir û xêr ji keda xwe
nekir,
Wê Xwedê îmanê jê bistînf.

Lo ji qewlê di batil vekin û ji nava hilfnin,
Berê xwe bidin rastiya û xema dinyayê ji
dilê xwe birevînin.
Lê emê essih ciwabê qewlê di batil bidin,
Ku wê rojê me li huzûra heq bikşînin⁴⁶.

Lo însano⁴⁷ bes va şer û guneha bike,
biqere û rûne,
Lê deng, dengê⁴⁸ li ezmana û dergê di
wan vebûne.
Û barî teala bi xwe ye milyaketê wî nazil
bûne⁴⁹,
Û çiqas⁵⁰ mirî hene ji tirba rabûne
Û em gunehkar in, me tobe nekir,
Qewî li me bisû ne.

Lo ma erd şehde ne û ezman gilçî ne
Û barî teala hakim e û milyaketê wî dawêçî
ne,
Lo heke rehm ji ba wî nebî⁵¹,
Me aza nekî,
Me mefir bi tu kesî dî nîne.

Lo ma⁵² ez çî bikim,
Sefîl im û sergîndan⁵³ im
Û rûreş im û gunehkar im,
Lo dikirê mirinê ne ye xêrê bî,
Ku ez xafil girtim,
Û nehêşt ku ez tobedar bibim.

Lo dilê min bi kerba qewî dinalî,
Go: Ne xwezî bi vê dinê û ne bi vî îşî û ne
bî vî halî,

Gu mirin li pey me digerî, roj bi roj, sal bi salî,
Weka bazê li pey werdekê li pey me dizûrî,
we dikalî⁵⁴.

Lo dilê min qewî dêşî we dinalî bi birîna,
Û ji kerba hestirê ji çava dibarin, weka
peşkê dixwîne,
Hemû ji xemê mirinê û zêde ji ezabê dojhê,
Ku dayim tehlî ne û keser in û şîn e û girî⁵⁵.

Lo xwezî ez teyrik bama, ji teyrê di ber
baya,
Ku ez biçûwama keviya behra mezin, min
xwe bihniyaya,
Min xwe ji derdê dinê û ji guneha xelas
bikiraya,
Zêde xofa min ji mirinê ku ez xafil bim, we
bi ser min bihatiya.

Lo hilê de'm tobe bikin, mal xerabo û serê
xwe hilîne û ji xewa rabe,
Lê dinya em ders kirin bi va guneha we bi
va şuxla.
Lo xwezî me ev dinya nedîtiya û me
rohniya wî nebîniya,
Gu paşê esseh wê me bikê ber va (va) dawa
û va hesaba.

Lo malxerabo serê xwe hilîne û ji xewê
rabe,
Lê dinya wî bi hev ketiye, lo wî dibêjin axir
zeman e
Û heyama qiyametê hatiye de'm tobe bikin
û tedarikê axîretê bikin,
Lê ha te dî em xafil, mirin bi tehma me girtîye.

Lo mirin û tu qewî bi lez bi ciwanî pey me
dikudînf,
Tu dayim suwar î û li ser me, we li ser me
pê ve tînf,
Tu nalêfî ku em pîr bibin,
Heta barî teala bi sebir emanetê xwe ji me
bistînf.

45 Di tekstê Hawarê de, "ko"

46 Ev beş di tekstê Hawarê de tune.

47 Di tekstê Hawarê de, "merovo"

48 Di tekstê Hawarê de "dingedinga"

49 Di tekstê Hawarê de, "barî teala bi milyaketên xwe ve dahatiye."

50 Di tekstê Hawarê de, "hingî"

51 Di tekstê Hawarê de, "lê heke ew rehmê jib a xwe nekê..."

52 Di tekstê Hawarê de, "pa"

53 Di tekstê Hawarê de, "sergirdan"

54 Di tekstê Hawarê de, "ko mirin weke bazihê li pey ordeke li pey me dizûrê û dikalî."

55 Di tekstê Hawarê de, "tehlî ne û girî ne."

Lê dinê te nehîşt em tidarika mirinê bikin û
 te em berdane sehreya,
 Tê go safî bikin dilê xwe, lê mirin dûr e û
 niha nayê,
 Tê em xapandin û mirin em xafil girtin li
 dinê,
 Tê nehêşt em têr sefayê bikin li vê dinyayê.

Lê dinê, tu ewil nişanê me didî rihetî û sefa
 û xweşiya,
 Paşkê tu dilê me tijî dikî jan û derd û
 tahliya,
 Zêde dikirê mirinê ne yê xêrê bî,
 Ku dayim suwara we li ser me bi paniya
 Û me ji tişt û malê di ber şemrend û me
 dest ji ber ruhê xwe kiriye.

Lo mirin û tu pêşkarê me bûyî zivistan û
 havîna
 Û te mehbûba dila ji me sitandin xwedanê
 hesp û rext û zîna,
 Lo dikirê (te ne yê xêrê be,
 Gu ji dil xemlê di nadir û di nazik te serê
 me bistan,
 Bi kefenekî di reş û şala,
 Lê pa ez çî bikim me mecel bi te nîne,
 Me tu supartî hukmê barî teala.

Lo malxerabo, serê xwe hilîne, lê em ders
 kirin va mirina,
 Ku ji koma û civata ji me nehêşt yek bi
 tenê,
 Lo d'em ji xema û derda mirinê,
 Balgehê evdaliyê wergirin û tayih bibin bi
 vê dinê,
 Lê heyf û xebînetî min tê ku emê,
 Bi va xema û bi va kesera biçin û bikevin
 gorina.

Lê dinê te ez berdame pey guneha
 Ji şîrî heta bi pîrî,
 Lê mirin qonaxçiya,
 Cihê min kir nav agirê dojehê
 Û ba û bizrûk û zemherîra.

Lê dinê, te ez ji guneha bar kirim,
 Û te destê min ji xêrata birriya,
 We zanim ku paşî poşmanîya,

Û keser in û şîn e û girîn e.
 Xwezî ez bi miriya ra ji tirba ranebûwama
 Ku min dojeh nedîtya,
 Lê min taqeta ezabê wî nîne.

Lo malxerabo, serê xwe hilîne, çavê xwe
 veke,
 Lê mirin em ders kirin û em sêwî hiştin ji
 dê û bava
 Û felekê em tazî hiştin li ber barana we li
 ber tava.
 Lo oxira di felekê ne yê xêrê be,
 Gu ji tişt û malê di pir em xizan kirin,
 Û em xistin ber va mutala,
 Û ber va hesaba.

Lo berê xwe medin vê dinyayê,
 Lê xayin e û derewîn e,
 Geh tal e û geh şîrîn e,
 Geh şahî ye, geh şîn e
 Û geh ken e û geh girîn e,
 Tehqîq ku tu destgirtiya min buwayî
 Gu min tu bi yekî dî bidayî,
 Lê pa ez çî bikim tu maka min î
 Û min mecal bi te nîne.

Lê dinê tu xayîn î û bêray î,
 Tê ez berdame pey guneha serberdayî,
 Tehqîq wekî tu dergistiya min buwayî,
 Min tu bi yekî din bidayî,
 Lê pa ez çî bikim tu maka min î,
 Min mecal bi te nîne û tu bi min dikarî.

Lê dinê, xwezî ez ne buwama,
 Min xêr û mekseba⁵⁶ te nedîtiya,
 Ku te ez berdame pey guneha,
 Û te ez menih kirim ji heft qewlê Xwedê û
 nebiya,
 Tehqîq wekî tu keçik bi xwezî buwayî
 Ku min tu bi yekî dî bidayî,
 Lê ez çî bikim tu maka min î
 Û min tu sipartî Xwedê û mêrê weliyayî.

Lo qulingo tu pirr bilind dibî û tu dinyayê
 dibînî, çî mîna ye?
 Go: Lo çî hewce ye hûn pîrsa dinê ji min bikin?

⁵⁶ Mekseb: Feyde

Dinya ye, we li darî çava ye, îro şahî ye û
bin da şîn e û sefa wî nehêja ye, Heke hûn
ji min yeqîn in gu dojeh ew bi xwe ye,
Xwezî em nebuwana û me nedîtîya.

Lo ev dinya mîna ye, meha zivistana,
Ku darê terr û hişk,
Mirhovê diçê û xerab hemû yek ewan e,
Û sibeha qiyametê mîna ye meha Nisanê
Gu darê terr û mihrovê diçê,
Wê xemlê xwe werkirin,
Fêhm bike û qenc bizane,
Ku darê di hişk û mihrovê di xerab wê çê 57
agirê ceahnemê ra,
Bibin xurde û nane.

Lo qulingo tu bi ser me ra gazî dikî û
dixwînî,
Go lo bîhna dojehê ji vê dinê dibhim,
W'ez hawara xwe ji Xwedê re dişînim,
Gu laşê min tê nemînî.
Xwezî bi wî mihrovî ku jê birevî,
Û xêreta bikê û pêşîya xwe bişînî.

Lo qulingo sergindano,
Tu qewî hawar dikî û dilezînî.
Go: Lo ez direvim
Ku dengê gurgura agirê dojehê dikim dilê
xwe pê dikewînim,
Ku ne xwezî bi cihê heramxwar e û zef kûr
e,
Ku cihê wan azabekî dijar e,
Xwedê tu muddet, kes nebînê.

Lo qulingo tu xayin î bi cihê xwe re zivistana,
Tu piştî xwe didî va çîya û va berfa û va
sîpana,
Û tu berê xwe didî deşt û beriya û sefa dikî
her ewana,
Û dîsa ku bû germ û havîna,
Tu berê xwe didî çiyayê bilind û hînkayîya,
zozana.

Lo ez ne xayin im, lê dinê xayin e, w'ez ji
ber direvim û dilezînim,
Nahêle ez li derkê biqerim, ku ez emrê xwe

bi rihetî biqedînim.
Ez her bi ser we gazî dikim û dengê xwe
dihiltînim,
Ku hûn jê birevin, lê xayîna ez her ecêba
xayîntîya wî dibînim.

Lo qulingo, em nizanin tu bihay î an tu
nivistî,
Xwe bişidîne we bi hewa xwe hilfne, lê tu
qewî sist î,
Go: De em pîrsa dojehê ji te bikin, lê me
dengê wî ji mêj nebihîstî,
Go: Lo ez saloxa wî qenc bidim we, belê jê
birevin weka mihrovê margistî.

Lo dojeh alîk jê behrek agir e û kifrît û zift
û qîr e
Û bîhnek jê tê reş û tarî hawîr e,
Lo dikirê wî ne yê xêrê be,
Ku aliyê din behrek serma ye û ba û bêzrûk
û zemherîr e.

Lo felekê zalimê ev dolamet e te bi serê me aniye,
Ku ji dêl xweşî û sefa te dilê me ji xema û
kesera dagirtî ye,
Weka ji me dihat em xêr û xêreta bikin te
nehêştîye,
Û niha ji tişt û malê pîrr te em xîzan kirin û
te em anîn parsekiyê.

Lo qulingo tu qewî bi hewa dikevî û tu
çengê xwe dihejînî,
Û tu berê xwe didî ezmana û tu erş û kursî
dibînî,
D'em pîrsa bihuştê ji te bikin, lê tu Xwedê
û mêra dihebînî,
Ku em bêjin rast û mizgîniya buhuştê ji me
ra bînî.

Lo wesfê buhuştê miqate ye⁵⁸ û qewî zor e,
Bajarekî bêqedir mezin e û bilind e û bêsur e
Û jê difûrî we diherikî bîhnekî xweş û
behrek nûra,
Hin sipî ye û hêşin e û hin kesk û sor e.
Lo heke behra me' tê nebî,
Xwezî em nebûwana, ku janek mezin e û
derdekî kûr e.

57 Çê: biçê

58 qetî.

Lo dikirê bihuştê ê xêrê bî, sefa raserî me ye,
Tiştê ku ne çava dîye û ne goha bihîstîye û
 ne bi ser fikrê dila ketîye,
Lo heke hûn ji min yeqîn in, ne xelet in ku
 buhuşt dî ne,
 Barî teala bi xwe ye.

Lo bihuşt welatekî bêqeder ferehî e û
 vatanekî şîrîn e
 Û buharekî bêhed xweş e û her dayim hêşîn e.
 D'em dua ji barî teala bikin, gu me jê
 mehrûm nekê,
 Lê dilê me ji guneha şikestî ye we bi kul e
 û bi birîn e,
Lê dojeh muqabilê me taqeta ezabê wî nîne.

Lo ma çî bikim, bi va guneha û va kula û va
 birîna,
 Mirin hatiye, me mecel bi ruhê xwe nîne,
Lê heke barî teala me bi rehma xwe aza bikê,
 Heke na, mecal tu kesî dî nîne.

Lo însano barê mirinê raykî bike û hilê rabe,
Lê barî teala adil e, ne rûmetî li balê heye û
 ne mehabe,
Mîr û feqîr û xanî û xîzan hemû li ba wî
 yek hesab e.
Her yek feilê wî bikê mîzanê û cezayê wî bidê,
Heke sefa û riheti ye, heke cefa ye û ezab e.

Lo însano, d'em tobe bikin,
 Lê telihna dijwar li ber me hene,
 Sisê ne, we li ber me veketî ne,
Esseh emê bi ser wa kevin, li derê rê ne,
Yek jê mirin e û yek jê huzûr e û yê din
 dojeh e
Ku can û kul û derdê me ne, ji wan e,
 Lê em çî bikin xelasa me ji wa nîne,
Ku qisas û cezayê me ne û hukmê Xwedê ne.

Lo qewlê kîtaba em gêj kirin,
 Û me gohdariya wan nekiriye we bihuşt û
 dojeh hene,
D'em dua ji barî teala bikin û bixwînin fatheya
Û em bêjin ya Reb tu bi êz û celalê di xwe kî,
 Heke em nehêja ne bihuştê tu me nekî
 dojehê,
Girê hesretê besî me ye.

Lo ez weka quling hawar dikim bi ser
 dinyayê dengê xwe dihiltînim,
 Weka kewê ribat li sehreya û ez li zara
 dixwînim,
 Û her yek navê wî dihiltînim
 Û ji hezarî yek li pey dengê min nayê,
 Hê ku ez dey nakim, ji qewlê di ber ku tu
 buha pê nayê,
Lê ma ez çî bikim ji derd û kulê axîretê
 hedana min nayê.

Lo çî biharekî xêr e hatî bi me ra w'ez
 girandim û bi va mêrga, va diyara
 Û min jê çinî baqek rihan û gulçîçek ji civa-
 ta nadir ra,
 Rehme li dê û bavê ku qewl gotin û dê û
 bavê gohdar û hazira.

SILÎVA:

BAJARÊ KU HEFT CAR XERAB Û HEFT CARÎ AVA BÛYE

Rohat Alakom
ralakom@yahoo.com

Gotina ku dibêje: "*cihê ku lê sekiniyê bikole!*" careke din tîne bîra me ku xebatên deverî (herêmî, lokal, meheli) çiqas girîng in û kemala wan mezin e. Xebat û lêkolînên deverî îro yek ji wan beşên kurdnasiyê (kurdoloji) yê girîng pêk tîne. Divê êdî warên lêkolînan teng, lê belê kûr bibin. Her kes li dîrok, folklor û devokên herêma xwe lêbikole û derxe holê, ez bawer dikim di nav demeke gelek kurt de hewes û evîneke mezin wê di derbarê kurdnasiyê de di nav lêkolîner û nivîskaran de dest pê bike. Êdî qala *mîkro-dîrokê* tê kirin. Dîroka dîroka cixaran, dîroka dînan, dîroka girtûgehan, dîroka nênan, dîroka pirtûkan, dîroka xaniyan... Ev babetana û babetên wek wan dikarin gelek rûpelên dîroka çanda kurdan jî ronî bikin. Tenê di nav me kurdan de dîroka sîyasî wek dîrok tê zanîn, lê belê dîroka çandî gelek caran tê ji bir kirin. Warên kurdnasiyê her diçin,

fireh dibin, wek alanake bêsînor e. Gelek babetên balkêş hene ku wisa veşartî mane, kes nêzîkî wan nebûye. Yek ji wan wek mîsal bajarê Ferqînê ye, li ber çavên me ye û li çavên me dinêre. Her quncikekî Silîva dîrok e, her mirovek xweyê serpêhatîkê û xweyê macarayekê ye. Divê em cesaret bikin û hewl bidin ji cîhekî dest pê bikin. Edetên nivîs, qeydkirin û xwandinê pir bikin. Silîva di dîroka kurdan de yek ji wan bajar û navendên herî girîng e. Serbajarê dewletoka kurd, mîrîtiya merwaniyan bûye, rengê Silîva yê netewî û kurdî angorî Amadê (Diyarbekirê) jî gelek vekirî û bi mane ye. Ji bo vê yekê Silîva zêde hêjayî lêkolîn û parastinê ye.¹

¹ Di derbarê Silîva de du lêkolîner min di kovarên Nûdem û Gulistanê de çap bûn, ev beşa ya sêyem e. Di pêşerojê de dixwazim formekê bidim wan û wek pirtûkeke piçûk çap bikim.

Min gotina Silîva, *heft car xerab bûye û heft carî ava bûye* pêşiyê li Stockholmê ji devê yekî Silîvî bihist.²

Min berê zanibû çî qeza û bela di dîrokê de hatine serê kurdên vê deverê, lê belê min berê ev gotinên folklorîk û aforîzmatîk tu wext nebîhistibûn. Bi rastî ev gotinên neninivîsî qedera bajarê Silîvayê bi zimanekî edebî û folklorîk, gelek baş îfade dikin. Dema em dîroka vî bajarî berçav dikin, em dibînin ku her sedsalê carekê ev bajarê kevn hatiye xirabkirin û careke din ji nû ve ava bûye. Silîva di sedsalên kevn de ji aliyê kesên ku dîne xiristiyaniyê diparêzin, wek bajarekî pîroz hatiye qebûl kirin. Hestiyên kesên xiristiyaniyê û cesetê wan li Silîva dikirine gorê, wek goristanekê hatiye qebûl kirin.³ Bajar paşê ketiye bin kontrola gelek hêzên cuda, wek Hamdanî, Buveyhoxullarî, Merwanî, Artukoxullarî, Eyubî û Osmanî. Bajar bûye hedefa êrişên moxolan û careke din hatiye xirabkirin. Van serobinan wusan ji bivê-nevê li ser mirovên vê deverê bandoreke mezin hiştiye. Ev yeka divê bê vêkolandin.

DÎROKA SILÎVA BALA LÊKOLÎNERAN DIKÎŞÎNE

Dîroka Silîva gelek bala hin biyaniyan û lêkolîneran kişandiye. Dema mirov li çavkaniyan mêze dike, bi rastî ji mirov dibîne ku Silîva di gelek minasebetan de bûye babeta

² Kurê Muhterem Biçimli.

³ *Martyropolis*, The Catholic Encyclopedia, vol. IX, 1910.

lêkolînan. Derbarê dîroka Silîva de heta niha çend berhem û xebat hatine nivîsîn. Di nav van de berhema ku hertim hêjabûna xwe parastiyê, pirtûka bi *Tarîkh Mayyafariqin wa Amid* (Dîroka Silîva û Amedê) ye. Ev pirtûka bi erebî ye ji aliyê Ibn al-Azraq de hatiye nivîsîn. Çawa tê xuyan pirtûk ji du beşan pêk hatiye, beşê li ser dîroka Silîva û beşê li ser Amîdê (Dîyarbekir). Beşê yekemîn derbarê mîrîtiya kurdan ya navdar Merwaniyan e.

Bi rastî ev xebata bi navê *Tarîkh Mayyafariqin wa Amid* (Dîroka Silîva û Amedê) wek destnivîs cara pêşîn berî sed salî bala H.F. Amedroz kişandiye. Wî bi nivîseke xwe ve bala lêkolîneran, kurdnas, nivîskar û rohilatnasan kişandiye ser vê çavkaniya giring û giranbiha⁴.

Derbarê dîroka Merwaniyan û Silîvê de kesa ku vê gavê kar dike Carole Hillenbrand e. Di Universita Edinburgê de derbarê babeta Dîroka Îslamê lêkolînan dike. Li ser devera Cizîrê doktoraya xwe amade kiriye. Heta niha di derbarê Merwaniyan⁵, pirtûka Ibn al-Azraq⁶ û gelek tiştên vê dewrê de çend nivîsên zanistî amade kirine. Bi taybetî *Tarîkh Mayyafariqin wa Amid* (Dîroka Silîva û Amedê) gelek bala wê kişandiye. Xebatên C.R.

⁴ H.F. Amedroz, *The Marwanid dynasty at Mayyafariqin in the tenth and eleventh centuries*, Journal of the Royal Anthropological Society, 1903.

⁵ Carole Hillenbrand, *Marwanids*, The Encyclopaedia of Islam, rûp.626-627. (Çapa teze).

⁶ Carole Hillenbrand, *A Muslim Principality in Crusader times*, Nederlands Historisch-Archaeologische Instituut te Istanbul, 1990.

Robinson⁷ û Ephrem-Isa Yousof⁸ ku di van salên dawîn de hatine weşandin, bala dorberên akademîk kişandiyê ser Mîrîtiya Merwanîyan.

KESÊN SILÎVÎ, BAJARÊ BAZÎDÊ ŞÊN DIKIN

Silîvayê bala dîrokzanê kurd Mele Mahmud Beyazîdî jî kişandiyê. Ew di beşeke pêşgotina pirtûkeke xwe de dibêje ku kurd pêşiyê hatine Diyarbekirê, li Meyafêrîqînê cîwar bûne û paşê li gelek aliyên din belav bûne⁹. Ahaliyê Silîva bi derdorê xwe ve gelek pêwendî pêk anîne. Ev yeka bi pêşketina bajêr ya pîralî ve girêdayî ye. Angorî Mele Mahmûdê Beyazîdî, wek mîsal bajarê Bazîdê ji aliyê kurdên Silîvayê de hatiye şên kirin:

"...Mirovekî bi navê Evdî beg bi eslê xwe ji Merwanîyên Mayafariqînê bûye, ji Diyarbekirê, digel çend malbatên Silîvan hatiye tevî xizmeta Sultan Murat bûye. Di şerê nêzikî Yerîvanê de mêraniya xwe nîşan daye û celaleta Siltan Murat, bajarên Bazîdê, Eleşkirtê, Mîlwe û hawirdorên wan *yurtlûk* û *ocaklık* xelatî Evdî Begê û êla Silîvan kiriyê. Wan li wir qela û gund avakirine, li wira mane û navê Bazîdê û qezayên wê bûye "Silîvanlî" ser navê êlê"¹⁰.

⁷ Dr. C. F. Robinson, *Ibn al-Azrak, his Tarikh Mayafariqîn, and early Islam*, Journal of the Royal Asiatic Society 3.6.1 (1996): 7-27.

⁸ Isa Yousif, *Les Chroniqueurs Syriaques*, L'Harmattan: Paris, Budapest, Torino: 2002.

⁹ E. I. Vasillieva, *Pirtûka Wînda ya Dîroka Kurdistanê*, Almanaxa Kurdî, Weşanên Roja Nû, 1997, rûp. 77.

¹⁰ E. I. Vasillieva, *Pirtûka Wînda ya Dîroka Kurdistanê*, Almanaxa Kurdî, rûp. 81-82.

Çawa ku tê zanîn Siltan Murat (IV. Murat) di navbera salên 1623-1640'î de hukimdarî kiriyê. Sefera wî ya Rohilatê di sala 1635'an de dest pê kiriyê. Dema çûye Bexdayê li dorberê çiyayê Aledaxê hêwiriye. Ev îfadeyên Mele Mahmûdê Beyazîdî yên ku kontakt û pêwendiyên *kurdên Serhedê û kurdên Silîvayê* ronî dîke, ji gelek aliyên ve girîng e. Em ji vê pêşgotina Mele Mahmûdê Beyazîdî fêr dibin ku wî di beşa nehan ya lêkolîna xwe de cih daye bûyerên dewra Silîvanliyan li Bazîdê. Şerefxan di xebata xwe ya navdar Şerefnameyê de cih nedayê devera Bazîdê û êla Silîva. Mele Mahmûdê Beyazîdî xwastiye vê valahiya dîrokî tijê bike û xwendevanan di derbarê dîroka bajarê Bazîdê û Silîvayê de zêdetir agahdar bike.

Hin çavkaniyên heyî jî nîşan didin ku kurdên Silîvayê di Paşatiya Bazîdê de hebûne, wek xebatên Abovyan¹¹ û Wagner¹². Abovyan dibêje ku berî sed-salan kurdên li derdorên Bazîdê ji xwe re nedigotin Bazîdîlî, ji xwe re digotin Silîvanlî. Çavkaniyêke mayin dibêje ku eşîra "Silîvan" û "Silîvanlî" li derdorên Diyarbekir, Malazgîrd, Mardîn, Rakka û Erxeniyê hebûye¹³. Angorî Law Reşîd, navê Silîvan wusan jî li devera Erziromê navê eşîreke kurdan bûye. Kurdên vê deverê bûne babeta gotineke pêşiyên ya kurdî (mesele û metelok) ya salên derebegiyê: "*Ferek cizmeya Rojkan, berdaye pênc hezar siwarên Silîvan*"¹⁴. Rojkan

¹¹ Xaçatûr Abovyan, *Kurd - Êzdî*, Erevan, 1986, rûp.63.

¹² Moritz Wagner, *Resa till Persien och Kurdernas land*, cild II. Örebro, 1953, rûp. 176.

¹³ Cevdet Turkay, rûp.130.

¹⁴ Law Reşîd, *Kürdlerde Durub-ı Emsal, Jîn, hejmar: 5*, 1918-1919. (Çapa ku ji aliyê Mehmed Emin Bozarslan ve hatiye amadekirin).

ji eşîreke mayin e ku zêdetir li dorberên Bidlîsê dimînin¹⁵. Angorî Muhammed Varlî kurdên ku li dorberê Dîyarbekirê diman ji wan re Silivî dihate gotin. Angorî Mele Mehmud Beyazîdî di salên 1860'yî de li dorberê Dîyarbekirê qasî 4000 xaneyên ji eşîra "Silwî" hebûne¹⁶.

Ehmedê Xanî dema behsa zaravayên kurdî dike, wan li ser sê beşan parve dike: "*Bohtî û Memedî û Silivî / Hincal û hinek ji zêr û zivî...*" Angorî Zîya Gokalp kesên ku ji der zaravayên Bohtî û Mehmedî dipeyîvin, ew kes dikarin Silivî bîn hesabî û erdê ku ew lê dijîn jî bi navê Silîvan tê bi nav kirin. Angorî Zîya Gokalp, Silîvan navê erdekî fireh e, ji erdê qezaya Silvan (Mayyafariqîn) firehtir e. Zîya Gokalp dibêje ku, kurmancên Silîvayê dibine du beş: *Mîl û Zîl*. Hin caran li cihê Zîl peyvên *Siliv* û *Sîl* tê bi kar anîn¹⁷.

TORIN JI KU HATINE SERHEDÊ?

Torin wek komeke aristokratên kurd tê zanîn. Piraniya wan berê li Serhedê diman. Ji wan gelek sînorparêz bûn, di nav ordiyên rûs de generalên kurdên torin hebûne. Yek ji malbatên Farqînê ku bi tirkî wek *Ezîzoxullarî* hatiye nasîn angorî hin kesan koka wan diçe, dighêje Torinan¹⁸. Dema havîna sala 2002'an

¹⁵ Averyanov, *Osmatlı -Rus ve İran Savaşlarında Kürtler*, Sıpan, 1995, rûp..IV.

¹⁶ Mele Mehmûd Beyazîdî, *Çirokên Kurmançî*, amadekar: Cankurt, rûp.30.

¹⁷ Zîya Gokalp, *Kürt Ajireteleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*, Sosyal Yayınları, 1992, rûp.29-30.

¹⁸ Nedred Bilici ku bi xwe ji Silivayê ye ev yeka ji devê Torinên İdirê (Elî Begê) bihistiye. Kurê Elî Begê Yaşar Oner ku niha li Stockholmê dimîne, wî jî behsa vê gera bavê xwe ya Siliva kiriye.

de ez çûme Dîyarbekirê, min nasiya xwe da malbateke ji Ezizoxullarî û ji wan re qala koka Torinê kir. Lê belê wusan dihate xuyan ku haya wan gelek ji vê nêzikayê û pismamtiya kevnare tune bû. Yek ji mezinên Torinan, Elî Beg berî mirina xwe, di salên 1970'yî de ji bo serlêdanê ji İdirê çûye Silîva, li wir mala Ezîzoxullarî ziyaret kiriye. Elî Beg kurê Resûl Begê ye û koka vê malbatê dighêje Eyup Paşa. Bi eslê xwe ji gundê Zîro ye. Ev gund, gundekî Agiriyê ye. Lê belê Elî Begê mala xwe bar kiriye aniye İğdirê. Çawa me li jor jî da kivşê eşîreke bi navê Silvanlî li Bazîdê dijiya. Elî Beg piştî ku ev yeka fêr bûye, mimkûn e bi saya vê ger û ziyareta xwe xwastiye ku bi nas û pismamên xwe li Silîva bibîne û bi wan re bibe nas¹⁹.

Di nav gel de tê gotin ku sê seyîdên kurd ji ber zilma Haccac direvin, tên gundê Kelî, li nêzikî Silîvayê cîwar dibin. Eşîrên Silîvayê ji van hez dikin û li wan xweyî derdikevin. Ev hersê bira demekê li Silîvayê dimînin, paşê ber bi Serhedê, zozanên Zîlanê (nêzikî Ercîşê) diçin. Navê yek ji van biran Resûl Axa bûye. Ev Zîlanlîyê îro neviyên Resûl Axa ne²⁰. Navê gundekî li derdorê Silîva, nêzikî Malabadê, Zîlan e, niha jê re dibêjin *Yeni Çağlar*²¹. Di sedsala 17-an de li Eyaleta Dîyarbekirê devereke hebûye, navê wê Zîlan bûye²². Divê em bidin dîyar

¹⁹ Hevpeyvîniya bi Remzî û Semra Ezizoxlî re 27/6. 2002. Remzî Ezizoxlî serêkê berê yê Belediya Yenîşehîrê ye (ta-xeke Dîyarbekirê).

²⁰ İbrahim Bağdu, *Seyhî Xalîd*, İstanbul, 1993, rûp.4.

²¹ İbrahim Bağdu, *Seyhî Xalîd*, İstanbul, rûp.12.

²² İbrahim Yılmazçelîk, *XIX. Yüzyılın İlk Yansında Diyarbakır*, Türk Tarih Kurumu, 1995, rûp.125.

kirin ku di navbera peyvên *Silva*, *Siltvi*, *Silvan* û peyvên *Zil*, *Zilan* de nêzikayên balkêş hene²³.


**BALADEKE KURDAN:
SERPÊHATIYA
SÎYABENDÊ SILÎVÎ**

Silva yek ji wan bajar û navendên kurdan ê herî kevn e. Yek ji wan destanên kurdan yên bi nav û deng *Xecê û Sîyabend* e. Gelek caran di çavkaniyan de mêrxasê mêrîn Sîyabend wek "Sîyabendê Silvî" tê nasîn an jî tê pêşkêşkirin. Di nav gel de gelek şaxên vê destanê yên devkî hene. Dema em çavkaniyan raçav dikin, em dibînin ku şaxa ku cara pêşîn hatiye berevkirin, di sala 1854 an de hatiye nivîsîn û qeydkirin. Ev bûyera derbarê berhevkirina folklorê kurdî de bûyereke gelek balkêş e. Ji ber ku heta wê demê folklorê kurdan bala rohilatnas, folklorêna û lêkolîneran ewqas nekişandibû. Ev şaxa *Xecê û Sîyabend* jî aliyê M. A. Jaba ve wek *Balada Kurdan* (Ballade Kurde)

²³ Rohat Alakom, *Törn: Artstokratiën Kurd*, Apcc, 2004.

²⁴ Ballade Kurde resueillie et traduite par M. A. Jaba et communiquée par M. de Tchinateff. *Journal Asiatique*, Paris, 1869, Tome XIV, rûp. 153-166.

hatiye binav kirin²⁴. Destan ji aliyê M. A. Jaba ve hatiye wergerandin, kurdî û fransî bi hevra weşiyaye. Tişteki mayin, di van salan de kurdiya vê destanê him bi tîpên latînî û him jî bi tîpên erebî hatiye çap kirin. Tekst qasî 13 rûpelan e. Angorî vê şaxê



destanê, Sîyabend ji "...*tayfa Silîvanid Dîyarbekri...*" bûye²⁵. Çawa tê xuyan peyva *Silîvanid* ev cara pêşîn ku di çavkanîyeke kurdî de derbas dibe û wek navê eşîrekê-qebîleyekê hatiye bikaranîn. Paşê di cîhên mayîn yên vê şaxê de navê Sîyabend bi îfada "Siyahamedî Silîvî" tê nasandin.

Çawa ku tê zanîn berê navê Silîva, Mayyafarqîn bûye. Dema Mayyafarqîn di sedsala 15'an de dikeve bin destê kurdên bi navê *Kurdên Silimanî*, navê bajêr jî dibe *Silvan*. Ji sedsala 15'an heta niha, ev bajar di nav kurdan de wek *Silvan/Silîva* tê zanîn. Peyva *Silîvî* çawa di destana Sîyabend û Xecê de jî tê xuyan wek sîfat hatiye bikaranîn. Eger mirov ji van agahdarî û zanî-yariyan bi rê bikeve, mirov dikare bi rehetî texmîn bike ku destana Xecê û Sîyabend di nav kurdan de bi kêmanî ev 500 sal in tê gotin û tê nasîn.

Tiştêkî herî balkêş jî çawa em dibînin ku keçeke mayîn bi navê Şemsê di vê şaxê destanê de cihê Xecê girtiye. Keça ku bûye evîndarê Sîyabend ji eşîra Millî, keça Temîr Paşa bûye. Ev perçeyê folklorê kurdî jî aliyê ziman de jî balkêş e. Tiştêkî din ê giring jî ew e ku serpêhatiya Sîyabend, bala Mela Mehmûdê Bazîdî kişandiye û wî aniye ev destan wek nesir (nivîsên vekirî) nivîsiye. Wusan tê xuyan ku di salên 1850'yî de ev şaxa Xecê û Sîyabend di nav xelkê de gelek belav bûye²⁶. Serpêhatiya Sîyabend di

nav xelkê Silîva de bûye destaneke herî hezkirî û heta îro jî li ser zarê gelê vê deverê digere:

...
Sîyabend dibê: Xecê ez Sîyabend im,
Sîyabendê Silîvî me.
Xweyê tîr û kevanê zivî me.
Minê Xeca keleş ji heft êla û heft eşîra
Ji heft bira stand, ez revîme
De niha ez li ber sekerata ji destê nêçîra
pezê kuvî me²⁷.



Wêne: N. Kaya

Dilketiya Sîyabend wek li jor di şaxeke destanê de tê xuyan ne Şemsê ye, Xecê ye. Di beşê dawîn yê vê destanê de ku îro tê zanîn çawa em dibînin, Xecê jî wek Sîyabend rîya mirinê hildibijêre.

Ez Xec im, Xeca dîn im
Ezê şera reş li ser çavên xwe bişidînim
Ezê xwe bi Sîyabendê xwe re bigihînim²⁸.

²⁴ *Ballade Kurde* resueillie et traduite par M. A. Jaba et communiquée par M. de Tchinateff. *Journal Asiatique*, Paris, 1869, Tome XIV, rûp. 153-166.

²⁵ *Ballade Kurde*, rûp.156.

²⁶ Aleksander Jaba, *Çîrokên Kurmançî*, amadekar: Cankurt, *Weşanxana Çand Nûjen*, Stockholm, 2000, rûp.55-57.

²⁷ Ev şaxa vê destanê jî aliyê Ehmedê Argîn de hatiye berevkirin, wek destnivîs e. Kopyake vê destnivîsê di arşîva nivîskar de ye. Di binê destnivîsê de: "Ehmedê Argîn 16.9.1983, Salzgitter" hatiye nivîsin.

²⁸ Mihoyê Mecid, *Ji Folklorê Me*, hejmar: 2/1993.

Folklorînasê kurd Ahmed Aras ser-pêhatiya Sîyabend û Xecê wek pirtûk çap kiriye²⁹. Yek ji wan xebatên herî baştirîn tê hesibîn. Lê belê Ahmed Aras di vê xebata xwe de zêde behsa şaxên Sîyabend û Xecê nake, ew şaxa jorîn ku navê Şemsê dide, di vê xebata Ahmed Aras de derbas nabe. Bi kurtî "Silvabûna" Sîyabend wek tezekê her berdewam e. Bi kêmanî kesên ji vî bajarî wusan difikirin û xwe dispêrine çend zaniyarîyên dîrokî û folklorîk³⁰.

ZEMBÎLFIROŞÊ SILÎVÎ?

Destaneke ku di nav kurdan de wek destana Xecê û Sîyabend gelek belav bûye, destana Zembîlfiroş e. Angorî gelek vegotinên bûyerên vê destanê li bajarê Silîva derbas bûne. Li Silîva qelayek heye, îro jê re dibêjin *Qelaya Zembîlfiroş*. Xirabe û bermahiyên vê qelayê heta niha jî mane. Angorî hin vegotinên devkî Zembîlfiroş xwe ji vê qelaya bilind avitiye û paşê jî miriye. Ji der van delîlên arkeolojîk hin çavkaniyên mayin jî hene ku cî û warê bûyerên destana Zembîlfiroş wek Silîva nîşan didin. Yek ji wan çavkaniyan di sedsala 18-an de ji aliyê Mirad Xanê Beyazîdî de hatiye nivîsîn. Ev berhema di derbarê *Zembîlfiroş* de gelek salan wusan wek destnivîs maye. Destnivîs cara pêşîn di sala 1967an de wek pirtûk li Iraqê ji aliyê Giw Mukriyanî ve tê weşandin³¹. Ev şaxa dawîn, ne şaxeke

folklorîk e, wek şaxeke edebî ji aliyê Mirad-Xanê Beyazîdî ve hatiye nivîsîn³². Li ser vê pirtûkê piştî çend salan lêkolîneke dirêj di sala 1979an de hatiye weşandin³³. Di vê nivîsê de tê dîyarkirin, Zembîlfiroş yek ji wan mîrê Merwanîyan e, navê wî yê rastîn jî Seîd e. Angorî vê dîtinê Seîd yek ji kurê Ebu Nasir Ehmed³⁴ e. Çawa tê zanîn paytextê vê mîritiyê Silîva (Mayafarîkîn, Silvan) bûye. Hin şaxên Zembîlfiroş yê folklorîk bi xwe jî hene ku nîşan didin wekî bûyerên vê destanê li Silîva derbas bûne³⁵.

Çawa tê xuyan hin zaniyarîyên arkeolojîk, dîrokî, edebî û folklorîk nîşan didin ku destana Zembîlfiroş cara pêşîn li Silîva hatiye gotin û hêdî hêdî li deverên mayin belav bûye. Heta niha gelek şaxên destana Zembîlfiroş hatine weşandin³⁶. Bi kurtî naveroka destana Zembîlfiroş waha ye: Zembîlfiroş debara xwe tenê bi firotina zembîlan (sêlik) pêk tîne. Kesekî belengaz û kesib e. Ew tax-tax, kuçe kuçe digere, zembîlan difroşe. Kesekî çeleng, spehî û xweşik bûye. Angorî şaxeke vê destanê Zembîlfiroş berê Mîr û dewlemend bûye, paşê jiyîneke sade ji xwe re hîlbijartîye û xizan ketiye. Rojekê tê bajarê Silîva cîwar dibe, li vir ji xwe re zembîlan difroşe.

³² Ev şaxa destana Zembîlfiroş wek şaxeke edebî hatiye amade kirin û di nav pirtûka Musaelyan de cih girtiye. Ji aliyê Mirad-Xanê Beyazîdî ve hatiye nivîsîn.

³³ *Zembîlfiroş* I-II, Pale, hejmar: 3-4, 1979, Uppsala, Swêd.

³⁴ *Zembîlfiroş* I, Pale, rûp.31.

³⁵ Muhsine Helimoğlu Yavuz, *Diyarbakır Efsaneleri II ve Diyarbakır Üzerine Sekiz Bildiri*, Ankara, 1990, rûp 142.


³⁶ Rohat Alakom, *Di Folklorê Kurdî de Serdestîyeke Jinan*, Nûdem, Stockholm, 1994, rûp.85-87.

²⁹ Ahmet Aras, *Siyabend û Xacê*, Ulkern Kitapevi, İzmir, 1993.

³⁰ Mehmet Ekmen, *Siyabend-i Silivi (Silvanî) ve Hacı'nın Aşk Öyküsü*, Eyyan, hejmar: 5, 1989.

³¹ Mirad-Xanê Beyazîdî, *Çîrokî Zembîlfiroş*, Çapxaney Hewlêr, 1967.

Ji ber çelengbûn, bejn-bala wî, rojekê dema ew dîsa kuçe-kuçe digere, rastî jina mîrê bajêr tê. Dilê vê jinikê dikeve Zembîlfiroş û pêsîra wî ber nade. Zembîlfiroş bi xwe jî kesekî xwedî jin û zarok e. Çavên wî di jina kesî de tune ye, kesekî serbilind, xwedî nefis e. Jina Mîr çî dike nake, nikare wî ji rê derxe, bi wî şa be û rojên xweş bi hev ra derbas bikin. Çawa em ji naveroka destanê û gotinên jina Mîr fam dikin, ew mêrê xwe davêje alîkî, dixwaze Zembîlfiroş kaşî nav cî-nivînan bike. Her çiqas ew bi gotinên xwe yên şehwetî



Wêne: N. Kaya

dinya Zembîlfiroş sero-bino dike, dîsa jî Zembîlfiroş li ber xwe dide, nêzîkê wê nabe. Ew zarokên xwe difikire. Dilpaqijî, helalî û namûs, çawa em dibînin kakilê felsefeya jiyîna Zembîlfiroş pêk tînin. Di dawîya destana Zembîlfiroş de çî tê serê Zembîlfiroş û Xatûnê? Bersîva vê pirsê angorî çend şaxên destana Zembîlfiroş ji hev cuda dibin:

A. Dema Xatûn pey Zembîlfiroş dikeve diçe mala wî, çawa em dibînin Xatûn jina Zembîlfiroş dixapîne, dikeve nav cihê mêrê wê. Ew lempê vedimirine, Zembîlfiroş dema tê dikeve nav cihê xwe wekî razê, Xatûn

ji bîr dike xirxalê lingê xwe derxe û Zembîlfiroş wê çaxê fam dike ku ew ne jina wî ye. Ew Xatûn e. Zembîlfiroş dibe teyrek di kulekê re difire diçe. Xatûn heft sal li pey wî digere, li serê çiyakî rastî şopa wî tê, dibine xûşk û bira, piştî çendekî, Xatûn dimire³⁷.

B. Li ser kaniyekê rastî hev tîn, Xatûn dixwaze Zembîlfiroş ramûse, dema Xatûn zimanê xwe dixwe devê Zembîlfiroş herdu jî dimrin³⁸.

³⁷ J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş-Kurdskeya Poema i ee Folkornie Versii* (Zembîlfiroş-Poema Kurdî û Şaxên Wê Yên Folklorik), Moskova, 1983, şaxa I.

³⁸ J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş*, şaxa II.

C. Agir ji devê Xatûnê derdikeve, herdu jî dişewitin³⁹.

Ç. Diçin cennetê, digihêjin mirazê xwe⁴⁰.

D. Mîr dema pê dihesa wekî jina wî çûye bal Zembîlfiroş, lédixe Zembîlfiroş dikuje⁴¹.

E. Zembîlfiroş xwe ji qesrê de davêje perçe perçe dibe⁴².

F. Dema Mîr dixwaze Zembîlfiroş bikuje, Xatûn dikeve navberê. Kêrê ji destê Mîr digre, zikê Mîr re dike, ew tê kuştin. Paşê Xatûn, Zembîlfiroş û jinzarê wî bi tevayî diçin cîhekî wusan ku dengê axa û mîran li wir nayê⁴³.

G. Jina Zembîlfiroş û Xatûn dibine hêwiyên hev, bi hevra dijîn⁴⁴.

H. Zembîlfiroş û Xatûn di nav xwe de peymaneke gîrêdidin wekî dest ji pêsîra hev berdin. Paşê Zembîlfiroş ji ber daxwaziya bavê, diçe bajarê Diyarbekirê dibe Mîr.

Di nav van şaxan de Şaxa E nîşan dide ku Zembîlfiroş xwe jor de avêtiye û miriye. Ev şaxa hebûna *Qelaya Zembîlfiroş* li Silîva tîne bîra mirovan. Ji bo vê yekê ev şax, hin pêwendiyên hevbeş yên di navbera qehremanê destana Zembîlfiroş, *Qelaya Zembîlfiroş* û bajarê Silîvayê hene, xurttir dike. Beşa dawîn ya vê şaxê waha diqede:

39 J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş*, şaxa IV.

40 J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş*, şaxa VI.

41 J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş*, şaxa VII.

42 J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş*, şaxa X.

43 Şaxa Emîné Evdal (Di nav pirtûka Musaelyan de cîh girtiye).

44 Qanadê Kurdo, *Beytêd Kurdi* (Ev destnivîsa şaxa Zembîlfiroş ya ku Qanadê Kurdo xwe berev kiriye ji 16 rûpelan pêk tê).

...

Qesrê mîrê du derge ye
Pir bilind e dor pencere
Zembîlfiroş xwe avît xarê
Parî lê bû sed hezarê⁴⁵.

Çawa tê dîtin heta mirinê jî Xatûn li pey Zembîlfiroş e, pêsîra wî bernade. Di çend şaxên destanê de Zembîlfiroş her çiqas ji ber Xatûnê direve jî, ji aliyê din wusan tê xuyanê bi kêmanî herdu qehremanê destanê dibin xûşk û bira. Dema em zordestiya mêrê Xatûnê didin ber çavan, em dibînin ku hevkarîyek û dostanetîyek di navbera Zembîlfiroş û Xatûnê de li dijî Mîr peyda dibe. Ev yek Zembîlfiroş û Xatûnê nêzîkî hev dike. Ji aliyê din ji ber xizanî û belengaziyê, jina Zembîlfiroş jî, li dijî Xatûnê stûxar e. Ev yeka jî wek faktorekê, pêwendiyên Zembîlfiroş, jina wî û Xatûnê ji dijmintiyê diparêze û wan di xalekê de dighîne hev û dijayetîya van her sê kesan kêmtir dike. Bêguman ev yeka, mesaja destanê ya li ser helalîyê û dilpaqijiyê ava dibe, nahejîne. Ji ber ku di destanê de motîva helalîyê û dilpaqijiyê gelek xurt e. Lê belê hevbandûriya bûyeran bivê nevê çend dijawariyan ji bo Zembîlfiroş peyda dike, wek mîsal hebûna du jinan û newekhevdîtina Xatûn û mêrê wê... Di şaxeke destanê de li dijî mêrê Xatûnê muxalefetek peyda dibe. Wê çaxê Xatûn wek dijmineke yekemîn nayê hesabîn. Di her du şaxên dawîn de çawa em dibînin Zembîlfiroş jî êdî hatiye guhartin û bûye xwediyê toleransê.

45 J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş*, rûp.140.

Destana Zembîlfiroş ji aliyekî ve destana Ûsif û Zelêxe tîna bîra mirovan. Xatûna ku navê wê di destana Zembîlfiroş de derbas dibe gelekî li Zelêxê çûye, dirûvê wê lê dikeve, wek hev in. Zelêxe jî wek Xatûnê jina mîrekî ye, mîrê Misirê. Dema Ûsif, kurê Aqûb pêxember dibin Misirê, dilê Zelêxê gelekî dikeve Ûsif. Di şaxên Ûsif û Zelêxê yên folklorîk de, çawa em dibînin dema Zelêxe, Ûsif ji xwe re dikire, wê demê Ûsif riya revê digere. Lê belê ji destê vê jînekê xelas nabe⁴⁶. Zelêxe tîne vê carê Ûsif şikyatî mêrê xwe dike, mêr jî tîne wî dixê zindanê. Ev destana di nav kurdan de gelek belav bûye, gelek şaxên wê yên edebî û folklorîk hene. Divê em li vir bidin dîyarkirin ku destana Zembîlfiroş cara pêşîn 1864an ve ji aliyê balyozê (sefir) almanî de li Şamê hatiye berhevkirin û di kovareke zanîstî de hatiye weşandin⁴⁷.

STRANA GUNDÊ CANO Û ANTÎ-MÎLÎTARÎZM

Di dema Şerê Cîhanî yê Yekemîn de çawa ku tê zanîn bi sedhezaran ermenî ji aliyê îdara Ittihat û Terakkî ve hatin qir kirin. Lê belê heta niha jî dewleta Tirkîyê ev kokanîna ermenîyan qebûl nekiriye. Gelek caran ev sûc û gunehê mezin avîtine ser kurdan û xwastine xwe waha xelas bikin. Lê belê gelek dokument û çavkanî şahadetiyê dikin ku ev jenosîd bi destê hêzên leşkerî yên dewletê pêk hatiye.

⁴⁶ M. B. Rudenko, *Şaxên Poema Kurdî Ûsif û Zelêxe Yên Edebi û Folklorîk*, rûp. 297.

⁴⁷ *Zembîlfiroş*, Pale, hejmar: 3, rûp.24, 1979.

Yek ji delilên vê yekê straneke kurdî ye û nîşan dide ku li derdorên Silîvayê gelek qir kirin bi destê leşkerên tirk de pêk hatine:

...

Min bala xwe dayê tebûra esker li kêleka wan e,
Singo li devê tivinga wan e,
Devê singuya li newqa wan e,
Wan ji bajarê Ferqînê deranîn,
Berê wan dane dax û çîya ne...⁴⁸

Bûyerên ku di vê stranê de tên behskirin, li gundê Cano û li nav bajarê Silîvayê de derbas bûne. Gund bi navê Cano gundekî Silîva ye û berê gelek ermenî têda diman. Gotinên vê strana dîrokî ya bi navê Ferman e! wuha ye:

Ferman e!

Gewrî dibê: "Lo-lo Matroso, lo bavo, ferman e,
Welle, îro serê sê roja li aşê Bêzo,
Li gundê Cano li fila dane,
Çi ka ez bi dîyara gundê Cano bikevim
Çi ka dinya çawan e?
Ez çûme gundê Cano, agir berdane gundê
Cano,

Tu kes li ber çavê ne xuyan e,
Ezê çûme çol û pesera ku çîqas laşê zaroka
Li çolê bêxuy û bêxudan mane...
Gewrî dibê: "Lo-lo Matroso, lo bavo,
Çi ka ez li bajarê Ferqînê kevîm dinya çawan e?"
Ez çûme bajarê Ferqînê,
Min dît çar qifle bi hev va girêdane,
Min bala xwe dayê, her qifle li heva girêdane,
Min bala xwe dayê her qiflekê bi hezaran e,
Qiflê pêşî ê pîr û kalan e.
Qiflê dudya ê zava û bûkan e,
Qiflê sisya ê qîz û xortan e
Qiflê çara ê zarokê medresan e,
Min bala xwe dayê tebûra esker li kêleka wan e,
Singo li devê tivinga wan e,
Devê singuya li newqa wan e,
Wan li bajarê Ferqînê deranîn,

⁴⁸ Ordixanê Celîl, *Stranên Kurda yê Tariqiyê*, 1975, Erevan, rûp.101-103.

Berê wan dane dax û çîya ne...
 Bavo ferman e...
 Serê wan jêkirin, cendekê wan bi avê çema
 ve berdane...

Gewrî dibê: "Lo-lo Matroso, lo bavo,
 Çi ka ez li çola Bişêriyê birevim dinya bi
 çawan e?"

Ez bi çola Bişêriyê ketim,
 Cendirmeyê Elmedînê suwarê hespan e,
 Li çol û pesera rewaşîyan e,
 Diçine ser sedê cotan e,
 Serê cotyara jêdikin, gayên wan dibin,
 Emûretê wan bêxuy man e...

Gewrî dibê: "Lo-lo Matroso, lo bavo,
 Çi ka ez bi deşta Reşkota bikevim bi çawan e?"
 Ez bi deşta Reşkota ketime,

Bila Mala Hecf Mihemedê Mistê ava be,
 Hêja tiştê li ber çavên min nexuya ne...

Gewrî dibê: "Lo-lo Matroso,
 Lo bavo ez bi kêşa Xarza bikevim
 Çi ka dinya bi çawan e?"

Ez çûme Awîska apê Musa Begê,
 Min di sed û pênce zilam heva girêdan e,
 Gewrî dibê: "Lo-lo Matroso,

Lo bavo, temam îşxan û giregirê filan e,
 De heb keşîşê fila raserî hemîyan e,
 Kula xudê bikeve mala waliyê Wanê,
 Miteserîfê Sêrtê, qaymeqamê Zoqê,

Midirê Ridwanê, cizmê Koserî li lingê wanin,
 Qamçiyê zivî di destê wan in,
 Demaçê wan li ber pişta wan in,

Qezmax dibin li dora wan e,
 Mi di midirê Ridwanê li ser telqirafê rûdinê,
 Têlqirafekê şande sera Stambolê, paytextê

Sultane,
 Hemû giregir û îşxanê filan e,
 Ji me re ciwab bişîne, em nizanin,
 Ne fermane, ne berdan e...

Sultan ciwabek şande Awîska apê Musa
 Begê,

Dibê: "Lêxin, îro serê çar roja ferman e...
 Li Stambolê şere, şer giran e,
 Li Çeneqelê singo dewran e,

Îzîn hatiye destê me, ji destê alman e,
 Îro çar rojê fermana filan e,
 Çewzo dibê: "Lo-lo Matroso, kula xudê bikeve

Derê mala midirê Ridwanê,
 Satorekî bi destan e, satorê wî tûj e weke dûzan e,

Yeko yeko wan ji şerîdê vedike, serê wan
 jêdike,

Cendekê wan bi avê da berdane,
 Tiştê ku hatiye serê me,

Hemî ji destê kûçîkbavê alaman e...⁴⁹

Angorî çavkaniyên kevn berî sed
 salan li Silîva 2430 ermenî hebûne û
 qasî 511 asurî li bajêr diman. Nifûsê
 misilmanan 4000 kes bûye. Vê gavê li
 Silîva yek ermenî nemaye⁵⁰.

ÇEND RÛPELÊN MAYIN JI DÎROKA SILÎVA

Yek ji kesên ku riya wan li Silîva
 ketiye arkeologa înglîz Gertrude Bell e
 (1868 -1926). Di sala 1911'an de Silîva
 ziyaret kiriye. Gertrude Bell, li vir
 gelek sûretên cihên dîrokî yê Silîvayê
 kişandine, wek Camiya Selahadîn
 Eyubî û gelek cihên din. Hemû ev
 sûretên Silîvayê niha li Londrayê di
 arşîva bi navê Arşîva Gertrude Bell e
 tên parastin. Gertrude Bell di nameya
 xwe ya bi tarîxa 3/5. 1911 de behsa vê
 gera xwe ya Kurdistanê dike⁵¹.

Li Silîva gelek bûyer, serpêhatî ,
 efsane û çîrok derbas bûne. Yek ji van
 jî serpêhatiya Ataturk û Makbûle
 Xanima Sadik Beg e. Çawa tê zanîn di
 sala 1916'an de Ataturk li Silîvayê wek
 Komutanê Kolordiyê hatiye tayîn-
 kirin⁵². Di vê demê nasiya xwe dide
 Sadik Begê Silivî. Ataturk ji bo ku
 navbera xwe û Sadik Begê xweş bike,

⁴⁹ Ordixanê Celil, *Stranên Kurda yê Tarîqîyê*, 1975, Erevan,
 rûp.101 103.

⁵⁰ Cuinet, *Le Turquie d'Asie II*, rûp. 470-72. Chapot, *Le
 frontiere de l'Euphrate*, rûp.359-61.

⁵¹ Adresa siteyê: www.gerty.ncl.ac.uk

⁵² Ayşe Gülben, *Mustafa Kemal Paşa Silvan'da iken*, Kara-
 Amid, hejmar: 15, 1981.

bûye kirîvê kurê wî
 yê bi navê Recep.
 Keçeke Sadik Begê
 hebûye, navê wê
 Makbule Xanim
 bûye. Makbûle
 Xanim, keça birayê
 mezin yê Sadik Begê
 ye, hinek dibêjin ku
 Makbule Xanim keça
 Miharem Begê ye, ev
 yeka ne rast e. Çawa
 tê gotin ku dilê
 Ataturk dikeve
 Makbuleyê. Hinek
 dibêjin Ataturk bi vê
 keçikê ve dergistî
 bûye û paşê ew ber-
 daye. Ataturk dema li
 Silvanê dima di
 xaniyekî mezin de
 dijiya. Ev xaniya yê
 Memed Begê
 Hezroyî (Budak) bû.
 Cihê karê Ataturk jî
 yê Sadik Beg (Ûstûn)
 bûye⁵³. Çawa me li
 jor jî da kîvê mala
 Ataturk cihêkî din
 bûye. Lê belê Ataturk
 çadira xwe demekê
 aniye ber derê mala
 Sadik Beg vegirtiye.
 Çima ber derê vê mala
 Sadik Begê? Wusan tê dixuye ku dilê wî
 zêde ketiye Makbûle Xanimê. Heta niha
 jî cihê vê çadirê hatiye parastin. Angorî
 zemînê mala Sadik Begê, cihê çadirê
 bilindcihek e û gulover e. Li dora vî cihê
 bi çemberan ve hatiye çeper- kirinê⁵⁴.



Koçero

Piştî ku Ataturk ji Silva diçe, Makbule
 Xanim jî bi yekî mayîn re dizewice û
 mala xwe koçî Îstenbolê dîkin. Angorî
 hin kesan mêrê wê dibê xweyê
 Fabriqeya Pirelli, navê wî Fikret
 Şemîn bûye. Hin kes dibêjin ew jî
 malbata Bedirxaniyan bûye.

Birayê Sadik Begê, Miharem Beg jî
 gelek hatiye nasîn. Ew xweyê çend

⁵³ Şevket Beysanoğlu, *Diyarbakir Tarihi*, cild II, rûp.786

⁵⁴ Dema sala 2000'an de ez çûme Silva, min ev cihê
 çadira Ataturk bi çavên xwe dit û sûretê wê kuşand.

zarokan bûye: Remziye, Fikriye, Hesen, Îhsan, Mehmet û Yûmmû. Ji van Yûmmû Beg 15 zarokên wî çêbûne, yek ji wan Ferîha Xanim e ku ji me re behsa malbata xwe kir. Qonaxa wan niha jî heye, bi navê Koşka Mala Beg tê nasîn. Sadik Beg birayê mezin, Miharem Beg birayê piçûk bûye. Navê bavê wan Evdile Beg, navê bavê Evdile Begê jî, Mîrze Beg bûye. Malbata Evdileh Begê, Ezîzoxullarî û Malbata Elî Begê li Silîva wek sê malbatên dewlemend û esilzade hatine nasîn. Piştî Serhildana Şêx Seîd hin kes jî Silîva hatine girtin û hikumetê ew nefiyê cihê mayin kirine. Yek ji wan malbatan, malbata Miharem Begê ye. Çawa di sûretekî van salan de hatiye kişandî de tê xuyan, Miharem Beg û kurê wî Hesen Beg jî hatine nefîkirin⁵⁵.

Yek ji wan eşqiyayên ku li dorberê Silîva nav daye bêguman *Koçero* ye. Ew bi xwe jî Silîvayê ye û di sala 1923an de li gundê Hêlsîn hatiye dinyayê. 14 salan li serê çîyan geryaye, xwe nedaye dest. Navê wî yê rastîn Mehmet Îhsan Kilit bû. *Koçero* pismamekî xwe kuştibû, piştî vê bûyerê derketibû serê çîya. Wê demê 23 salî bûye. Li gelek deverên Kurdistanê geriyaye. Di dawiyê de dema li Batmanê davêje ser şantiya petrolê, ji aliyê cendirman ve di roja 3/7/1964 an de tê kuştin. Zirara wî tu wext negihîştîye belengaz û xizanan. Ji ber vê yekê di nav gel de hatiye hezkirin, bûye efsaneyek. Piştî kuştina wî, gelek serpêhatî, kilam û stran hatine gotin. Helbestvan Hasan

Huseyin Korkmazgil⁵⁶ çawa tê zanîn helbesteke dirêj bi navê *Koçero* û Orhan Duru jî bi wî navî serpêhatiyek nivîsiye⁵⁷ û jiyana wî bûye babeta pirtûkekê⁵⁸. Di derbarê Silîvayê de divê em navê pirtûka Ruşen Arslan ya bi navê *Nîyazî Usta* jî bi bîr binin⁵⁹.

⁵⁵ Ji arşîva nivîskar.

⁵⁶ Hasan Hüseyin Korkmazgil, *Koçero Vatan Şiiri*, Bilgi Yayınevi, 1971.

⁵⁷ Orhan Duru, *Sarmal*, Toplu Öyküler, YKB (*Koçero*: rûp. 253-258).

⁵⁸ M. Ali İzmir, *Son Eşkıya Koçero*, 2004.

⁵⁹ Ruşen Arslan, *Niyazi Usta*, Doz Yay, 2004.

**Eliyê Teremaxî û Dîtinên wî yên li ser Rêçikên
Rêzimana Kurdî li Gor Pirtûka wî ya bi Navê "
Destûra Zimanê Erebi bi Kurdî Digel Hinde Nimûneyêd
Farisî û Kurdî"**

Amadekar: Mamoste Qedri

**ÇEND GOTIN DERBARÊ
'ELİYÊ TEREMAXÎ Û
PIRTÛKA WÎ DE***

Eliyê Teremaxî zimanzan û wêjekarê kurd ê navdar e. Ji gundê Teremaxê ye ku ev gund di navbera bajarê Hekarî û navçeya Muksê de ye. Ciyê jidayikbûn û mirina wî ev gund e. Di hinek berhevan de wekî "Termûkî", "Termûxî" û "Termakî" jî derbas dibe. Teremaxî piştî ku xwendina xwe ya medreseyê li deverên mîna Mosil, Besra, Bexdad û "Camî'ul-Ezher" a Misrê tamam kiriye, vegeyriyê gundê xwe û li wê derê jî bo dersdana feqîyan mizgeft û medrese ava kirine.

*Ji bo agahiyên bêtir derbarê Eli Teremaxî binêrin: Muhemmed Emin Zekî Beg, *Hulasetu Tarihî Kurd ve Kurdistan*, wergêr ji bo Erebi: Muhemmed 'Eli 'Ewnî, çapa duyemîn, Beyrut, 2003, cild: 2, r. 293; eynî nivîskar, *Kurd ve Kurdistan Ünlüleri*, Wergêrên ji Erebi jî bo Tirkî: M. Baban, M. Yağmur, S. Kutlay, çapa duyemîn, weşanên

Di dema Eliyê Teremaxî de feqî û şagirdên kurdan di medreseyan de destûra zimanê erebî jî kitêbên ku bi erebî hatine nivîsandin hîn dibûn. Lê Teremaxî bi armanca ku hînbûna destûra zimanê erebî jî bo feqiyên kurd yên ku hîn nû dest bi xwendinê dikin hêsantir bike, di sala 1000'ê koçî de, ku beramberî bi 1591-1592 yê zayinî dike, bi kurmancî kitêbek bi navê "*Destûra Zimanê Erebi Bi Kurdî Digel Hinde Nimûneyêd Farisî û Kurdî*" nivîsandîye. Ev zimanzanê kurd di vê

Apec, Spanga/Sweden, 1998, r. 271; Kamûran Eli Bedirxan - Luîs Paul Margret, *Dirasetun Fi'ş-Şi'rî'l-Kurdî*, Wergêr ji bo Erebi: Refîq Hilmî, Paris, 1937, r. 14-27; Bilêç Şêrko, *el-Qadiyyetu'l-Kurdiyye: Madî'l-Kurd ve Hadîmulum*, Kahire, 1930, r. 23-24; Marîf Xeznedar, *Destûrê Zimanê Erebi Bi Kurdî: Eliyê Teremaxî*, çapxana Daru'z-Zerman, Bexdad, 1971; Îzzeddin Mustefa Restûl, *el-Wakî'yye Fi'l-Edebî'l-Kurdî*, Beyrut, r. 57-59; Reşîd Findî, Eli Teremaxî Yekemîn Rêzîmannivîs û Pexşannivîsê Kurd e, Bexdad, 1985; Feqî Huseyn Sağniç, *Diroka Wêjeya Kurdî*, weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, çapa yekemîn, Stenbol, 2002, r. 387-390; *İslam Ansiklopedisi*, Stenbol, 1955, cild: 6, r. 1114.

pirtûka xwe de gava di hinek babetan de li ser rêçikên rêzimana erebî sekiniye, wekî muqayese rêçikên rêzimanê farisî û kurdî yên di wan babetan de jî diyar kiriye.

Wêjekarê kurd ê navdar Mela Mehmûdê Beyazîdî di sala 1274ê koçî de, ku beramberî bi 1857-1858ê zayinî dike, pêşgotinek li ser vê pirtûkê nivîsandiyê û pirtûk wekî destnivîsek teslîmî Qonsolosê Rûsî yê bajarê Erzeromê Aleksander Jaba kiriye. Marif Xeznedar ev destnivîsa ku li Lenîngiradê di Pirtûkxaneya Amojgeha Rojhilatnasî ya girêdayê bi Akademiya Zanistî ya Sovyetê de bi hejmara C1958 hatibû qeydkirin, di sala 1971ê de bi dest xistiye û di eynî salê de bi navê "Destûra Zimanê Erebi Bi Kurdî: Eliyê Teremaxî" li Bexdadê daye çapkirin.

Reşîd Findî, rêçikên ku Elî Teremaxî di vê pirtûkê de derbarê rêzimana kurdî aniye zimên, di kitêba xwe ya bi navê "Eliyê Teremaxî Yekemîn Rêzîmannivîs û Pexşannivîsê Kurd e" (Bexdad, 1985) de kom kirine û bê ku dest bide orijînalê wan, bi alfabeya kurdî ya Başûr bi tîpên erebî nivîsandiyê. Findî di vê pirtûka xwe de -çaxa ku ji navê wê jî tê fêmkirin- pêşniyaz dike ku Teremaxî wekî yekemîn rêzîmannivîsê kurd bê qebûlkirin.

Elî Teremaxî di diyarkirina dîtinên xwe yên li ser rêçikên rêzimana kurdî de term û bêjeyên wê demê bi kar anîne, ku ev term û bêjeyên han bi giranî erebî ne. Çawa ku me got, Reşîd Findî jî dest nedaye tekstên Teremaxî û wan bi şiklê xwe yên orijînal qeyd

kirine. Lê kesê ku têra xwe di ziman û rêzimanê erebî de pispore nebe, mimkûn nîn e ku ji van gotin û term û bêjeyan fêm bike. Ji ber vî, me xwest ku em hem orijînalê wan bi tîpên latînî binivîsîn hem jî wan wergerînin kurdiya nûjen. Em di vê nivîsa xwe de cihê nadine nîrx û şîroveyan li ser kêmasî û usûlban û em destê nadine mînakên orijînal yên ku Teremaxî bi kar anîne û Findî qeyd kirine. Lewra niyeta me ew e ku em di demê bê de hem vê xebata Teremaxî, hem jî xebata Yusuf Ziyadîn Paşa ya li ser rêzimana kurdî di pirtûkek de bicivînin û bi hûrgilî li ser wan bisekinin.

**FESL DI BEHSA FÊLA
MUDARî DA YE**

Di zimanê Kurmancî da pênc siçe bi der dikevin, zêde nabin. Weku niha:

Diçî, diçe, diçîn, diçim, diçîn.

Efalêd mayî jî li van qiyas bike. Evne pênc siyejan ji demayirêd kurmancî hene. Weku niha:

Tu, ew, hûn, ewan, em, me.

Eve şeş demîr jî demayirêd wan efaletan ne, diçel wan tene 'emilandîn.

**(EV) QISIM DERBARÊ
LÊKERA DEMA NIHA DE YE**

Di zimanê kurmancî de pênc rawek çê dibin, zêde nabin. Mînak:

Diçî, diçe, diçîn, diçim, diçîn.

Lêkerên din jî li van qiyas bike. Ji bo cînavkên Kurmancî pênc rawek hene.

Mînak:

Tu, ew, hûn, ewan, em, me.

Ev şeş cînavkên han jî cînavkên wan lêkeran in, bi wan re tên bikaranîn.

**FESL- DI BEHSA EMRÊ
HADIRÎ DA YE**

Me'lûm bibe ku emrê hadirî bi herfa "ba"yê dibe. Weku ba di îbtîda da waki' bibî 'elametê emrê ye. Bi zimanê kurmancî Dîsanê pênc sije di emrê hadirî da jî dibe. Mesela weku niha:

Bide : Yanî mufredê muxateb e; çî muzekker e çî muennes e.

Bidet : Yanî mufredê gayib e; çî muzekker e çî muennes e.

Bidin: Yanî hûn tesniye û cem'a gayiban; çî muzekker çî muennes e.

Bidim: Yanî ez ku mutekellim wehde me.

Bideyin: Yanî em ku mutekellim me'elşeyr in, em bideyin...

**(EV) QISIM DERBARÊ
RAWEKA FERMANÎ DE YE**

Bila bê zanîn ku raweya fermanî bi daçeka "bi"yê çê dibe. Heke "bi" di serî de cih bigire nişana fermaniye ye. Mînak:

Bide: Ango kesê duyemîn e, çî nêr dibe çî mê.

Bidet: Ango kesê sêyemîn ê yekjimar e, çî nêr dibe çî mê.

Bidin: Ango hûn du kes û pirjimarên sêyemîn, çî nêr dibin çî mê.

Bidim: Ango ez ku kesê yekemîn ê yekjimar im.

Bideyin: Ango em ku kesên yekemîn ên pirjimar in.

FESL- DI BEHSA MESDERÊ DA YE

Mesder goya eslê fê'lê ye; bê zeman û bê fa'îl û mef'ûl e; mutleq 'ibaretê wê fê'lê ye. Mesela weku niha lefzê "fê'l" bixwu mutleq ibaret e ji kirinê. Lakin mucerred e ji zemanê û mesder e. Mesadirêd efalêd Farisiyê ne ile di axirê wan da "dal" tunine, belku ekserî "ya" û "nun" dibin. Mesela weku niha:

Kirin, bîrîn, xwerin

Yanî mutleq kirin û birin û xwerin mirad e. Paşê weku sije jê cuda dibin wê weqtê fê'l û fa'îl û mef'ûl û madî û mudarî jî me'lûm dibe.. Di Kurmancî da jî 'elametê mudarî "dal" e di îbtîda da dibe, eger fê'l mitte'edî be. Mesela weku niha:

Dîde, dîbe, dîçe

Eger fê'l lazim bî êcarê ew "dal" di axirê fê'lê da heye. Weku niha:

Siwar dîbe, radîbe, radîke

Evne jî fê'lêd mudarî, 'elametê fê'la mudarî "dal" e, lakin di axirê kelîmeyê dibe.

**(EV) QISIM DERBARÊ
RADERÊ DE YE**

Rader wekî eslê lêkerê ye; bê dem û kirde û bireser e. Hew tenê ibaretê ji kirinê ye. Bo nimûne bêjeya "fê'l"(kirin)ê bixwe jî bi tenê ibaretê ji kirinê ye. Lê ji demê vala ye û rader e. (Raderên kurmancî wekî) raderên lêkerên farisî ne. Lê di dawiya wan de "d" tune. Belkî bi piranî "y" û "n" dibin. Mînak:

Kirin, birin, xwerin

Ango hew tenê kirin û birin û xwerin mabest e. Piştî ku rawek jê çê

dibin wê demê lêker û kirde û bireser û dema borî û dema niha jê tê zanîn.. Di kurmancî de jî nîşana dema niha "di" ye. Eger lêker gerguhêz be di serî de dibe. Wekî niha:

Dide, dibe, diçe

Heke lêker negerguhêz be, vê carê "di" di dawiya lêkerê de tê. Wekî niha:

Siwar dibe, radibe, radike

Vanan jî lêkerên dema niha ne. Nîşana lêkera dema niha "di" ye, lê di dawiya bêjeyê de dibe.

FESL- DI BEHSA ISMÊ FA'ILÊ DA

İsmê fail, navê failê wê fêlê ye. Lakîn di elfazêd kurmancî bi xwe serê ismê fail bi lefz bitenê nabî; belku lazime lefza "ê" di berî wî kelimê bête zikirkirin. Weku niha ji boy mufredan dibêji:

Ê kuştî, ê kirî, ê xwerî

Evne mufred in. Çi muzekker çî muennes, hadîr çî ğaîb.

Emma ismê fa'ilêd tesniye û cem'êd zimanê kurmancî bi ğeyrê ji lefza "ê" di îbtîda da, di axirê da lefza "nûn" û "ha" yek dibî ku delalet dike ku ev fa'ilane tesniye we yaxud cem' in. Mesela weku niha:

Ê kuştine, ê kirine, ê xwerine

Yanî ew tesniye û cem'êd ku kuştî ne û kirî ne û xwerî ne.

(EV) QISIM DERBARÊ PARENGA LEBATÎ DE YE

Parenga lebatî navê kirdeyê wê lêkerê ye. Lê di peyvên kurmancî de

parenga lebatî bi serê xwe tenê nabe. Belkî lazim e peyva "ê" berya wê bê gotin. Bo nimûne ji bo yekjimarên wiha dibêjin:

Ê kuştî, ê kirî, ê xwerî

Evan yekjimar in. Çi nêr dibin çî mê, çî kesên duyemîn dibin çî sêyemîn.

Welê parengên lebatî yên ji bo du kes û pirjimarên di zimanê kurmancî de ji bilî peyva "ê" di serî de, di dawiyê de peyva "n" û "e" yê (jî) dibe û diyar dike ku ew kirdeyên han du kes in an jî pirjimar in. Wekî niha:

Ê kuştine, ê kirîne, ê xwerîne

Ango ew du kes û pirjimarên ku kuştine û kirîne û xwerîne.

FESL- DI BEHSA ISMÊ MEF'ÛLÊ DA

İsmê mef'ûl nav e ji boy wî tişteki ku ew fêl li ser wî tiştî we yaxud ser wî mirovî waki' bûye. Lakîn di ismê mef'ûlê zimanê kurmancî da di axirê da lefza "ya" dibê. Ew 'elametê ismê mef'ûlê ye. Weku niha:

Kuştî û birî û girtî

Evne nav in ji boy mufredêd meqtûl û birî û girtiyan. Yanî ferdek hatiye kuştin û birin û girtin; çî muzekker çî muennes, çî hadîr çî ğaîb e.

Emma tesniye û cem'êd wan ji "ya" û "elîf" û "nûn" dibin. Mesela weku niha:

Kuştiyan, biriyar, girtiyan

Evne ji boy tesniye û cem'êd ismê mef'ûlan e. Yanî evne ismê ji boy tesniye û cem'êd meqtûlan û şey'ê birî û mehîbûsan; çî muzekker çî muennes, çî hadîr e û çî jî ğayîb e.

**(EV) QISIM DERBARÊ
PARENGA TEBATÎ DE YE**

Parenga tebatî nav e ji bo wî tiştê ku ew kirin li ser wî tiştî an jî li ser wî mirovî tê holê. Lê di parenga tebatî ya zimanê kurmancî de di dawiyê de peyva "-î" dibe. Ew nişana parenga tebatî ye. Wekî niha:

Kuşti û birî û girtî

Ev nav in ji bo yekjimarên kuştî û birî û girtî. Ango kesek hatiye kuştin û birin û girtin. Çi nêr dibe çi mê, çi kesê duyemîn dibe çi sêyemîn.

Welê du kes û pirjimarên wan jî (bi) "y" û "a" û "n" (-yan)dibin. Wekî niha:

Kuştiyan, biriyan, girtiyan

Ev ji bo du kes û pirjimarên parengên tebatî nin. Ango ev nav in ji bo du kes û pirjimarên kuştî û tiştên birî û girtiyan. Çi nêr dibe çi mê, çi kesê duyemîn dibe çi sêyemîn.

FESL- DI BEHSA NEHYÊ DA NE

Me'lûmê te bibe, ku nehiy bi me'na men' e. Yanî men'a fê'la şoleki ye. Ew jî 'eksa emrê ye. Lewra ew emrê bi fê'la wî şolî ye, lakîn nehiy men'a fê'la wî ye.

Nehya kurmancî ji hisêb ke ku ew ji mislê nehya farisî ye; ew jî bi "mîm" û "nun" e. Weku niha dibêji:

Meke, meken, neke, neken, nakem, nakeyin

**(EV) QISIM DERBARÊ
NEYINIYA RAWEYA FERMANÎ
DE YE**

Divê tu bizanî, ku wateya neyiniya raweya fermanî qedexekirin e. Ango

qedexekirina tiştêkî ye. Ew jî 'eksa fermaniyê ye. Lewra fermanî emrê bi kirina wî tiştî ye, lê neyiniya fermanî qedexekirina kirina wî ye.

Neyiniya raweya fermanî ya kurmancî jî hema bibêje ku wekî ya karisî ye; ew jî bi "me-" û "ne-"yê ye. Wekî niha:

Meke, meken, neke, neken, nakem, nakeyin

**FESL- DI BEHSA ĞAYÎB DA NE Û
DEMAYÎRÊD WAN DA YE**

Demayirêd Ğayibêd zimanê kurmancî ji hisêb ke weku zimanê farisî ye:

Ew, ewî, wan, ewan

Demayirêd Ğayibe evne, me'lûmî te ye.

**(EV) QISIM DERBARÊ KESÊN
SÊYEMÎN Û CÎNAVKÊN WAN
DE YE**

Cînavkên kesên sêyemîn yên zimanê kurmancî jî hema bibêje mîna (yên) zimanê farisî ne:

Ew, ewî, wan, ewan

Cînavkên kesên sêyemîn ev in, tu dizanî.

**FESL- DÎ BEHSA DEMAYÎRÊD
HADIRE YÊ**

Melûmê te bibe ku ji boy hadiran ji mexstûs e demîr hebin. Weku niha:

Tu, ez, em, hûn

Ev demirene zav misal heyin, lakîn hinde qeder ji boy muhtedîyan kaftî ye. Teşîla wan ji kûtebêd serjê me'lûmê te dibî...

(EV) QISIM DERBARÊ
CÎNAVKÊN HAZÎR (KESÊN
DUYEMÎN Û YEKEMÎN DE YE

Tu bizan ku divê ji bo kesên hazir jî cînavkên taybet hebin. Wekî niha:

Tu, ez, em, hûn

Ev cînavkên han gelek mînakên xwe hene. Lê ji bo nûdestpêkeran ev qas bes e. Tu dikarî kîtkîteya wan jî pirtûkên li ser rêziman hîn bibî.

FESL- DI BEHSA ÎSMA DA YE

Esmâ'ed kurmancî jî mufred cuda ne. Weku niha ferdek jî vana. Lakin tesniye û cem'ed wan jî weku farisiyan bi elîf û nûnan têtin. Weku niha:

Merevan, daran, hespan

Evne ji boy tesniyeyê jî û cem'ê jî têtin û ferqa muzekker û muennesî jî nabê. Yanî jî vana herdu û cema'etek jî dibin...

(EV) QISIM DER BARÊ
NAVDÊRAN DE YE

Cînavkên kurmancî jî yekjimar cuda ne. Wekî niha kesek jî vana. Lê du kes û pirjimarên wan jî mîna yên farisî bi "a" û "n" tèn. Mînak:

Merevan, daran, hespan

Ev jî bo du kesan jî, jî bo pirjimarên jî tèn û ferqa nêrîtî û mêyîtîyê jî çê nabe. Ango hem jî bo van herduyan hem jî jî bo komeke dibin.

FESL DI BEHSA
